

HÊVÎ

KOVARA ÇANDIYA GIŞTİ



\$ 6 (Etranger)

HEJMAR 3 / SEBAT 1985

40 FF

ESPOIR

HÊVÎ

Revue culturelle kurde
No. 3 - Février 1985

Prix : 40 FF

Directeur de la publication : Helkewt Hekim

Réalisation : Joséfa Bertolino, Ali Bucak et Mohamad Hassan

Collaborateurs : Ibrahim AHMED (Angleterre), Rojen BARNAS (Suède), Ferat CEWERI (Suède), Dr. Kemal FUAD (Berlin), Dr. Cemşid HEYDERİ (Suède), KENDAL (France), MALMISANIJ (France), Simko NAKAM (France), Ferhad ŞAKELİ (Suède), Hesen SEYF (Suède), ZILFI (Berlin).

SOMMAIRE

- Hommage à Yilmaz Güney et à Cigerxwîn	7
- Souvenirs d'Ihsan Nouri Pacha sur la révolte d'Agrî (1927-1930)	25
- Notes sur l'écrivain Enwer Mayî - <i>Dr. Rêzan</i>	39
- L'enfant malade (nouvelle) - <i>F. Ceweri</i>	43
- Le dernier jour de la vie de Mistê (nouvelle) - <i>S. Sorekli</i>	46
- Memê û Eysê (pièce de théâtre) - <i>X. Çaçan</i>	55
- Poèmes inédits - <i>T. Reşit, B. Brecht, Cankurd, M. Hamî, Birindar, Amed, D. Zengî</i>	73
- L'anathème dans le folklore kurde - <i>M. Lewendî</i>	80
- Publications récentes	87
EN KURDE DUMİLİ	
- Recueil de folklore dumili - <i>Malmîsanij</i>	93
- Deux poèmes - <i>E. Gökçe</i>	105
- Les aventures de Silêman Gence (conte)	107
- Le combat de Nérib et Siwan - Texte recueilli par <i>P.I. Lerch</i>	109
- Bibliographie dumili - établie par <i>Malmîsanij</i>	114
- Le genre et le pronom dans le dialecte dumili - <i>Dr. Q. Kurdo</i>	118
EN KURDE MÉRIDIONAL	
- Hommage à Yilmaz Güney, Cigerxwîn et Sicadî	
- <i>S. Nakam, Dr. M. Xeznedar, H. Hekîm</i>	203
- A propos du recueil de nouvelles de Mem - <i>Sepan</i>	192
- Un aperçu du folklore kurde - <i>K. Husamî</i>	170
- Poèmes inédits - <i>E. Peşêw, E. Qadrî Caf, E. Şerîfi</i>	163
- La Fuite (nouvelle) - <i>F.K. Ahmed</i>	148
- Le Secrétaire de cellule (nouvelle) - <i>S. Şêxaxayî</i>	137

La revue Hêvî (Espoir) est une publication bi-annuelle de l'Institut Kurde. Elle est ouverte à tous les courants de la vie culturelle kurde.

Les textes publiés n'engagent que la responsabilité de leur auteur.

Pour toute correspondance, écrire à : Institut Kurde de Paris, 106, rue La Fayette, 75010 PARIS - FRANCE. Tél : 824 64 64.

HÊVÎ

KOVARA ÇANDÎYA GİSTÎ



HEJMAR 3 / SEBAT 1985

**Imprimé en France
Copyright INSTITUT KURDE DE PARIS - 1985 -ISSN 0761 - 1242**

Kurmanç di dewleta dinê da
Aya bi çi wechî mane mehrûm ?
Bîlcimle ji bo çi bûne mehkûm ?

Ehmedê Xanî (sedsala XVII)

SERECEM

KURMANÇÎ

- Biranîna Yilmaz Güney û Cigerxwîn 7
- Ji nameyêñ hatî 21

BELGE

- Biranînen Ihsan Nûrî Paşa (II) 25

ZIMAN Û EDEBIYAT

- Kanî Berhemên Enwer Mayî ? - *Dr. Rehber Rêzan* 39
- Lawikê Nexweş - *Firat Ceweri* 43
- Roja Dawî ji jiyana Mistê Kurê Salha Temo - *Şahînê Sorekli* 46
- Memê û Eyşê - *Xelilê Çaćan* 55

HELBEST

- Ax dayê, dayê - *Tosînê Reşît* 73
- Welatê me - *Bertolt Brecht* 74
- Ez û Kewê - *Cankurd* 75
- Zîndan - *Mejdal Hamî* 76
- Yekitî - *Birîndar* 77
- Tirali - *Amed* 78
- Kurmê darê ne jê be xera nabe tucarî - *Dilawer Zengî* 79

FOLKLOR

- Nifir - *M. Lewendî* 80
- PIRTÜKÊN NÜ 87

DUMILÎ

- Folklorê Ma ra - <i>Malmîsanij</i>	93
- Wa Suwend bo, wa şirt bo - <i>Enver Gökçe</i>	105
- Ca'deyanê ma di zî - <i>Enver Gökçe</i>	106
- Maceraî Silemonî Gince	107
- Qawxê Nêrib û Sîwanî - <i>P.I. Lerch</i>	109
- Welat Welatê Kurdon o - <i>Xortê Kurd</i>	112
- Xona Hecî	113
- Bibliyografa dimilî - <i>Malmîsanij</i>	114
- Haletekanî cins û bînay berkar le zaza da - <i>Prof. Qanatê Kurdo</i>	118

KURMANCIYA XWARÊ


- Rijanî estêreyêkî pirişîngdar - <i>Dr. Marif Xeznedar</i>	203
- Diwa Sefer rîbwarêkî nesrewt - <i>S.N</i>	201
- Koçî Sêyem - <i>H. Hekîm</i>	197
- Namey hawrêyan	195
- Bûmelerze le gomî meng da wi berew asoyekî geştilir - <i>Sepan</i>	192
- Serincêkî serpêyê - folklorî kurdî - <i>Kerîmî Hisamî</i>	170

HELBEST

- Sedan Sal e - <i>Ebdulla Peşêw</i>	163
- Zengoley yad - <i>Enwer Qadir Caf</i>	159
- Siware - <i>Ehmed Şerîfi</i>	154

ÇIROK

- Helhatin - <i>Fazil Kerîm Ehmed</i>	148
- Serşane - <i>Siyamend Şêxaşayî</i>	137



BÎRANÎNA YILMAZ GÜNEY û CIGERXWÎN


Enstituya Kurdî di şinê de ye, çand û hinera kurdî di şinê de ne, gelê kurd xemgîn e : di nav çend heftên payîza reş a 1984 de du hîmdarê Enstituyê, du şerkarêne tirsnezan ên azadiyê ji nav me çûn, du sitûnêni jiyana me ya çandî hilweşîyan, du stêrkêne ges ên esmanê Kurdistanê xuricîn.

Hevalê me Yilmaz Güney hê 47 salî bû. 25 salên pêşîn ên jiyana xwe, wekî piraniya Kurdan, di nav tunebûn, belengazî û hezar û yek dijwarî de derbas kiribû. Qasî 12 salan jî di zindanan de. Bi filmên xwe, bi pirtûkên xwe, xwe bi hemû cihanê dabû qebûl kirin, bûbû dengê xurt ê azadîxwazên Tirkîyê, remza şerkarı û têkoşeriyê, hêviyek mezin ji bo doza kurdî. Ew hê nû gihiştibû azadî û serbestiyê, dixwast xwestek û meremên xwe yên salan bibe serî, bi dehan film çêke li ser rewşa Kurdan, li ser şerê Kurdan, trajediya Kurdan bi temamî dinyayê bide nasîn. Haziriya her du filmên pêşîn pir jî pêş ve çû bû. Feleka bêbext dest neda, mirina bêwext û xedar nehişt ku ev xewn û kam bibin pêkahî.

Cigerxwîn Seydayê me bû, çîrûska welatparêziya kurdî wî xist dilên çend newşen Kurdan. Xwendekar an feqeh, xwenda an mela, mîvîskar, ronak-bîr, helbestvan an dengbêj, têkoşer û welatparêzên kurd ên cil salên dawîn, xasme yên Kurdistanâ Tirkîyê û Sûriyê, hîşyarbûna xwe ji Cigerxwîn re deyndar in. Piştî ev çend salên têkoşîn û keftelefte Seydayê me yê hêja bê ku rizgarbûna perçeyekî Kurdistanê bibîne, li şaristana wefat kir.

Ewê her du lawêni giranbiha yên gelê kurd bi afirandinêni xwe timî di dil û têkoşîna me de, di dilên newşen Kurd ên nû de bijîn. Baştırîn bîranîna wan domandina têkoşîna wan e.

Di vê hejmarê de em bi kurtî jînegariya wan bi bîr tînin û ewê di payîza 1985 de «Hêvî» hejmarêni taybetî li ser wan derîne.



GOTAREKE YILMAZ GÜNEY *

Hevalên min ên héja,
hogirên min,
û mîvanên héja,

Hun bi xêr hatine, silav li we ...

Wekî hun dizanin, Newroz ji bo gelê kurd nîşana berxwedana dijî zali-man û zordestiyê, dijî dilsarî û teslîmiyetê, nîşana şerê azadî û serxwebûnê, nîşana yekîtî û hevgirtinê ye.

Ez dizanim ku dilên hevalên ku îro li vê derê civiyane bi tevayî bi van hisan lê dixe. Ewê dilê zarokên me jî ji bo van hisan lê xe. Ji bo azadî û serxwebûnê, ji bo ku belavbûnê vagerînin yekîtiyê...

Heya îro di ber van amancan de gelek gorî hatin dayîn, wê hê jî bêñ dayîn, ji ber ku bê gorî serketin ne mimkin e. Divê ku em xwîn û hêşiran bidin ber çavan. Em dipirsin : gelo kes dikare dengê dilekî teji ezm û inyat, teji bawerî bibire ? Em dîsa dipirsin : gelo mimkin e ku serê gelekî ev qas bîqerar, ev qas mîrxas û fedakar bê tewandin ? Tucar...

Geli hevalan, cefa, stem, belengazî, xwîn û hêşirên çavan qedera gelê kurd nîne. Em vê qederê red dikin, em vê qederê nas nakin. Em naxwazin ku zarokên welatekî ji çar alî de işxalkirî, mistemleke bimînin, dixwazin bibin zarokên welatekî kurdî serbixwe, yekbûyî û azad, zarokên Kurdistanê. Em dixwazin li welatê xwe, li ser axa xwe, bi zimanê xwe stranê evîn û azadiyê bistirêñ.

Em dixwazin dinya xwe bi destêñ xwe ava kin, axa xwe bi destêñ xwe bi kar bînin, teşeyêñ nû bidin wan û em dixwazin li ser axa xwe di bin ala xwe

* Yilmaz Güney vê gotarê 18 adar 1984 di cejna Newroz a ku Enstituya Kurdi li Parisê çêkiribû li ber du hezar mîvanan bi zimanê tirkî got. Yilmaz ditinêñ xwe yên li ser rizgariya gelê kurd tucar bi vê zelalî û xurtahiyê negotibû. Gelo jê re çê bûbû ku ev cara dawîn e ku ew li hasa gelê xwe dipeyive ? Gili û şireten vê gotarê férêñ jiyanekê dewlemend, berhemên céribandin û ramanêñ salan in. Gotar wesiyatnameyek e ji bo welatparêzen kurd, ji bo caniya Kurdistanê, ji bo newşen nû yên Rôhelata Navîn.

de serbest û serbixwe bijîn. Em dîsa ji bîr nakin ku menfeeta karker, gundî û xebatkarêñ kurd, tirk, ereb û ecem di avakirina dewletên yekbûyî û xurt de ye. Lê yekîtiyek weha bi pêkanîna hoyêñ (şertêñ) yekîtiya bidil mimkin e. Heke ev tunebe, ev yekîti xewn e, ji vê bûnê li pêsiya me bi tenê rîyek heye : him li nav xwe û him jî li dervayî xwe têkoşînek piralî ...

Gelî hevalan, amanca kesêñ ku iro li gelek hêlên Kurdistanê, li serê çiyan li deştan, di zindanêñ faşîzmê de li dijî stem û zulmê şer dîkin, têñ kuştin jî her ev e. Emê bîranîna wan ên ku di şer de hatin kuştin, ku di vê rîyê de şehîd ketin di dilê xwe de û di têkoşîna xwe de xwedî bikin û bidin jiandin. Xwezî bi wan ên ku bi berxedan mirin. Ü bûn agirê meşala serxwebûn û azadiyê. Pir xwezî bi wan ! ..

Hevalêñ hêja, tê bîra we, di cejna ku ji bo vebûna Enstituya Kurdî hatibû çêkirin min awa gotibû : Enstituya Kurdî ne di xizmeta filan an bêvan grûbê de ye, Enstitû malbendeke zanistî ye ku de xizmeta temamiya neteweyê kurd de ye. Xebat û icraeta salekê, ez bawer im, van gotinêñ min rast derxistin. Bila herkes baş zanibe ku ewê Enstitû karekterê xwe ye serbixwe û bêali, avahiya xwe ya demokratik di ser her tiştî de bigre û biparêze. Ewê tucar nekeve dafika polemik û xirecirêñ siyasi yêñ stewr. Divê ku hun jî Enstituyê weka çavê xwe biparêzin û piştîvaniya têkoşîna wê bikin.

Hevalêñ min, Enstitû şitlek tovê serxwebûnê ye û berhemâ têkoşîna ku neteweyê kurd heya iro daye ye, pêşveçûn û xurtbûna wê bi xebat û hevkarîya we ve girêdayî ye. Emê li dora Enstituyê bicivin û li gora karîna xwe alikariya wezifêñ ku wê daniye pêsiya xwe bikin. Emê zanibin ku serê serxwebûnê tevahiyek e. Carna nivisandineke du rîz ku rastiyê ifade dike, ramanek, carna qîriña stranek ku di dilê xelkê de deng dide, carna mizrabek ku li têla tenbûrê dide, piricar ji bombeyek atomî xurtir in. Jî ber vê yekê ye ku divê em di her warêñ jiyanê de şerkarêñ baş, şerkarêñ jêhatî bin û divê ku em şerkarêñ weha bîghînin.

Divê ku em baş, pir baş li tenbûra xwe xin ; divê ku em xweş, pir xweş stranan bistirêñ. Divê ku em wêneyêñ baş, pir baş çêkin. Divê ku em çîrokêñ baş, helbestêñ baş, romanêñ xurt binivîsinin. Divê ku em zane, diplomat û teknîsyenêñ xurt bîghînin. Divê ku destê me him baş qelemê, him makînê him jî çekê (silihê) bigire. Divê ku carna tenbûra me bibe çek, carna çekê me me bibe tenbûr. Dîsa em baş dizanin ku ê ku stranê baştırin, gotinêñ rastirîn dibêje gulleya ku di ciyê xwe de hatiye bi kar anîn e.

Hevalno ! Çiyayêñ me, deşt û çemêñ me li hêviya me ne. Em naxwazin emrê xwe tev li xeribiyê derbas kin û stranêñ xeribiyê bêjin. Em xelkekî wisan in ku bi mîrxasiya xwe destanan nivisandiye û ezm, biqerarî û hoyêñ me têr dîkin ku bi ser dijwariyêñ pêsiya me kevin.

Soreşgerêñ demokratîn tirk, ecem û ereb wekî parastgerêñ mafê gelê kurd ê bi xwe tayînkirina qedera xwe perçeyek vî şerî ne û şerê dijminê mişterek dîkin. Bratiya çînî ya çînêñ bindest yek ji xurtirîn çekêñ me ye.

Bila dost û dijmin, herkes zanibe ku emê bi serkevin, miheqeq bi ser kevin. Wekî şerkarekî azadiyê mirin ji wekî kole jîndinê çêtir e.

Bijî Kurdistana serbixwe, yekbûyî, demokratîk !
Bijî bratî û piştîvaniya gelên tirk, kurd, ecem û ereb !
Ü bijî Enstituya Kurdî.

JÎNENÎGARIYA YILMAZ GÜNEY

1937- Y.Güney li gundê Yenice, di navçeya Adanê tê dinê. Diya wî Gulê ji eşireke kurd a deşta Mûşê ye. Di salên Şerê Cihanî yê Pêşin de welatê xwe terikandiye hatiye aliye Adanê. Bavê wî Ahmed Kurdekî zaza yê Siwerekê bû, ji ber şerên eşîran hê di zarotiya xwe de li Adanê bicih bûye. Heta 14-15 saliya xwe Yılmaz Güney her texlit karên piçûk ên ku lawikekî belengaz dikare di bajarekî wekî Adanê de bike dike : pembûçinî, şagirtî li ber desten goştiroşan, hwd, ... Di ber de jî ew diçe xwendegahê. Bavê wî dixwaze ku ew bixwîne û bibe katibê ser qapana pembûyê ...

«Min tiştek din dixwast, dibêje Yimaz, lê min nizanîbû ev tişte din ciye».

1952 - Di kovara «Birgün» de çîrokek li ser şerê gundiyan diweşîne. Di wê heyamê de rastî sosyalistan tê û hisyarbûna wî ya siyasi dest pê dike.

1955 - Bi awayekî vekirîtir dinivîsîne û ji'ber nivîsarên xwe bi «propaganda komunistî» tê sûcdar kirin, 7 sal û nîv zîndan û 2 sal û nîv sîrgûn di dinê. (Dû re, cezayê wî dikeve 1 sal û nîv zîndan û 6 meh sîrgûn). Sûcê wî : di çîrokeke wî de, jinikeke gundî ji axê re dibêje : «Ewê rojek dawiya we bê».

1958 - Di filma «Alageyik» a Atif YILMAZ de dileyize û beşdarî nivîşandina senaryoya wê jî dibe. Mehkemê wî dom dikan.

1959 - Mahkeme hikmê dawîn dide. Yılmaz xwe dide alî û dev ji xwendina xwe ya aboriyê, li Fakulta Aborî ya Stenbolê, ber dide.

1961 - Xwe dide dest û 18 meh di girtigehê de dimîne. Li wê derê romana xwe ya pêşin «Boynu Bükük Oldüler» (Ew Stûxwar Mirin) dinivîsîne ku tê de piranî ji jiyana xwe û malbata xwe îlham stendiye.

1963 - Y. Güney dikeve şirketeke belavkirina filmên sînemayê. Ew bajêr bi bajêr digere, filman pêşneyarî xwediyêن sîneman dike. Di nav van filman de hinek zehf lê tesîr dikan, wekî yê Lütfü AKAD, xasme «Kanun Namina»

(Li ser navê qanûn). Ew hindê çend senaryo û gelek çirokan dinîvisîne. Wekî «Qralê Nexweşik ê sînemayê» nav û deng dide. Di 5 salan de di bêtirî 60 filmên ticarî (yên melodramî) de dileyeze.

1968 - Karxweyê (patronê) wî bi mehkûmiyeta wî dihise û wî ji kar derdixe. «Ciyê komûnîstan li cem min nîne !».

Yılmaz Güney filma ku wekî cêribandina girîng a yekemîn a filmçêkeriya xwe dihesibîne, pêk tîne ! «Seyit Han» (Seyit Xan, Bûka Axâ). Ev film li ser adetên Kurda ye û li Kurdistanê hatiye kişandinê.

1972 - Dîsa zindan, ji ber ku xwendekarêن şoreşger ên firar li mala xwe hewandiye û veşartiye. Di girtîgeha leşkerî ya Selimiye de rîzke çîrok û name dinivisîne : «Selimiye Üçlemesi» û «Selimiye Mektupları».

1974 - Çend heftê piştî azadbûna xwe, wî bi kuştina hakimekî tirk sûc-dar dîkin û 18 sal ceza didin wî.

Ew di zîndana xwe de 3 senaryo «Sürü» (Kerî), «Yol», Rê), «Düşman» (Dijmin) û 2 pirtûk dinivisîne : Ogluma Hikayeler (ji kurê min re çîrok) û «Soba, Pencere Camı ve İki Ekmek İstiyoruz» (Em sobe, sûşeya pacê û du nan dixwazin). Ji ber pirtûka wî ya qedexekirî «Faşizm Üzerine» (Li ser faşizmê), 7 sal û nîv cezayê nû û 2 sal û nîv jî sirgûn didinê. Û ew qas cezayê din jî ji bo benda wî «Siyasi fraksiyonlar üzerine». Ji ber nameya ku ji Sénor Fernando HERRERA, sermiyanê Festivala Valladolid (Espanya) şandiye 5 sal cezayê din jî dixwe. Li ser hev, cezayê wî digihê 100 salan.

Filmên wî «Sürü» (Kerî), «Düşman» (Dijmin), «Arkadaş» (Heval) li Tirkîyê qedexe dibin. Kerî, ku çîroka eşîreke koçerên kurd ên ku keriya xwe dibin Ankarê ye, li Awrûpayê zehf tê ecibandin.

1980 - Piştî darbeya leşkerî ya 12 ilonê, her wekî imkana ku ew li wela-tê xwe filman çêke an bide çêkirin namîne, Y. Güney firar dike û tê li Fransayê ciwar dibe. Berî hatina xwe, wî ji zîndana xwe filma Yol (Rê) bi hev-karê xwe Şerîf GOREN dabû kişandin.

Ev film ewê di Festivala Nawneteweyî ya Cannes'ê ya 1982 de xelata zê-rîn bistîne û di dinyayê de deng bide.

1981 - Remza berxwedana dijî rejîma leşkerî Yılmaz Güney di kanûnê de ji netewahiya (milliyeta) tirkîyê tê avêtin. Filmên wî, pirtûk, afîş û wêneyêñ wî tên qedexe kirin.

1982-1983 - Pêkanîna filma «Dîwar» li ser zîndanê zarokan li Tirkîyê. «Ew Stûxwar Mirin» bi zimanê fransızî derdikeve.

24 sebat 1983 - Yılmaz Güney tevî çend ronakbîrên kurd ên navdar li Parisê Enstituya Kurdî datîne ji bo parastin û pêşvebirina çanda kurdî.

9 ilon 1984 - di saet 5.30 de Yılmaz Güney li nexweşxaneyek Parîsê wefat kir.

ŞİNA YILMAZ GÜNEY

Çend roj berî mirina xwe, Yılmaz Güney wesiyet kiri bû ku cenazê wî ji «mala wî ya Parîsê Enstituya Kurdi» rakin.

13 ê îlonê tabûta wî anîn Enstituyê da ku hemû kesên ku wî dinasîn, ku jê hiz dikir û heyranê wî bûn, dikaribin werin silava xwe ya dawîn lê bikin.

Ji saet 9.30 ta 14, bê fasilê, dora 2000 kes, ên pirîcar kelegirî, di eywana mezin a Enstituyê de di ber meytê wî de bihurîn, silav lê kirin û serxweşiyê dane jina wî Fatoş Güney û keça wî.

Li ser navê hikûmeta fransız Mîrza Jack Lang, Wezîrê çandê, hatîbû serxweşiyê û Stî Danielle Mitterrand, xatûna Serekkomarê Fransayê, ku wê rojê ne li Pârisê bû, qevdeke gul şandibû.

Serekwezirê Yunanistanê, Mîrza Andreas Papandreou ji li ser navê xwe, sefirê xwe yê Parîsê şandibû Enstituyê.

Gelek şexsiyetên navdar ên dinya hiner û sinemayê, wekî Patrick Chéreau, Costa-Gavras, hatin cara dawî silavê li çêkerê YOL'ê kirin.

Lionel Jospin, sekreterê Yekemin ê Partiya Sosyalist a Fransayê, Maxime Gremetz, endamê sekretariya Partiya Komunist a Fransız û berpisîyarê siyaseta derva, Guy Hernier, endamê Politburo ya Partiya Komunist a Fransız, berpisîyarê sendîkayên C.G.T., C.F.D.T. û F.E.N. hatin xatirê xwe ji Yılmaz Güney xwastin. Partiyên siyasî yên kurd, teşkilatên kurdi yên Awrûpayê û qasî bist komele û teşkilatên tirk ên Awrûpayê noneran (temsîlkaran) şandibûn şînê.

Ji çar aliyên dinê, bi sedan têl û name yên serxweşiyê gihîstîn Enstituyê. Herweki, yek bi yek bersîvdana wan ne mimkin e, em ji hemîyan re li vêderê spasiyên xwe yên dilsoz pêşkêş dikin.

Cenazê ji Enstituyê birin Meydana République û ji wê derê bi hezaran kes pê re heta goristana Père Lachaise, ya mîrxasên Komûna Parîsê, meşîyan. Li wir, bi hezaran karkerên kurd û tirk û hevalên ji gelên din wî defn kirin.

Ji bo xatirê vî merivê bi nav û deng ku xwe berî her tiştî têkoşerekî şoreşger dizanî, karkerên tirk û kird bi hevre Enternasyonalê gotin.

PEYAMA CIGERXWÎN

Seydayê Cegerxwîn li ser mirina Y. Güney peyama jêrîn şandibû Enstituyê :

«Mirina dostê min ê hêja Y. Güney dilê min perçe kir. Ez pir xemgîn im, dilbikul im.

Yilmaz stêrkeke ges bû di esmanê milletê kurd de. Pir zû xuricî. Bi mirina wî diwarek mezin ê seqafeta kurdî hilweşıya.

Feleka bêbext dest neda ku ew merema xwe bibe serî, filmên nû çêke, doza Kurdistanê bi cihanê bide nasin. Em ci bikin ? Hêvîdar im ko ewê stêrkeke din, stêrkêن din di esmanê me yê reşê tarî de peyda bibin, dewsa wî bigirin.

Mirin li pêşîya me hemiya ye, jê re çare nîne. Tu kes nikare xwe jê xelas bike. Lê gava ew wilo bêwext bi carek tê, hê xedartir e.»

MIRINA GÜNEY DI ÇAPA BIYANI DE

Ji Swêd ta Awîstralya û Hindistan, ji Amerîka Latin ta Kore û Japonya, li Rohelata Navîn û li Awrûpa hejmareke gelek bilind a rojname û kovarêن cihanê li ser mirina Yilmaz Güney nivisin, radyo û televîzyon qala wî kirin. Ewê bi hinceta yeksaliya mirina wî pira-niya van bend û gotaran di nav pirtükekî bêن civandin û çap kirin. Berhevokeke destpêkî ya van nivisaran (dora 50 rûpel) di hejmara 8 a bultena Enstituyê de derket. Di hejmaren 9 û 10 ên bultenê de hin bendêن din jî hatin weşandin.

Va ne, bi kurtî, çend bernameyên girîng ên ku li ser Y. Güney hatine pêk anîn :

- Ji bo bîranîna Yilmaz Güney, televîzyona fransizî TF1 şeva 10 ê ilonê filmeke belgewerî ya Patrick BLOSSIER «AUTOUR DU MUR» (Li dora Dîwar) ku li ser kişandina filma dawîn a Güney «Dîwar» hatibû pêk anîn, nişan da.

- Weşîneka MOSAIQUES a televîzyona fransizî roja 23 ilon 1984 bernameyek li ser merasîma cenazê Yilmaz Güney nişan da.

- Şemi 29 ê ilonê, radyoya çandî ya fransizî France Culture car din bernameya ku Hélène TOURNAIRE di 1978 de li ser Kurdistan pêk anî bû weşand : «Les Kurdes, un peuple réfugié dans la poésie». Ev bername ji saet 19 ta 21.30 dom kir û li pey wê bernameyek ji bo «bîranîna Yilmaz Güney» hate weşandin bi besdariya Jean Bertolino, Kendal û Hélène Tournaire.

- Şeva 27.10.1984 li ser radyoya fransiz France Culture, weşîneka «Divergences» filmçekerê kurd Yilmaz Güney bi bîr anî. Dengbêj Temo jî besdarê vê bernamê bû.


- Roja 27.10.1984 di çarçeva Festivala Xerîban de Yilmaz Güney bi bîr anî ; sê filmên wî «Endişe», «Düşman» û Sürü» li sînema Splendîd a bajarê Fives-Lille hatin nişan dan.

- Weşîneka RESISTANCES a televîzyona fransizî Antenne 2, şeva 3.1.1985 bernameyeke 20 deqîqe li ser Yilmaz Güney nişan da. Di vê bernamê de filmekê ku li gundê Güney û bi besdariya hin heval û hevkareñ wî yên Tirkîyê hatibû kişandîn nişan dan.

EVÎNDARE WELAT IM

cigerxwîn

*Ji bona her kese kerek heye ê min welat yar e
Belê çibkim di destê dijminê xwînxwar û xeddar e
Çiqas pesnê giran bêjim nikarim ez bidim zanîn
Çeleng û nazik û şeng û şepal û şox û cebbar e
Hezar wek min di vê rê de bi van derd û kulan kuştin
Tilisma ser devê genca, di sînga min de reşmar e
Çi zanî qîmetavê şengeşoxê dijminê bêbext
Ne wek min dil bi top û awirê yarê birîndar e
Eger çendan bi dest dijmin belê yara min a şerîn
Bi navê wê bilind bûme giham gerdûnê seyyare
Bi wan lêvên şekerbarîn bi min da soz û peymanek
Ji min pê ve ku dil nadî kesî ew yara bêçare
Ev e soza me jî pê re ku dil her dem bidim destâ
Netirsim ez ji zindan û ji lêdan û ben û dar e
Li ser her kavîlî rûnim, bikim qêrîn heta her kes
Ji tamara xewê rabin bibin hozan û hişyar e
Di bin lingê xwe de deynin serê dijmin wekî dûpişk
Li ber pozê xwe deynin wê gula nû pişkivî xar e
Di govenda me de her kes bi dilşadî bikin dîlan
Li şûna hêstirêن çavan xuşîn bén co û cobar e
Ev e soza min û dilber eger bimrim di vê rê de
Ji vê dinya xwes û şerîn Cegerxwîn jî ne bêpar e.*



JÎNENÎGARIYA CIGERXWÎN

Keyo CIGERXWÎN

Cigerxwîn di sala 1903 a li gundê Hesarê hatiye dinê. Ji 11 xwûşk û bira tenê sisê mane : bi xwe, birayê xwe û xwûşka xwe. Ev yeka gelek tişa nîşan dide : Feqîrtiyê, belengaziyê û nexweşiyê. Roj roja axa û bega, şêx û mela bû. Wana nanê gundiyan bi zor ji destê wan digirtin û Cigerxwîn yek ji wan bû. Ji bo ku zikê dê û bavê xwe û xwe têr bike, Cigerxwîn hê di salên zaroktiyêde dest bi kar kiriye û stemkariya beg û axa baş naskiriye. Hê emrê wî 15-16 sal bû dê û bavê xwe bi salek navber winda dike. Carna li cem birayê xwe yê mezin û carna jî li cem xwûşka xwe dimîne û ji wan re şivantiyê û rencberiyê dike. Di salên 1918 û 1920 an de di riya hesin de dişixule.

Cigerxwîn di zaroktiya xwe de çend salan çûye ber melan xwendîye. Lê ji ber belengaziyê nikariye xwendina xwe bidomîne. Sala 1920 a Cigerxwîn serê xwe hiltîne û berê xwe dide deşta Diyarbekrê, bo ku biçe ber şêx û melan bixwîne. Ew, xwendina 15 salî di 8 salan de diqedîne. Dema feqetiyê Cigerxwîn li herçar parçen Kurdistanê têr digere û rewşa gelê Kurdistanê baş nasdiike. Sala 1928 Cigerxwîn dibe Seyda û her ûsa di vê salê de jin jî tîne.

Dema Cigerxwîn meletiyê dike, bi mesela kurdî hişyar dibe. Ewî nivîsan-diye û ûsa dibêje : «Weki tê bîra min, di sala 1924 an de bû ko ez li ser destê Şewqî Begê Erxanî şiyar bûme û bîra kurdperweriyê biriye, bûme welatparêz. Çenda ko ez berî hingê ristevanekî kurd bûm, min caran ristên xwe bi zimanê erebî jî datanî, lê min ev miletperweriya hûr û kûr nizanî bû.»...«Lê ez bi xwe di vê qunaxê de bê xeber û agah bûm, haya min ji tiştekî nebû. Ji nanê zikê xwe û xwendina mizgevtê pêva li tiştekî dî nedigeriyam. Me nizan bû çawa Kurd dixebeitin û ji bo ci dixebeitin. Lê paşiyê min ev serpêñ ha ji devê hin hevalên xwebihîstin û nivîsin.... Piştî şerê Şêx Seîd Efendî, sala 1925 a min dest bi xebatê kir.»

Di destpêka salên sîhî de Cigerxwîn şasik û cibbê davêjê û êrişê şêx û axan dike. Beg û axayê kurdperwer piştgiriya Cigerxwîn dikan. Piştî ku Cigerxwîn dest ji meletiyê berdide, diçe du gundan ava dike. Dixwaze rewşa gundan li ser êsasên wekhevîbe. Lê pir naçe, gundi li hev nakin û Cigerxwîn dest ji gundîtiyê berdide û tê Amûdê. Li wir Cigerxwîn û hevalên xwe li hev dicivin û bîryara sazkirina nadiyekê (komelekê) didin. Sala 1937 an «Nadiya Ciwankurd» saz dikan.

Lê pir naçe, kolonyalîstên Fransa vê nadiyê digrin. Derheqa karê nadiyê Cigerxwîn ûsa nivisandiye : «Ev cara yekem e ku Kurdên Cizirê, xortê kurd, bi zimanê zikmakî dixwînin, tarîx û rewşa miletê kurd dibihîzin»... «Cara yekem e ku şerqî û xwoşxwanêñ kurdî bi dengê bilind li nav bajarê Amûdê têne gotin. Jin bi lîlan û mîr bi demançâ bersiva me didin.»

Sala 1946 an Cigerxwîn dikeve Xoybûnê û kar dike. Navê Xoybûnê diguerin û dikin «Civata Azadî û Yekîtiya Kurdistan». Gava Cigerxwîn ji vê civatê diqete, dinivise : «Di wê çaxê de min baş nas kir ku çandan Xoybûn bi nav hatiye guhartin jî, lê hê peyayêñ wê bi hev ra girêdayî mane û destê xwe zû bi zû ji rojava bernadin. Dek û dolab û daxwazêñ malmezinan nayêñ guhartin. Gur in, lê xwe di nav postê berxikê de vedîşerîn.»

Sala 1949 an de Cigerxwîn dibe hevalê komûnîstan. Vê gavê girtin û lêdan jî bi serê wî de têñ barandin. Bi xwe nivisiye : «Cara yekem e tême girtin. Cara yekem e dibim hevalê komûnîstan û cara yekem e dubendî ketiye navbera min û malmezinan.»... «Hê jî nûve min xwe da xuyakirin û rêça xwe da guhartin. Çûme ser olekî dî û kevneperekî bi sun xwe ve hişt û gavêñ xurt û hêja ji bo welatparêzî û aşitîxwezî û gerdenazadî bi pêşde avêtin.» Cigerxwîn heta sala 1957 an bi xurtî bi komûnîstan re xebiti ye. Serokatiya Komîta aşîti li Cizirê kiriye.

Piştî ku hevkariya Cigerxwîn û komûnîstan diqete, Cigerxwîn bi hevalêñ xwe ve rêexistina Azadî saz dikin. Sala 1958 a jî bi Partiya Demokratê Kurd ve dibin yek. Partî, sala 1959 an Cigerxwîn dişine Kurdistana Iraqê. Cigerxwîn li wir, li Bexdayê di Univêrsité de dersê kurdî, zaravayê kurmancî dide xortêñ kurd. Piştî ku navbera Kurda û hikûmatê xirab dibe, Partiya Demokrat xwe dikşîne serê çiya sala 1962 a hikûmata Iraqê bera Cigerxwîn dide û Cigerxwîn vedigere Kurdistana Sûriyê.

Sala 1957 an di kongra Partiya Demokratê Kurd li Sûriya de Cigerxwîn tê helbijartinê Komîta Merkezî ya Partiyê. Heta dawiya jiyana xwe jî Cigerxwîn endamê Komîta Merkezî a Partiya Demokratê Kurdên Pêşverû li Sûriyê bû.

Sala 1969 an Cigerxwîn cardin diçe Kurdistana Iraqê û li şoreshê nézîkî salekî dimîne. Sala 1973 an ji ber stemkariya hikûmeta Surî Cigerxwîn diçe Lubnanê û heyâ sala 1975 an li wir dimîne. Dîwana xwe ye sisiya li Beyrûdê çap dike.

Sala 1979 an Cigerxwîn hate Swêd. Pênc salêñ dawî ji jiyana xwe Cigerxwîn li Swêd derbaskir.

**
*

Heta niha 14 afirandinêñ Cigerxwîn hatine çap kîrin.

- | | |
|---|--|
| 1 - <i>Dîwana Yekem, Prisk û Pêti, 1945</i> | 8 - <i>Ferheng (perçê diwem), 1962</i> |
| 2 - <i>Cîm û Gulperi, 1948</i> | 9 - <i>Dîwana Siyem, Kîme Ez ? 1973</i> |
| 3 - <i>Dîwana Diwem, Sewra Azadî, 1957</i> | 10 - <i>Midya û Salar, 1973</i> |
| 4 - <i>Reşoyê Darê, 1956</i> | 11 - <i>Dîwana Çarem, Ronak, 1980</i> |
| 5 - <i>Gotinêñ Pêşîyan, 1957</i> | 12 - <i>Dîwana Pêncem, Zend Avista, 1981</i> |
| 6 - <i>Destûra Zimanê Kurdî, 1961</i> | 13 - <i>Dîwana Şeşem, Şefaq, 1983</i> |
| 7 - <i>Ferheng (perçê yekem), 1962</i> | 14 - <i>Dîwana Hestem, Hêvî, 1984</i> |

ŞİNA CIGERXWİN

Seydayê Cigerxwîn şeva 22.10.1984 li Stockholmê wefat kir Cenazê wî roja ûn, 2.11.1984, ji Stockholmê bi merasim rakirin. Welatparêzên Kurd ên ji çend welatên Awrûpayê hatî, di nav wan de Sermiyanê Enstituya Kurdi, di merasimê de hazir bûn û li hozanê mezin silava dawîn kîrin. Paşê, li ser wesyeta Seyda, cenaze şandin Sûriyê. Rojnamevanekî kurd ku ji bo şîna Seyda çû bû Sûriyê ji xwendevanê me re qala vê bûyera dîrokî dike :

Şeva 4.11.1984, saet dora 21 an. Salona bendemayîni ya Balafirgeha Şamê ji qasî hezar welatparêzên kurd û nonerên teşkilatên Kurdistanê tejî bû. Danîna balafira ku cenazê hozanê kurd ê mezin Cigerxwîn ji Stockholmê dianî Şamê ilan kîrin. Weşkî bi şûn de xortêñ kurd - xortêñ hêviya Cigerxwîn- cenazê, weka ku çûkekî sivik hilgirin, li ser milêñ xwe anîn nav qelebalixa bendewar. Pê re tabûtê bi gul û kulîlkan xemilandin, di ambulansê de bi cih kîrin. Nîvê şevê ambûlansa bi cenaze barkirî kete ser riya Qamişlo.

Wê şevê xelkê Qamişlo ranezabû. Lempikên hemû malan vêketî bûn. Herkes li hêviya helatina rojê bû, kar, xwendegah, wezîfe nedihate bîra kesî. Xelkê Qamişlo di nav hestekî wisa da bû ku gotina wî dijwar e. Ewê cenazê hozanê xwe yê mezin Cigerxwîn li ser destêñ xwe hilgirtina. Ewê bi sed hezaran kes bi hevra biqîrîna «Cigerxwîn nemiriye ! Cigerxwîn namirin !» û bi vî awayî nemiriniya Cigerxwîn di dîrokê de binivîsandina. Ü xelkê Qamişlo, wekî ku bixwaze xelkên bajarêñ kurd ên din têxe hesûdiyê, kubar bû.

Hestêñ (hisêñ) ku di bajarêñ kurd ên din de dihatin jiyan jî ne cihê bûn. Ji Çiyayê Kurmanca ta Dêrikê gelê kurd ê welatparêz ketibû ser riya Qamişlo. Her welatparêzê kurd dixwast nişan de ku Cigerxwîn ê ku kaniya ramana (fikra) welatparêziyê bû, bûye nemir.

Bi helatina rojê re cenaze gihişt axa Kurdistanê. Li wê derê gelek kes, ku di nav wan de Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdên Pêşverû yên Sûriyê, Hemîd Derwêş jî hebû, li benda cenazê bûn. Nêzikî bajarê Hesekê bûbûn. Saet li dora 10'a cenaze, tevî konvoyek dirêj kete Hesekê. Bi hezaran

Kurd cilêن xwe yên neteweyî li xwe kiribûn û li her du aliyên kolana sereke ya bajêr û heta dervayî bajêr rawestiya bûn, li cenazê silav dikirin. Keçan cilêن sor û zer û kesk li xwe kiribûn, sê bi sê komikan çê kiribûn û bajarê Hesekê dixemilandin.

Di nîvê riya Hesekê-Qamişlo (84 km) konvoyek 20 km li dû ambulansa cenazê pêk hatibû. Heya Qamişloyê xelk li qerexên rê civiya bû, li cenazê silavê dikir û dikete nav konvoyê. Li gund û bajarokan wesaît nemabûn. Hemû wesaît, traktor, kamyon, otobêz, pîkap û erebe ketibûn ser riya Hesekê - Qamişlo. Waliyê Hesekê ji Qeymeqamê Qamişlo re telefon dikir, di-gotê : Lehiya mirov û wesaîtan ji Hesekê rabû ber bi Qamişlo tê, bila haya te jê hebe!

Berê nûçe hatibû belav kirin ku ewê cenaze roja 5.11.1984 di saet 9 de bigihê Qamişlo. Û bi sed hezaran kes* sibê zû li derveyî bajêr civiya bûn, çavêن wan li riya bûn. Kes li nav bajêr nemabû. Te digot qey sendikayeke xurt biryara greveke giştî daye û li dervayî bajêr jî xelk cejna Newrozê pîroz dike.

Dawiyê cenaze saet li dora 15 a tevî bêtirî 50 hezar kes xuya kir. Sed hezaran ku bendewar bûn jî tevî wan bûn. Dengên «Cigerxwîn nemiriye ! Cigerxwîn namirin !» li hawir belav bûn. Xelkê dest pê kir cenazê tevî ereba wî rakir hewayê û hilgirt.

Teşkilatê kurdî ên ku merasîma cenazê amade kiribûn îndî nikaribûn vî mexlûqatî kontrol bikin. Xelk kontrolê girt destê xwe û bi disiplîneke mezin dest bi meşê kir. Li pêsiya sed hezaran, bi hezaran xortên kurd, ên ku cilêن xwe ên netewî li xwe kiribûn, di destê wan de wêneyên Cigerxwîn û çeleng, şirîteke çend kilometir pêk anî bûn û ber bi mala Cigerxwîn dimeşîyan. Kuçe û kolanêن Qamişlo têra van sed hezaran nedikirin.

Li ser wesiyata Cigerxwîn cenazê wî di baxçê mala wî de vesartin. Li ser gorê Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdên Pêşverûyê Suriyê Hemîd Derwêş û Kerîm Ahmed, endamê Politbüroya Partiya Komunist a Iraqê gotar gotin. Civîna bi bîr anîna Cigerxwîn li Qamişloyê hefteyek dom kir.

H.C.

* *Li gora texmînan dora 300 hezar kes beşdarî merasîma cenazê Cigerxwîn bûn. Li tevahiya bajarêن kurd ên din ên Sûriyê û wisa jî li Şam û Helebê jî civînêن ji bo bîranîna Cigerxwîn hatin çê kîrin. Li dervayî welêt jî civînêن bîranîne li Stockholm, Paris, Moskova, Leningrad, Sydney, Köln û hê gelek bajarêن din ên Awrûpayê hatin pêk anîn.*

ji HÊVÎ yê re name

Gelek silavêن biratî li we teva dikim, di xebat û tekosîna we de serketin û serfirazî dixwazim.

Kovara Hêvî kete destê min. Bi rastî we xebateke gelek giran û hêja daye ser milên xwe ; di Ewrûpayê de cara pêşîn e ku, kovareke kurdî bi sê zaravayên kurdî dertê. Derketina wê ya bi sê zarava, giranbihayiya wê bêtir dike, ew dibe bingeha dan û stan-dina hemû Kurdan.

Xala netewetiyê ya yekemîn, ziman e. Çaxa zimanê neteweyekî bê wenda kirin an ji bê pişavtin (asîmile), ew netewe nikare xwe bi netewatî bide pejirandin. Li gora min, her Kurdeki ku doza serbixwebûna welatê xwe, azadiya gelê xwe û rizgariya netewa xwe bike, divê xwe hînî nivisandin û xwendina zimanê xwe yê zikmaki bike. Çaxa meriv xwe hînî xwendin û nivisandina xwe neke, meriv hem zimanê xwe ji bîr dike, xwe bi xwe winda dike û bi ser de daxwaza dijmin ya pişavtina zimanê kurdî ji tê cih. (Ji bo kesen xwenda derbas dibe).

Gelek ji me hene (ji bo kes, rêxistin û partîyan ji derbas dibe) dibêjin «em li dijî kolonyalizmê ne» û berdewam dîkin «ziman ne pêwîst e, çaxa Kurdistan rizgar bû, wê çaxê emê xwe hînî ziman bikin.»

Çi ditinek çewt û şadkirina dilê dijmin ! Tam xwestina dijmin ji ev bi xwe ye.

Careki ku, ziman wenda bû, şertek ji yê netewetiyê ji holê radibe û pê re netewek ji wenda dibe. İro her gelek bi zimanê xwe li dinê tê naskirin. Heger iro zimanê min tune-

be, ez nikarim bêjim ez Kurd im, wê yê li hemberî min bipirse : tu bi ci zimanî diaxi-vi ? Wê çaxê emê çawa bersivê bidin û xwe biparêzin. Bê guman meriv dikare ji hezar çemî avê bîne û xwe pê biparêze, lê ev têr nake.

Serbixwebûna welatê meriv û zimanê meriv bi hev re girêdayî ye, meriv nikare wan ji hev veqetîne.

Erê rast e, ziman ne giring e, lê ne di dema iro de. Ev dûrişme hatîbe gotin ji ne ji bo dema iro hatîbe gotin. Ev gotin enceç di civakeke komunist de derbas dibe û dikare cih bibîne. Ji ber ku, di civaka komunîstî de tu zor û sîtem li ser hebûnê gelerî nemîne, milet êdî ne ji bo parça-parça bûnê lê ji bo hemjiyanê wê bixebeitin. Bê gûman hemjiyan iro ji kam a dilê me ye û ev dûrişma me ya bingehin e, lê mixabin iro ew merc nînin. Hemjiyana hemû mirovan wê dûrişma me ya bingehin be, lê divê neyê ji bîr kirin ku meriv pêlik bi pêlik hildikşe serê ban.

Di pirtûka «mafê çarenûsi» de Lenîn dibêje :

- Yekîtiya gelan, bi serbixwebûna wela-tan gengaz (mikin) e, heta welatê bindest serbixwe nebin û nebin xwediyê welatê xwe, yekîtiyeke bi xwestek çê nabe. Ji vê yekê, ji ku em karibin bi gelên dinê re bibin yek, di-vê berê em bibin xwediyê welatê xwe û mafê xwe bi destê xwe bigerinin. Serbixwebûn û doza welateki, mafê netewan e, şertekî netewetiyê ji ziman e. Heger ji niha ve em zimanê xwe pêşde nebin û lê xwedî derneke-

vin, emê nikaribin xwe bi gelê xwe û bi dinê bidin pejirandin.

Dîtin a «piştî rizgarkirina Kurdistanê ziman hesan e», ditineke çewt e, weke ku hinek «rizgariya Kurdistanê li benda hatina sosyalîzmê dihêlin» di bingehê de çewte e û ne li berjewenda gelê Kurd e.

Îro li her çar ali Kurdistanê gotinên biyanî ketine nava zimanê kurdî, gelek ji Kurden me xwe wenda kirine û xwe Kurd napejirinin. Heger em ziman li benda serbi-xwebûna Kurdistanê bihêlin, an jî rizgariya Kurdistanê li benda avakirina sosyalîzmê bihêlin «mala me Kurda şewiti ku, ji xwe şewitiyê.» Wê çaxê emê yekcarî têkevin nava tore û gerdiş (adet) ên dijmin û emê bi rastî bibin «Tirk, Ecem, Ereb ê çiyayî.»

Bav û bapîrên me gotine «ziman mifta derî ye» an jî «her zimanek zilamek e». Ger em zimanê xwe nizanibin û bavêjiin pist guhê xwe, ne zilam lê em nabin xulamê gelê xwe ji.

Birîndar Almanya Federal

* *

*

Hevalên berêz,

Li pêş hemû tiştekî, silavên xwe yên şoreşgerane, li çiyayênil bilindên Kurdistanâ Iranê ra pêşkêşê we yên hêja dikim. Her wisa dixwazim xebata we ya bilîmet û hêja, ji bo miletê me yên reben û jar, roj bi roj berbi pêş biçe.

Hevalên hêja, damezrena Enstituya Kurd, ji bo miletê kurd ciyê kéfxweşiyê û ciyê serbilindiyê ye. Bi taybetî ji bo pêşdabirîna çand û sineta miletê me, Enstituya Kurd dibê bibe bingehêki zanyarî. Da ku, bikare, çand û sineta miletê me, yên bilaw û paşdamayı, kom bike û pêşda bibe. Ez xwe wek niştimanperwerekî kurd baweriya min, ji Enstituya Kurd heye ku, wezîfa xwe ya giran û lê gelek hêja, wê cî bine. Ji bo miletê me wê bibe bingehêki peşengî li aliye çand û sinet da.

Hevalên hêja minbihist ku du ewladêñ mîrxas, du ewladêñ xebatker û hêja yên miletê kurd, Tewfiq Wehbî û Yilmaz Güney çûne heqîya xwe. Mirina wan herdu xebat-

kerên mîrxas miletê me xiste şînê. Alyê din jî dujmin xiste şadiyê. Çimki mirovêñ wiha bikêrhatî û hêja li nav milet da kêm peyda dibin, kêm derdikevin. Ji xebata wan herduwa xebatkerêñ xelkî, xelkê me kêt-xweş û serbilind e. Ci wextekî wana ji bir naake, wê hemû wexta dilê xwe de wê wana bijine û wê pê wana mehtê xwe bike. Miletê me baweriya wî heye ku ji di nav refêñ xwe da, hezaran Tewfiq û Yilmazê, derêxe li hember dijminen xwe. Da ku rîya wan nemiran winda nebe û dirêjayî hebe. (...)

Ez hêvidar im ku hûn, her wisa xebata wan herdu nemira ber bi pêş bibin û ala wan berz bigrin.

Silavên birati û şoreşgeriyê.

Kamil Reşo
Xelkê Kurdistanâ Tirkîyê lê
niha li Kurdistanâ
Iranê da pêşmerge

* *

... Ez dixwazim bi kurtebirî nêrîna xwe ya li ser kovara Hêvi bêjim : Kovara Hêvi, weke ku we jî rohnî kiriye, ku ev yekem car e, kovarek wisa bi hersê zaravayê kurdî derdikeve. Lê bi a min, bi zaavayê kurmancî pir hindik hatiye nivîsandin. Kovar 208 rûpel e. Ji van 208 rûpelan tenê 50-55 rûpel bi zaravayê kurmancî hatiye nivîsandin. Yê din hemû bi soranî û zazakî ye.

Gava ku ez yên yeka han dibêjim, mana xwe ne ew e, ku ez li hember zaravayê din im, an li hember nivîsandina zaravayê din im.

Rast e, divê ku em bi zaravayê din jî binivîsin û wan jî têxin warê nivîsandin. Lê jî alîkî ku em bala xwe bidinê, bi hezaran pirtûk, rojname û kovar bi zaravayê soranî çap bûne. Ji aliye din jî pir klasikên dinyayê hatine wergerandin.

Lê bi kurmancî ? Na, ne bi hezaran, bi dehan pirtûk çap nebûne. Bi zazakî jî çap nebûne. Lê gava ku em kurmancî û zazakî bidin ber hev, ferqe mezin di navbera wan de heye. Kurmancî zaravayê heri mezin e. Ji sedî ne nod be jî, ji sedî hyştê gelê kurd bi kurmancî dipeyîvin, an kanîn bipeyîvin.

Ger ku hun di kovarê de hebkî din jî cih bidin kurmancî, bi a min dê baş bibe. Wek

N. Zaza jî gotiye, ku ji her sê mehan carekê kovar derkeve dê hîn baştır bibe. Ji ber ku çavên pir Kurdan li riya kovarên kurdî dixerimin.

F.C
Swêd

* *
*

DIZÊN ZAROWAN

Rojekê kurê min ji dibistanê vegeriya mal, girî di çavan de, ji dayîka xwe re got :
- Hun derewan li min dikin ?
- Cîma em derewan li te dikin ?
- Hun dibêjin ku em ji Kurdistanê latine !
- Mirzo ! Bavo ! em ji Kurdistanê hatine.
- Mamostê me iro hişt ku hevalên min bi min bikenin ... Pirs kir : tu ji kîderê yî, min gotê ku ez ji Kurdistanê me, loma keniya û hevalên min jî, wî nexşa welatan anî û ji wan re got : de werin binêrin, ka Kurdsitan li kîderê ye ...

Mamostê kurê min 1 7 salî tirk bû, li dibistanêne elemanan dersên olperestiyê di dan zarowan, ez pey ketim, derket ku li qunsiliya Turkiyê jî kar dike. Ji wê rojê de zarowenê me çend malê Kurdan li vir naçine dersên wî. De bila em şiyar bin, ewan dixwazin zarowenê me, li dervey welat jî ji me bidizin.

Cankurd
Almanya Federal
1984

* *
*

... Felekê carekê çerxa me Kurdan xerab badaye. Karwanê kulê carekê konê xwe yê reş li carekê li warê me vegirtiye û me büye cînar, şîrik ! Sedemên gotinên min ên jorîn ew e ku em Kurd her li derwelat hewl didin xwe (ya rastî her li TERKE welat) ku em disan «kok» û «reha» xwe ya kurdewarî bibînin ; û li ser pêgirtiyê (edetên) xwe yên geleri bisekinin. Lî birîna welatê me yê bindestkirî carekê kêm girtiye û birîna wî (welêt) zehf jî kûr e. Ji me re zehf xebat, zehf xîretî, zehf jîritî divêt.

Divêt em lawên bindest (şoreşger an welatparêzên kurd) jîritiyê ji xwe re wek erkekî bingehîn bibînin û bêjin ku em deh, bîst, sî ... hezar caran ji yên din zehftir xebat bikin, da ku em bîghêjin koça hempayê xwe. Lewra em carekê dû koçan ma ne. Bawer im hûn têdighêjin ez li kîjan defê dixim.

Serketina, serfiraziya û serdarîya we daxwaza min e.

Brayê we
M. ARARATÎ
Austriya

* *
*

... Ez dixwazim dîsa li ser naveroka na ma xwe ya di hejmara 2 a Héviyê hatiye wêşandin hinek rawestim. Lewra bersiva Héviyê min têr nekiriye û qîma min pê nehatiye. Ango ew babet li ba min zelal nebûye. Bi hêviya zelalkirina babetê ez dixwazim bersîva Héviyê bidim.

Di nama xwe da min nivîsandi bû ku ; «Me» ya neyîniyê tenê û tenê di fermaña hazir û yekser da tê bi karanîn.

«Hêvi» ji di bersîva xwe da weha dibêje : «Neyîniya fermanê ji bo kesê duwemîn timî bi me çedîbe.»

Belê rast e, û gotina min bi xwe jî ew e. Lewra fermana hazir û yekser tenê ji bo kesê duwemîn e.

Ma gelo gava em bi dildarî bala xwe bidin van pevek (hevok) ên «Hêvi» yê, emê karibin bibêjin ku ev ji bo kesê duwemîn ferman in, an na ?

1 - «Em ji hemû welatiyê xwe hêvî di kin ku di vî warî de berpirsiyariya xwe ji bir mekin, cih nedîn peydabûna dijwari û tevlî-heviyan.»

a) Ev ne ji bo kesê duwemîn, ji bo kesê seyemîn e. Lewra bernava ku divê hevokê da veşartiye û ne pêwîst e mirov bikarbîne ya kesen 3 a e, ne ya kesen duduyan (hun) e.

b) Beşê dawiya vê hevokê (cih nedîn) ji dide nişandan ku ev ferman, hêvî ye. û «me» ya neyîniyê di gotina pêsiya wî da bi şâsi hatiye danîn, an bişâsi hatiye nivisandîn.

2 - «Di vê navê de hemû niviskarê kurd tika dikin : Em heryek di tengâ xwe gotinên nuh çê mekin.»

Ev jî ne ferman, tika ye. Û bernava tê da hatiye danîn (em) e, ne (hun) e.

Ji ber vê yekê ez disa dibêjim ; di nav herdu hevokan da jî diviyabû di şûna «me» ya neyîniyê da «ne» ya neyîniyêbihata danîn.

Hêvî di bersîva xwe da weha dibêje :

«Lê di zimanê peyvandinê de, pirîcar ev teşe têkil dibin û em ji hevalê hemberê xwe ra di şûna mekeve de nekeve dibêjin. Heçî rûpela 29, meremê bi du awayan gotin mimkin e.

a) Mezintirîn helbestvanê Tirk.

b) Mezintirîn helbestvanê Tirk.»

Belê rast e. Di zimanê peyvandinê da li hinik ciyên Kurdistanê ev tevlîhevî çê dibe. Ji ber vê hoyêye ku hin zimanzanên me jî di bin vê werêcê da mane û her du awan jî dirist dîtine. Lê di baweriya min da wek ku Mîr Celadet û Bedirxan gotine, di fermana neyîniyê da divê mirov «me» ya neyîniyê bikarbîne.

Mixabin hin gotinên din jî hene ku di zimanê peyvandin û nivîsandinê da bikar tê anîn.

Di hinik ciyên Kurdistanê da di şûna venakim da navekim tê gotin û di hinek zimanen nivîsandinê da jî di şûna mezтир û mezintirîn da mezintir û mezintirîn tê bi kar anîn. Lê gel eger ne bi tevayî be jî bi piraniyek mezin mestir û mestirîn bikartînin û venakim dibêjin.

Belê mirov dikare mezintirîn û mezintirînê jî bikarbîne lê ne di ciyek da. Gava bi tiştekî din bê timam kirin, qiyas kirin, an nîsbet kirin wê demê divê mirov daçeka izafê «ê» bikarbîne. Lê li derê vî awayî «ê» nayê xebitandin.

Herwekî :

«Umeta wî çêtirînê umetan» (Mewlûda melayê Batê).

«Ji amê melek qenctirîn ey ciwan Nehcilenama Mele Xeşîlê Sêrtî.

Di nivîsandina hêviye da eger nîsbeta mezintirîn bibal helbestvanan va natana kirin wê demê rast bû.

Mebest ji vê nivîsandinê hêviya vekirina riya minaqşen weha ye.

Bi silay û hezkirinê biratiyê ji Hêvî yê ra jiyanek domdirê dixwazim.

Zinar Şîro
Swêd

(*Di hevokên 1 û 2 de gotina Z. Şîro ye : dişûna ji bîr mekin û çê mekin diviya bû ku ji bir nekin û çê nekinbihata nivîsandin û ew bi xeletî wisa hatîne danîn.*

Heçî mezтир ew di zimanê rojane de kurteya mezintir e ; mezintirîn û mezintirîn her du jî rastin.)

BELGE

BÎRANÎNÊN IHSAN NURÎ PAŞA (II)

Piştî bi kurtî qalkirina serxwebûnên kurdi ji sala 1514 ta Agrî, nivîskarê bîranînan çend gotin li ser dîroka çiyayê Agrî gotibû û paşê herdu serokên serhilanîna Agrî, Bro Heskî Tellî û Ihsan Nûrî

nasandibû. Di salên 1926-27 de mîrxas û welatparêzên kurd ên sereke yek li dû yekî xwe digihandin Agrî. (binêre Hêvî, hejmara 2).

Iro Heskî waliyê Agrî û Temirî Şemkî fermandarê jandarmayêni Agrî helbijartin. Niştimanperweranî kurd wê gavê marşa Agrî bi şadîmanî dixwendin, digotin :

Îro dîsa hêrsa te hat
Ev agiran bûne kelat
Kom bûn êdî serte civat
Hilbe Agrî, Hilbe Agrî

Eyûb Axa, ji rîsêni eşîreta Qotan, pey dûrxistina brayê xwe yê mezin bi rojavayê Enedolê, ligel çend kesik xizm û dost û pêvendêni xwe li besê ba-kûrê Agrî li Kelefey Korxan pena* biribûn. Li ber pelamarêni Romê ketin, çend saet şer kirin ; berdan Tirkan, hêzên tirk çend nefer dîl û kuştî dan, mecbûr man, ji par ra kişiyan. Eyûb Axa xwe bi hêzên Agrî girê da. Bi ev çeşnê bakûrê Agrî ji bi destê netewexwazên kurd ket.

Hêzên Agrîbihêztir bûbûn. Rûniştevanêni bajarê Bayzîdê, ji bona şewatê, ji qamişen dorûberê Agrî kelk* digirtin. Mecbûr man bac bidin, ji komelêni neteweyî yên kurd ên Agrî izin bigirin, ta bi azadî nêzîkî sînorê Agrî bin, qamiş bicinin, bi pişt kerê bar kin, bibin.

Dewleta Tirkîyê dît ku ligel hêzên zor ji naqedîne karê bike îcar ku min li nav Agrî da idareya kurdî danîme, ûmîd kir me bixapîne. Ji bona hilweşandin û têkdanîna vê hêza Agrî û ev civatêni netewayetî yên kurd qanûnek

* penabirin : iltice kirin ; penaber : mûlteci ; pelamar : eriş, hicüm ; kelk : feyde, istifade, kelk girtin : istifade kirin.

derxist ku navê wê «qanûna te'cîl» bû û li Meclîsa Mezin a Neteweyî ya Tirkîyê jî pesend kiribûn. Li ber vê yasayê bexşîn û lêbihartina hemû karêñ xerab bi Dewlet re li temamî welatê Kurdistanê pesend kirin û ragiyandin, ye-kî ji rûspiyanêñ Bayzîdê bi vê qanûnê ve şandin Agrî, ta em ji vê qanûnê agah bin.

Ewanan ji zarokê Agrî dixwastin ku ew dest ji şer bikêşin, îtaet bi dewletê bikin, ji vê qanûnê kelk bigrin. Min gotim ev dek û dolabê Romê ye, bawer mekin, efû nîne. Brayek Bro Heskî hebû zor dîndar bû, digot : Tirk kafir bûne, her kesê teslimê wan be, ew jî kafir dibin, telaqê wan jî batil dibe. Ji wî re Araratian Sofî digotin. Navê wî Eyûb bû. Çaxê ruesa têgihiştine ku Kurdên ku Dewlet girtibû an ji welatê wan dûr xistibû azad bûne, hatine ser ciyêñ xwe yên berê, wê çaxê giliyêñ wê bawer kirin. Dewlet giliyêñ rûniştevanêñ Agrî tewecuh qerar da, ji xwe ve çend neferên din jî azad kir.

Nûvîneranêñ* dewletê, xeyn ji propaganda li nav rûniştevanêñ Agrîyê, ligel Ihsan Nûrî û Şêx Abdulqadir, ku jin û zarêñ wan bi rojavayê Enedolê dûr xistibûn, gotübêj dikirin, bi navê dewlet qewl didan heke ji dewletê re îtaet kin, ewê jin û zarêñ wan azad kin û bişînin cem wan. Ev pêşneyarêñ nûvîneranêñ dewlet ji aliyê Ihsan Nûrî red bûn, lê Şêx Abdulqadir û kurapê wî çûne Bayzîdê, xwe bi destê dewletê spartin. İcar Şêx Abdulqadir ligel nûvîneranê din memûr bû were Agrî heta bi qise û tedbîrê dostane Bro Heskî ji ligel xwe bibe cem dewletê. Lê çaxê Agrîyîyan evî zanîn, riya wan birîn, nehiştin ew werin Agrî, wan sûnda zivirandin.

Dewlet digot : Ji şer dest bikêşin, îtaet bi dewlet bikin, ji ev qanûn kelk bigrin ! Teşkilata Agrî cewab da, got : heke dewlet rast dibêje, bila serokêñ Kurdan ku ji welat dûr xistiye azad bike, cardin wan bişîne ciyêñ wan ên berê, ku em bawer kin. Zehf nekêşa jin û zarêñ Şêx hatin, ekserê serokêñ ku bi rojavayê Enedolê dûr xistibûn berdan, evanan jî hatin welatê xwe. Li ser vê qanûnê êdi Kurd teslimê dewlet dibûn, diçûn welatê xwe.

Hinekê wan ên ku ji derva li Agrî pena biribûn, çav dane Şêx Abdulqadir, çûne Bayzîdê. Ewan ên ku diçûn, xwe didan destê dewletê, dewlet jî silahê wan nedistand, hetta xelat û beratekê jî bi wan dida.

Di nav wan de Seyid Abdulwehabê Berzencî û Axayê Temir Şemkî jî hebûn. Ev herdu ji fedakartirîn Kurdan bûn, li ser daxwaza qomandarê niştimanperweranê kurd xwe bi destê dewlet dabûn. Neqşeyê* qomandar eve bû ku teşkilata «Xoybûn» li navçeyê din ên Kurdistanê çê bikin. Ewê yek li navçeya Ercîs, yê din li navçeya Tuzlûcê û Qaxizmanê kar bikira.

Niştimanperestî li nav hinekî serokêñ canbezaran wisa zor bû ku xwe bi destê dewletê spartinê kufir dizanîn, bi hîç çeşnêk* giyanê xwe bi giliyê qanûna te'cîl nedidan.

Di ev serbendê de bû qomandarê niştimanperweranê kurd nûvînerê resmî yê komela «Taşnaq» a fillan li Agrî qebûl kir, ji ber ku Kongra kurd bi fillan re yekbûnê dixwast, ku li dijî neyarê mişterek yek bin, alikariya hev bidin. Kurd û Fille bi xweşhalî pesend kiribûn.

* nûvîner an noner : temsilkar, neminende ; neqşeyê : pilan ; çeşne : awa, cor, teher, vine.

Navê wî Ardaşêr Mûradyan bû, di nav Kurdê Zîlan nav girtibû, xelqê gundekî fille yê nêzîkê şarê Xenis bû. Xortekî têghiştî û neteweperest bû.

Hinekan, mîvandarê qomandarê kurd ji nûvînerek fille re behane kîrî digotin, hêzê çekdarê fille bi aliye netewexwazên kurd hatiye ; lê ev rast nebû.

Teslîmbûnî hinekî Kurdêñ muhacir, rêvebirinî qanûna te'cîl hêzêñ Agri zor kêm kiribûn û di babetê xwarin de jî zor bi tengî ketibûn. Lê em kêmbûnê, hizra me bi Romê qe nehisand.

Zivistan bû. Berfekê li navçeya Bayzîdê heta sînorê niştimanperweren Agriyê pûsandibû. Bihar gihîst, ev berf hê jî neheliyabû. Di katek de, di bin tarê Agrî roj bi roj di şûna berfê giyayê hêşîn derketibû. Ji rûyê vê bûyînê xurekê pez û dewaran li navçeya Bayzîdê zor telef dibûn, li ber eve xelqê dorûberê Bayzîdê li ser qiseyê dewletê hatin ser vê yekê ku ligel Teşkilata Agrî gotûbêj bikin, pez û merrên xwe ji bona çêrandin bi aliye Agrî bişînin. Bi ev çeşne colê pez û dewar bi aliye Agrî berjêr bûn. Qerar bû xwedanê heywanet li gora heywanê xwe ji Teşkilata Agrî re pez bidin. Bi ev çeşne rûniştevanê Agrî ji babetê xwarinê asûde bûn. Tê gotin, Xwedê bi niştimanperrestan (...)* bi vi tehrî yarî dabû ...

Qomandarê netewayeti kurd, bona zortir xwe nîşandanê û pesendnekirina qanûna te'cîl, ji aliye Xalis Beg bi çend siwar û peyan û ji aliye din Ferzende Beg ligel siwarêñ wî memûr kir herin navçeyen li bin nifûza Romê, rê bibirin, post bişêlinin, xetêñ telgraf û telefonê biqetînin, emniyet û rahetiye egle kin. Çaxê giliyê kutasiya rûdaveya Agrî li nav Tirkâ belav bûbû, desteya Xalis Beg 300 nefer eskerê teze bi çek ragirt û pasevanê vani bê çek kir, têkoşa bi heftan. Ferzende Beg û her weha desteyê Edo Ezîzî û desteyen piçûktir ku ji Agrî derdiketin, rîyê nêzîk digirtin, xerabî dikirin û dizvirin quđret û xebatê bi riya hêzê Agrî re, bi çawa cilve dewletê dixapandin. Bi rastî, li navenda kurdî ya Agrî tenê deh mîrêñ çekdar mabûn li pêsiya hengê Bayzîdê .

Havîn gihişt. Katê ji bona lepandin, ji bona xerabiyê munasib ! Şêx Abdulqadir ligel dest û pêvendêñ xwe çû zozanê çiyayê Şinek ku dûr ji Agrî bû, jin û zarêñ wî jî dewlet ji Izmirê anî tehwîlê wi da.

Êdî desteyen canbêzarêñ Agrî li nav erdê Tirkîyê zor dûr diçûn. Desteya Ferzende Beg ji helmeta xwe ta navçeya Hesen Qele, nêzikayeti Erzerûm dirêj dikir ! Layekî helmeta xwe da karvansera li nivanî Hesen Qele. Sari Qamiş girt, çend zabitêñ tirk ku ligel jin û zarêñ xwe diçûn bi Sari Qamiş dîl girtin. Paşê bi ihtiramê jina ku li cem wan bûye memûran azad kirin. Ihtirama ku bi jina kiribûn û parastina namûsa jinan xesletê çakê Kurdan diyar kir û li nav zabita deng dabû.

ELO BEŞO

Desteya Elo Beşo ku tenê pênc mîr bûn ku heya derê Erzurûm diçûn. Carek nêzîkê zinya Palan Döken mifrezeyen eskeriyê taqîbê canbêzaran bûn

*(1) di vir de çend gotin nayêñ xwendin.

e, tele* avêtine, pey şerek sivik, zabitek û çend esker kuştin, kincê wan li xwe kirin, çekê eskeran ragirtin, zivirîn ; kincê zabit li ser Elo Beşo bû.

Pey şerê 1930 ku Agrî bi destê Romê ket, hinek canbêzar li navberê perakende mabûn. Elo Beşo bi yek hevalê xwe li nav şikeftek simmê dêran. Eskerên Rûmî dor li şikeftê girtibûn, dixwastin bikevin nav şikeftê. Di nav wan de şer dest pê kir. Paş midetek, hevalê Elo Beşo xwast here teslim bibe ; Elo Beşo tifeng û fişeng ji wî sitend, hişt ew ji şikeftê derkeve. Elo Beşo bi tenê ma. Eskeran bomb davétin, Elo Beşo nedîhişt biteqin, niştva digirt, bi aliye eskeran davêt. Carek neqedand bombê bigire, teqiyâ, ser rûyê wî xûnî bû, çavê wî nedidît, dîsa bi gulûle bi neyar nehisand. Sev bûbû, hewa munqelib bûbû, baranê şedîd dibarı. Eskera ji bona xwe ji baran veşartin çûn dizanîn ku bi tenê mirovek di şikeftê da ye, li derê şikeftê dirêj erdê bûne. Elo Beşo kincê eskerî li xwe kiribû, paltoyê eskerî li ser kişi. Baran çiqas şedîd bû ewqas jî hewa tarî bû. Elo Beşo hêdîka xwe gihad derê şikeftê, mîna eskeran dirêj erdê bû, hêdî hêdî li nav eskeran ji bona xwe cih vekir, piçekî ji devê şikeftê dûr ket, paşê bilind bû. Heke yekî ewî didî tesewir dikir eskerek hevalê wan e. Bi vî tehrî ji nav eskeran difilite, dikeve nav hevalên xwe.

Rojek zabitek Romî xeber dişîne, xwastiye were wan bibîne. Memed Axa Heyderî jî li nav frariyan bû. Ew zabit tê nava wan dibêje : eskerên ku di şikeftê dorê li Elo Beşo girtibûn, ez tevî wan bûm. Ew Elo Beşo kîjan e nîşan didin ; çavê wî radmîse, dibêje : tu çawa ji şikeftê derketî, ji nava me xelas bûyi ? Elo Beşo tarîf dike !.

Memed Axa digot : rojek Elo Beşo gote min işev xew dît, iro esker tê ser me, emê şer bikin, ezê di vî şerî da bêm kuştin ! . Ü wisa jî bû. Wê rojê Romî hatibûn ser wan, şer çebübû û Elo Beşo jî hatibû kuştin.

* *

*

Tello, ji omerayê Melazgirt û hevalê wî Çavreş û tevî çend mîrên Hesenî heyâ navçeya Mûşê diçûn ; xeyn ji xerabiya ku dikirin îrtibata Agrî ligel navçeyen din ên Kurdistan bi cî dianîn.

Xeyn ji ev çesnê xebatê, niştimanperestanî Agrî li ciyê din ên Kurdistan jî xebata têkoşeran ra tîrêjê dida. Çumkî Agrî navendê şorişa Kurdistan bû (...) * Li qismetê nîvroya Kurdistanâ Tîrkiyê navçeyen Midyat, Mîrdîn, Şîrnaxê serokê xêla Hevirkî Haco Axa idare dikir. Desteyen wî heyâ Eroh û Hekarî diçûn ...

Rojnameyek tîrk bi navê «Gece Postası» dest bi nivîsîna meqalat kiribû. Ev meqalat di bin navê «Isyana Mezin a Agrî û şerîn wî çawa bûn», bîranînen Yüzbaşı Zöhdî Güven, zabitek tîrk bû. Ev zabit li sala 1929 hatibû Kur-

* tele : dafik ; canbêzar : fedakar, fedayı ; (2) di vir de çend gotin nayêñ xwendin.

distan, li alaya jandarmî ya seyar kar kiriye û hinekê li şerêd Kurda hevbes bûye. Nivîser di navbera meha temûz a 1929 li Zonguldak bi rê ketiye, hatîye Trabzonê û wisa dînivîse :

Hema Şoforêن Trabzon çaxê navê Igdîrê - bajareke li bakûre çiyayê Agrî, zor nêzik e li sînorê Ermenistana Sovyetî- dibihîstin, serê xwe xwar dikirin, digotin «heya Erzûrûm diçin, ji wê pêştir naçin, li wan deran şaqî zor in. Wê salê di rohelat de xebat û têkoşîna eskerî ji bona girtina çiyayê Agrî û temirandina şoreşê dewam dikir. Paş çend roj mayîn li nav Trabzon, ji bona peydakirina otomobîlek, min şoforek ji dostêd hevalên xwe peyda kir û bi hezar zehmet razî kir ku me bibe Erzurûm. Di nav rê da her gili ku me dibihîst, hemû ji bona şaqiyanê kurd bû. Li Gümüşhane - bajareke li nîvî riya Erzûrûm - Trabzon - digotin : Wextekî midirekê nehîyê bi navçeyên rojhelat, ber bi ciyê karê xwe diçû. Çaxê bi çiyayê Kop digihîje - li nav Bayburt- Erzûrûm çar Kurdêñ çekdar pêsiya maşına (otomobila) wî digrin, perê wî distînin, li nav xwe bi vî tehrî par dikin :

«Heso evî kiriya riya te, ev jî kiriya riya min, evî maliyatê malê, ev jî maliyatê zeviyê !». Pey vê beşkirinî dizvirin cem midir, dibêjin, «em rîbir nîn in, çiqas pêwîst bû me girt, zêdemayîn didine te, bigir», pere danê, paşê gotinê ; «Fermû, te bi Xwedê dispêrin !».

Zöhdî Güven jî li çiyayê Kop da rastê du mirovên çekdar tê. Ewanan kêsik kêsê rê bûne. Zöhdî Güven dibêje : bi min gotin : «bi me welamê* cil mîrên çekdarê Dêrsimê -navçeya di navbera Erzincan û Xarpêtê, iro Tırka Tuncelî nav danê- bi vî alî têñ, lêbelê em ta niha nizanin ew li ku ne». Ev zabit bi hezar tirs û lerz xwe bi Erzurûm digihîne. Şoforê ku wan anîbû qerar bû bi İgdir bibe deng û basê ku bi tirs li çilonayetê destê û taqîmêñ Kurda dibhîse tê cem wan, dibêje : «Ez nikarim ji Erzurûm pêş da herim, dizvirim Trabzonê ! Hun ji bona xwe çareyek peyda kin !».

Evanan giliyên zabitek Romî ye ku li babetê fealiyet û reftarê muadelaneyê desteyeki canbêzarêñ kurd çaxê encam dayê destûratê ku girtibû li nav rojnameyek İstanbul da çap kiri bû. Desteyêñ ku ji Agrîyê dûr diketin, ji aliyê Kurdêñ Tirkîyê bi corekî şayeste mîvan dibûn, ji bona wî hewcê wan ne bûn ligel xwe bar û nan û pêxwarin bibin. Brîndarê wan li layêñ navçe tîmar dibûn û ji navenda wan re dişandin. Yekî ji wan desteyar çûbû navçeya Adilcewaz û çiyayê Sîpan. Li wê derê tacirêñ pez hebûn, pezê xwe diçerandin, destê mîvan nekiribûn, tenê pezek ji nedabûn ku serjêkin, bixwin. Evanan ji Kurdistan pez berhev dikirin, dibirin Sûriyê difrotin. Ji bona çavtir-sandin û têgihandina ev kesan, desteyêñ Ferzende Beg, Xalîs Beg û Edoyê Ezizi şandin çiyayê Sîpan gelleyê* tacira, ku zêdetir sê hezar pez bûye, bigrin, bînin Agrî. Eva destûr hate bi cî kîrin. Her çend eskerêñ Romê riya wan girtibûn û xwastibûn pez bizvirînin, belam* neqedandibûn. Xwedanêñ pez bi Anquerê têlgraf kişandin, gotin :

* welam : 1) bersiv, cewab. 2) peyam, mesage ; gelle : kerî, col ; belam : lê, lêbelê.



«Heke Dewlet nikare me û malê me ji tecawiza şaqiyanên kurd biparêze, çêtir e ku Kurdistanê bi Kurda, bi wan bispêre, ta teklîfa me jî diyar be !»

Rûdave* yek li pişt a din çêdibûn. Ji ber ku dewlet ji qanûna te'cîlê jî kelk û sûdê* negirtibû, ji bo dîtin û qisekirin heyeteke nuwîneran şand Bayzîdê.

ÇAVPÊKETINA KURD û TIRK

Em li zozanan bûn. Rojek qomandarê jandarmên Bayzîdê, Arif Hikmet Bey, xeber şand, hate dîtina me. Yek qîte fotografê eyala min Yaşar Xanim ku li Bayzîdê derxistibûn anîbû, bi min da û got : heyetek ji Ankara hatiye, dixwazin we bibînin. Me qebûl kir, cewab da ku sibehê saet heşt hev bibînin.

Roja din, beyanî, piştî sînorê Agrî-Tirk, li erdê Tirkîye, ev çavpêketin pêk hat. Ez, Ihsan Nûrî, çend hefta ji serokên kurd bi bîst siwarênu li bare-yê azayeti* û şehamet serhatiyêن rojgarî* bûn bi hevra çûbûn. Ewanan jî bi du maşîn* hatin tevî deh jî esker. Endamên ev heyeta bêrîti bûn : du nûvîneren Civata Mezin a Netewayetî ya Tirkîyê -ku yek nûvînerê Istanbul, ê din nûvînerê bajêrê Bayzîdê qomandarê tumena-firqeya-Qerekosê¹, çend zabit û Arif Hikmet, fermendarê jandarmên Bayzîdê.

Pêşneyarêن nûvînerên bêrîtiyê ev bûn :

- 1 - Arambûna Agriyê
- 2 - Destparastin ji pelamardanê riya û xirabîkirin
- 3 - Şûndadayinî pezê taciran
- 4 - Ji hemû zêdetir, derketina Ihsan Nûrî ji Agrî bi her şertê ku ew bi xwe bixwaze.

Li muqabil da Araratîyan her xirabiye kîrine tê bexşîn, her yarmetî ku pêwîst be ewê dewlet bide, rahetiya wan temîn bike.

Min tevahê hemû pêşneyarêن wan red kir. Bi min gotin : Were niştimanê xwe, dewlet li her babetê ji bona selamet û rahetiya te qewl dide ! Bi welamî min got : ez li nava niştimanê xwe me, ji we ihtiyacim nîne ; esasen bi qewlê dewleta we baweriya min nîne !

Gotin : tu kîjan dewletê dixwazî, em memûriyet bidin, here meaşê xwe bigir û kar bike !

Min got : Ez naxwazim ku navê dewleta we li ser min be.

Gotin min : ha ji te ra pasaport bidin, her li ku dixwazî azadane here. Ewê pasaportê ji te ra konsolosê Tirkîyê li Tebrîzê bi xwe bîne, bide te.

Min bi welamî got : beyhûde zehmet mekêşin ! Ez bi hîç ciyê naçim. Ez xulamê neteweyê kurd im. Ewanan dikarin bi min teklîfa tayîn bikin. Hun heke rast dibêjin, welama eva ala serbixoya kurd ku li ser çiyayê Agrî li ber çavê dewletê ve daçikandiye bidin.

Hatin ser pirsa pezê tacira, gotin : van peza kî anîne, bidin xweyê wan.

* rûdave : bûyer, hadîse ; sûd : istifade ; azayeti : mîranî, mîrxasî ; şehamet : cesaret ; rojgarî : jiyan ; maşîn : otomobil.

Min got : ev pez kî anîn, belav kirin nav, hemû xwarin, temam bû. Heke bawer nakin, min Ferzende û Xalis Began nîşan da û got : evanan çûn anîn, ji wan bipirsin. Yekî ji nuwîneran ji Ferzende Beg ra got : heke hun peza nedîn, dewlet jî we efû nake ! Ferzende Beg welam da : em ji dewletê ef naxwazin, hewcê me bi bexşînî dewlet nîne. Qederek ligel Bro Heskî qise kirin, me jî li gel zabitan qise kir. Metalîbî Agriyîyan li du wûşe (gotin) da kurt dibû : Azadiya Kurdistan !... Cîgehî hîç mebestegiyen nebû ku dewlet nezanî be ! Pêldanî alaya sêrengîn a serxwebûna Kurdistan li ser girên Agrî, çiyayê Cezîra Botan û Midyat, Sason û Xerzan û çiyayê din ên Kurdsitan bi destê azadîxwazîn kurd baştîrin û aşîkartîrin amanca wan bû. Diyar bû ku dewlet dixwaze me bixapîne !

Tenê di ev çavpêketinî da dest hat peymanê li ser zarekî wisa ku hêzên Agrî êrîşê Bayzid ne kin û Dewleta Tirkîyê jî bi ser Agrî hêz û esker neşîne.

Li axirî gotûbêjan de, çend ji wan zabitên ku navê Ihsan Nûrî ji İstanbûlê nas dikirin bi Ihsan Nûrî gotin : ci xizmetê dixwazî bi şexsê te bikin ? Ihsan Nûrî got : jina min bişînin Helebê !.

Havîn ser çû, êlat gerane ser gundên xwe. Şêx Abdulqadir, ku teslimê dewlet bûbû û hêjî li jér fermana dewlet da bû, li gundên xwe, ku li nîvroyê rojavayê Agrî bûn, rûnişt. Elo Beşo ku bi Şêx guh neda, teslimê dewlet nebûbû, mirovên çekdarên xwe şande ser. Em li hawara Elo Beşo çûn, mirovên Şêx vegeriyan ser ciyê xwe.

Çend mal ji êla Hesesorî bi îcaza dewletê li kelefîyê gundê xerabê Kanî Korkê ava kirin û bi cî bûn. Gundê Kanî Kork li nîvroyê Agrî da û li kêleka sînorê Agrî û Romê li jér destelatê* Tirkîyê bû. Kanî Kork ji bo çavpêketin û axaftin li gel dewletiyan û serokên Araratîyan zor baş ketibû. Çend roj paş avakirin, çavpêketinê dostane di nav serokên Agrî û zabitên tirk ên şarê Bayzîdê li vî gundi pêk hat. Keyayê gund Hemîd Ismaîl mîvandarîke germ û gorî li mîvanan girt ; ev çavpêketin di hewayek zehf dostane de temam bû, çend wêneyek ji bona bîrmanê helgirtin.

Zabitên tirk bi Ihsan Nûrî pêşneyar kirin ku rojek biçe Bayzîdê, mîvanê ewan bibe. Di welama (cewaba) xwe de min got : qewl bidin min ku ez disa bi xoşî vegerim Agrî, ezê bi ser çav, bi xoşhalî bêm. Ji bo navê mîranî û wefa li ser qewlê xwe, bi hevmeslekên xwe zabitên tirk baweriya min hebû. Zabitan gotin : emê bifikrin, paşê bişînin dû te. Paşê jî hîç xeber û basek nebû.

Paş çend rojê din, wezareta hindurî ya Tirkîyê bi riya waliyê Bayzîdê bi min xeber da ku hevaljina min bi riya Sûriyê ketiye û ji Tirkîyê derketiye.

Li ser pêşneyara hikûmetê, berpirsiyaren Bayzid û serokanî Agrî li nêzîkayetî Kanî Kork dîsa hev dîtin. Di vê çavpêketinê da hikûmet çend kes ji ruesayê kurd ên mutîe xwe li gel xwe anî bû. Yek ji wan Teymûrê Kesko-yî, serokê xêla Kesko-yî bû. Di nav axaftinê da got : Ez Tirk kurê Tirk im.

* destelat : hikm, otorite.

Xwast dilê hikûmetê xweş bike. Ev giliyê Teymûr bi Agriyîyan giran hat. Bro Heskî bi xwînsarî û heqaret welam da got : ji Xwedê dixwazim pey mirinê, tu li gel brayêñ xwe yên Tirk çal bibî !

Li zivistana wê salê, di şerê ku di nav Kurdish û eskerên tirk de qewimî laşê Teymûr li teniştä laşê zabitek tirk, li ciyek, di nav kendalek de hat dîtin. Herduwan anîn di paşila hev de çal kirin. Xwedê hêviya Bro qebûl kiribû.

Çend roj paş ev çavpêketin rûdavekê bû ku ji serokêñ Agri bi temamî diyar kir ku ev hevdîtin tenê ji bona xapandina û xewkirina Agriyîyan bûye.

ŞERÊ KANÎ KORK

Rojekê beyanî*, payîz bû. Hewa bi birê beyaniyê bi kar ketibû, şevnemê xwe bi ser erdê raxisti bû, li ser rûyê çîmenênel pelaside û zerd mîna dilopêñ ferlîskî ji ser goneyêñ zerd kilor dibûn. Tîrêjêñ tavê perdeya tariya şevê qelaştibûn, di ber serê ewran lê dabûn. Teze tebîetê ronahiyê bi riyê zevî gihadibû ku çend dengêñ tifink ji nêzîka xetê sînorê kurd-tirk bilind bûn. Li pey wan şelikî mîtralyoz hatebihîstîn. Zehf nekişa gundê Kurd Ava ber bi gullebaranê topêñ neyar ket. Kurd Ava ku ji sînorê kurd-tirk çend sed metir dûr bû, nêziktirin gund li neyar bû, mala me û mala Bro di vî gundi da bû û ala serxwebûnî kurd ji li ser vî gundi pêl dida. Berê navê wî Tirkmen bû, min guhirî Kurd Ava danî bû.

Tırka qewlê xwe şikandibûn, me Kurda xafîlgir kiribûn. Bi rastî ji Kurden Agri di vê demê da helxeleta bûn. Ji bona wî beşek hêzêñ Agrî li nav erdê Tirkîyê xerîkê isperkênanê xwe bûn, beşek siwarêñ kurd çûn ku xwe li şûnêñ giring ên Zinya Agriyê di nav Agriya Mezin û Piçûk da bilind rabigrin, nehêlin Tirk ji wî ali werin, çûnkî di her teqê ordukeşî da ev cî diket pela-marê Tırka ta ji vê rê navbera navçeyêñ Agri û erdêñ bêlay ên Iran bibirin, hêzî Agri gemaro bidin (dor lê bigrin). Kes li vê zînê nebû ku ji bona me gelek bitirs ba ; em hemû di gund da rûdiniştin. Gundek jî li ba me bû, belam ev gund ji me dûr bû, gundê Mûsa Bêrkî bû.

Ev du gundan vala kirin, jin û zar bi nêzîki sînorê Iran çûn. Frokeyêñ neyar li esmanê Agri difirîyan, bi bomb û mîtralyozêñ xwe, mîkrobêñ ecel direşandin li ser rûyêñ jin û mindal.

Qomandarê kurd li gel Bro Heskî û duwanzde mîrêñ din di gund da man ta pêsiya pelamara neyaran bigrin. Şer giran bû belam bo Agriyîyan nebû. Me neyaran didît, girêñ pêsiya Kanî Korkê girtibûn, bolikek siwar û topek jî li wêderê bû. Pelamarê peya nedihat dîtin. Gulûleya peya û mîtralyozêñ van ber bi Agri nedavêtin, şerê qors (giran) li aliyê Kanî kork bû ...

Li Kanî Kork, 25 mal rûnişti bûn û li ser qiseyê dewlet ava kiribûn. Têkoşeranî Agri baş dizanibûn ku rûniştevanêñ gundê Kanî Kork hîç karî bi pêçevaney dewlet nekirine ko hêzêñ dewlet li ser wan pelamar bikin. Nişkeva me dît dûyê qalind ji ser Kanî Kork bilind bû, pey wî jin û zarêñ kurd derke-

* *beyanî* : sibe, danêsibê ; *fermisk* : hêstirêñ çavan.

tin bi aliyê sînor beziyan, hatin Agrî. Ez li hespê xwe siwar bûm, çûm wan deran bibinim, min dî ewanan bi aliyê gundê Şêx Abdulqadir, ku muti'î dewlet bû, diçûn. Du ta zarok ku çaxê revê dayikên xwe winda kiribûn li deşte mabûn digiriyan. Min wan li bin agirê mitralyozêneyar siwarê hespê xwe kir, zivirîm nav hevalan.

Frokên neyar her xerîkê gulûlebaran bûn li ser jin û zarokan. Çawa bû braziyê Bro yi neh salî, Ibrahim, bi tifinga xwe li laşê mezîn ê firokek da, anî xwarê û ew li nav zeviyêni di bin hikmê Tirkîyê ket. Tipêni siwarêni tirk ji bona parastina frokê bi rê ketin, li pişta girek ji çav winda bûn.

Ta vê çaxê kesî nizanîbû Tirkâ ji bo ci rikê li Kanî Korkê kiriye. Zehf nekêşa, çend têkoşerên ku çûbûn nav Tirkîyê, zivirîn. Evan, Elxanê kurê piçûkê Bro û Mela Şunullah ku yek ji canbêzaranê netewayeti kurd bû, rojêni inê li mizgefta Agrî xutbê bi navê netewayeti kurd dixwand, li gel pênc fedaî bûn û digotin :

Em işev dereng gihîstîn Kanî Korkê, westiya bûn, xwastin şevê li mala Hemîd Ismaîl istirahet bikin û sibê beyanî sînor derbas bin. Edî em nizanîn Romî çawabihîstiye em işev li mala Hemîd Ismaîl mane. Xwedanê gund ji bona destmêj girtin ji gund derdikeye, dibîne destek siwarêni tirk bi gund tê. Bi bîrê fedaiyan dikeve ku li mala wî mîvan in. Kurd ji bona parastina mîvanen xwe, her ci ji destê wan tê kîmasî nakin. Ji bona vê, bi siwaran qîrîn dike : Siwarno pêş da neyên ! Aliyek ji hawarê jîna xwe dike : zû tifinga min bîne ! Jîna wî tifingê ji wî ra bir, em jî rabûn, tifing û rextê xwe girtin, beziyan derva çûn. Siwar nesezinîn, disa pêş da dihatin. Hemîd Ismaîl gulûleyek avêt, eskerek kuşt, me jî xwe gihand Hemîd Ismaîl. şer dest pê kir, gundi jî hatin aliyê me. Me çend esker kuşt, çekêni wan girt. Alayek esker ku ji şev dor li gund girtibûn, li hawara siwara hatin, şer qors bû. Sê mîr ji nav gund şehîd ketin. Me gund berda, çûn, me dît naqedinin pêşîya alayê bigrin. Çaxê revê sê jin û qîzek piçûk, 4 salî, hatin kuştin. Em bi aliyê we hatin, gundiya berev Şêx çûn.

Paşê hate zanîn ku du mîr û pitîyek-pitê ji qîza zor piçûk ra dibêjin-jî ji agirê mitralyozê birîndar bûne û brayê Hemîd Ismaîl û jîna Hemîd Ismaîl jî bi mukafata mîvandariya ku çend roj pêş ji zabitan re kiribûn. Revîyen Kanî Korkê tîpek eskerên Tirkâ li pey xwe bi Agrî kişand, wanani ji pira li ser çemê sînor derbas bûn hatin erdê me. Xwastin ku pez û dewarêni Kanî Korkîyan ku li alî me li qerexa çem diçêriyan talan kin, bibin. Dîtina vanan û revîna dilşewitane ya jin û zarêni kurd ji çengê eskerê Romê edî mecalâ tehemul ji bo desteyê piçûk ê Agrîyiyan ku li ser gir didîtin nehişt. Mîrxasên kurd hatine ser eve ku numayışek ji nimûneyen qaremaniyen bav û bapîren xwe bidin, ervahê ev mezinan ku ji bona parastina niştiman û azahiya xwe bi şûrê rût hesp bi deryaya neyar dibezanîn şad bikin, xwastin carek jî perdeyê ji xebat û şerîd Iran û Tûran ên mîjûyî ra bi çavêni neyarêni kurd raxin. Bi hemû ragihêniñ ku neteweyê kurd ê iroyî bi rastî neveyen ev palewanen navbangen ku li meydana şer da rûh û hestî* nebezî* û şerkarî li xwîna pak

* hest : his ; nebez : palewan, mîrxas.

û zelal a aryayî wan hîç alegorekî bi ser da nehatiye, bi kurtî xwastin di ev rojê da hêjayiya rasteqîne ya şerkarî û mîranî ji Kurd û Tirk ra pêkewe* helsenginê ber derê xwe aşîkar bikin, ji yar û neyar itiraf bigirin, xwestin canê xwe li ber piyê me'sûqê Azadî pêşkêş kin. Tesmîm girtin : ba zanîna zêde û bertêrbûnê çekê neyar û ji hemû gîringtir li miqabilê tenê yek şerkarê kurd hebûna sed esker bi çav girtinê hemûyê vanan rêkêb kin. Pêwîst bû şehamet û tehevorê cibilê kurd kêmasiya hejmarî cibran ke. Pey maçkirina kevirên reş ên Agrî mîna Hecerelesveda Kabê ya neteweyê kurd, pişt bi Agrî rû bi neyar pêşda çûn. Meydan rast û rût û ji Agrî dûr bû. Êdî neyar nikaribû bêje Kurda kelk girtine ji aşînayetiya bi newalên pirzinar ên Agrî ji çengê merizgar dîkin. Li babetê hejmar û çesnên çekan qorxanê neyar zehf bêtir bû ; li bareyê cîgirtin zor ciyên baş li çengên neyar bûn, li pişta gir û li nav gund bûn ! Lê peçîvaneyê van Kurda li zevîkê rast û rût bû. Lê li haletê ev hemû zal de têkoşerên kurd tesmîm kiribûn, te digot ervahê palewananêñ kevn ên Iran li gel rûhê wan tékil bûye, di ev misabeqeşa giyanbazî de her yek dixwast ji ên din serfiraztir bin. Agrîyiyan nedixwastin xwîna bêgunahan birêjin, vanan tolê wan negirin. Xwastin sunbilên spî ên payîzê ku li dewrûberê çemê sinor li ser zeviyêñ kesk hêşin bûne bi xwîna sor rengîn bikin, ala niştimanî kurd careke din berçav xin. Êdî gulûleyen top û mîtralyoz pêsiya wan nikaribûn bigirin. Xwîna şerkarêñ kurd keliyabû.

Li ser rikêbî mutehevranyê kurd neyar erdê Agrîyê bi cî hiştin, helatin nav gundê Kanî Korkê. Neyar pê re çopira ku li pêsiya Kanî Kork li ser çemê Sînor bû gulûlebaran dikirin ta Kurd nikaribin derbas bin. Hevalên şerê min gihiştin pirê û li kêlekê perderiyê erdê bûn, dest pê kirin şer. Di nava wan de tenê ez siwar bûm ; li nêzikayetê pirê peya bûm. Li wan deran cî nebû ku hespê biveşêrim. Min hespê kêşa nav cuhek. Neyar pirê li bin agirê mîtralyoz girtibû ku em nikaribin jê derbas bin. Min dît şer dirêj dikşîne, min tewekelê Xwedê kir, siwarê hespê bûm, mehmûz bi hespê da, xwe gihad pirê. Giliya hevalên ku digotin neyar li nav gund e, zû peya be, min guh neda, pirê derbas bûm, gulûleyek jî bi aliyê gund avêt. Ji gund jî çend gulûle bi min şêlik kirin. Ez ketim nav gund. Peyayêñ tirk ji aliyê dinê gund berdan. Wê gavê Yadoyê Delxerî û Osmanê Kilem bi sê siwaran destûrekî girtibûn, ji rûyê pirê ku pênc sed metir li rojavayê pira Kanî Kork bû derbas bûn, aliyê girekî ku li aliyê rast û piçekê li pişta neyar bû hesp bezandin, çar nal çûn.

Li nav gund, çend jinêñ dîl, ku yekî avis bû, xwe veşartibûn bi dengê hespê min zanîn ku Kurd e ; eskerê Romî ku li gund peya bûbûn, ji malan derketin ; laşê jinikek ku Romî dixwastin li gel xwe bibin û neçûbû, li nav gund kuştibûn, li ser erdê bi xwîna xwe gevez bû, ciyê çend nîze li ser laşê wî dihate dîtin. Ev jin jina kurapê Hemîd Ismaîl bû. Gund hatibû girtin, jinêñ rizgarbûyî digiriyan, bi çavê pir firmîsk xwe bi min gihadîn, xwe bi hefsarê hespê çespandin nedîhiştin pêş da herim, ketine lingê hespê hemêz kirin, Sim, rikab û piyê min radimîsin, lava dikirin neçe, mîna dîn bûbûn.

* pêkewe : bi hevra.

Bro û hevalên wî ku li pêsiya pirê dirêjî erdê bûn, şer dikirin, dîtin ku min li nav gund hesp bezand, rabûn û ji pirê derbas bûn, peyatî hatin. Jina xwe bi kenar kişandin. Em tev çûn pişta gund. Di vê katê de Yado Delxerî û Osmanê Kilem xwe ragihandibûn kêlek û pişta Romîyan û li wan didan. Romîyan dît ku me gund girtiye û ji du alî pelamarê dikin, panîk kete nav wan. Bro Heskî go içar dora min e, bi îsrar û lava hespê min girt, siwar bû, li pey peyayênu ku ji Kanî Korkê revîbûn ket. Peyayênu Romî zor dûr bûbûn. Zivirî, bi tenê bi mevaziyê neyar rikêb kir. Rê dûr, erd rast û pir bi kevirêن piçûk bû, Ji bona ku Romî nikaribin li Bro xin, me wan di bin agirê şedîde xwe girt. Bro bi girê ku Romî li ser bûn gîhişt, êdî neyar wî nedidît. Neyar xerîkê parakişanê bû. Qomandarê firqeya Romî ji hemû zûtir siwarê otomobîla xwe bû, revî, paşê maşîna xwe şand pê topên girêdan ji destê Kurdan xelas kirin.

Yadoyê Zilanê Delxerî ku li pişt û kêlekê Romî rikêb kirî, neyaran ji şûna xwe rakiribû xwe gîhand çend eskerên ku mabûn, dil girt. Em derketin gundê Qotisê, ku li rûyê çiyayê pişta Bayzîde bû, ji wê derê bi gulgule Romîyên firarî teşyi' bikin. Li zinya Qotis top û eskerên wan hebûn.

Ev şer gelek ecêb bû. Zêdetir ji du hezar peya û siwarên meşqdîtî bi top û mîtralyozên mezîn û piçûk û bombefroke* li pêsiya panzde peya û şes siwarên kurd te digot mîna ku gur ketiye nav pez, direviyan, mîtralyozan bi cî dihiştin ; taqimek esker dihatin girtin, dîl dibûn, frokê û bi pasebanê wê va bi cî hîstibûn. Kurd ta gundê Qotis ku li singê çiyayê pêsiya Bayzid bû pêş da çûn.

Kurdek ji gundê Hellac, navê wî İbrahîm Azo bû. Frokevanê wê froka ku gulûleyên Kurdan anîbûn xwarê bi şarê Bayzîd biribû. Di zivirandinê da hatibû zinya Qotis - navê zinya Qotis, zinya Şeytan bû. Çaxê gîhişt me, got : çaxê ez hatim zinya Şeytan, eskerên tirk ji pêsiya we direviyan, çend zabitên tirk bi dûrbîn li meydana şer temaşa dikirin, yekî ji wan destê xwe li çökê xwe dixist, digot : Xwedê ev ci bêbextî ye ? Ev qas peya û siwar ên bi top li pêsiya çend Kurdên rût û tazî û birçî firar dikin !

Belam nayê zanîn qomandarê tirk li babetê ev şer ci rapor daye, hejmara Kurda çiqas nivisiye. Ev şer li nav inirovan bûbû efsane, belav bûbû. Digotin ku li nav rîzê şerkarêne kurd siwarek kincspî peyda bûbû, Tirka dişkand.

Nêziki êvar bû, şerkarêne Agrî çûne ser ew froka ku Kurda anîbûn xwarê. Duwanzde peyayê din ku Eyûb Axa, birayê Bro Heskî û çend peyayê Mûsa Birki di nav wan da bû zûtir xwe bi pasevanê frokê gîhandibûn, dest bi teqe kiribûn. Wez'ê meterisê eskera gelek baş bû. Li nav girêne tabiye nêzika gundê Dûdkan meterizek girtibûn. Şerkaranê ku li çiyayê Qotis da bûn pêwîst bû nezikê kilometrek li erda rast li jêrî agirê neyar da biçin.

Seyid Resûl Berzencî û Ferzendeyê Hesenî, du mîrên sergerê Rustem pêsend, kêleka çep a siwarêne Tirkan bin gulûle girtin ... peyayê mesafetê me derbas bûn girê pêsiya neyaran girtin. Ew siwarê kurd ê ku bi tenê xwe bi Kanî Korkê gîhandibû xwe bi nav du girêne ku Kurd û Tirka girtibûn û şer

* bombefroke : bombavêj, balafira bombavêj.

dikirin gihad, ji hespê peya nebû, xwe da penayê girê neyar, ji zaviyeyê meyite kelk girt û xwe ji gulûlên neyar veşart.

Qomandarê siwarên tirk dît ku Kurd nakevin, axir dil kir fermana paşekêsi da, li gel sê eskerêni siwar hespêni xwe bezandin çûn. Seyid Resûl û Ferzende çûn ev zabiti bigirin, belam negihîsttin. Eskerêni din neqedandin xwe bi hespêni xwe bigihînin, peyatî parekêsi dikirin. Çaxê dengê tifingan hate birîn, şerkaran feryad kirin : Romî revî ! Min êdî dereng nekir, xwe gihad ciyê Romî ; hespêni wan û sê kuştî, çend birîndarêni wan û çekêni wan mabûn ! Şerkarêni kurd her yekî hespek girtin. Neyar bi rêzenê nêçirê di erda rast da para diçûn.

Siwarek dît ku neyar ji dest difilite, êdî dereng nekir, mehmûz bi zikê hespê da, bi tenê rikebê neyar kir. Tifinga wî nebû, dehtîr di destê wî da bû ; gulûleyek agir kir, qalingê fişeng di nav lûlê da ma, dehtîr xerab bû. Çend esker zivirîn, nihîrin, dîtin ku siwarek bi tenê rikêb dike. Siwar xwe winda nekir, bi tirkî notilê zabitên tirk ferman da : Teslîm bin ! Dest bilind ! Neyar mînanî ku manyetize bûne zû itaet kirin. Siwar kete nav neyaran, tifingek û qetarek fişeng ji destê eskerek girt û ferman kir : tifengen xwe ji desten xwe bavêjin zeviyê ! Avêtin. Paşê ji dîlketiyan ra wa'd da, go : dilteng mebin ezê işev we bişînin Bayzîdê nav hevalên we. Ev siwar xeyn ji qomandarê kurd kesê din nebû !

Ez qederek sekinîm ta peyayêne me hatin. Ewan eslehê dîlan girtin. Min tifengek zêde girtibû û min wê da Bro Heski. Teyara ku anîbûn xwarê nêzîk bû, em çûn dîtina wê. Mixabin di nav Agriyyan kes nebû frokê bifirîne, belam ji mîtralyoza ku di frokê de bi cî kiribûn me dest nekişand û wê ji frokê derxist. Bi destûra qomandar hindurê frokê teji giyayê hişk kirin. Qomandar li gel Ahmedê Haci û Bro li kêleka frokê man, ên din çûn. Çaxê ew dûr ketin, agir avêtin giya, ewanan ji hespêni xwe bezandin, çûn bi hevalên xwe gihîsttin. Qederek dûr ketin, bombe teqîyan û frokê tike tike kir, dengê wan zafera Kurdan bi guhê Romîyan gihadîn. Nêzikî Agri bûn, dîlketiyan bi kirâs û derpê şandin Bayzîdê ta ahalî bibîne ku Romî nikare şikesta xwe veşere.

Ferişteyê şevê balê reş û tariyêni xwe bi serê ev kuşt û kuştaran kişi, ji pêşîya çavan veşart. Xeyn ji simê hespêni ku me ji Romîyan girtibûn û peyayêne me hemû lê siwar bûbûn, tu dengek nedihat. Bêdengî şûna teqînen top û tifengen cehenemî girtibû. Nale û nezarêni birîndarêni ku musebib inku ev şerê xunavî dest pê kiriye, destê tol giran û padaşê dagir kirin û pelamar deranî jin û zarêni bê tavan bi çakî dabû, piliseyek ku li ser froke bilind bû bi şerkaran re oxir bixêr digot. Bombêni ku ji bona kuştina jin û mindalêni kurd di nav frokê danîbûn, bi dengê muhibî teqîya, feth û pîroziya Agriyyan ilan kir.

Katê şerkaran gihîsttin cem frokê, du mindalêni kurd ji gundê Hellac ji bona dîtina frokê têni. Çaxê bi kêleka frokê digihîjin, bombê diteqe, her du mindalan ji dikuje. Bi vê teqîna bombê perdeya teatra* Kanî Kork hate girêdan.

* teatr : sanogerî, tiyatro

Çendek berê, qomandarê sînorê tîrk mîralay Ferhad Bey bi min xeber şandibû, gotibû : Em çira şergerên xwe didine kuştin. Tu were, em herdu tenê li hevxin, yek ji me were kuştin, şer temam be. Min di welamê de gotibû : «Heke yekî ji me bimire şer temam bibe, ez elan hazır im. Belam tu hêjî tê-negihiştî ku em Kurd ji bo çi li gel Tirkan şer dikin ! Em azadî û serxwebûna netewayê kurd dixwazin. Ku dewleta we evî qebûl ke şer temam dibe. Belam doel* kirina min ji heke pêwîst bû, ne li gel te, li gel serekê neteweyê tîrk doel dikim, ji ber ku ez ji nuwînerê kurd im, em milletek in. Pêşıya ku tu herî, emê rojek hevdu li ser meydana şer ziyaret bikin. Evî bizane : heye ku bimirim, lê bi hezaran mîna min û ji min çêtir di nav Kurda de henin ku tolê* neteweyê kurd ji Tırka digirin. Eva kuşt û kuştar wê çaxê temam dibe ku civata Mezin a Netewayetî ya Tırkiyê mafêñ netewayetî yên Kurda qebûl û İlân dike ! ...»

Ew şev Ihsan Nûrî bi wan siwarêñ dîl spart, got : «Bi qomandarê xwe Mîralay Ferhad bêjin : iro ez hatim, şâ bûm ku emê li meydana şer wî bibînim. Ji bona wî him li Kanî Kork, him li vir, hun bi xwe dîtin, ez li pêşıya şerkarêñ xwe hatim, ewî bibînim. Zor dilteng bûm ku min nedît, zû revî, ji destê min difilitî. Diyare gelek zîrek bûyî, di şûna te, min siwarêñ te dil girt û çekêñ wan ji destê wan stend.»

Li ser wa'dê ku ji dîlketiyan ra dabûn, wan azad kirin, bi şarê Bayzîdê şandin.

Tê gotin ku ava rûbarê sînorê ev beşê strana Agriyê dixwendin.

Roja azad li ser te helat

Ronîka ta Besre reşand

Nav milletê azadî çand

Hilbe Agrî, hilbe Agrî !

Serê Kanî Kork bi serbestî ji postêñ sînorê Iranê, ji Ser Kanî û ji girê Ayî Bey dihate dîtin. Nûvînerê Filleyêñ Taşnaq jî li Agrî bû, ew jî şahidê van canbêzarêñ kurd bû.

Agrî ezîztir bûbû, li ber çavan gewretir* dihat, lawêñ Agrî ev beşê* Marşa Agrî bi şadî, bi tehrê ku dengê wan çiyan dilerzand, dixwendin.

Hilbe Agrî, hilbe Agrî

Ji sawa te Tirk digirî

Te dît çawa Rûmî revî

Hilbe Agrî, hilbe Agrî !

(Dûmahîk heye)

* doel : dûello, şerê du kesan ; tol : heyf, intiqam ; gewre : mezin, beş : par, peşk.

1. Iro navê Qerakosê Agri danin e. Wallyê Agri ku ji tîrsa têkoşêranê Agri biribûn Qerekosê, lê dîsa bi navê Wallyê Bayzîdê kar dikir. Qeymeqamê Qerekosê ji anîbûn Bayzîdê ; ew jî ll şarê Bayzîdê dîsa bi navê qeymeqamê Qerekosê kar dikir. Vi kari ji tîrsa Kurdan kiribûn.

ZIMAN û EDEBIYAT

KANÎ BERHEMÊN NIVÎSKAR Û DÎROKNIVÎS ENWER MAYÎ ?

Dr. Rehber REZAN

Rojnamenivisiya kurdî ji roja derketinê û heyâ niha roleke mezin lîstiye û dilîze di mêtüya gelê kurd da ; ci organên çapemenî derkîne û derdikevin serçavine giranbiha ne ji xwendevanan ra û bi taybetî ji lêgervanan ra.

Kovara Ronahiyê¹ a rehmetî Celadet Bedirxan, yek ji kovarên taybetî ye di dîroka rojnamevaniya kurdî de. Emê di cihekî din da vegeerin ser wî, lê di vir da em dixwazin bi kurtî li ser nivîskar û dîrokvan Enwer Mayî bipeyi-vin û mebesta me ew e ku em bi berpirsiyarî rawestin beramber kelepûra netewî û rewşenbîrên xwe binasin û wana binasînin.

Li dawiya sala 1983 a em nêzîki heftekî li pirtûkxana Enstîtuya Kurdî li Parîsê mijûlî kovara Ronahiyê bûn, bi eşqeke mezin me rûpelên wê di xwendin, lewra yekemîn car bû hemû 28 hejmarên wê ketibûn dest me. Gava em gihîştin rûpelên 10-11 ji hejmara 12, lîsta berhemê Mela Enwer, an Lawê Çiya (bernavê wî bû) bala me rakişand û bi rastî xem û keser ji me re peyda kirin, we pirsek dahat pêşıya me, ku em li pey wê biggerin, bizanîn ci berhem çap bûne, ci destniyîs mane ?

Navê Mela Enwer carekê bi me re di kovara Hawarê de derbas bû² di wê hejmarê de hozanvan helbestek bi sernivîsa «Beyta Kewê» belav kiribû û sê perçê helbest di ronahiyê de çap kirine : «Serbest»³, «Pirsa min ji Xwedê»⁴ û «Cewab ji Xwedê»⁴ û di hejmara 12 a ew dabûn nasîn, ku Mela Enwer li gundê Mayê, dorhêla Amêdiyê, sala 1913 a hatiye dinyayê ; ji binemaleka olî û wêjeperwer. Xwendina xwe li ber destên melayên binav û deng li Dihokê,

1) Yekemîn hejmara «Ronahî» yê di yekê nîsanê da, sala 1942 de derket li Şamê, xwedî û berpirsiyarê wê : Mir Celadet Ali Bedirxan bû, bi şêwakî giştî kovar her mehê carekê derdiket, hejmara 28 a ya dawiyê di adara 1945 a derket.

2) Binér : Hawar, hejmara 52 a, 20 a kanûna paşin, 1943, rûp. 7.

3) Ronahî, hejmara 12 a, 1 ê adarê, 1943, rûp. 11.

4) Ronahî, hejmara 16a, 1 ê tîrmehê, 1943, rûp. 8-10.

Zaxo, Amêdiye û Erbilê xelas dike, bi xwe, dibe mela û ji bili mijadên oли mamosta Enwer Mayî nefeseke niştimanperwerî bi feqehêن xwe de berdide⁵ û wana hînî alfabêya latînî kurdî dike. Heya sala 1943 a, em dizanin ku ew melatiyê dike, pişti wê demê wek ji jêderan tê zanîn ku ew tevî jiyanâ rojnamevanî dibe, bend, gotaran bi kurdî, erebî dinivîsine, bayexeke mezin dide pirsên dîrokî, du berhemên hêja di wê babetê de bi zimanê erebî ji me re dihêle⁶. Dîroknivîsê mezin doktor Kemal Ahmed Mezher çalakiya mêtjû-nivîsiya Enwer Mayî bi vî coreyî dinirxine :«Enwer Mayî yeke ji wan serbâzen ke bi dilsozî hatiye meydana mêtjû-nivîsiya kurdî».⁷

Enwer Mayî xwediyyê texlit behre bû, ew serbazekî nenas e di warî hel-bestvanî da, wek ji Ronahiyê tê zanîn, gava temenê wî sî û sê sal bûn. Di salen sî û çeli da ji babelîska bîstan, dema birayên Bedirxaniya Celadet û Kameran sergovendiya rojnamevaniya kurdî (di kurmanciya jorîn da) dikşandin, wê heyamê hozan Enwer Mayî jî rûyê hejmareke Ronahiyê dixemilîne bi lista hin berhemên xwe, em jî wana raberî xwendevanan dikan :

- 1 - Dîyariya Lawan. Pend û şîret li ser jiyanâ civakî û welatparêzîyê.
- 2 - Kitêba Gergorî, bi navê «Leylaneka Sipî», wergerandiye kurdî.
- 3 - Mewlûdeke Kurdî, menzûm.
- 4 - Tertepêleke (Kitêbeke) metelûkên kurdî, qederê 2000 metelûk tê de ne.
- 5 - Tertepêleke baweriyyê, menzûm.
- 6 - Dîwana Mela Enwer, şî'rên welatîn, heyran û wesif.⁸

Ev lista xem û keser ji me re peyda kirin ... Va ye bêtirî çel sal di ser re bîhurtin û xwediyyê wê 21 sal in (sala 1963 çû rehmetê) spardeyî axa Kurdistânê bûye û çavên me bi berhemên çapkiri neketine. Lê rojnama Hawarê bi ser de bedxeberê dide me, ku piraniya helbestên hozan hinda bûne û hatine şewitandin, herweha çend perçe helbest bi dest mamosta Cemal Silêman de mane⁹ zor mixabin eger encam we çikos be !.

Hîn rûyekî din ji çalakiya rehmetî Enwer Mayî ji me re tê nasîn ; wî dilsozî baş zanîbû bayexa berhemên berhevnekirî, ên mayîne di paş dîwarên vepenî da ; ew bi xwe karekî mezin dike :

«Gelek nivîsin li ser Ezidiya nivîsine û gelek jî kom kirine, belê mixabin negîhişt hemiya belav ket û heta domahiyê li dû ev biçêt»¹⁰. Ew destê

5) Binêr : Helbesta «Serbest», Ronahî, hejmara 12.

6) 1) Mihadere li ser Kurdan li Çinê, Bexdad, 1959, (bi erebî)

2) Kurd li Behdinan, Mosil, 1960, (bi erebî)

7) Doktor Kemal Ahmed Mezher, Mêtjû, kurte basêkî zanistî mêtjû û Kurd û mêtjû, Bexdad, 1983, rûp. 179. Me gotinên doktor wergerandin ser kurmanciya jorîn.

8) Ronahî, hejmara 12 a, 1 ê adarê, 1943, rûp. 11.

9) Binêr : Hawkari, 19.7.1984, rûp. 10.

10) Taha Mezher Mayî, têkisteke nû ji olê êzîdyatî, Roşinbirî Nû, hejmara 102 a, temûz 1984, rûp : 87.

xwe davêje nihêniyêن ola Êzîdiyan, hin belgeyêن pîrozî ji wî olî, piştî mirina wî raberî xwendevanan dibin. Helbestvan Taha Mezher Mayî hin têkistêن (metnêن) nû ji «Meshefa Reş» û «Cilwê» belav dike¹¹ û me dinasîne bi hin mijadêن wan eserêن nirxîn.

* *

*

Rojgara berheman jî wek a jîndaran dijwar e, sext e. Piraniya berhemêن li ser xaka Kurdistanê hatine vehandin, jînge ji wan re, jî xwediyê wan re pir caran bêdilovan bûye. Em bawer nakin li dinyayê ti milet wa berhemêن nivîskarêن wan qedexekirî bin, şewtandî bin wek me Kurda. Lê tevî her tiştî pêwîst e em fersendê bernedin : binivîsin, bicivînin, wergerînîn, bikolînin, bilîmet û rewşenbîrêن xwe binasin, binasînin, biparêzin û roj bi roj hebûna xwe dewlemend bikin bi şakar berhema.

11) *Binêr : jêdera binavkirî, rûp. 87-92.*

alîkari ji bo ferhenga kurdî - fransizi

Enstitu ferhengeke kurdî - fransizî çedike. Ev xebat karênu ku Kamuran A. Bedirxan di sî salênu dawînêni jiyana xwe de pêk anî bû didomîne û temam dike. Ta niha qasî 55 000 gotin hatine berhev kirin û wergerandina fransizîya gotinênu ku bi tîpênu A, B, C dest pê dikin qediyaye, tipa D jî di ber qedandinê de ye.

Ev ferheng ewê mezintirîn û firehtirîn ferhenga zimanê kurdî be û dixwaze, qet ne be, piraniya mezina dewlemendiyêni zimanê me diyar bike. Piştî çapa wê ya fransizi, ewê çapêni bi zimanêni din (tirkî, almanî, ingilîzî, erebî, farisi) bêna amade kirin.

Ziman malê hemû Kurdan e. Wekî derya ye, kûr û fireh e. Ci şivan, ci gavan, ci koçer, ci cotkar, ci dengbêj, ci nivîskar, her welatikî me wekî masiyan di nav vê deryayê de mezin bûye û jê parekê stendiye. Enstitu di xebata xwe de hewcê zanîn û alikariya hemû welatiyêni me yên bixiret e. Em dixwazin ku kevirê her Kurdeki dilsoz di vê avahiya giştî de hebe. Kerem kin, navêni giya û daran, ên hêşînatî û meywan, ên rawir û teyran, ên haletêni kar an gotinêni ku hun bawer dikin nadir û kêmdîti ne ji me re bişînin. Ku dikaribin her gotinekê piçek izah kin an wergerandina wê bi zimanê ku hun pê çêtir dizanîn li kéléka wê deynin baştı dibe. Heçî navê giya û daran, heta dikaribin diyar bikin bejna wan çend bilind e, li ku hêşîn dibin (di erdêni avî an bejî de, li devêni cema an li çolan), berêni wan çawan in, ci reng in, çiqas gir in, têni xwarin an na, tama wan çawa ye ? Ku dikaribin pelek ji darê an jî berê wê, an wêne (resm) yê giya an teyr bişînin hê jî çêtir dibe. Tikaya dawîn :ji bîr me kin di nameya xwe de bêjin hun ji kijan bajar an navçeya Kurdistanê ne.

Ji niha ve, spasên germîni ji bo alikariya we.

* * * *

Nameyan li ser navnîsana jêrîn bişînin : Ferhenga Kurdî, Institut Kurde de Paris, 106, rue La Fayette, 75010 PARIS, FRANCE.

LAWIKÊ NEXWES

Firat CEWERÎ

Lava ku ketin nav nivînan, dîsan dengê giriyê lêwik hat. Diya wî zû ji nav nivînên xwe rabû û pêşîra xwe xiste dev. Lê lawik bi pêşîrê jî aş nebû. Wî qet devê xwe neda pêşîrê. Wisan digiriya, ku carna lal dibû. Jinikê lihêfa mérê xwe ji ser çavêن wî avêt û bi ser de qîriya :

- De rabe ha ! Qe tu rabe awakî ji vî lawikî re çê bike ! Qe rabe xwe bia-vêje camêrنا ! Ev lawik mir ! ...

Mêrik vê carê erza jina xwe neşikand. Hema zû ji nav nivînan rabû û heb-kî lampe bilind kir. Cigarek qalind pêça, vêxist û hî ber serê lêwik rûnişt. Dû re destê xwe dirêjî lêwik kir û ji jinikê stend. Lawik bir ber lampê û lê nihêri. Rûyê lêwik zer bûbû. Gava ku digiriya, wek dareki hişk dibû. Lê giriyê wî îşev ne wek giriyê tu şevan bû. Ji giriyê her roj û her şev cihê bû.

Dilê mîrik bi rewşa wî şewiti û bê hemdê wî çend dilop hêşir ji çavan hat. Hêşirên ku ji çavan hat, di ser riwê wî ê bi rih de herikî ser simêlê wî ê gur û qalind. Ji roja ku wî bîr biribû heyâ bi iro tu caran negiriyabû. Ji xwe li cem wî girî ji peyan re şerm bû. Girî karê pirekan bû. Lê ew di wê deqîqê de têgihişt, ku peya jî kanin bigirîn û dilên wan jî diêşe.

Jina wî ya ku ji kerban û ji girî nikanîbû di cihê xwe de rawestiya, ber bi wî çû û bi stûxwarî jê re got :

- Ma tu dibêjî em çawan bikin lo ? Em ci awayî ji vî lawikî re çê bikin ? Mêrik serê xwe vir de û wê de hejand û bi keser got :

- Ez nizanim !

Jinik îcar bi dengekî bilind giriya û got:

- Ma ku tu nizanibe, kî ê zanî be ? Ma ezê bi vê pepûkiya xwe zanibim ?

Mêrik tu bersîv neda. Weke zarokan kire îskîn û bi pişta destê xwe hêşirên xwe paqîj kir. Ji bo ku giriyê xwe bisekinîne cigarek vêxist. Lê giriyê wî nesekinî. Çend caran diranên xwe qırıçand û bi pistinî tiştin got. Her sê jî digiriyan. Lê ê mîrik tenê hêşir ji çavan dihat. Dengê giriyê wî weke ê jina wî û layê wî nedihat. Piştî ku cigarek din jî vêxist got :

- Mîratê niha ku gundbûya, minê biçûya xwe biavêta camêrنا. Qe çawan

bûya meyê awak çê bikira. Lê bajar e, ka ezê xwe biavêjim kê ha ! Ezê ci bikim ?

Biskî deng ji her duwan hate birîn. Lê lawikê nexweş her digiriya. Carna jê ji nişkê ve qîrîn pê diket û li ser piştê lal dima.

Şev dereng bûbû. Saet sê-çarê şevê bû. Donê ku di lampa wan de mabû dawî hat (qediya, xelas bû). Lampê sê-çar caran li ser hev kire pit-pit û agir bi fitilê ket. Pir tê de neçû vemirî. Hundirê xênî bi yek derbê re tarî bû.

Gava ku lampe vemirî, mîrik rabû ser xwe û çû derî vekir, da bi şewqa ronahiya ji derve, hebkî hundir ronî bike. Barana ku dihat hîn xurtir dibû. Ewr ji jor de weke zihakî ber bi rojava de dikişya. Giregir û şîrquesîrqa es-mana qidûmê mirovan dişkand. Ji xwe her carekê ku ewran birûsk vedida, weke şîşek sor li dilê mîrik keve. Çavên wî fireh dibûn û tirsa mirinê dikete dilê wî.

Mîrik dîsan derî girt û bi destpelînkê li hestê xwe geriya. Hestê xwe li ber nivînê xwe dît û vêxist. Jina wî lawik di dest de û xwe li quncika xênî kiribû qomik. Lawikê nexweş her digiriya. Ev deh rojêن wî bû, ku pêşîr ne-xistibû devê xwe. Carna ku diya wî bixwesta pêşîrê têxe dev, qîrîn pê diket, digiriya û li ser piştê lal dima.

Gava ku mîrik di bin şewqa roniya heste de, jina xwe û lawê xwe di wê rewşê de dît, weke ku agir têkeve dilê wî, dîsan ji kerban hêşir ji çavan hat. Dû re daqûl bû û bi heste sobe dada (vêxist). Ji xwe êzingên wan ên ku mabûn hew ew bûn. Du roj berê ew êzing xistibûn sobê û li bendî rojek pir sar û dijwar sekinî bûn. Sar û seqema herî dijwar hîn mabû. Lê ji ber ku don di lampê de nema û hundir tarî bû, mîrik ji bo ku hebkî hundir rohnî bike sobe vêxist. Deriyê sobê jî vekirî hişt, da ku hundir baş ronî bibe. Êzingên di sobê de hişk bûbûn. Gava ku mîrik agir berdayê, alavê avêt ser çavên wî û hin ji porê wî û simêlê wî kizirî.

Di wê bîskê hundir hebkî germ û ronî bû. Şewqa sobê li dîwêr wek hêle-kanê dihejiya. Mîrik ber bi jina xwe çû û li ser tütikan rûnişt. Dû re lawik ji destê wê girt û bi dilşewatî lê nihêrî.

Spîkên çavên lêwik zer bûbûn. Çavên wî fireh dibûn û dihatin girtin. Wer ku giriya bû dengê wî ketibû. Mîrik serê xwe hejand û got :

- Welleh ev lawik dê bimire, xelasîya wî tune !

Jina wî peyva wî birî :

- Qe bila devê te ji xêrê vegere, ci ye tu qala mirina lêwik dîkî !

Mîrik tişt negot. Lawik da destê jinikê, rabû ser xwe û cigara xwe bi agirê sobê vêxist. Piştî ku du hulm li ser hev li cigarê xist, li jina xwe zîvirî û got :

- Ezê rabim herim mala cîranê Seydo hin êzing û don deyn bikim. Ku ev soba me bîqede, emê bê agir û ronî bîmînîn.

Jinikê bi dengekî nîvgiri got :

- Tu zane, ku te bivê here.

Her ku diçû şîrqîn û giregira ewr zêdetir dibû. Dengê xuşîna baranê weke dengê xuşîna çemekî ji derve dihat. Hîn ew wilo bi hev re dipeyivîn, dilo-

pek li ser serê mîrik ket. Mîrik pêşî bawer nekir ku dilop e. Piştî ku destê xwe da serê xwe, têgihişt, ku bi rastî jî xanî dilopan dike. Di hundirê wextek kurt de, dilopên xêni hîn zêdetir bûn. Tew ji qorziya xêni weke ku mirov bi kulman avê birijîne, av herikî hundir. Jin û mîr bi lez firaxên ku hebûn danîn ber dilopan. Lê firaxên wan têra hemû dilopan nekir, pir dilop bê firax man.

Mîrik qapûtekî leşkeran ê kevin avêt milê xwe û ji jina xwe re got :

- Ez herim bê ez hinek don deyn nakim. Ku dinya li me ronî bibe, dibe ku Xwedê rêkê nişanî me bide.

Jinikê piştî ku keserek kûr kişand got :

- Welleh nakeve serê min, ku tu kes vê şevê li te derî veke, lê dîsan jî he-re, dibe ku camêr bi xwedî wijcdan derkevin. Ezê jî rabim herim ser xêni du gundoran lêxim û hinek ka lê bireşînim, dibe ku hebkî dilop bisekinin.

Mîrik piştî ku di dilê xwe de axînek kûr kişand got :

- Baş e. Ü ji hundir derket.

Piştî ku mîrik ji hundir derket, jinikê lawik di nav lihêfekê de pêça, kev-nikek avêt nav milê xwe û derket ji der ve. Baran hîn xurtir bûbû. Mirov di-got qey bi kûzan tê. Ji ba û baranê mirov nikanîbû çavêن xwe vekira. Jinikê teneka kayê xiste destê rastê û bi mîrdewanê (sêlim, derence) de bi jor ket. Çaxa ku gavê xwe avêt ser xêni, kevirê bin lingên wê şemîti û jinik ji jor de weke gomagî mezin li ser dika çîmento, ya li ber devê derî li erdê ket. Serê wê ji hev belav bû, bû meyt û li erdê ma.

Piştî deh-panzdeh deqîqan, mîrik bi çend qutik dar û bi şûşek don vege-riya û di deriyê paşıya xêni de kete hundir. Ku kete hundir, zû qapûtê xwe ê ku ji baranê şil bûbû ji xwe kir, hestê xwe ji bêrika xwe derxist û vêxist.

Ji dengên dilopan pê de tu deng ji hundir nedihat. Mîrik şaş û ecêbmayî ma. Hestê xwe ê vêketî xist destê xwe ê çepê û ber bi lihêfa lawê xwe çû. Dît ku lawik bêdeng li we erdê di nav lihêfê de dirêjkirî ye. Pêşî di dilê xwe de got, «Ox, qe wa bîskê xew kete çavan». Dû re weke ku tiştek niqutî dilê wî, hêdî ji bo ku lêwik hişyar neke lihêfa wî ji ser çavan hilanî. Lêwik qet xwe tev nelivand. Weke darekî hişk rep ma. Mîrik hema rahiştê û bi qîrîn bang jina xwe kir. Gava ku tu deng ji derve nehat, mîrik digel lêwik bazda derve û dîsan bi qîrîn bang kir.

- Xatêê ... Xatêê. Malşewitiyê lêwik can daye !

Hîn peyva wî di dev de bû şîrqînek ji ewr hat û birûskê veda. Bi vedana birûskê re, çavên wî li jina wî xwîna ser wê ket. Hema bi yek derbê re qîrî-nek jê hat û xwe tevî lawê xwe avêt ser.

ROJA DAWÎ JI JÎYANA MISTÊ KURÊ SALHA TEMO

Şahînê SOREKLÎ

Salê bi umrê şazde salî bû bûk û bîst û heft salîn jî bû jinebî. Xwediyyê wê kîrin nekirin wê carek din bidin mîr, lêbelê Salê qayil nebû ; ew li Kaniya Ereban¹ li ser her du kurênen xwe rûnişt û ji ew roj şûnve bi navê Salha Temo hat naskirin.

Kaniya Ereban iroj bûye beşek ji bajarê Kobanî, lêbelê bîst salan berê ew gundekî bi serê xwe bû. Di dawiya heftan de, xasme dema biharê, xelkê bajêr nan û vexwarina xwe radikirin û berên xwe didan Kaniya Ereban. Li ser giyayê kesk, di bin siya daran de û li kêleka çayê, wan çîg, kibab, salete û xwarinê din çedikirn, dixwarin, vedixwarin û ber rojava berê xwe didan bajêr, vedigeriyan malên xwe. Ava Kaniya Ereban avek qerimî û zelal bû. Xelkê wê derdorê jê re digotin ava qinê û ta roja iroj gel dizane ku ew qine ji çekirina Romanan e, yên ku ber salên pir ew hêl jî kiribûn bin destênen xwe.

* *
*

Payîz e, êdî qeram hêdî şûna germa havînê digre û li Kaniya Ereban roj hîn nuh çûye ava. Mistê nivînênen xwe û birayê xwe li ser sekûyê radixe. Tevî ku payîz e jî, ew û birayê xwe hîn li derva radikevin. Bavê wan berî şes salan çûye rehmetê û dayika wan rojekê birçî, yekê têr ew xwedî kirine. Mistê ji hevdan dihere hejdane, birayê wî Xello du salan ji wî biçûktir e. Xello lal e û dilên xelkê bi xwe dişewitîne. Her kes dibêje : «Xelloyê bextereş ; heyf ku ev xortê delal û bextereş nikare şorê bike.»

1) *Kaniya Ereban : Bajarê Kobanî di navbera her du şerîn cîhanê de hat şen kîrin. Fransizan li wîr qîşle bo leşkerên xwe çekirin û ji ew cîh re digotin COMPAGNIE. Wisa Kurdan ew nav kîrin Kobanî. Li her du hêlén Kobanî kani hene. Li roava Kaniya Murşid (beşê li hêla Tirkî : Murşit Pinar) û li rohilat Kaniya Ereban. Pir û kalén me digotin ku di demêñ kevin de, di salên bê baran de, Erebêñ koçer havînê dihatin wan doran û ji eşîrên kurdan izin dixwestin ku ew pezê xwe li dora kani biçêrînin û av bidin. Wisa navê Kaniya Ereban li wê kani bû.*

Em niha çiroka Mistê li şûnê bihêlin, herin ya Xellê. Bi bîr û baweriya her kesî be, ew emrê Xwedê bû û di qedera Xello de hatibû nivîsandin ku ew jîyana xwe lal derbas ke, lêbelê ev gotin ji rastî dûr bû. Xello bi xwe qerar dabû ku ew jîyana xwe lal berdewam ke. Bi umrê pênc salin ew şandin ber xoce. Doma çavêن Xello li çoyê xoce yê dirêj ket, çûyîna xoce li hesabê wî nehat. Qet nediket qafê wî, ango wî fêm nedikir, ji bo ci xoce dixwaze bi hukmê zorê peyvên bê feyde û bê mane bi wî hokirin bide.* «EBCED HEWWEZ HUTTÎ KELEMEN,...» Xellê ronedî li xoce vedigerand lêbelê şîng², xoce yek pê vedida û digot : «hey kerê çolê, li çavêن min menihêr, di kitêbê de bixwîn EBCED HEWWEZ HUTTÎ...». Xello ji kerban re dest bi girî dikir, dilê kafiran bi wî dişewitî lêbelê ne yê xoce. Ew ji derdê çûyîna xoce ge giriyanbû, ge reviyabû, ge xwe veşartibû lê xilas nebûbû. Rojekê xoce gotibû : «bixwîn, Xello bixwîn, lawo bixwîn, li min vegeîn, kero bibêje EBCED bibêje HEWWEZ...». Xello du-sê caran devê xwe ji hev vekiribû lêbelê deng qe jê derneketibû. Ji wê rojê şûnve lawik du salan xwe li lalkî dabû, şor ne kiribû û wisa xwe ji xoce xilas kiribû.

Du sal derbas dibin, zarok hêdî hêdî dîsa dest pê dike, dipeyive. Rojekê bav bi çepelan digre dibê dibistanê. Xellê dîkin odak mezin ; di hindir de mamoste sekiniye û ji mindalan, yên ku li ser sendeliyan rûniştîne, pirsan dipirse. Zarok yan dibêjin NEAM û yan KELLA. Xellê ne pirsên mamoste fêm dike û ne jî tê dighê çîma şagirtêne wî wisa bersîva wî didin, lêbelê peyva KELLA, kelle, şiva serê dewêr, dihanî bîra wî û lêwik wer texmîn dikir ku dersa iroyîn belkî li ser dewar û pez e. Rojekê mamoste hin pirsan li ser textereşê dinivise û ji zarokan dixwaze, ew bersîvîn wî di defterên xwe de binivîsin. Pey neh-deh deqan mamoste tê cem Xellê û dibêje IKTUB³. Xello li mamoste seyr dike û dikene. Mamoste carek din bi qehr li wî emir dike ew binivîse. Xello çavêن xwe berdide erdê û deng nake. Mamoste dihere şiva xwe ji ser masê radike, vedigere cem Xellê û jê re dibêje bila ew destek xwe veke. Pey ku lawik çar-pênc şivan di destê xwe yê rastê de dixwe, ew diqîre, direve der û berê xwe dide Kaniya Ereban. Roja şemiyê di komcivîna sibê de midûr bang Xellê dike, xizmeçî bi newqa wî digre, wî radike û midûr jî bi xêzera-nek zirav li textê qûna kurik dixe. Di wê rojê de Xello dîsa xwe lal dike û nema zimanê xwe difetiline. Di hindir zikê heftê de midûr dişîne pey bavê û jê dixwaze ew kurê xwe bibe mal.

Xello neh salin bû dema bavê wî mir. Dû mirina bavê xwe, wî rihet rihet dest bi axaftinê kir. Du-sê salan pey mirina bavê, Xello rojekê berê xwe dide gundê Mezrê, dihere mala xaltiya xwe. Wê şevê şerek mezin di navbera qaçaxçıyan û leşkerên Tirk de cîh digre. Dora nîvseetekê tiqetîqa mitralyozy û tifing û demançan dinê tijî dike. Dû nîvêşevê qaçaxçî hejmarek mezin dewar û titûnek pir ji beşê Tirkî tînin hêla Sûrî û di nêzîkî Mezrê re derbas

* bi wî bide hînkirin.

2) şîng, xoce yek pê veda : şîng, deng hat dema xoce bi şivê li lawik xist.

3) Iktub -bi erebi- : binivîs/ neam -bi erebi : erê, belê/ Kella - bi erebi : na.

gundê Minazê dîkin. Dûre belî dike ku wan du hevalên xwe yên birîndar di Tilşeyrê re şandibûn Kobanî ; yek ji wan di zik de birîndar bûbû û yê din jî lingek xwe di nav mayînan de winda kiribû.

Bi rohilat re cîpekkî cendirme li pêş mala muxtêr sekinî. Cendirman çayî vexwarin, dûre xort û peyayêñ gund kom kirin û dest bi feleqe kirina wan kirin. Bi nişkeve çavêñ çêwîş li çavêñ Xellê rast hatin, bang wî kir û şûna qaçaxçîyan jê pîrsî. Xello bi rastî jî bersîva pirsa çêwîş ne dizanibû lêbelê çawîşê cendirman bawer nekir, lepê xwe yê rastê ta dikane paşve kişand, du sîlle li kurik xistin, ew pêre gêj kir. Xello ji qehra xwe hema hindik ma biteqê, xwe zept nekir û got : « Ez di devê bavê te n... » Çawîş wek dînan bû û dixwast bizanibe wî ci gotiye. Muxtêr çawîş bi xwe re bir derva û ew bi peran razî kir. Dema çawîş vege riya hindir, ew nema êdî li şûna qaçaxçîyan dipirse lêbelê ille dixwaze bizanibe « ev lawê bê edeb » ji wî re ci gotiye. Muxtêr sond xwar ku « ev zarokê nezan » tiştek xirab negotiye, lêbelê bê fayde. Çawîş emir da ku Xellê rakin feleqê. Deng ji Xellê dernediket, lêbelê bi kulman hêstir, nûnerên jan û qehra hindirê wî, di kêlekêñ çavêñ wî yên reş-belek re, wek kevir û zinar û agirê qehra volkanan dihatin der û di nav bijangên wî re rîçik çêdikirin, yan di nêzikî guhêñ wî re li ser kulavê oda muxtêr dirijîyan û yan jî, hin caran dema wî qafê xwe dilivand, li ser eniya wî belav dibûn û diketin nav porê wî. Di ev deqeyêñ jiyana xwe de, Xellê di dilê xwe de sondek mezin û giran xwar ku ew êdî ji vir şûnve li ev cîhana bêbext şorê neke.

Niha em disa vege rin destpêka çiroka xwe, dema ku berê êvarê Mistê, birayê Xellê, şeltêñ xwe û birayê xwe yê lal li ser sekûyê radixist. Îroj kêfa Mistê li cîh bû û sebir nedikir şelta xwe raxe û li ser vekeve. Di çend hefteyêñ bihurîn de, wî li virûwir ji xelkê re pembî berhev kiribû, hin pereyêñ rîncberiya xwe dabû dayka xwe û bi yên mayî jî ji xwe û birayê xwe re hûr-mûr kiribû û yek ji ev tiştêñ ku hatibûn kirin radyok transîstor bû, ya ku wî îroj bi xwe re anîbû mal û sebir nedikir wê veke û guh bide ser. Bi rastî ev seet li cem Mistê wek roja cejnê bû û ew zehf ji xwe razî bû ji ber ku, bi hesabê wî be, hemû welatêñ cîhanê di vê deqê de dibin emrê tilîya wî de bûn. Bi pêciya gîrikê ya destê rastê Mistê derziya radyo virde û wêde dibir dianî û wisa ji Londrê der diket, bi ser Beyrût, Şam, Qahire, Eman, Bexda, Mosko û Tehranê diket û bi rî ve ji xwe re qasî cixare-kışandinekê li şûnekî disekinî û guhdarî stasyona radyo ya wî bajarı dikir.

Li Enquerê keçek deng-zengilîn li ser însanîyet û edaletê dipeyivî. Mistê di dilê xwe de pesna xwe da, dema wî ferq kir ku ew piraniya axaftina keçikê fêm dike. Ew demek dirêj di dukana Canîgê quesab de xebitibû û tevî ku Canîg Ermenî bû jî wî, wek piraniya Ermeniyêñ Kobanî yên ku ji derdê neheqî û tadeyêñ zordaran xaniyêñ xwe li şûnê hiştibûn û li vir cîh bibûn, bi tirkî qise dikir û wisa şagirtêñ wî jî, ji wî û yên derdora wî fêr dibûn zimanê tirkî. Tevî ku Mistê pir bi siyasetê nedizanibû jî, ew ecêbmayı ma dema wî peyvîn wek însanîyet û edaletê ji keçika deng-zengilîn bihisi. Di dilê xwe de Mistê wisa got : « va qîzika di radyo de şorê dike, dengê wê ji Enquerê têye, ya ku paytexta hukmata tirk e û xelk û alem jî gîh dibêjin ku hukmata tirk in-

saniyet û edaletê nas nake, lêbelê wa ye keçik aşkere gotina mirovî û edaletê dikêye.» Mistê cixarek pêça û fikirî. Hat bîra wî ku çiqas pîr û kalan, denbê-jên kurd û xortê de siyasetê de mijûl dibin li ser kuştin û talan û neheqiyêñ kemalistên tirk di derheqê gelê kurd de peyivîne ; ku çawa leşkerên Tirk, bi gotina Maroya Ermenî, bi hezaran zarzêç, jin û mîrên Ermeniyan avêtine ava çemane ; ku çawa hukmata tirk bombe li wê hêla xeta tirênen çandine, ev bombêñ ku sal bi sal dibin sedema qutkirina lingêñ bi dehan mirovêñ kurd yêñ ji derdê tunebûn û bêkarbûn û belengazî rihêñ xwe dikin devêñ xwe, qaçaxî dikin ; çawa leşkerên tirk qışleyêñ xwe li ser qûç û giran lêkirine û ji roj-ava ta rohilat ev sinorê li ser Kurdan ferzbûyi bi şewqa projektoran ronî dikin û nahêlin ne Kurdêñ li vê hêlê, ne yêñ wê hêlê nêzikî li xeta hesinî bikin ; ku çawa hejmarek ji jin û peyayêñ kurd yêñ beşê Sûri ji xwe re di nav erdêñ xwe de dixebeitin û yan di rê de diherin, her sal bi guleyêñ leşkerên hukmata tirkî bê sûc û sedem têñ kuştin ; ku ...Nirçe-nirç bi devê Mistê ket, serê xwe leqand û wek mirovek nehişar bi xwe re got : «va mesela meselak pir kûr e ; ne îşê nezanêñ wek min e.»

Derziya radyo li ser stasyona bajarê Şamê sekinî. Ebdonasir⁴ li ser yekîti, sosyalizm û azadî dipeyivî. Dengê «aşe-îş»⁵ û çepikan ahaftina wî pir caran eware dikir. Mistê cixarak din pêçand, bi darikê kibrîte vêexist, nefesek kûr jê kişand û dîsa dest pê kir bifikire. «Ê bavê min, » Mistê got ji Ebdonasir re, «madam tu li ser heqê millet şorê dikî ; de çima bo me mektebeke bi zimanê me venakî ; tu çima çend stranêñ me jî nakî radyo, bo pişika me jî hebkî bi wan rabe.» Méjiyê Mistê di ev mesele de zor mijûl bû. «Na ez benî», bersîva pirsa xwe Mistê da, dema ew di kûraniya dilê xwe de gihiş hilika⁶ meselê û fêr bû ku ev camér li ser mafê Ereban, ne yê Kurdan diştexile, «ma kê rojekî li ser heqê me bextereşan şor kiriye, ku iroj bikî !! » Careke Mistê bi xwe re kenî, li birayê xwe nihêri û got : law Xello, welle radyo meriyan xirab ho dike. Mirov dest pê dike kûr-kûr bifikire.»

Derziya radyo Mistê li stasyonekê rast hat, xwediyê xwe vêre veciniqand û jorve çekir. «Law' Xello, va bi kurmancî ye ; lawo bi Xwedê ev bi kurmancî ye», bang kir Mistê. Derziya radyo wî li bernama Erivanê ya kurdî qelibî bû. Şabûna Mistê pir dirêj nekir çimkî deng ji Erivanê baş ne dihat. Lawik derzi virde bir, wêde bir, radyo leqand, berî bi jor de kir, bi jêr de kir, lêbelê nedikanibû (nikaribû) xiş-xişê ji stirana Meyrem Xanê veqetîne û yan deng zelaltır bike. «Ne em bin ne ev bernama be», Mistê got bi qehir, «bi zooro cize-çiz jê tê der. Ma nedikanin hebkî qewîn bikin, bo em jî wek însanan bibhîzin û dilê xwe honik bikin.» Mistê derzi livand ser stranek erekî û li wir sekinand. «Mistê», ji nişke ve dayka wî bang kir, «de bes e êdî kurê min. Ji tînge-tînga wê quzilqurtê min nimêja xwe ya yasiyan gîh şaş kir».

4) Ebdonasir : Cemal Abdul Nasir -Di salêñ 1958-1963 Misir û Sûrî di bin navê Komara Erebî Ya Yekbûyi de yekîti çekirin. Ebdonasir, wek ew li cem Kurdan dihat naskirin, serokê komarê bû (beri yekîti û dû şikestina yekîti ew serokê Komara Misrê bû).

5) Aş / Yeş - bi erebî :bijî -aşe- îşa wan dihat : digotin bijî ev kes yan bijî ev tiş.

6) Hilika meselê : cewherê meselê, binê kûraniya meselê.

Çilkek baran li ser eniya Mistê ket, yê ku li ezman mîze kir û kenek sivik anî ser lêvên xwe, dema hat bîra wî çawa zarokên gund iroj dû nîvro bi şûlikê diliztin. Pazde-bîst zariyan dabûn dû hev û ji malekî diçûn yek din, digotin :

Şûllikê !
Avê berde Kûllikê
Tasek avî zehwanê
Berde binê leganê
.....
Baran bibar bibar
Çûçikan hebkên me xwar
Sêwîngan serên hev xwar

Hêdî hêdî çîlkên baranê girtir û pirtir bûn. Mistê û Xellê bi lez şeltên xwe kişandin hindir. Li derva dengê mindalan dihat, ew diliztin û qe ne dixwastin herin hindir. Barana payîzê ya yekemîn zor li kêfa wan hatibû, lêbelê pir dirêj nekir ew jî çûn hindir xaniyan. «Maşalla, tu dibê belkî derê kunan li ezmên vekirine», dengê Salha Temo hat.

Li şûna bêderan peya û zarok kom dibûn, jin û keçen berbext jî li pêş deryan ; û şora barana vê êvarê di devê her kesî de dibû benîst. Nedihat veşartin ku hilma bayê honik û bîna axa bi barana payîzê şîlbûyî zor li xweşîya gundiyan hatibûn. Dengê teqîna bombekî bi nişkêve hat guhan û deh deqan şûnve carek din. Gûmîna her du bomban xew ji çavên yên kom-bûyî dizi û nema êdî kes meraq dike vegere nivînên xwe, bo razê: «Ev mayînên Tirkan in diteqine», hat dengê peyakî, «yan dîsa malik li bexte-reşek fiqare şewiti, ling qut bû ; yan jî hin ji ev bombêna nale-lê-hatî bi ber ava baranê ketin, diteqine.»

Trimbêlek gihişt gund û li ber malekê sekinî. Du mîrik jê peya bûn, bi kebaniya malê re çend gotinê kin kirin û dûre berên xwe dan şûna bêderan, çûn ketin nav koma peyan. Li Kobanî nîvê bajêr yê bakur di bin ava lehiyê de mabû û zirarek mezin li beşê nêzikî sînorê Tirkî bûbû, pir tiştên dukan û qehwexanan bi ser ava lehiyê ketibûn, hin xaniyên kelpîçîn hilweşiyâbûn...

* * *

Bi rohilat re Mistê ji mal derket, berê xwe da gundê Elîşarê ; karê wî li wir hebû. Dema girê gund derbas kir, dengek xweş bala Mistê kişand ser xwe, digot :

«Sala çûnî l'vê demê
Mala me l'Bîra Remê
Te ez kuştım helandim
Kirme şûşa melhemê
Leylo, Leylo, Leylo, lê Leylo.

Sala çûnî l'vê çaxê
 Mala me l' Gawir Daxê
 Te ez kuştım helandim
 Kirme şûşa gulyaxê
 Leylo, Leylo, Leylo, lê Leylo.»

Mistê dizanîbû ku ew xwediyê ev deng nas dike, sekinî û baş guhdarî kir, ji bo îspat ke ku texmîna wî sedî-sed rast e. «Lo lo Remo,» Mistê bang kir dema li cem wî êdi ti sek neman ku xwediyê deng Remo ye. «Hele were, were ! Ez Mist im, Mistê Salha Temoo.» Remo ji strana xwe eware bû û Mistê ji riya xwe, her du xort ber bi hev çûn û dest pê kîrin li halên hev bipirsin.

- Tu kengî ji Tirkî vegeriyayı, Remo ? Welle keko min bêriya te kir.

- Ez roja ïnê vegeriyam Mistê Can. Min dixwast ez iroj ser mala we de werim, te bibînim û silavêن xaltiya xwe ya li Sirûcê⁷ bîghînim dayka te.

Xweziya⁸ min bi dilê te be Remo !; tu ji xwe re têr geriyayı. Hele bibêj, Sirûc xweş e?

- Welle Sirûc bi xwe ne weqa, lêbelê Riha bajarek xweş e. Xwedê mala hukmata tirk hilweşîne. Ger ne ev sînor û bombêن binê erdê bin, bi otoinbilê ji vir ta Riha seetekê jî dirêj nake.

- Malava, hele ez diherime Elişarê, karê min li wir heye ; lê tu vê sibê zû li vir ci dikî ?

- Ma haya te jê tune ? Te nebihîst ku şeva bihurî pir hûrmûrêñ dukanêñ Kobanî bi ber lehiyê ketin ? Ez ji xwe re bi dû rêçika ava ketime. Belkî ez tiştekî ji xwe re bibînim. Berî tu bang min kî, min sandiqek tiji şûşeyêñ kazozê dît. Were ez şûşekî dudiyen bidim te ; ji xwe re bi rê ve vexwe.

Mistê du şûşê kazoz ji hevalê xwe stand, xatir jê xwast û berê xwe da rê. Remo sandıqa şûşen kazozê rakir û hîn dixwest bang Mistê ke û jê re bibêje ku ewê berê êvarê were mala wan, dema ku teqînak naye hesaban hat û Remo dît çawa laşê Mistê rabû jor li erdê ket. Remo berive hevalê xwe reviya lêbelê lingêñ wî li hev geriyan û ew bi rû ket erdê. Guhêñ wî dikirin zîngêzîng, dinê li ber çavêñ wî pîlik-pîlikî dibû, dil dikir gupe-gup û ew gêj bûbû, erd û ezman li dora wî difertilin. Remo disa rabû ser xwe, wek serxweşan du-sê caran berive rastê û çepê çû û hat, lêbelê xwe zept kir, hisêñ xwe hebkî anîn ser hev û xwe gihand hevalê xwe. Dema çavêñ wî li bedena Mistê ket, ew qîri, li xwe xist û dest pê kir bi her du destan xweliya şovê li ser serê xwe bibarîne. Ew wek mirovek dîn li dora laşê hevalê xwe dizivirî û şas bûbû ci bike, dema tûte-tûta trimbêlekê ket guhêñ wî ; cîpek li ser rê sekinibû û şofêr bang wî dikir...

7) Sirûc (Surûc) iroj li beşê Kurdistana Tirkîyê, lêbelê piraniya Deşta Sirûcê li beşê Sûriye. Hin ji gundêñ Deşta Sirûcê li başûré (qibleyê) şîvén hesinî (xeta tirêñê - sînorê Tirkî û Sûri) ev in : Miktele, Helinc, Şeran, Tiléjbé, Şerran, Com Elî, Kazikan, Xerîb, Elişar, Dihaban, Kîkan, Mizirdawd, Kaniya Ereban.

8) Xweziya min bi dilê te be : qaskiya ez di şûna te de bama, çiqas dilê min dixwaze min ji wek te bikira.

Tixtorê Kobanî ereb bû, ji bajarê Şamê hatibû wir û şagirtê wî jî kurd bû, yê ji pênc salan pirtir neçûbû dibistanê. Piraniya karûbarên tixtor li ser milên şêgirt bûn û xelkê digot şagirt ji tixtor çêtir nesaxî û birinê nexweş û birindaran derman dike. Îroj tixtor dereng mabû. Hindir xaniyê tixtor tiji jin, peya û zaroyên nexweş bû û şagirt yek li pey yekî li paş perdê miayene dikir ; şagirtên di bin destên wî de jî di quncekî de derzî li hinan dixistin. Carekê dengê tütika trimbêlekê hat û Remo pêre xwe avêt hindir. «Hawar, ez dest lingên we radimûsim...» Mistê di paşıya cîpê de vexistibûn ; rûyê wî reş-qûl bûbû, çavêن wî wek hîvên şevêن zivistanê dibrûsîn, lêbelê ti germayî di wan de nema bû, lingê wî yê çepê di jér çongê de qut bûbû û sê çar tamârên tazi xuya dikirin, pîyê wî yê çepê di bin enîşkê de qetiya bû û li ser kèleka wî hatibû danîn, hêlek sîngê wî qul bûbû û pilçikên xwînê ji birinê der diketin Mistê dinalî û digot : «ez şewitîm ; hawar tixtor, ez di bextê bavê te de me, min xilas ke !...» Dema wî dengê şêgirt, ne yê tixtor, bihîst, axaftina wî hebkî ji berê şentir bû û di çavêن wî de çîrûskek hêvî hat peyda kirin, wek mindalek windabûyî yê ku di bazara bajêr de dengê kesek ji gundê xwe dibhîze. Wek tê gotin rih şêrîn e ; tev ku rewşa Mistê weqa xirab bû jî, gidî nedixwest destên xwe ji jiyanê biço. Şagirtê tixtor ji kerban re dest pê kir qisêن kêm ji Mistê re bibêje : «ey alçax, tu ci digerî li nav şov û keviran vê sibê ? Tu dixwazî kazozê vexwî, ha ? De here bimir...»

Nexwesxana Kobanî nexwesxanak bê sermiyan bû ; nav û şûna xwe hebû lê kar û feyda wê tune bû. Tixtor ji xwe re şûnek vekiri bû û bi peran li xelkê dinhêri. Bi kinî, li Kobanî bo Mistê tu hêvî tune bû. Trimbêlê berê xwe da bajarê Helebê, lêbelê berî ku bi çemê Ferêt⁹ bigihê rihê Mistê teslim bû ; êdî xwîn di canê wî yê hevde salîn de nema.

* *
*

Salha Temo bi umrê sîh û sê salîn wek pîrek di şêstî de xuya dikir. Bi porê sipî, bi çavêن ji hêstiran sor bûyî, bi sûretê ji kişandina keseran qermiçî, bi dilê ji derdê kul û hewesan şikestî, bi hindirê ji dest bêtaran şewitî, bi şara qetiyayî, bi kiras, xeftan û bervaneka reş li ser gora kurê xwe rûniştibû û bi wî re digot :

«Mistê min, cîgera dayika xwe ! Ez bi şev û roj ji te re duan dikim. Ne roja min roj e, ne şeva min şev e, kurê min. Birayê te Xellê ev bûn sê roj devê xwe bi nêن nekirye ; wer di quncikê xêni de rûniştîye, ketîye xewn û xeyalan. Wey Xwedêyo, mala te ava be, te çira ez nekirim qurbana Mistê, ez bi dora wî re negerandim ?»

Salhê hêstirên xwe damalandin û dest pê kir, lorand :

- Lo Xwedêyo, te çima li min wa kir ;

Te hijêن dara Mistê min bi umrê hevde salîn
ji vê dinê rakir ?

9) Çemê Ferêt 35 kilometir li rojava Kobanî dikeve hindir Sûriyê.

Ya Rebbî, tu dizanî, min jiyana xwe
Bona xatirê her du lawan winda kir ;
Min xwe bi xortê baqil, bi Mistê xwe
yê sivik û delal şâ kir.

Te çima mala wî çavreşî, wî ciwanî
Bê sûc û sedem ji nav xwedî û hevalan bar kir ?

Salhê dîsa hêstir bi devê pîyek xeftên ji rûyê xwe damala, çîşkî¹⁰ vêsi
kir û domand :

- Wey xwediyê bombê, we çawa pergala min belav kir,
Xwedê pergala we jî belav ke ;
Rebbê alemê hijên dara we ya bi xwîna Kurdan hatî avdan
hişk bike, kurm û müriyan têke, bişewtîne û ji vê dinê rake !
Xwedê li we were xezebê, we tar û mar ke, ji hev belav ke, we winda ke !

Ü Salha Temo hêstir barandin, giriya. Hin caran serê xwe dileqand û
caran jî sivik bi destê rastê li pêşîra xwe ya çepê û bi destê çepê li ya rastê
dixist :

- Lo Misto, tu çelengo bejin ziravo, şîrhelalo ;
Lo lawo, tu xwînşerîno, bê keso, lo delalo ;
Lo xweşiko, tu ciwano, rûlikeno, lo bêmalو.

Bila hilweşe mala wan dijminan, wan bêbextan ;
Bila ew bikin nekin, tum li pê bin, negihêne deran ;
Bila ew zadê xwe biçinin, li şûnê rakin korik û zîwan.

Ma ew bin, ew jin û zaroyê xwe li paşbihêlin,
Bibin parsekçî û rûreşen ev cihan ;
Ma ew bin, ew xêrê nebînin, werê serê wan
Ya wan anî serên gelan ;
Ma ew bin, bi roj tî bin, bi şev birçî bin,
Li vê dunê bimînin cahîl û nezan.

Carekî Salhê pê hesiya ku ro li ava ye ; rabû ser lingan, destek da ser
kevirê serê gorê û got : « Ezê herim mal, kurê min. De bi xatirê te Mistê.
Dayka te sibe bi rohilat re dîsa li cem te ye. »

Salha Temo berê xwe da Kaniya Ereban, giran giran meşîya, çû mal. Li
bakurê wê, li ser şivîn hesinî tirênek dirêj, wek marek reş yê ku li ser laşê
mirovek nexweş dixuşe, hêdî hêdî berve roava dikişîya, dûyê komirê reş û
gemarî li ezmanê hêşin belav dikir.

Sydney (Awîstralya) 5.8.1984

10) Çîşkî : Hebktî, hindik, ne pir.

TÊBINÎ :

Di payîza sala 1958 an de ava lê hin bombên Tirkî, yê li ser sînor hatî çandin, bi ber
xwe xistin û derbas hêla Sûrî kirin. Xortek kurd nêzîki Kaniya Ereban pê li mayînekê kir
û wek di çirokê de hatî xuya kirin mir.

kitêbxana enstituyê

Kitêbxana Enstituyê dixwaze bibe hîmê Kitêbxana Neteweyîya Kurdistanê. Tê de niha bi 25 zimanan bêtirî 2600 cild kitêb hene. Hin ji van kitêban gelek kevn in, di sedsalên XVIII û XIX de çap bûne. Hin destnivîs jî hene.

Ji kovarêñ kevn, civanbendêñ (kolleksiyonêñ) Hawar, Ronahî, Roja Nû, Stêr û Kurdistan (Iran) temam bûne, ên kovarêñ din têñ berhev kirin.

Di vê navê de Enstitu, belgeyên arşîvên diplomatîk, film, wêne û diapozîtîf, kaset û sêlikêñ kurdî jî dicivîne. Ta îro dora 2000 diapozîtîf, 26 film û qasî 130 saet mûsiqîya kurdî hatine civandin.

Bê guman, ev hê destpêk e ; karê saleki ye. Divê ku em afirandinêñ li ser ziman, dîrok û çanda xwe diyar kin, binasîn û bi dinyayê bidin nasîn. Civandina arşîvên me yên neteweyî, dewlemendkirina kitêbxana me ya neteweyî karê her welatparêzî kurd, her Kurdeñ bixîret e.

Li kitêb, kovar, film, wêne, kaset û belgeyên li ser Kurdan bigerin ; we bi çi zimanî çi peyda kir ji kitêbxana Enstituyê re bişînin. Çavêñ xwe li dengbêj û çirokbêjan, xasme li yên pîr, bigerînin. Stran û çiro-ên wan bigrin kasetan û ji me re verêkin. Bila, bi mirina wan, keriyek ji folklora gelê me winda ine be, ji bîran neçe.

PARASTINA ÇANDA KURDÎ, KARÊ ME HEMÛYAN E.

MEMÊ û EYŞÊ

Xelilê ÇAÇAN

Leyistvan :

- 1 - Elî Axa, emrê wî 50 salî ye.
- 2 - Eylaz, gilavî, emrê wî devedevî 60 salan e.
- 3 - Memê, xortekî tûnsizi 25 salî.
- 4 - Eyşê, 18-19 salî ye.
- 5 - Wetê, diya Memê, 60 salî ye.
- 6 - Mexsûd, xulamê axê, emrê wî 40 salî ye.
- 7 - Zozan, jina axê 50 salî ye.
- 8 - Hevsê, pîra sêrbaz 60-65 salî.

PERDA YEKA

Li mala Elî Axa kulavên xuristanî raxistine, li ser wana balîvên quştûkî ne. Elî Axa, ku merîkî hupizî ye, birûyên wî têñ dikevine ser çavê wî, çavêñ çux-çerkezî lê ne, kolozê xwe daniye ser çoka xwe, şar û temezî daye dorê.

Elî Axa - Çiqas difikirim, riya ji riya dernaxim, ci bikim, wekî ecêbekê bînime serê wî kelbê kurê Wetê, Memê. Wekî Eyşa bedew ji min ra bimîne. Kuro Mexsûd ! /dike gazî/

Mexsûd - /Şalekî fire lê, bilûzek berî ser şal daye, kolosekî bê şarî û şimaqî di sêri da, tê hundir û li ber Axê temene dibe./ - Emir ke Axa !

Axa /ji serî hetanî pîya li Mexsûd dinhêre û dibêje/- Kuro, ca here gazi gilavî ke, bêje Axa bi lez gazî te dike !

Mexsûd - Vê sehetê Axa ! /tirçikekê dide xwe û diçe/.

Axa - Hela bira gilavî jî bê, çika aqilê wî ci dibire ? Ew merîkî wisan e, wekî çare ji hemû tiştî ra dibîne, herge lazim e bertîlê hildide, ruşwetê dide, lo hela wextê lazim e bextê xwe jî dişewitîne.

Zozan - /Ne ewqas bedew e, lê kincê şar-quṭîn lê ne, di nava zér û zîva da winda bûye./ Bi hêrs tê hundir.

Eli Axa - Qîzê Zozan, eva ciqas we'de ye tu nehatibûyî dîwana min. /Bi şik-beri/ Dibe tiştek qewimiye ?

Zozan - /Bi hêrs/ Tiştek neqewimiye, ci biqewime jî dîsa ji rûyê te da ye, tu tiştê nelirê dikî, xelq caba ser min da dişîne.

Eli Axa - Cabê ci keçê, kê ci ji te ra gotiye, ca ji min ra bêje, kê cab ser te da şandiye, ez ji heqê wana bême der, heqê kê ye li kêfa nav-namûsa min keve.

Zozan - Îzina kesekî tune li kêfa nav-namûsa te keve, lê îzna te heye, wekî li kêfa nav-namûsa xelkê bikevî, navê xwe li pey qîzê xelkê xî !

Eli Axa - Keçê, te ez birim kirim e hevalê wan tûzîka, çîma ji bîra te çûye, wekî ez Axa me.

Zozan - Çîma, wekî tu Axa yî gerek e tu dinê hûfî xwe bikî, ci ye ?

Eli Axa - Canim, zêde-zêde xeber mede, tu giliyê xwe bêje, çika giliyê te ci ye û ji van dera here, min gazi meriya kiriye, merî ê niha bêne cem min.

Zozan - Eva çend meriya ser minda gilî şandin, wekî mîrê te diçe pêşıya qîz û bûkê me. Niha jî dê û bavê Eyşê gilî ser min da şandine, wekî tu çûyî pêşıya qîza Rizgan, Dilberê.

Eli Axa - Canim, tu û wana ji riya Xwedê ketine, kê çûye pêşıya Dîlberê, dibên ro diçe, qeda naçe. Eva bendana min û wana.

Zozan - Him diçi pêşıya qîzê xelqê, him jî xwe afû dikî. Tê niha bêjî ez ne çûme pêşıya qîza Zurbê, yanê jî pêşıya bûka Şikri, Zilfo jî, ez kîjanê bêjîm, kîjanê nebêjîm, ez me'rûma Xwedê nizanim bi ku da herim.

Eli Axa - Keçê, tê ji vêderê bicihimî herî, an na ezê rabim ser û guhê te melhut kim. Tu kulfet ï, here di mala xwe da rûne, tu wî çaxî dikarî xeber dî, kê çaxê nanê te tune, ava te tune, tê wê di nav zér û zîva da winda bûyî, idî ci dixwazî, ji Xwedê qedê dixwazî ?

Zozan - Bira ez di nava xelqê da nebime sosret, zêr û zîvê te ji min re ne lazim in. Her carekê ez seh dikim, wekî te gili ber qîz û bûkê xelqê avêtine, an na çuyî pêşîya wana, ez dibêm : Xwedê, bira erd biqelişê, ez tê de herim ; bes e, ez vê sosretiyê idî nikarim bibim !

Eli Axa - Xwedê hebinî, dewsâ min tu çîma di erdê da diçî, kê mîr e bira bê bi min ra xeber de. Xwedê hebinî, çîma giliya ser te da dişînin ?

Zozan - Heyran, merîyê mînanî te ber xwe nakevin, wekî şerm bikî, tê giliyê wisa bikî, tu wê idî kurê xwe tînî ber zewacê, sibê nebî-nebîçirkê te dê hebin, axir tu xor тек nînî. Wekî tiştê wisa dikî. Heyran, herke dixwazî yeka dinê bînî, xwe ez ne bêxweyî me, ezê jî herim mala bavê xwe.

Gilavî - /Merîkî aşxorkî, kincêd kurmancî lê, qure-qure tê hundur/ - Selam, Axê min !.

Eli Axa - / Tevhevbûyi / Selam maqûl, kerem ke rûne. Zozan, tu here, ezê bême malê, emê xeber din. /Zozan bi hêşir ji otaxê derdikeve/.

Gilavî - /Bi lawkayî/ Çi bûye, xanim çîma hêrs bûye ? Canim, ev jin bela serê meriv in, wekîbihêlin ewê sibê hetanî êvarê bê nan û av xeber din.

Axa - Welle, tu rast dibêjî, ewana bona xeberdanê hatine dinê, ya dinê jî xêncî me gere tav li ser yeke dinê nekeve.

Gilavî - Axê min, meriyê aqil li vê dinê ew e, wekî bi jinê ra nekeve huncetê, xêr ku kete huncetê, mala wî dê xirav be. Here, eger dikarî pê ra lawikaya bike û ya xwe jî di binî va zanibe, dilê te ci dixwaze bike, emê ji vê dinê ci bibin. Axayê min, tu kêfa xwe neşkêne, niha giliyê xwe bêje, hêrsa jinê jî mîna kela dîzê ye, ew zû kel diçê û kela wê jî zû datîne.

Axa - Canim, welle giliyê te ye, yê kurê camêra tu yî, wekî serê xwe ji jina ra danaynî. Yek e, ci bêjî, ci nebêjî ew naxape.

Gilavî - Vê sibê ci qewimîye, xulamê te lezo-bezo hat, ez ji xewê rakirim, go axa bi lez gazî te dike. Min go ci ye kuro, dibe savar sar dibe. Go : welle tu savar tune, lê axa gazî te dike.

Axa - Lo mala te ava be, tu çiqas radizêyî, ji meriyê çaxê te ra gerek e şevê ancax çar-pênc sehetan razên.

Gilavî - /Bi ken/ Lo maqûl, ne meseleke me awa heye : dibêñ Kurmanc birçî ye, xew jê ra ci ye, Kurmanc têr e, xew jê re xêr e.

/Bi lawkayî/, Axê min, tu giliyê xwe bêje, lê ji bîr meke ji xulam ra bêje bira ji me ra çayê, qawekê bîne.

Axa - Lo mala te ava, ca tu xwe di şerma xwe da bigre, çay û qawe narevin, lê tu gelekî ji zikê xwe hiz dikî, ha !

Gilavî - Axê min, em mane, ew zik, gerek e em rind miqatîyê li xwe bikin, mîrê mezin zû dikevin, lê zaro bi cilma pozê xwe jî dikarin bidebirin. Em bêjin, ez ji te mezintir im, ya min û te xwe nabe yek.

Axa - *Mexsûd ! /dike gazî/*, kuro ji me ra çayê qawê bîne !

Gilavî - Axê min, aqilê te ci dibire li dinê, bîna şer tê, tu were şer bibe, emê ji dest û piya herin.

Axa - Emê çîma ji dest û piya herin, xwe me naşînin ber şer, wekî em ji dest û piya herin, kê ji dest û piya diçê bira here.

Gilavî - Wisa nebêje, axê min, her şerek bi xwe ra ziyanê tîne, ji şera gişk jî li ziyanê dikevin, padîşa, ku padîşa ye, dîsa li ziyanê dikeve.

Mexsûd - */Sêni di dêst da tê hundir, çayê qawê datîne ber Axê û Gilavî, diçê/*

Gilavî - Kuro Mexsûd, çayê germ xwey ke, iro kêfa min ji çayê heye, ezê çend fîncana zêde vexwim.

Mexsûd - Axa, min semewir teze avêtiyê, çiqasî vedixwî, vexwe, bi saya serê Axê her tişt jî heye.

Axa - Eylaz, lê tu qe nabêjî, te seba ci gazî min kiriye, gilî-gotinê te ci ne ?

Eylaz - */Bi lawikayî/* Hela ro neçûye ava, şev jî dirêj in, tu ditirsî, wekî ez giliyê te nebihêm, de niha bêje, çika giliyê te çiye, ez jî zanim te seba xêrê gazî min nekiriye.

Axa - Welle, ez jî qet nizanim ci bêjim.

Eylaz - Camêr, heta niha tu bi lez diketî, îcar nizanî ci bêjî, qet tişt nake, ezê vê fîncana çayê jî vexwim, heta tu giliyê xwe li hevdatînî.

Axa - Mala te ava be, ew xeysetê te ye, meriv ci dibêje, tu giliyê meriv tirane digri.

Eylaz - Axê min, wekî li vê dinê meriv hinek jî heneka neke, wê çawa roja wî derbaz be. Tu dizanî di vê êlê da ez û tu ne, kirîn-bîrîna êlê di destê me da ne ; bêje çika em ci bikin ? Tu dizanî, serê min û kura jî di oxira te da ne, tu çîma ber xwe dikevî ?

Axa - Xwedê serê te xwey ke, lê dixwazim gilîkî ji te ra bêjim, gerek e tenê di orta me da bimîne.

Eylaz - Ji sola xwe ra bêje camêro !

Axa - Ezê ji te ra bêjim, tu jî hela di ser vê pirsê da bifikire.

Eylaz - Lo mala te ava be, seba te ez dikarim qe bê duşurmîşbûn jî bikim.

Axa - Na Eylaz, eva gilîkî wisan e, wekî em gerek e aqilanî bikin, an na emê di nava êlê da bibine sosret, hurmeta me dê bikeve.

Eylaz - Canim, Xwedê sosretiyê nede, heta niha em kîngê bûne sosret-robet, wekî iro bibin.

Axa - /Hinekî bi şerm/ Tu dizanî, wekî ez ji Eyşê jina Memê hez dikim, em çawa bikin, ku ecêbekê bînin serê Memê, wekî Eyşê ji min ra bimîne.

Eylaz - Rastî jî pirseke çetin e, em wekî wî serwinda kin, paşê wextê te Eyşê ji xwe re anî, cimaetê e'se bêje, bi destê wî Memê hate serwindakirinê.

Axa - A, bona wê yekê jî min gazî te kiriye û bi te ra dixwazim şêwrê bikim.

Eylaz - /Bi fêlbažî destê xwe li hev dixe/ Me ji gelek tişa re çare dîtiye, emê ji vê pirsê re jî çarekî bibînin. Kuro Mexsûd, /dike gazi/, çayê bîne. /Mexsûd çayê tîne dide ber/. Axê min, kuştin jê re dest nade, ya girtinê aqilê min nabire, çimkî bona wî bigirin, manî tunene.

Axa - Ez ji te razî me, lê em çi bikin ? Ez jî difikirim, rê ji riya dernaxim.

Eylaz - Axayî sax be, were em tiştekî awa bikin.

Axa - Bêje, çika tu çi difikirî ?

Eylaz - Ji min esker dixwazin, ezê hema iro gazî kimê, bêjimê da wekî karê xwe bike, tê herî eskeriyê. Ezê bişînime cîkî wisayî dûrî-derez, wekî Eyşê tenê di xewna xwe de bibîne. Tu bi xwe jî dizanî, wekî eskeriya niha jî 7 sal e, kê zane 7 sala kî sax bimîne, kî bimire.

Axa - /ji cî radibe diçe eniya Eylaz/. Welle tu rind fikirî, şîrê te xwarî li te helal be. Lê tu zanî, wekî pêşkêşa te jî li ser min, ha...

Eylaz - Canim, ji bona pêşkêşê şerm e, tu bi xwe pêşkêş î, çima ji bîra te çûye, te çi qencîke mezin bi min re kir, wextê ewî kûçikê Eslan çû got, wekî bertîl daye min, ku ji te nebûya, ji xwe wê ez him ji gilavîtiyê derxistima,

him jî bigirtama, anê em bêjin çiqas giliyên wisa hatine ber destê te, te bindoşek kirine.

Axa - Ez borcdar im, Eylaz, ne axir di êlê da tu jî ne parîkî piçûk ì, tu jî notla şûrekî dudevî li pişta min sekiniyî. Çima van giliya birê te ji bîr dike, lê ji bona ci min ev gili qe ji birê xwe re jî ne gotine, tenê ji te re dibêjim.

Eylaz - Kuro Mexsûd ! /*dike gazî, Mexsûd tê hundir*/, here mala Weta pîr, bêje Memê kurê wê, bê gilavî li mala Axê de rûniştiye gazî te dike, bira nesekne, bê.

Mexsûd - /*Tırçikekê dide xwe*/ . Vê sehetê, Axa !

Eylaz - Wekî ew geda hate vîra, tu qet dengê xwe nakî, yanê xwedêgiravî haya te ji tiştekî tuneye. Hela hergê dikarî tu li pişta wî xeber de, yanê gunê xwe pê tînî, hemin ya dila jî bira di dila de be.

Axa - Ser çavêن min, Eylaz.

Eylaz - De bira here yeke xwe bêje, dû da jî ya me. Axa, lê tu hay ji Eyşê heyî, ewê ji te re bê, lê wekî li hêviya mîrê xwe ma, xwe tu nikarî bi zorê bînî.

Axa - Eylaz Can, çima nizanî, çima te sistiya jina ne dîtiye,. Emê pîrika Hevsê bînin, çend zêra bidinê, bira «li kûpê xwe yê sêra» siyar be, here mala Eyşê, tu binhêri, ew di nava çend roja de wê çawa ji rî derxe û ji min re bîne yolê.

Eylaz - Axa, welle, aqilê min ji vê yekê dibire, çimkî ew di vê êlê da kîjan qîzê û bûkê bixwaze, dikare ji rî derxe.

Axa - Ya dinê jî, wextê wê di derheqa hebûnê, zêr û zîva de gotê, ewê bi derbê ra temê xwe biguhêze ; ya dinê jî ewê bibe jina Axê êlê, ne jina tûzîkekî tî-birçî.

Eylaz - Wisa nebêje, Axa, cimaet dibê : «Jin jî hene, jinkok jî hene, seba navnamûsa xwe qe tuyî ser zêr-zîv jî nakin.»

Axa - Tiştekî nake, bira ew kelb ji vira biqewire, here, ew şuxilê paşê ye.

Mexsûd - /*Tê hundir*/ Gilavî sax be, min Memê anîye, bê hundir ?

Eylaz - Bêje wî bira bê.

Memê - /*Kincêñ teze li xwe kirine, simêlkî qeytanî lê ye*/ . Selam, gelî Axa. /li ber wana temene dibe/.

Axa - Kerem ke rûnê, Memê min, qe halê diya te ci ye ? Dinhêri Eylaz, Memê çawa bi derbekê ra mezin bû, çend sal pêş da ew parî tifal bû.

Eylaz - Dinya wisan e, Axê min, karik ji xwe di bin selika da namîmin, mezin dîbin.

Axa - Bavê wî belengazî li ser talan hate kuştin, lê eferim ji diya wî ra, ew li ser tifalê xwe rûnişt, mezin kir. Memê lawo, dibêñ zewicî, rast e ?

Memê - /Bi şerm/ Erê Axa, rast e.

Axa - Xudê li hev bîne, lawo !

Memê - Zehf razî me Axa, Xwedê kurê te bihêle.

Axa - Lê tu li kî derê yî, ci şuxilî dikî, qe rojekê bi ser me da nayê.

Memê - Malim, Axa, ançax şuxilê malê pê ra dighînim, de tu dizanî halê me gundiya : cot in, cobar in, dewar û pez e, hemî şuxilê malê ji notla qulê dîwaran in. Yekêigrî, ya dinê vedibe, şuxil bi ber şuxil va dertê.

Axa - Rast e lawo, qaraniya malê çetîn e, wekî di stuyê mîriv da be, ew ji mîrekî tenê.

Memê - Axayı sax be, em ji diqacqicin, wekî ji xelqê paş da nemînin, xwe ji şîn û şahiya daneynin.

Axa - Eferim lawo, bavê te ji wisa pêciryayî bû, em bêjin, tu parî tifal bûyî, wextê bavê te hate kuştin, bîra te nayê.

Eylaz - Memê, tu dizanî, wekî min seba ci gazî te kiriye ?

Memê - Welle nizanim, Axa, wextê xulamê Axê hate pey min, diya min ji ecêbmayî ma, wekî gilavî çima gazî min dike.

Eylaz - Lawo, kaxezê te hatine, tu gerekê herî eskeriyê.

Memê - /Bi dilşikestî/. Lê diya min pîr e, jina min cahil e, wê çawa bin ?

Eylaz - Wê çawa bin, ewê di mala xwe de bimînin, hetanî tu têyî.

Axa - Tu nikarî hinekî vî şuxilî paş xî, ne axir xort teze zewiciye, li ber miraz e.

Eylaz - Axayê min, ev fermaña min nîne, eva fermaña dewletê ye. Ez qe

dikarim paş xim. Xwe Memê tenê nîne. Wê hela gelekê mînanî wî jî herin eskeriyê, çîma ewana kurê dê û bava nînin ?

Axa - Eylaz, hilbet ez ji te fam dikim, lê herge mecal hene, qene çend meha paş xe.

Eylaz - Axa, evî şuxulî ez tenê dikarim heftekê paş xim, heftekê şûn da ezê kaxezê wî bidimê, ew gerek e here.

Memê - /Bi melûlî/ De qirar qirara dewletê ye, ezê idî ci bêjim, dest diçe ber destê dewletê ?

Axa - Memê, bêje diya xwe û kufleta xwe, wekî kîmasiya ci dibînin, bira ser min de bêñ, ez ji wana tu tiştî texsîr nakim.

Memê - Zehf razî me Axa, ew kulfetên wisa nînin, wekî seba tişa herin ber derê xelqê.

Axa - Lawo, çîma tu min xelq hesab dikî, ne axir ez Axê we me, ez û bavê te tevayî mezin bûne, em bêjin wextê bavê te mir, min hindik komek daye diya te ?

Memê - Tu kurê Axa, bavê min yê kesîba, we ci hevaltî bi hevra kiriye ? Em bêjin niha ez û kurê te, em dikarin, bi hevra hevaltiyê bikin ? Naxêr, nikarin. Kurê kesîba bi kesîba ra hevaltiyê dike, kurê dewletiya jî bi dewletiya ra hevaltiyê dike.

Eylaz - Memê, de niha here, karê xwe bike, wekî tê herî eskeriyê.

Memê - Pak /Memê diçe/

Eylaz - Bira here bizanibe, wekî dew birê mast e, te dît hela serda jî çawa berzeq berzeq xeber dida, digot ew kulfetên wisa nîne, wekî herin ber deriya. Heta tu herî, bêyi, çika tê wana bibînî, îcar wê neçne ber deriya.

Axa - Tiştê ɳake, dilê wî tije ye, bira hinekî jî zêde zêde xeber de.

Eylaz - Te ne dît, kulê çawa di dilê wî da hene. Kurê Axê û kesîba ci wan bi hev ketiye, yanê hûn ci dixwazin, dîkin.

Axa - Lê Eylaz, tu zanibe, wekî ew her tiştî fam dike, zane ku ev şuxilê destê me ye.

Eylaz - Lo hela çawa dixwaze, bira hema wisa jî texmîn bike, emê ya xwe bikin, paşê ci dibe, bira bibe. De Axa, ez çûm, bira şuxilê te jî açix be !

Axa - Ez zehf razî me, maqûl, bira Xwedê me ji hev nede şermê. /Eylaz diçe/.

(Perda tê dadan.)

* *
*

PERDA DUDUWAN

/Mala Memê, maleke kesîb, textek li rex dîwêr e, carcimeke kevin li ser e, li kêleka dîwêr dîz, kûp cîwar kirine, çend kursî danîne orta malê. Wetê destê xwe kiriye nav kêleka xwe, bi hêrs li nav malê diçe tê/.

Eyşê gore di dêst da, çê dike.

Wetê - /Kincêd kurmanciyê heznî lê ne/. Eyşê lawo, tu dibêjî gilavî çima gazî Memê kiriye, ew jî di mala Axê de. Hebe tune be, ewana dixwazin dîsa şer û dawekî tev rakin.

Eyşê - /Kincine kurmancîne bedew lê ne, gora çê dike/. Çima Memê,çi kiriye, me kurê wan kuştiye, wekî şer û şiltaxa bavêjine me ?

Wetê - Ewana bira nebêjin ez kevnejinek im, çi bixwazin dikarin bînîne serê me, ezê wana di nava êl û eşirê de bikime sosret, giliyê wana bighînime text û tacê padîşê.

Eyşê - Dayê, ev axa-beg çi ji cimaetê dixwazin, malê yekî dibin, bertîla ji yekî din dixwazin, heta jin û zarê wana jî zordestiyê li zarêni kesîb dikan.

Wetê - Tiştekî nake lawo, kê zor û zulmê, şer û şiltaxa dike, ew yek tê pêsiya wana, ewê rojekê bi ser bela xwe vebin.

Memê - /Bi hêrs-hêrs tê hundir, li ser text rûdine û cigarê dikişîne/.

Wetê - Lawo, ewana çima gazî te kiribûn ?

Memê - /Bi hêrs/. Qet, hema wisa gazî kiribûn.

Wetê - Hilbet, çima gazî te kiribûn, çimkî ewana ji bona xêrê gazî meriya nakin.

Memê - /Bi hêrs/ Min dişîne eskeriyê, îcar te seh kir ?

Wetê - Eskeriyê ? /di orta malê diçe û tê/. Lê te ne got, wekî diya min pîr e, kulfeta min cahil e, kê wê wana xwey ke. Çiqas hevalê te hene, ku neçûne

eskeriyê, hema ewana jî te dîtin.

Memê - Na, min xwe kerr kir, min go ez şa me, wekî hûn min dîbin ! /bi eks dibêje/.

Wetê - Lo lawo çîma bi hêrs xeber didî, min hema wisa pîrsî, çîmkî di vê yekê de ez tiştekî dijminatiyê dibînim.

Memê - Gotin ji bona wan decala çî ye ; ewana, ku inyata xwe kutane yekî, idî notla meriva bernadin, hetanî diranê xwe di wî da nekine xwarê.

Wetê - Erê welle wisan e lawo, lê çîma te çavê wana rîtiye, wekî li te kirine inyat ?

Memê - Çîma tu nizanî, dayê, xortekî êlê wekî kinceke temîz li xwe bike, an kulfeteke baş bistîne, lê dikine inyat, hetanî ew serwindayî dikin, an ne jî sekез dikin.

Wetê - Lawo, belkî Xwedê bi bextê wan re nîbe, belkî ewana bela xwe li ber piyê xwe bibînin.

Memê - Lê dayê, ewana stûr bûnin, Xwedê jî bi meriyên wisa nikare, ka evdê ku pê bikaribin ?

Wetê - Erê lawo, welle xebera te ye, eva dinya zorban e.

Memê - Dayê, lê eva dîwana zora û zorba nîne, wê axê êlê roj nava nîvro bajo pêşıya xelqê, giliya ber qîz û bûkê xelqê ra bavêje, hela wextê em dergîstî bûne jî, çend cara gilî ber Eyşa bûka te re jî avêtine.

Eyşê - De ewî jî caba xwe rind sitend. Welle min wisa berî wî dayê, wekî kûçika nan ji destê wî nedigirt. Bira nebêje ez axa me, wextê cinê min bigre, ez bavê xwe jî nas nakim. Ya dinê jî ez sola Memê bi serê bavê wî re naguhêzim.

Memê - Hela wextê gilavî gazî min kir, ew jî li wê derê bû, henek dikirin, ji xwe va hê li pişta min digire, digot Memê li ber miraz e, tu nikarî eskeriya Memê paşve xî. Ji ewî tirê ez nizanim, wekî eva temam şuxilê wî ye, eva gişk ewi teşkil kiriye. Hela ser de jî digot, wekî herge diya te û jîna te kêmasiya tiştekî dikişinin, bira bi ser min de bêñ, ez ji wana tiştekî texsîr nakim.

Wetê - Lê te ne got bira destê te bi don be, li serê te be ; diya min û kulfeta min têne ber derê kûçikê mînanî te ?

Memê - /Bi hêrs/. Welle, çawa lazim e min cawaba wî da.

Eyşê - Memê, tu qet nefikire, here eskeriyê, rind qulix ke, zû were, heft sala na, sed salî be jî ezê li hêviya te bim, ezê pîra diya te jî notla ronaya çavê xwe xwey kim, nav û namûsa te jî bilind bigrim.

Wetê - /Digri, bi desmalê çavê xwe paqij, *dike*/. Xwedê, eva ci zulm e, meriv zavê çend roja jî nehêle, di mala xwe de bimîne, wekî bi mirazê xwe şâ be. Min caniya xwe ya ter û can da ser wî, ew bi parsê-pûrsê xwey kir, mezin kir, gîhande mirazê wî, iro jî destê me ji hev dikan. Xwedê tu qebûl neki ji sebe-bê me ra.

Eyşê - Tiştekî nake, dayê, ber xwe mekeve ! Sal in wê bêñ û herin, rojekê jî te hew dît, wekî Memeyê te hat, dîsa şayî kete mala te.

Wetê - /Bi girî/. Erê lawo, sal in wê bêñ û herin. Lê gelo wê çawa herin, dîsa çavê diya te ya belengaz wê li rê û dirba biqerimin, ezê li ser rê û dirba bisekinim, kê bê û here pirs û pirsiyara Memeyê xwe bikim, lê gelo kê wê pirs û pirsiyara min re bîne ? Xwedê tu çima ruhê min nastînî, wekî ecêbê awa li ber çavê xwe nebînim.

Eyşê - /Bi kelogirî/. Dayê, bes e, li ser oxira Memê de megirî, girî xirab e, hineki jî ber xwe bide.

Wetê - Ez qurbana te bim, Eyşê, dil e, nasekine, ez jî dixwazim li ser riya Memê xwe de negirîm, lê nikarim, lawo.

Memê - Dayê, meriv li ser miriya digrî, hî ser saxa nagirî. Ci bû ji te re, xwe mim nabin dar dakin ?

Wetê - Bira sebebê te dar dakin, lawo, wekî iro min şîna wana bikira.

Memê - Dayê, de zû bike, kincêñ min dagrin, ew kûçik dê niha meriya bişîne pey min.

Wetê - /Bi kelogirî/. Eyşê, lawo, de zû bike, xurca Memê bîne em dagrin. /Eyşê gava xurcê tîne datîne ber dê, kela Wetê hê gur dibe, *digrî*/.

Memê - Dayê, de zû bikin, wextê giriyê nîne.

Wetê - /Ji kêleka xwe gore û lepika hildide/. Ha ne lawo, eva gorê te, miqatî xwe be, lingê te necemidin, eva jî lepikê te, eva kincê te yê binîda, eva kincêd te yê serda. Eyşê lawo, ca xwarina riya wî jî bîne têke xurcê, kê dizane delalê dilê min dê riya çend qonaxa here.

Memê - Dayê, meriv ji mala xwe derket, îdî dûr û nêzîk yek e.

Wetê - Erê lawo, belkî diya te kor û kotî be.

Eyşê - /Xwarinê tîne/. Ha ne eva kade ye, eva hewle ye, eva penêr e, eva ji nan e.

Wetê - /Radibe ji ber pişa xwe kîsikekî derdixe, tiştekî jê derdixe û dibêje/. Memê, lawo, hela di bûktiya min de ev çend zêrê hanê bavê te dane min, got, Memê min mezin bû, bidê. Min ew heta niha xwey kirine, dest nedanê, de hanê hilde hilde, welatê dûr i derez e, dibe li te lazim bê, hezar û yek olecaxê dinyayê hene ; herge lazim be, bide xwe xilas ke, were.

Memê - Dayê, ez wan zêra nabim, ez mîr im, kîderê ji hebe ezê serê xwe xwey kim, tu hilde ewê lazimî we bêñ.

Eyşê - Hilde, Memê, hilde, bira di dilê diya te de nebe xem. Em di mala xwe dan in, şikir mal-halê me pirî-hindikî heye, emê xwe pê xweykin.

Memê - /Zêra hildide/. De wekî ji we ra ne be xem, hanê, nîvê min, nîvê we /ew nîvê zêra dide Eyşê/.

Eyşê - /Ji ber pişa xwe desmaleke morîkirî, neynikekê derdixe/. Memê, hanê vê neynikê û vê desmalê çawa bîranîn hilde, lê miqate be winda mekî.

Memê - Eyşê can, meriv qe pêşkêsa wisa dike ? Ew ji pêşkêseke mînanî pêşkêsa te ?

Memê - /Ew ji ji cêba xwe desmala xwe derdixe/. Hanê Eyşê, eva ji desmala min ji te re pêşkêş, wextê ez dikevime bîra te, derxe hevekî serda mîzeke, bira xemê dilê te bela bin. / Eyşê dide ser dilê xwe û dike paşla xwe/.

Dibe ringe-ringa denga, ber derî du ersewil têne hundur.

Ersewilê yekê - /Yekî hupizî ye, kincê eskeriyê lê ne, tiving di dest da ne/. De zû bike Memê, lawik li hêviya te ne, gilavî em şandine dû te.

Memê - Çima ezê birevim, wekî gilavî hûn şandine pey min ?

Wetê - Gilavî, wekî merivekî wisayî rast e, ew çima kurê xwe, kurê axê naşîne eskeriyê ?

Memê - Giliyên wisa çima dibêjî, eskerî ji, hemû olamê dewletê ji bona me kesîb û kûsîban e, ew ji bona dewletiya nîne.

Ersewilê duda - Canim, tu çima ji me ra dibêjî, em ji merîne mînanî te berdestî ne. Ci ji me ra dibêjin, em wê ji dikin. Ji me re gotine herin Memê bînin, em ji hatine. Hergê naxwazî, bêje, wî çaxî emê ya xwe bikin.

Wetê - Hûn xwe wisa efû dikan, hesêvankî hûn hindik li serê xelqê dikan, xelqê dikutin, mal-halê wan dibin, iro jî hatine dibêjin em merîn in berdestîn in, ci ji me ra dibêjin, em jî dikan. Belkî bêjin herin xwe di gelî da bavêjin, hûnê wisa bikin ?

Ersewilê yekê - Na, xwe em ji riya Xwedê neketine, wekî serê xwe li dîwêr xin. Dayê ew e pêsekê me, wekî em, bi gotina wana nekin, ewê me ji xebatê derxin û zarêن me dê tî-birçî bimînin, îcar jî yekî dinê wê li me xe.

Memê - /radibe ser piya/. De dayê, Eyşê êdî wextê dem û xatiran e, ezê zû-zû we ra name bişînim, hun jî min ji bîr mekin. /Ew xwe pêşiyê davêje pêşîra dê ; dê bilind digrî, nifira li Axa û bega dike. Paşê xwe davêje pêşîra Eyşê, surca xwe hildide û ji mal derdikeve/.

Dibe kûrekûra Wetê û Eyşê.

Perda tê dadan

* *
*

PERDA SISIYA

Mala Memê. Heft sal derbas bûne, hebekî guhastin ketiye nav malê, Weta dê pîr bûye, Eyşê jî idî qîzeke bûkîn nîne, jineke bi qedemê xwe ye. Wetê li ser text rûniştiye, tizbiya xwe dikşîne, xêr-şer-xudê ...

Wetê - Eyşê, idî heft salê Memê temam bûne, lê kanî qet ser û beratê wî tune, qet kaxezake wî jî tune.

Eyşê - Tişt nake dayê, ewê idî li kîderê hebe, Memê ê bê.

Wetê - Eyşê, ez ewqas bêsebir bûme, wekî bawer nakim Memê xwe bibînim.

Eyşê - Dayê, çîma tiştê wisa dibêjî, te ewqas ber xwe daye, nikarî cend roja jî ber xwe bidî ?

Wetê - Na, Eyşê, kambaxê tiştên wisa di nêta min re derbas dibin ...

Eyşê - Ci nêt, dayê, dilê xwe sax ke, tiştên xirab ji nêta xwe derxe ! Şikir Memê wê bê, emê şayikê di mala xwe de deynin.

Wetê - Heyran, ci tê bira bê serê min, bira ez derdê we nebînim, lê hûn derdê min bibînin.

Eyşê - Dayê Can, tu çima wisa dibêjî, bira tu jî sax bî, em jî sax bin. Dayê, wekî Memê bê û me weha sax û silamet bibîne, wê çiqas şâ be, wê per û baskê wî tunebin bifire.

Wetê - Erê welle, wê gelek şâ be, bira ew roj bê, bira Xwedê jî ruhê min bis-tîne.

Eyşê - De bira dijmin jî bimrin, biteqin, ewana ci nêt danîbûne pêşîya xwe, ji wana ra li hev ne hat, Xwedê çawa li situyê wana xist.

Wetê - Te dît ewê Memêyê min şande eskeriyê, çawa li ser bela xwe vebû, notila kûcîka gever kirin. Xwedê min qurbana nav û namûsa te ke, te kolosê Memê di nava pismama da bilind xwey kir.

Eyşê - Dayê Can, here razê, tu gune yî, ber xwe mekeve, zehf çûye, hindik maye, te hew dît Memê rojekê jî hat.

Wetê - Erê lawo, welle ez westîya me, ez herim razim, şeva te bimîne xwes. /*Wetê diçe/*.

Eyşê - Belengazê çiqas bêsebir bûye. Xwedê xirab ke, ceger e, çetin e. /*Ew jî ciyê xwe çedike, radibe razê, demekê çira vêsandine, xêlekê şûnda dengê kutana derî tê/*.

Eyşê - /*çira vêdixe, dike gazî/*. Ew kî ye vê şevê derê me dikute ?

Memê - /*Dengeki ji dûr tê bihîstinê/*. Ez im, Eyşê.

Eyşê - Tu kê yî, ez vê şevê derî venakim.

Memê - /*Deng ji derva tê/*. Eyşê, tu min nas nakî ? Ez Memê me, kurê Weta dê me, kilê çavê Têlî Eyşê me.

Eyşê - /*Dudilî dibe, xwe tevhev dike, diçe derî lê vedike, Memê tê hundir, xwe davêje hemêza Eyşê. Eyşê jî Memê hemêz dike, hêşirê şabûnê di çavê herduwan ra jî davêje/*. Wey Memê Can, ez ji herdu guha kerr bûbûm, ez ji herdu çava kor bûbûm, min çawa te nas nekirî.

Memê - /*Bi şabûn/*. Eyşê Can, eva 7 sal derbas bûne, teyê ji kîderê dengê min nas kira.

Eyşê - Memê Can, tu hespa xwe bikişîne aliyê tewlê, ez jî ji te re nan bînim, tu ji rê hatî, niha birçî yî. /*Memê diçe. Eyşê nan, xwarinê dide ser texte/*.

Memê - /*Tê hundir, dîsa xwe davêje pesîra Eyşê/*. Eyşê Can, min bêriya te kiribû.

Eyşê - Memê Can, tu bizanibe te çiqas bêriya min kiribû, deh cara jî zêdetir min bêriya te kiribû, de rûnê, nanê xwe bixwe.

Memê - /Memê rûdinê, lê dest bi nanxwarinê nake/. Eyşê Can, lê ka pîra diya min, here gazî ke bira bê, bêje kurê te Memê hatiye.

Eyşê - Memê can, pîra dê razaye, gune ye, emê sibê bêjinê, bira şâ be. Niha ez naxwazim deng lê kim. /Ew ji bona wê yekê weha dibêje ku têr bi hevdu şâ bin/.

Memê - Wekî te niha bigotayê, wê pak bûya, lê wekî dibêjî sibê, bira giliyê te be. Ê, de bêje ! Eyşê can, qet êdî çi heye, çi tune ye. Di nav êlê da kê sax e, kê miriye ?

Eyşê - Di nav êlê da çi hebe, ew kelbê Eli Begê, wekî şev û ro li pey xelqê diçû, lê dan kuştin, wisa jî pê ne hesiyan kê ew kuşt. Ew gilaviyê tu şandî eskeriyê, ew jî ket, gever bû.

Memê - Wisan e Eyşê Can, kê xirabîya xelqê dike, bi xwe li ser bela xwe vedibe. De bêje, halê we çawa bû, we qe korlixî nekişand ?

Eyşê - Me qet korlixiya tu tiştî nekişand, me ji xwe re ekin-tîknê xwe dikir, pê wilo diçûn.

Memê - Eyşê, Xwedê kî Weta dê zehf pîr ne bûye, gelo li ser gav û çavê xwe ye ?

Eyşê - Memê Can, lê pîr nebûye, eva 7 sal derbas bûne, şev û roj çavê wê li riya te bû. Kê diçû-dihat ewê pirsa te dikir, çiqas roj e xewnên te didîti.

Memê - Eyşê Can, de ciyê me deyne, em razên, tu dizanî min qonaxa 7 roja qedandiye, min hespê xwe yî belengaz jî hindik mabû biteqanda, çimkî min şev û roj dajot, wekî zû bighîjme we.

Eyşê - Vê sehetê Memê, ezê ciyê te deynim. /Eyşê diçe piş perdê/.

Memê - /Li nav malê diçe tê, dor û bera dinihêre/. Xwedê kesîbtiyê xirab ke, lê eva hal e, em tê da dijîn. Tiştek nake, Xwedê rehîm e, dibe ku Xwedê rojekê jî bide me, emê jî dewletî bibin.

Eyşê - /dike gazî/. Memê de were, ciyê te hazır e.

Memê - Vê sehetê, Eyşê. /Ew diçe, demekê seyr dike, dibe tarî, paşê dibe ronahî/.

Wetê - Kincine heznî lê ne, pişta wê ketiye ber, bi ecêbmayî tê hundir, ji

xwe re dibêje/. Mêvanê Xwedê ye, hespê xwe li serê tewlê girêdaye, eva jî çek û sîlihêd wî ne. Lê ew bi xwe kanê ye ? Wekî nîvê şevê mêvan hatiye, Eyşê çima ji min re ne gotiye ? /Ew hêdi hêdi ber bi perda ciyê Eyşê diçe/. Çika ez ji Eyşê pirs kim, eva kî ye hatiye. /Ew perdê dikişîne, Memê û Eyşê li ser text paldayî dibîne, lê Memê nas nake û paşda vedikişe./ Ev çi ye weyî Eyşê, te paşî Memê zenda xwe ya morî-mircan daye ber serê kurê xelqê ? Şerm ji te re Eyşê, ne te digot ezê kolosê Memê bilind xwey kim, ev bû sozê te ? Tû, qeda bê li eslê jinê ye. /Ew tev-hev dibe/ De tuê niha ji xwe re bibînî, te hatiye peyî namûsa Memeyê min kiriye. /Ew ber bi tivingê diçe, tivingê hildide/. Ezê niha berî qefesa wî dim, bira cî bi cî can de. /Ew hineki difikire, tiving ji destê xwe datîne/. Na, wê deng li dinê bela be, wê bêjin bûka wê bênamûsî kiriye û kolosê Memeyê min wê berjêr be. /Ew ber bi rimê diçe, rime digre destê xwe, hildibile/. Xwedê xirab ke qeweta jinê, tu were qefesa wî bi carekî xilas neke. /Ew şûr digre destê xwe, ji kalan dikişîne, ewê jî ji destê xwe datîne/. Dibe wextê lêxistinê serê şûr bighîje dereke Têlî Eyşê. / Ew ber bi soraniyê diçe, ji kalên dikişîne, hêdîka ber bi ciyê Memê diçe/. Eva rind e, ezê deynime ser kevçika dilê wî, ewê di kevçika dilê wî da here, heyâbihustekê jî di doşekê de here xwar. /Ew tele-tel diçe soraniyê, li kevçika dilê Memê dixe, nalîn dikeve Memê/.

Eyşê - /Ji dengê nalînê ji ciyê xwe banz dide. Wextê soraniyê bi xûnê va di destê Wetê da dibîne, dike qîrîn/. Weyê dayê, marûmê, te çi kir ? Ne eva kurê te Memê ye, iro hatiye mêvanê pîra dê ye, iro jî te kiriye mêvanê qebrê ye.

Wetê - Wey lawo, /xwe davêje ser meytê Memê, xwe vedirû, paşê rûdinê kêleka meyt û dinivê je.

Eyşê - Navê tajîya Memê min Çilê ye,
Selefê siyara diçê tê ye,
Kuştina Memê bi destê dê ye,
Weyla min bêçarê !

Wetê - Memê min siyarê Bozê zirav e,
Min nizanibû iro li Eyşê bûye mîvane,
Dayka te gurê serê çiya be, lawo !

Eyşê - Şam-Heleb li devê rê ye,
Serê Eyşê bi qurban be,
Memê li hespekî zirav siwar e, rê da tê ye,
Dê çawa kuştiye kure xwe Memê ye.

Wetê - Rênga Helebê bi zebeş e,
Memeyê min xweyê Bozê serxwes e,

Dayika te yê çima li herdu dinya rûrêş e,
Dayika te gura serê çiya be, lawo !

Eyşê -

Darê lianê li serê rê ne,
Şaxek sêv e, yek hirmê ne,
Kê ecêba ha diye, bînaye
Dê bibe qesasê serê kurê xwe Memê ye.

Wetê -

Xwedê çavê te kor ke rû dinê,
Te çawa xerîbê xwe yi heft sala bi xwe kire
mêvanê qebrê ye,
Diya te gura serê çiya be lawo !

Destê xwe li serê xwe dixe, li çokê xwe dixe, digirî.

Eyşê -

Îro sisê ye, sibe çar e,
Memê siyarê Bozê zirav e,
Dayikê bi xwe kuştiye Memê xwe ye.

Wetê - /Ew hêdîka ji cî radibe/. Ez çûm, Eyşê lawo, ezê bikevime çil û çiya, bira hirç û gur min bixwin, wekî mezelê min jî tune be. /Ew notila dîna destê xwe bilind dike, dike qîrîn û derdikeve, diçe xwe di zerê de davêje, dibe hezar tîşî./

Eyşê - /Radibe piya, dor û berê xwe dinihêre, soraniya ku pê Memê kuştin, hildide/. Paşî Memê êdî saxbûna min ji çira ye, ez paşî Memê herim bibime bermalika yekî dinê, destê xwe bidime ber serê yekî dinê, na ez jî gerek e bême rex Memê xwe. /Ew qûz dibe, Memê paç dike, disa li dora xwe dinhêre û xwe bi ser soraniyê de davêje, diçirçire û diçe li rex Memê dikeve erdê./

PERDE

*Li ser hîmê zargotina cîmaeta kurda
nivisi Xelîlê Çaçan Mûradov.
(Serokê Radyoya Kurdi)
Erivan 1980..*

XEBATÊN ENSTITUYA KURDÎ

Derveyî lêgerin û xebatê zanistî, Enstitû bi nivisin, çapkirin û belav kirina kitêb, ferheng, kovar, kaset û sêlikên mûsîqî û filmên bi zimanê kurdî, an li ser Kurdan bili dibe.

Di milê din de, Enstitû her vine (texlit) belge, kitêb, arşiv, foto, diyapoziyîv, kaset û filmên kurdî û li ser Kurdan dicivîne, li pêmahiya (mîrasa) çandiya gelê kurd xweyî derdikeve, dixwaze wê ji windabûnê xelas ke.

Li Enstituyê wisa jî férén (dersén) ziman û mûsîqî, konferansên nasîna Kurdan, raberî û pişangeyên hinerî têk pêk anîn.

KOVAR

Ji bil «Hêvi» yê, Enstitû kovarên jêrîn jî çap dike :

- Bultena peywendî û agahdariyê : ji du mehan carekê bi zimanên almanî, fransizî, ingilizî, ispanyolî, italyanî, kurdî û tirkî dertê. Her hejmareke bultenê dora cil rüpelâ ye, agahdari û xeberên karêن Enstituyê û bendên ku di çapa awrûpayî de li ser pîrsâ kurdî derketine dide, dixwaze doza gelê kurd bi cihanê baştır bide nasin.

Kiriyariya salewextî : 12 dollar

- MIZGİN : kovareke bi kurdî û almanî ye, ji du mehan carekê li Bonnê bi hevkariya Enstituya Kurdî (saxê Almanyê) û Xaça Sora Almanî derdikeve. Ev kovar bi giranî li ser pîrsâ jiyana rojane (saxî, xwendin, hwd ...) yêk karkerên kurdên Almanyê ye.

Bihayê hejmare : 3 dollar

- STUDIA KURDICA : Malbenda Légerin a Enstituyê vê kovara zanistî ji bo ronakbîrên gelên cîranên Kurdan ji salê 2 caran derdixe.

Hejmara pêşîna kovarê di çile ya 1984 de bi erebî û farisî derketiye. 128 rüpel e. Ewê ji hejmara 2 pê ve beşeke tirkî jî hebe.

Kiriyariya salewextî : 12 dollar.

VIDEO

Enstitû ewê di 1984 de bi zimanê kurdî 5 filmên video çê ke. Filma pêşîn «Dengê Kurdistanê» (62 deqiqe), bi sistêmê VHS (PAL û SECAM) û Betamax (PAL û SECAM) derketiye.

Biha : 30 dollar

KASET

Ewê Enstitû di 1984 de dora 20 kasetên mûsîqiya kurdî derîne. Ji niha ve 8 ji wan derketine. Her yek saetek dom dike û 4,5 dollar e.

Enstitû deriveyî weşanên xwe her cûre kitêb, kaset û sêlikên bi zimanî kurdî an li ser Kurdan di gelek welatên Awrûpa, Amerîka, Rohelata Navîn û Awîstral-yayê de belav dike.

Hun dikarin ji me lista weşanên frotinê bixwazin.

Ji bo agahdariya zêde kerem kin werin Enstituyê an ji me re binivîsin.

HELBEST

AX, DAYÊ, DAYÊ

Tosînê REŞİT

*Karwanê roja bê zengil maye,
Dengê axîna tek têbihîstin,
Roj çâ bê welat li şaristana
Destê hev girtî wî îske-îskin.
Roj e tengezar, roj melûl mane
Idî naxwazin roj pêş da herin,
Roj sêwî bûne, roj bêzar mane
Tenê dixwazin berbi zarotyê,
Berbi wan demên çûyi vegerin.*

Erivan

*Helbesta jêrî S. Bekir ji pirtûka Brecht Der Mench Von
Se Zuan (Mirovê çê ji Sê Zimanê) wergerandiye kurmancî.*

Welatê me iroj bûye yê dilreşan
Pir teng bûye li ser ewên pak û ciwan
Û Xwedê jî destan nade ewên xizan.

Çima Xwedê tank û tifeng, top û qurşin
Nedan ewên bimdest, ewên birçî û dilşin ?
Hêstir wilo nedibariyan ; nedirjiya xwîn.

Însaneti li cihanê iroj tiştek pir pir zor e
Ewê dilgewr zikî birçî, ewê dilreş zikî têr e
Ewê dilpak xas û bêwar, bo dilreşan xêr û bêr e.

Bo ci pêxember nayêñ cem ewên rêtber, ewên bê nan ?
Bo ci ew nadin wan pere, çima ew nadin wan arvan ?
Wilo birçibûn dihere der, rindî û xwesi têne meydan.

Bo ci Xwedê qe pirs nake j'ewên dilreş
Çima ew dijin ser piştêñ ewên keleş ?
Bo ci dest nade ser tank û balefirán ;
Yan wan nake destêñ ewên ketî û xizan ?
Wilo cihan zor baş dibe, dibe ciwan
Gel şâ dixin, dixin rizgar ji xwînmijan.

Bertolt BRECHT
(1898-1956)

EZ û KEWÊ

CANKURD

Ber destê sibê
Rabûm ji xewê
Dengek hat ji çiyayên welatê min
Qebqeba kewê kete guhêñ min
Gote min : «Kurdo !
Tev jan û derdo !
Çi heye li waletêñ biyanî ? !
Bo çi te serî ji mal hilanî ?
Bîra te dikin
Çi mîr û çi jîn !
Rêhevalêñ te, dostêñ kevn
Bîra te dikin
Çiya û rîbar
Kolan û zinar
Çîmen û kanî ...»
Min gote kewê :
«Ji min çi divê ?
Li min tengijîn
Her cî û her der
Rê li min bîrrîn

Leşkerêñ Teter
Bi zor û sitem
Ji mal çûme der ...»
Kewê dîsa kire qebqeb û got :
«Te erzan fîrot dêrîna bavê
Va li te digrîn kaniyêñ avê
Li te dikine gazî û hawar
Diya te, merx û belan û çînar
Çîma venagerînî silavê ? ...»
Min gote kewê:
Dûrketin bi min giran e
Şevêñ Bonnê bûne bendexane
Hêstir di çavêñ min de nemane
Rê li min tarî ye ... Nihan e ...»
Min û kewê xwe, ji hev fêm nekir
Min çi jêre got, wî dil nekir
Min dest dirêj kir, destê min nebir
Ez çûme ber lingan, ew bû kevir ...

1984

ZINDAN

Majdal HAMÎ

*Di zindan de,
Birçîbûn, tîbûn, nexwesbûn*

*Di zindan de,
Kuştin, nehiştin, perçiqandin*

*Di zindan de,
Tarı, qefalî, perişanî*

*Di zindan de,
Ez natırsim, ez nakevim, ez namirim*

*Di zindan de,
Şoreşger im, biceger im, bixeber im*

*Di zindan de,
Ji bîr nakim azadiya gelê xwe*

*Di zindan de,
Gelê min wê zincîran biqetîne*

Lyon 1984

Y E K İ T İ

BİRİNDAR

*Bes e birano, bes e ev pирbendiya me
Ev pирbendî bûye bela li serê me
Xelk ber bi pêş de diçin dişikînin zincîran
Eme em mane li paş dernakeve dengê me*

*Çaxa em dinhêrin li dîroka Kurdistan
Pirbendî û eşîrtî derdikeve ber çavan
Ev astengên mezin in li pêşya xebata me
Ji wan fêran bistînin bilind bikin dengên xwe*

*Ew dema pирbendiyê derbas bûye êdî bes
Divê ji vê rastiyê êdî nereve tu kes
Pirbendiya me Kurdan ji me re ne çare ye
Ji bo rizgariya me eniyek netewî hewce ye*

*Divê em dîtinê teng ji serê xwe bavêjin
Ma ta kengî emê van derd û kulan bikêşin
Divê ji bona welat rakin vê pирbendiyê
Em ber bi pêş de biçin bona yekîtiyê*

*Bergeha serhişkiyê derbasbûye êdî hew
Rastî li ber çavan e nikarim bikim derew
Li vê bergeha dijwar kes nikare rake seri
Em tev dizanin bi sernakevin bê yekîti*

*Birîndar im bang dikim ey keç û xorîn Kurdistan
Ger em dest nedine hev rizgar nabe Kurdistan
Yekîti ye ji bo me dermanê kul û derdan
Çavan vekin lo bira ev şerê man û neman*

TIRALÎ

AMED

*Tiralî bi kêr nayê ev ji mêt ve xuya bû
Ji vê sekna tewşike malika me mîrat bû
Gava em bi cîh û war bûn dijmin tengezar bû
Bi hevdû ketinêne me dijmin timî pê şâ bû*

*Do em bi kar û bar bûn lê iro em ci dikin
Me dijminan berdaye dijminiya hev dikin
Başıya hev naxwazin xerabiya hev dikin
Bi vî hawî em ketin xulamiya wan dikin*

*Heger em ji xwe re nebin kesek ji me re nabe
Bi van axîn û waxîna derdê me derman nabe
Mêraniya ji rastîn bi zirt û fortan nabe
Bê bawerî û dilxwazî tu caran şoreş nabe*

*Bav û kalan şer dikir bi camêrî û mîrani
Bi vî hawî wan caran dijmin ji war deranî
Em ji rîya wan bigrin bi ew rengê şîranî
Ger em bî a wan bikin wê rabe malwîranî*

8 ê adara 1984

KURMÊ DARÊ NE JÊ BE XERA NABE TUCARÎ

Dilawer ZENGÎ

*Ey bira tu binêre,
Şax û gulên li darê
Serî hildan ber bi jor,
Bışkoj vebûn ji xarê
Li ber roja zér reşan,
Pel zér l'enîya yarê
Bisk û kezî tev berdan,
Zilfên li ser guharê
Xunc û kulîlk bişkivîn,
EZ bûna noke xarê
Li ber bayê sibayê,
Sema têr gulyê darê
Por li deşt û gelîya,
Çinçîna zilfên yarê
Hibrî bi ser xwe werkir,
Ji kulîlkên hinare
Bejin kada mirovan,
Wêne ji geh nigarê
Dest û mil ezman hildan,
Hevpêçana serbarê
Çi zirav û ci sitûr,
Tev ji qurmê vê darê
Rehê lingê xwe berda,
Di nêv xaka nêdarê
Li jor ezmanekî xav,
Ne baran û şehdarê
Pertewa tav û birûsk,
Da gelî û zinarê
Bager û toz û dûman,
Ji jor bi ser tê xwarê
Ziyakî mari çar ser,
Talan bi alîn yarê
Zor û zeber li saxan,
Zingar bû qurmê darê
Gelek ramûsan wê da,
Ji lêvén sor sûxarê
Kuştin, mirin armanc e,
Ji destêr siyehkarê*

*Pir weşin pelê jînê,
ji perçe bûn ji parê
Kurmê darê ne jê be,
Zingar na be kevnarê
Şan û rûmet nema hew,
Ne şeqîna hawarê
Ew kirasê li bejnê,
Her kes li xwe diparê
Girtî û berê te me,
Sêv nej dara hinarê
Zimanê lal bê gerîn,
Çavê kwîr vebî xarê,
Reh tu bîghîne derya,
Jê vexwî xwîn li karê
Kurmê gerdin bê kuştin
Dûvê, şûr du rû zarê
Baran bi peşk bi barî,
Şebnem li dém bê xwarê
Tişt xweş e di çaxê xwe,
Zer bibî berê darê
Şax û terhê te geş bê,
Mehabad û Qentarê
Agri, Zaxo û Zozik,
Li Mûsil û Enbarê
Li Cezîré û Efrîn,
Dêrsim û Şanbêcarê
Ava gola bela be,
Sin bêñ terhê mişarê
Tovê jînê ji nû kad,
Nîşîn nû huşeyarê
Riya jînê da biçin,
Bero kaş û dijwarê
Ger serxwebûn bidîta,
Dê nema sîtembarê
Bi yekîti û zanîn,
Li berxwedana marê...*

Sam
15-7-1984

FOLKLOR

NIFIR

M. LEWENDI

Kultur, her wekî tê zanîn di jiyana mirovan de bi her awayê xwe heyê ; ango jiyan bi xwe kultur e, û hem di warê maddî de hem jî di warê manewî de xwe rê dide. Ji wêneyên dîwarên şikeftan heta bi heykelan, gîsin, awayê xaniyan, mizgeft û dêr, qesr û cil û berg û xwarin û heta bi fera û folan, bi kurtebirî hemûyêñ ku bi avahiya destan an jî bi kedê hatine çêkirin û afirandin hemû dikevin nava kultura maddî. Bîr û bawerî û tiştên fîkrî jî hemû dikevin nava kultura manewî. Emê li vê derê bi dûr û dirêjahî li ser peyva kulturê nesekinin, tenê bi kurtebirî mirov dikare bibêje ku her wekî me li jorê jî gotibû, bi her awayê xwe jiyana mirov kultur e. Cihê ku gel lê tunebe kultur jî li wê nîne, an jî li derveyî dîrok û civatê mirov nikare qala kulturê bike. Hemûyêñ gelan, kom û komikan xwedî kultureke taybetî ne.

Emê di vê nîvisê de bi taybetî li ser bareyekê (mewzû) bisekinin ku ev bare bi xwe di nava folklorê (zargonin) de cih digre û her weha folklor bi xwe jî di nava kulturê de cih digre.

Folklor, ji sitran û çîrokan bigre heta bi destan û govandan jî di nav xwe de dicivîne. Folklora milletekî herweha hin xusûsiyetên wî jî radixe ber çavan. Mirov dikare bibêje ku folklorâ milletekî her wisa hêza wî ya hunermen-diyyê jî derdixe holê.

Bi rastî folklorâ gelê kurd jî wekî yê hemû gelên dinê, wî jî li gora xwe şiklek girtiye û gelek jî dewlemend e. Lê divê ev berhemên gel, ango tiştên folklorîk hemû derkevin meydanê ; divê hemû ber bi cav bin, da bila herkes jê feydê bigre û her weha wê çaxê mirov dikare folklorâ xwe bi gelên cîhanê jî bide nas kirin. Her çiqasî li ser karûbarê folklorâ kurdî hin lêkolîn û lêgerîn hatine çêkirin jî, lê, divê em tenê qîma xwe bi wan neynin, ci yî me heye divê em hemûyan derxin meydanê. Gava ku em vî karî bi can û dil bikin her weha em folklorâ xwe jî ji winda bûnê didin xelaskirin.

Dîsa, gava ku tiştên folklorîk berhev dibin û derdikevin ronahîyê û gava ku mirov li ser wan lêkolînekê dike, wê çaxê mirov di nav wan tiştên berhev-kirî de (her wekî : stran, kulam, destan, çîrok, xebroşk, çîrokên tarixî, tiştanok, gotinêñ pêşîyan û hwd ...) leqayî (rastî) gelek bermayêñ mîtolojîk, gotinêñ kevn, peyvêñ ku di warê nîvisînê de nehatine bikaranîn û nav û ciyêñ tarixî tê.

Her weha dîsa, ji tiştên folklorîk mirov têkiliya nav gelan, eşîran û ya mirovan û her wisa rabûn û rûniştinê wan ên wê demê, 'urf û 'edetê wan û hwd ... fêr dibe.

Di vê nivîsa xwe de her wekî min li jorê jî gotibû ku ezê bi taybetî li ser bareyek bisekinim ku ew jî bi xwe di nava folklorê de cih digre. Belê ; nifir (beddua, zewt). Bi rastî heta niha di tu kovar an jî pirtûkên kurdî de ez lê rast nehatime ku kesekî li ser nifiran tiştekî nivîsiye, li derveyî Zargotina Kurdî ya O.C. Celîl,* ger hatibe nivisin jî min nedîye û nexwendîye ji ber vê yekê jî ev bare ji bo min nû ye, û ji ber ku nû ye jî, bê gûman, dê hin kîmaniyan jî bi xwe re bîne.

Nifir ; gava ku mirov dibeje nifir, berî her tiştî bi taybetî jî li Kurdistanê di nava Kurdan de jin tenê bîra mirovan. Her çendî carna mîr jî nifiran dikin lê ne wekî jinan in. Lewra jin bêtirin di nifiran de pêş de ne. Mirov gava ku zarotiya xwe bi bîr tîne ku ewê demê dîya me an jî diyêñ hin zarokên din gava ku bîqeheriyanâ, an jî zarokan tiştekî, şixulekî çewt bikirana derhal nifirêwan hazir bûn, her wekî : «tu bîbelqîti, belqîtiyo, tu bîmrî, tu di erdê kevî» û hwd...

Gelek babetên nifiran hene û her weha derece-derece ne, li gor cih û bareyan tênu guhertin. Nifirê besît hene ku qet ji devê kesê ku nifiran dike nakeve, her wekî «Xwedê ruhê te bistîne». Ev nifir an jî nifirê wek wê bi taybetî di jiyana rojane de gelek normal e ;ango kesek li hember tiştekî gava ku qehra xwe dide xuya kirinê van nifiran dike. Lî gava ku bûyerek mezin be, wê gavê dereceya nifirê jî bilintir dibe û her wisa awayê gotina nifirê jî hîn dijwartir û sert dibe, her wekî «tu bî, tu xêrê ji ciwaniya xwe nebînî», «Çêtiyê te were xwarê», «tu çêtî çêtî bî» û hwd ...

Dîsa hin awayê nifirkirinê hene ku bi taybetî jî ji alî jinan ve tênu gotin ku ew jî li hember bûyerek gelek mezin be, û gava ku nifiran jî dikin, him dengê xwe gelekî bilind dikin her wekî biqîrin û ji alîkî de jî dest diavêjin sîngâ xwe an jî hustukura xwe dikşînin û nifiran dikin. Nifirê bi vî awayî her wekî me li jorê jî gotibû li hember bûyerek, an jî tiştekî, qewiman-dinekî gelek mezin de tênu gotin.

Hin nifir hene ku bi taybetî tenê li keçikan an jî li jinan tênu kirin, yanê ne ji bo mîran e. Her wekî van nifiran ; «Qebheta şevê bi serê te de were !», «tu kur û kem bî !», «gulî kurê !» û hwd ...

Me li jorê jî gotibû ku mîr carnâ nifiran dikin, lê millet ferqekî gelek mezin dixe nava nifirêjin û mîran. Mirov dikare bibêje ku nifirêjin jinan ji bo millet perçeyek ji jiyana rojê ye, lê yê mîran ne wisa ye. Ji ber vê yekê ye ku di nava millet de jî carnâ tê gotin ku «nifirê dayikan (jinan) zû bi zû nayêt cih, ji ber ku şîrên wan dikeve ber, lê nifirê bavan (mîran) zû bi cîh tê». Ji ber wê jî bav (mîr) zû bi zû nifiran li zarokên xwe an jî li xizm û nasîn xwe nakin, lê herçî jin, wekî me li jorê jî gotibû, nifir di jiyana wan i rojane de her heye.

Her wekî hemû berhemên folklorîk (zargotinî) gava ku nifir jî derkevin ronahiyê, gelek peyv tê de hene ku mirov dikare di warê nivîsandinê de wan

* Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl di pirtûka xwe ya «Zargotina Kurda», cilt 2 rûpel 440 de nêzî 322 nifir berhev kirine.

bikarbîne, û her weha windabûna wan peyvan jî mirov ji holê radike. Di vê derê de emê nêzî sed û heşte (180) nifiran raxin ber çavan û di nava nifiran de jî hin peyvan işaret bikin û li jêra wan jî maneya wan binivîsin. Li ber hin nifiran jî hatine nivîsin «stran», ew jî tê wê maneyê ku ji stranan hatine girtin.

NIFIR

- 1) Ava zer di canê te da bê xwarê.
- 2) Ava reş di çavê te da bê /were/ hato.
- 3) Ava reş bi çavê te da were.
- 4) Argûnê te vernire.
- 5) Argûnê te ji kok da vernire.
- 6) Ar di mala bavê keto / ar bi mala bavê keto.
- 7) Ar di mala te keve / ar bi mala te keve / ar bi malê keto.
- 8) Agir bi te keve / agir pêketo.
- 9) Atara we bîqele / bîqellihe.

- 10) Belqityo
- 11) Belqityê belqitî.
- 12) Bextreşo / bextê te reş be.
- 13) Birûsk li te keve / birûska Xwedê li te keve.
- 14) Bav û birê te bi miradê te şâ nebin.
- 15) Bi te keve derdekî bê derman; dermanê te şîrê teyran û qoçê keran be». (Ji strana «lo bavo»)
- 16) Bê mirado.
- 17) Ber xwe nedîyo.
- 18) Bedena te reş be.

- 19) Cîgera te qul be.
- 20) Cîgera te biperite.
- 21) Cîgera te di devê te re were.
- 22) Cîgera te di porê te re were.

- 23) Çavê te di mista min keve.
- 24) Çavê te li deriya be.
- 25) Çêtîyên te werin xwarê.
- 26) Çûyina te hebe, hatina te nebe / çûyina te hebe, hatina te tunebe.

- 27) Di bin çengan da hato.
- 28) Dil û hinavén te di devê te ra were.
- 29) Derî moro / (mor li deriyê te keve)
- 30) Derdê bê derman bikeve canê te.

- 31) Emir quto.
- 32) Emrê te qut be.

- 33) Gulla serê sibê li te keve.
- 34) Gulla berbanga sibê li te keve.
- 35) Gulla serê sibê lêketo.
- 36) Gurê har bi te bigre.
- 37) Gura xwaro.

- 38) Gulî kurbiyê.
39) Gurrî bûyê.
- 40) Hustuyê te bişkê.
41) Hustuyê te di ber te da bimîne.
- 42) Jana zirav bi te da were.
- 43) Kezeb xwê biyo.
44) Kezeb peritiyo.
45) Kula Helebê di mala te keve.
46) Koka we vemire.
47) Koka we biqele / biqellihe.
48) Kezeba te were xwarê.
49) Kula salê di te da derkeve.
50) Kwinêra reş di sîngê da hato.
51) Kezeba te bîhele.
52) Kalina pêz ji ber deriyê te neyê.
53) Kund li deriyê te bixwîne.
54) Kulê biro
55) Kilita reş li deriyê te keve.
56) Kevir û kuçik li te bibare.
57) Kuçikê har bi te bigre.
58) Laşê te çêtî çêtî be.
59) Lawo, lawo tu xêrê bikî, tu qe nebînî.
60) Ma şalê tu bî, tu gurrî bî, neynûk tunebin tu xwe pê bixurînî.
61) Marê kor bi te vede.
62) Ma şalê warê te hêşin neyê.
63) Mirazê te di qirika te da bimîne, tu şâ nebî.
64) Meytê te hilê / Meyt hilato.
65) Mala bavê te xirab bibe.
66) Mala te xirab be / Mal xirabo.
67) Miradê te di qirika te da biqurçime.
68) Ma şalê tu bi gulla sibê herî.
69) Miradê te di çavê te da bimîne.
70) Ma şalê fermana we rabe.
71) Marê reş bi te vede.
72) Ma şalê tu herî, darbesta te were.
73) Ma şalê tîr li te hilê.
74) Ma şalê tu bî, tu di mala xwe da qe nebînî bûk û zava.
(ji strana «Lo Bavo»).
75) Ma şalê Xwedê ji te bistîne teqeta çoga û roniyêd herdu çava
(ji strana «Lo Bavo»).
76) Ma şalê ewê sî ro rojiyê bigre û şeva eydiyê nebînî.
(ji strana «Lo Bavo»).
77) Ma şalê tu biperitî.
78) Mala te here ber mîrata.
79) Mala te li mîrata bigerî.
80) Mala te bisewite / Mal şewitiyo.
81) Ma şalê tu bê melle herî.
82) Mala bavê te bisewite.
83) Ma şalê tu şâ nebi.
84) Ma şalê tu bî, tu bikevî ber destâ.
85) Ma şalê Xwedê per û baskê te ji te bistîne.

- 86) Min ji te xêr nedîyo / nedîto.
 87) Mêjiyê te di pozê te ra were / Mêji di poz ra hato.
 88) Ma şalê tu korocax bimînî.
 89) Mala te ne ava.
 90) Ma şalê tu din û har bî bi çola kevî.
 91) Meytê te li erdê bimîne / Meyt li erdê mao.
 92) Mirazê te di pozê te ra were.
 93) Mala te wêran be.
 94) Ma şalê kirâsê reş li te be.
 95) Ma şalê tu ker û lal bî.
 96) Ma şalê tu bî tu di nava alemê da sosret bî.

 97) Ocaxa te kor be.
 98) Ocaxa we ji kok da vemire.

 99) Perçê mezin guliê te be.
 100) Porê te kur be / Por kurê.

 101) Ro li te nerî ava.
 102) Reşayî li mala te bigerî.
 103) Ro li te hilneyê.
 104) Ro lê hilnehato.
 105) Rûdiyê te di qûna te ra werî.

 106) Tu bibelqitî.
 107) Tu bî tu di gorê da nesitirî.
 108) Tu kotî bî.
 109) Tu bî tu rizqê xwe nexwî.
 110) Tu bî tu nebînî.
 111) Tu xêrê ji canê xwe nebînî.
 112) Tu xêrê ji xwe nebînî.
 113) Tu şâ nebî.
 114) Tu têr nexwî.
 115) Tu têr nebînî.
 116) Tu di tora zaliman kevî.
 117) Tû bê kefen herî.
 118) Tu bikevî ber destâ.
 119) Topa ezmanâ li te keve.
 120) Tu bibehecî.
 121) Tu bi devê hirça har herî.
 122) Tu bî tu ber xwe nebînî.
 123) Tu bi çolê kevî.
 124) Tu bi çol û polan kevî.
 125) Topa Xwedê li te keve.
 126) Top lêketo.
 127) Tu xêrê ji mala xwe nebînî.
 128) Tu herî, tu venegerî.
 129) Tu kût û 'utim bî.
 130) Tu kor û 'utim, bî.
 131) Tu biperpitî.
 132) Tu xêrê nebînî bi ciwanî
 (ji strana «Lo Bavo»)
 133) Tu ji ciwaniya xwe xêrekê nebînî.
 134) Tu perçê bî.

- 135) Tu perçe perçe bî.
 136) Tu kur û kem bî.
 137) Tu bî tu di ber destan kevî.
 138) Tu têkevî ber destan.
 139) Tu bi dora mi bigerî.
 140) Tu bi dora xelkê bî.
 141) Tu ji ciyê xwe ranebî.
 142) Tu bî, tu bi avê herî / tu bifetisi / bixeniqî.
 143) Tu bê av herî (di maneya meytê te neyê şûştin e).
 144) Tu çêtî çêtî bî.
 145) Tu sêwî bimînî.
 146) Tu di ber lehiyê da herî.
 147) Toqa Xwedê di hustuyê te keve.
 148) Tu li ber tofana Xwedê herî.
 149) Tu bê war bimînî.
 150) Tofana Xwedê bi ser te de bibare.
 151) Tu ber xwe nebînî.
 152) Tu bê mirad herî.
 153) Tu bî, tu binepixî.
 154) Tu bi parsê kevî / Tu bi xenequtkê kevî.
 155) Tu bi ser bela xwe vebî.

 156) Xêr nedîyo.
 157) Xwedê mala te bişewitîne.
 158) Xwedê Ocaxa te şen nekî.
 159) Xwedê ruhê te bistîne.
 160) Xwedê ruh stendo.
 161) Xwedê li te were xezebê.
 162) Xisxîş bi te bigre.
 163) Xenequt bi te keve.
 164) Xenequt bi te bigre.
 165) Xwedê te bike sosret.

 166) Qebaheta şevê bi serê te de were.
 (ji bo keç an jinan tê gotin)
 167) Qurçimîyo.
 168) Qeda bi te keve.
 169) Qeda û bela bi te keve.
 170) Qırqende bi te da were.

 171) Yeka te nebe dudo.

ar : agir, adir, atas

argün : tiflik, kuçik ; bi taybeti ji bo xwe germkirinê bi kar tînin, ango di súna sobeyê de tê bi kar anîn, lê wek şikil dişibe tiflikê, şömineyê.

atare : kom û komik, êl, (bo musteqbel)

bi te vede : bi te bigire (pê vedan)

bê melle çûyin : Bê qur'an û bê şuştin çûyin, mirin.

çêtî : ji bo goşt, perçê biçük.

çêtî-çêtî : kerî kerî, perçe perçe.

darbest : sedye ; gava ku kesek bimire an birîndar be an ji nexweş be, di súna ku tabût tunebe li darbestan dikin pê digihînin bajêr an nexweşxaneyê.

hustu : stû, sto, esto.

jana zirav : *nexweşîya weremê, tuberkuloz.*

kalîn : *dengê pêz.*

kirasê reş : *di nifirê de maneya şîn girtinê de hatiye bi kar anîn.*

korocax mayîn : *bê zar û zêç mayîn.*

kût û 'utim : *acûze, mirov dikeve ber destan*

kula salê : *tewrek kul, kwînêr, birîn.*

kwînêr : *kunêr, kinor ; babetek kulê, birînê.*

Ma şalê : *Ma insallah, ma sae'ellah (?)*

Mist : *kefa destan, hundirê destan.*

Tîr : *êş, tajan, sancî.*

qırqende : *tewirek nexweşiyê ye.*

xeneqûtik : *kuxika xenequtikê, babetek kuxikê ye, li hin ciyan qenequtik ji dibêjin. Bi taybetî zarok bi vê nexweşiyê dikevin.*

xişxişe : *heywanek ; gava ku bi mirovan vede mirov reş dibe û dimire.*

TÊBINÎ : *ji van nifiran hinek li alî Qerejdaxê têñ gotin hinek jî ji wan ji ali Mûşê ji devê Zinetê ... hatine girtin. 1983-1984.*

PIRTÛKÊN NÛ

Joyce BLAU
Abdullah MERDUX

CIVAKNASÎ - DİROK

BAYEZİDİ Mela Mahmûd, Dab û nerîti Kurdekan, wergerandina Şukriye Resûl, Wezareta rênîşanîyê, idara weşanîna kurdî, rîz no. 75, Bexda, 1982, 98 rûpel.

Şukriye Resûl afirandina Mela Mahmûd Bayezîdi ku di destpêka sedsala XIX de bi serinvisa *e'dat û rasûmetname yê akradiye* hatiye nivîsin werdigerîne kurdîya navendî. Rohelatnas A. Jaba ku Mela Mahmûd baş dinası û ku bi salan jê hînî kurdî bûbû, destnîvisareke ve afirandinê spartibû Pirtûkxana Saltikov-Şedrîn a Leningradê. Kurdinasa Sovyetî Margarîta B. Rudenko di 1963 de sûretê destnîvisarê tevî wergerandina rûsi çap kiribû (*Pravy i Obicay Kurдов*, Moskva, 1963). Wergerandina erebî ya destpêka pirtûkê jî di rojnama kurdî-erebî El-Taaxî (Brati), ku li Bexdayê derdiket, de çap bûbû.

Ş. Resûl ji wergerandina rûsi ya M.B. Rudenko kelk digire û ketiniya wê jî werdigerîne kurdî. Bi saya wî metneke girîng a pêmahiya çandî ya kurdî dikeve ber destê gelek Kurdan.

A.M.

MEZHER EHMED Kemal, Mêjû, kurte basekî zanîstî mêjû û Kurd û mêjû, Bexda, 1983, 384 rûpel.

Ev pirtûka gir ji sê dîrokñasen kurd ên mezin, Şerefyanê Bedlisî, Mela Mehmûdî Bayezîdi û M. Emin Zekî re hatiye ithaf kirin û nivîskarê wê çêtirîn pisporê kurd ê dîrokê ye.

Piştî pêşgotineke dirêj li ser teoriyên cihêreng ên dîrokî û li ser gehînekên mezin ên dîroka mirovahiyê, nivîskar lêgerîneke orijinal û gelek balkêş pêşkêş dike li ser dîrokniyiya kurdî û li ser dîroka Kurdan (rûpelên 133-256). Ew xasme li ser rola zehf girîng a «rojnamevan» û kovar û rojnameyên kurd ên ku ji kovara kurdî ya pêşîn «*Kurdistan*» bi vir de derketine israr dike. Di pirtûknasiyê (rûpelên 257-366) tenê nivîsandinê nivîskarên kurd hene û ew digihîn 976 ketinan. Nivîskar wan li gora zimanê nivîsandinan civandî : bi kurdî (no. 1-574), bi erebî (575-872), bi tirkî, azerî û farisî (873-897), bi rûsi (898-954) û bi îngilîzî, fransizî û almanî (955-976).

J.B.

EDEBIYAT

AL-BASIR, Kamil Hasan Ezîz, Zanistî Awelwata, weşana Akademiya Zanistî ya Iraqê, Destey Kurdî, Bexda, 1981, 124 rûpel.

Nivîskar, ku li Zaningeha al-Mustansiriya 'ya Bexdayê profesor e, li awelwatayê

(teşbihê) digere ji nivîskarêن yunan û latîn ta îro. Pirtûka wî ji 4 pişkan pêk hatiye.

- Awelwata li cem Yunan û Latînan ; awelwata li cem Erebîn ; awelwata li cem Aw-rûpayîyan û, di dawiyê de, awelwata li cem nivîskarên kurd. Bêgûman, pişka dawîn ya orîjînaltir e. Nivîskar bala xwe dide xebatê du zaneyên kurd ên Iraqê : Alaeddîn Secadî û Ezîz Gerdî û xebatê Ewrehmanî Hacî Marif, zimannas û nivîskarê pir pirtûkên rêzimanî û légerinê zimanewanî, hwd ... Al Basir dibêje tiştê ku herdu nivîskarêne pêşin kirine wergerandinê kurdî yên afirandinê biyanî ne, lê xebatê E.H. Marif bergehêne fireh vedikin ji bo nasîna teşeyêne edebî yên kurdî.

J.B.

BEXEW Midhat, Darberû, Wezareta çand û agahdariyê, idara çand û weşanên kurdî, rêz no. 74, Bexda, 1983, 95 r.

Berhevoket helbestan bi kurdiya navendî. Piraniya van helbestênu ku geh bi weznê serbest geh bi weznê klasîk hatine nivîsin xwediyê naverokek siyasi ne. Hin ji wan di kovarênu kurdî yên Bexda de mîna *Hawkari* (1980), *Beyan* (1977, 1978 û 1981), *Nûserî Kurd* (1979) û *Nûserî Nû* (1980) berê derketibûn.

J.B.

BRECHT Bertolt, Jiyanî Galileo, Wezareta çand û agahdariyê, idara çand û weşanên kurdî, rêz no. 71, Bexda, 1982, 224 r.

Vê piyesa navdar a Bertolt Brecht Fuad Mecîd Misrî ji wergerîna erebî ya Bekir el. Şerqawî kiriye kurdiya navendî. Di pirtûkê de du pêşgotin hene li ser jiyana nivîskar û li ser mana piyesa wî.

J.B.

BRÎNDAR, Soro, roman, 1983, 179 r., ciyê çapkiranê ne hatiye diyar kirin (Komara Federal a Almanya ?)

Soro «romana» duwemîn a Brîndar e, bi kurdiya jorîn û bi alfabeaya Hawarê hatiye nivîsin. Xelil û Xezal gundiyan belengaz in, kurekî wan heye, Soro. Keçek dostê wan Çeto heye, navê wê Leyla ye. Herdu malbat biryar didin ku zaroyen xwe bîşînin xwendegêhê. Mamosteyê wan Cemîl Tirkîkî pêşverû ye, zarokan him hînî dîroka gelê wan him jî hînî marksîzm-lenînizmê dike. Soro dibe şoreşger û jiyana xwe ji rizgariya gelê xwe re fida dike. Di nava Soro û Leyla ya bedew de evîneke germ diqewime.

J.B.

BRÎNDAR, Xanê, Keça Kurd, romana kurdî, 1982, 84 rûpel. Ciye çapkiranê nehatiye diyar kirin (Komara Federal a Almanya ?).

Ev «romana», ku bêtir dirûvî kurte-çirokek pê dikevê, di nexweşxanê de hatiye nivîsin. Afirandina pêşin a vî nivîskarê can e. Qala şerê Xanê, keça axayek, ji bo rizgariyê dike. Ewê here serê ciyayên Kurdistanê, teví şerê Pêşmergan bibe. Her çiqas di aliye ziman û stîlê de kêmâsi hebin jî derketina vê pirtûkê bi xwe şayanê pîroziyê ye ji ber ku Kurdên Tirkîyê pir kêm nesrê bikartînin.

J.B.

CIGERXWÎN, Hêvi, weşanên Roja Nû, rêz no. 6, Stockholm, 1983, 186 r.

Hêvi diwana heftan a helbestênu Şêxmûs Hesen (Cigerxwin) e. Helbestvanê neteweyî yê kurd ku vê payizê (22.10.1984) li Stockholmê di 81 saliyê xwe de çû rehmetê. Pêşgotina vê diwanê pisporê folklorâ kurdî Ordixan Celîl, karmendê pişka kurdî ya Enstituya Rohelatnasî ya Leningradê, nivîsiye.

Babetên helbestan cihêreng in û teşeya wan klasîk e. Di afirandinê xwe de helbestvan dîroka gelê kurd, ji Şerê Cihanî yê Yekemîn bi vir de, dibêje. Lê ew wisa jî guh didêre têkoşînên gelên Cihana Sêwemîn ji bo rizgariyê û di gelek ciyan de qala mîrxas û şehîdên neteweyen din dike.

Mirina Cigerxwin ji bo hemû Kurdan xemgîniyeke mezin e.

J.B.

DUHOKÎ Xelil Mihemed, Te çi viya û min neanî ? Wezareta çand û agahdariyê, idara çand û weşanên kurdî, rîza helbestî, no. 24, Bexda 1982, 136 r.

Berhevoka helbesten şâirekî Duhoki, bi kurmanciya jorîn û tîpêne erebî hatiye nivîsin. Hin ji van helbestan berê di kovara Hawkarî, di 1975-1977 de, li Bexdayê derketibûn. Helbestvan *nameyek nedîti ya Che Guevara* dixe helbest û û helbestek şâire Iraqî yê mezin Abdul Wahab al-Bayatî werdigerîne.

Di dawiya vê dîwançeyê de ferhengokek kurmanciya jorîn - kurmanciya navendî hatiye danîn.

J.B.

FEYZÎ BEK Emîn, Encumenî edîban, Akademiya Zanistî ya Iraqê, Destey Kurdî, Bexda, 1983, 177 rûpel.

Komîta ji bo Edebiyat û Pêmahiya Çandî ya Kurdi ya Akademiya Zanistî ya Iraqê, Destey kurdî vê antolojiya yekemîn a edebiyata kurdî bi kurmanciya xwarê tevî têbinîyen gelek girîng ji nû ve çap dike.

Emîn Feyzi Bek (1860-1923) zaneyek bû, pirtûkên matematîk û zanîstiyêne xwezayî nivisiye. Wî gerînendeyê idara leskerî ya Bexdayê tayîn dikin û paşiyê dibe waliyê Silêmaniyê. Pey Serê Cihanî yê Yekemîn besdarî pêşveçûna netewaperêziya kurdî li Iraqê dibe. Hindê bîyar dide ku berhevoker afirandinê çêtirîn ên helbestvanen kurd, ku hemû bi eslê xwe ji navçeya mîraniya Babanan in, çap bike. Ev berhevoka 113 rûpelan di 1920 de li Stenbolê derdikeve û helbestine helbestvanen han dicivine : Mewlana Xahid (1799-1826), sofîyê navdar ê tariqata Neqşebendîyan xiste nav Kurdan ; Nâli (Xîzîr Ehmedî Şawîs, 1800-1856), Şêx Riza Talebanî (1837-1909) ; Ahî (Salih Efendi) ; Mewlewî (Ebdul-Rehîm Mela Seîd, 1806-1882) ; Kurdi (Mistefa Mehmûd Beg Sahibqîran, 1812-?) ; Salim (Ebdul Rehman Mihemed Beg) Qerecehenmî, 1800-1866).

Li pêş helbesten çêtirîn ên her helbestvanî kurte jînenîgariyek wan hatiye danîn.

A.M.

GOGOL N.V. û PÜŞKİN A.S., Lût û kirêwe, Bexda, 1983.

Ev herdu çîrokên Gogol û Püşkin, Ewirehmanî Hacî Marif ji rûsi wergerandiye kurdî û Mihemedê Mela Kerîm çav li wergerandinê gerandiye. Her du zat jî endamên Destey Kurdî ya Akademiya Zanistî ya Iraqê ne.

A.M

HAMID Sadiq, Govend û behî, Wezareta çand û agahdariyê, idara çand û weşanên kurdî, rez no. 59, Bexda, 1980, 68 r.

Dîwana klasik a helbestvanekî can ê Badînânî. Ev xezel û qesideyêne delal qala evinê dikin û di salên 1970-1980 de bi kurmanciya jorîn hatine nivîsin û bi alfabeşa erebî ya Kurdîn Iraqê û Iranê çap bûne. Piraniya van bîst û çar helbestan di 1977 de di kovara Hawkarî de derketibûn.

Têbiniyênu ku li jêr rûpelan hatine danîn peyv û gotinan bi kurdiya navendî izah dikin.

J.B.

HAWAR, Helbijarde, no. 2, 1982, 150 rûpel. Ciye çapê ne hatiye diyar kirin.

Hawar leqebehê mamoste Mihemed Resûl e. Ev helbestvan niha li Ingilterê li sîrgûnê dijî û li ser Pîremerd kitêbek gelek hêja nivîsiye ku ew di 1970 de li Bexdayê çap bûye. Gelek helbestan nivîsiye û hin ji helbesten wî yêne klasik û nûjen di berhevoka wî ya pêşin *Yadî Niştiman* de derketine.

J.B.

HAWDENG. Şî'r û çirok, Hewlîr, 1983, 66 r.

Hawdeng berhevokerke helbest û kurte-çîrokên nivîskarêne can ên ku, bi pîranî, cara pêşin berhemên xwe didin çapê ye : Rostem Bacelan, Sebahet Taher, Azad Heme Şerîf, Enwer Mesîfi, Ezwad Ref'et, Qasim Şîrwan, Ferhad Pîrbal, Mohsîn Aware, Celal Berzen-

cî, Haşim Serac, Selah Umer, Ebas Ebdullah Yûsif, Nejad Ezîz Sûrmê, Mewlûd İbrahîm Hesen.

J.B

HEJAR, Dîwanî Arîfî Rabbâni Şêx Ahmedî Cizîri, Meşhûr bi Melayê Cizîri, Tehran, 1982, 626 rûpel.

Dîwana şairê Sofî yê mezin Melayê Cizîri heta niha çend car çap bûye. Çapa spehîti-rîn hê jî ya Von Hartmann (Berlin, 1904) e. Demek pêş mirina xwe ya bêwext Sadiq Bahâedin Amedi di 1977 de li Bexdayê çapeke bedew a şerhkirî ya wê derxistibû. Hejar, di pêşgotina xwe de mikur tê ku ji vê çapê gelek kelk girtiye. Çapeke din a Dîwanê tevî şerh û wergerandina erebi di 1959 de li Qamişliyê derketibû. Ew bi destê Ahmed bin al-Mulla Mihemet al-Zafangî, miftiyê Qamişliyê hatiye pêk anîn (Lê di warî de minaqe-şeyek ciddî heye û gelek kes difikirin ku xwediyê vê xebatê zaneyê mezin Mulla Abdul Selam e ku di 1958 de, angò salek pêşîya derketina kitêbê, wefat kiriye). Hejar, ku navê wî yê rastî Abdulrahman Şerefkendî ye û di 1922 de nêzî Bokanê hatiye dinê, *Dîwanâ Melayê Cizîri* wergerandiye kurdiya navendi. Bi vî awayî ewê bi sedhezaran Kurd dikarîn vê şaheserê bixwinin. Di ketiniya xwe de Hejar dinivise Kurd çawa tevkariya edebî-yata oli ya İslâmî kirine û wê dewlemend kirine.

A.M

HEWRAMÎ, Heme Kerîm, Xatû Kilawzer, çapxana al-Hawadis, Bexda, 1982, 223 r.

Ev piyesa şanoyî bi alikariya Sekreteriya Giştî ya ji bo rênîşanî û ji bo caniyê çap bûye. Evîna Xatû Kilawzer ketiye efsanê. Ew xwişka Şah Abbasê Sefewî bû û ji bo girêda-na peywendiyek xurt bi xanedana kurdi ya Ardalan, Şah wê dabû Xan Ahmed Xan, mîrê Ardalan. Lê ev zewaceke bedbext bû. Xanima canik dil dide Yuso Aske, helbestvanekî şareza (afîrandinê wî yêñ bi goranî gîhiştine heta îro) û sazbend (xweş li tarê dixist). Heme Kerîm Hewramî sentezeke guhartoyen efsanê dike û jê piyêseke şanoyê çê dike. Di hin ciyan da şerê gelê kurd xwe diyar dike. Ev piyes heta niha nehatiye leyistin.

J.B.

KEMAL Yaşar, Karîte ya ew dîwî çiya, ji tirkî wergerandiye Şukur Mistefa, Bexda, 1983, 431 rûpel.

Bi alikariya Sekretariya Giştî ya ji bo rênîşanî û ji bo caniyê ya Navçeya Otonom a Kurdistanê, Şukur Mistefa vê cildê pêşin ê sêwergiyê navdar a Kemal bi zimanekî gelek spehi kiriye kurdiya navendi. Di vê sêwergiyê de du pirtûkên din, «Erd hesîm, esman sıfir» û «Tovê nemir» jî hene û ew di ber wergerandinê de ne. Şukur Mistefa pisporê wergerandinê zimanê tirkî ye û berê «Efsana Çiyayê Agiri» (çapa Akademiya Zanistiya Kurdi, Bexda, 1976, 178 rûpel) jî bi kurdiya navendî derxistibû.

A.M.

KURDO Qanatê, Tarîxa Edebiyata Kurdi, Cild 1, weşanên Roja Nû, Stockholm, 1983, 192 rûpel.

Qanatê Kurdo di sala 1909 de li Qersê hatiye dinê û navdartinî zaneyê kurd ê Yekîtiya Sovyetî ye. Ewî çend deh salan li Leningradê mamostayıya zimanê kurdi kiriye û beşa kurdi ya Enstituya Gelên Asyayê a Leningradê idare kiriye. Xebatên wî yêñ li ser zimanê kurdi (ferheng, lêgerinê zimanewanî, rêziman) û li ser edebiyatê digihîn hejmareke bilind.

«Tarîxa Edebiyata Kurdi» a ku derketiye ji sala 1975 bi vir de dihate amade kîrin. Di vê cildê ku bi kurmanciya jorîn û alfabeşa Hawarê hatiye nivîsin de ketinîyeke dirêj û fêrker xebatênu ku ji pirtûka navdar a Alexandre Jaba, *Recueil de notices et récits kourdes* (St. Pétersbourg, 1980) pê ve li ser edebiyata kurdi hatine pêk anîn, bi kurtî, dinasîne. Dû re, nivîkar xebatênu ku li Rûsyâ û li Yekîtiya Sovyetî çap bûne bi dora dîrokî pêşkêş dike û li ser rola çapemeniyê (kovar, rojname hwd...) di belavkirina çanda kurdi dimîne. Ew hemû agahdariyênu ku di Şerefname ya Şerefjanê Bedîsi (dawiya sedsala XV. Ia) û di

seyahetnameya Ewliya Çelebî (sedsala XVIIa) li ser helbestvanen kurd hatine dayin tine bire. Dawiye ew qala pêşêveçûna edebiyata kurdî li Iraqê dike.

Ev cildê pêşin li ser jiyan û afirandinê helbestvanen Kurdistana Bakûr in : Elî Herîrî, Melayê Batê, Feqiyê Teyran, Melayê Cizîrî, Selîm Sulêman, Ehmedê Xanî, Xaris Bitlisî, Pertew Bege Hekarî, Şêx Xalid, Siyahpûş, Cigerxwîn, Osman Sebrî û Qadrî Can.

J.B.

NALBEND Ehmed Emîn, Qeftek ji hozanê Nalbendî, wezareta çand û rênîşaniyê, idara çand û weşanen kurdî, Bexda, 1981, 273 rûpel.

Se'îd Dêresî afirandinê helbestvanen sofi Ehmed Emînê Nalbend, ku bêtir bi leqebe Muxlis navdar e, berhev kiriye û tevî ketinî û têbiniyan çap kiriye. Ev helbestvan di navbera salen 1880 û 1890 li Baniernê hatiye dinê û di 1964 miriyê wî hatiye dîtin (Gelo hatiye kuştin ?) Ew navdartirînê helbestvanen Behdinan ên heyama me ye û miridê tariqeta Neqsebendî bû. Di helbesten wî de hilmeke dindari û hesten (hissêن) netewi yên xurt xwe nîşan didin. Xalid Huseynê Zaxoyî berê li Duhokê, diwanekê Muxlis çap kribû (cild 1, 1971, 173 r ; Cild II, 1972, 86 r.) Sadiq Bahadînê Amedî ji behseke girîng a berhevoka xwe *Hozanvanet kurd* (Bexda, 1980, rûpelên 533-583.) ji wi re veqetandiye.

Di vê çapa nû ya afirandinê Nalbend de helbestine heya niha çapnebûyî hene.

J.B.

MAH ŞEREF XANOM, Divanê Mastureyê Kordestanî, çapker Ahmed Karemî, çapa duwemîn, Tehran, 1983, 145 r.

Divana Mastüreyê Kordestanî cara pêşin di 1925 de li Tehranê bi destê Yehya Marifet û Asadullahxanê Kordestanî tevî pêşgotineke Yehya Merifet û paşgotina Abolbeqa Mo'temedî Kordestanî çap bûbû. Di pêşgotinê de bi kurtî jînenîgariya helbestvanê jî hatibû nivîsin.

Mastûre (1805-1847), bêgûman, yek ji bedewtirîn sîmayen jinî yên edebiyata sedsa-la XIX a ye. Mêrê wê, Xosrow Xan, Waliyê Ardalanê, jî helbestvanekî navdar bû. Ew di bin leqebe Nâkân bi goranî (zimanê edebî yê Kurdên wê heyamê) dinivisi. Demek dirêj wilo dihate bawer kîrin ku Mastûre tenê bi farisi nivîsiye. Xweşbextane berî maweyek gelek helbesten wê yên bedew bi goranî hatine dîtin. Helbestvanê mezin Nâli ku du dîwana Babanan, hemberên dîrokî yên xanedana Ardelanan, dînia heyranê Mastûrê bû û qasîdeyeke şoxî li ser wê nivîsiye.

Mixabin di vê çapa nû ya dîwana Mastûrê de kîniyasi pir in. Xeletiyen çapê gelek in û têghiştinîya metnê diguhîrinin. Ne pêşgotin ne jî paşgotin ên çapa pêşin di ya nû de nehatine danîn û ya xerabtir hemû helbesten goranî nexistine diwanê.

A.M.

MUHEMMED TAHIR Enwer, Ev çirok bi domahî nehat, Bexda, 1983, 55 r.

Heft kurteçirok bi kurmanciya jorin û tipen erebî. Weşandina çirokan bi kurmanciya jorin li Iraqê timî bûyerek e, nivîskar bi dijwarî dikarin çapkerek peyda bikin. Ev berhevoka piçûk jî bi saya alîkariya Sekreteriya Gîstî ya ji bo çand û caniyê çap bûye. Di dawîya wê de ferhengokeke piçûk kurmanciya jorin - kurmanciya navendî heye.

A.M.

QAZÎ, Ehmed, Baqebêñ, 1981, 74., r. ciyê çapê nehatiye diyar kîrin (Tehran ?).

Nivîskar, ku li Mahabadê hatiye dinê, ji malbata mezin a Qazîyan e. Ew xwe daye wergerandinê farisi û kurdî. Hin afirandinê Pearl Buck wergerandiye farisi. Wî wisa jî tevî braxweyê xwe Mihemed Qazî romana İbrahim Ahmed, *Janî Gel*, ku di sala 1972 de li Suleymaniye çap bûbû wergerandiye farisi.

Baqebêñ çirokeke dirêj e û pir xweş hatiye nivîsin. Rojek, nivîskarê çirokê li Mahabadê li muayenexana doktorê dranan li hêviya dora xwe ye. Menzel tiji xelk e û germ germ sohbet dîkin. Şoreşa Islamî hê di destpêka xwe de bû û gelek hêvi jê dihate kîrin.

Nivîskar hin ji van axaftinan dicivîne û bi vî awayî taswîreke rind û gelek hînker a pêşve-çûna bûrjûwaziya kurdî a Iranî û besdariya wî ya siyasetê dike.

A.M.

SERRAC, Ebdulla. Baram nawêk hebû, weşana Akademiya Zanistîya Iraqê, Destey Kurdî, Bexda, 1982, 82 r.

Sêzde çirok ên bi kurdiya navendî hatine nivîsin. Ev çîrokên «pêkahinêr» qala jiyana rojane ya gundi û bajarvaniyên kurd ên Iraqê dikan ; bi uslûbekî bedew û zimaneki gelek xwerû hatine nivîsin.

J.B.

ŞEMO Ereb, Dimdim, Stockholm, 1983, 206 r.

Wesanên Roja Nû ku ta niha heft pirtûkan derxistine romana navdar a Ereb Şemo (1898-1979), *Dimdim*, ku di 1966 de li Erivanê (wesanên Hayastan, 216 r.) derketibû ji alfâba kîrilîk qelibandine tîpêñ latîni. Destana *Dimdim* qala berxwedana mîrxasane ya Kurdan, di bin serokiya şerkarekî navdar Emir Xan, Xanê-çeng-zérin li dijî leşkerên Şah Abbas ku dorê li kela Dimdimê girtibûn dike.

Di 1975 de Şukur Mistefa Dimdimê qelibandibû kurdîya navendî (wesanên Akademiya Zanistî ya Kurdî, Bexda, 366 r.).

J.B.

UMER Feryad Fazil, Awazî gerûyekî zindû, Berlin, 1982, 117 r.

Beşê zimanê Iranî ê Zanîngeha Azad a Berlinê vê berhevokê çap kiriye. Hin ji helbestan li Iraqê hatine nivîsin û di kovara Nûserî Kurd li Bexdayê çap bûbûn. Piraniya helbestan bi bandûra xwe siyasi ne.

J.B.

UMER Feryad Fazil, Roşnayî le dengewe, Berlin, 1983, 218 r.

Beşê zimanê Iranî ê Zanîngeha Azad a Berlinê vê berhevokê çap kiriye. Tê de helbesten nûjen, bi wezne serbest hene û ew li dervayî welêt hatine nivîsin. Ji bo ifadekirina romanên xwe helbestvan remzan bikar tîne.

J.B.

FOLKLOR

SECADI Alaedîn, Rîştey mirwari, cild VIII, Bexda, 1983, 184 rûpel.

Alaedîn Secadi ji 1957 bi vir de methelok û çirokên ji folklorâ navçeyên cihêregê ên Kurdistanâ navendî helbijartî çap dike û ev pirtûk cildê VIII ê berhevoka wî ye. Çirok hemû bi zarava û devokên xwe yên eslî hatine nivîsin - hewlêri, sineyî, hewramî, jaffî ...

Nivîskar bi awakî giranbiha xizmeta belavkirina çand û folklorâ kurdî dike.

A.M.

JINA KURD

GARNETT Lucy, Afretî kurd le Tirkîye, ji îngilîzi wergerandiye Ezîz Gerdî, Bexda, 1983, 84 rûpel.

Ezîz Gerdî behsa yekemîn a besê sêwemîn ê pirtûka gir a Lucy M.J. Garnett, *The Women of Turkey and their folklor*, London, 1891, rûpel 113-189 wergerandiye kurdîya navendî. Ev behs bi temami li ser jina kurd li Tirkîyê, li ser rewşa wê û karêñ wê ye. Xebateke berbiçav û balkêş e.

J.B.

HANSEN Henny Herald, Jîyanî afretî kurd, wergerandina îngilîzi ya Ezîz Gerdî, wesanê Akademiya Zanistî ya Iraqê, Destey Kurdî, Bexda, 1983, 436 rûpel.

Ezîz Gerdî vê pirtûka navdar a etnologa swêdî ku Nationalmuseet a Kopenhagê di 1961 de çap kiribû ; wergerandiye kurdîya navendî. Gerdî qîma xwe bi wergerandîne tenê ne anîye, gelek têbîniyên isabetdar bi ser ve kiriye û bi vî awayî hin «xeletî» û jîbîrkirînên Stî Hansen temam kiriye.

Naci Abbas ji pirtûkeke din a Stî Hansen, *The Daughters of Allah*, London, 1960 wergerandibû kurdî (Bexda 1980).

A.M.

(dûmahiîk heye)

FOLKLORÊ MA RA

MALMISANIJ

I - DEYÎRÎ

Nî heme panc deyîrê cêrenî mi fekdê Nûriyê Gêlicî ra girewti, nuştî.

1 - XUMXUME¹

Xum-Xumê² to rî vana
Ti nêba ez nêvana
Ti nêba ez nêvana³
 Dayikta 'eyla nana
 Maya 'eyla ver dana
 Çimsiyaya-n xwi rî ana
Darê mezlandê ma kewr i⁴
Xumî yenî hewadê hewrî
Çimsiyay î, senegewr î
 Xumê Gêldê⁵ ma hewt î
 Heme hewt kelawçewt î⁶
 Piy cînî manenî mewt î

1. Vatişbê Nûri gore na deyiri Gêl ra Zikîfi (Zülküf Karakoç) veta.

2. Yew yew ca di Xim-Ximê vajiyéno.

3. Dormarê Piran'î di tiya ra pey enawa zî vanî :

 Xim-Ximê haşa vanî
 Keyneka bêtîmanî
 Geyrena dormey banî.

4. kewr : dara ki pîr bîya û asan şikiyêna, kewir.

5. Gêl : Egil

6. kelawçewti : Dormarê Gêlî di (mesela Qizlan di) cenî koftya xwi kiştkanî bestentî. Tiya di cenîyan ra vajiyawo kelawçewti.

Zikîf Beg (Zülküf Karakoç), key mîreyanê Gêlî ra û Îsmaîl Begî bi. Zeweijnaye bi û zerri devisti bî Emo y. Xanimi (waya Emoy), mabênenê Zikîf û Emoy virazena. Emo zi Zikîfî ra hes kena.

Biray Emoy, Hecî Husnî Beg, ki şono hac, Emoy ra vano : «Vinde, ez şona hec yena, ti kamî biwaza ez to dana ay.» Labrê waxtano ki hac ra yeno, nişka Emoy dano Bedrî Beg'î. Bedrî Beg zî baba Zikîf Begî ra, key mîreyanê Gêlî ra wo.

Çiqas ki deyîranê zерри, hina vişî cenî waştanê xwi sero vejenî zî, na deyîri Zikîfî eṣta xwino waṣṭa xwi Emoy ser. Vatişan gore Zikîfî sowbî deyîri zî vetî bî: Zikîf 1966 (yan zî 1967) di merdo. Emoy yê ra pey merda.

Em-Emo, Emo Emo

Em-Emo, Ema mîran

Engura (ungura) bindê Hîran

Werê kalan û pîran.²

Ne ti ba, ne name bo,

Ko Zikîf to sero debo.

Mexreb o, ha mexreb o,

Mexrebo, wextê pesî,

Day pêro 'elbi w fesî,

Ax limino bêkesî !

Kura mendo babay Hesî ?³

Emîna tevişo yesîr.

1. Yew yew qala na deyîri tay cayan di bedelêna. Meselâ tay vatişan di nî qalî zî vajiyêni :

Weriştî filankesî

Roniştî bêbankesî

Emoy va : «wardî, bes o !»

.....

Emoya lewenteniki

Qinî kena gurmiki

Cillan kena villiki

.....

Zikîf yeno bi gamî

Keşa cê pûrî vamî ...

2. B'ewnî : Zaza-Kürt Türküleri: Deyr, M.Tayfun, Özgürlek Yolu, N. 19, Ankara, 1976, r : 73

Em-Emo, Ema mîran,

Engura rezdê hîran,

Çadira serdê bîran,

Werê kalan û pîran.

3. Babay Hesî : Zikîf

*Em-Emo, Emo- Emo
Em-Emo, Ema mîran
Engura (ungura) bindê Hîran
Werê kalan û pîran.*

*Xendeqê ma bi vay o,
Peyew verên Paşa⁴ yo,
Fanos destâ berqa yo,
Kîye bi kîye geyrayo,
Marey Emoy birnayo.*

*Kuçey Kilisi⁵ teng i
Zikîfi venday di veng i
Çillo⁶ y çinay tay nengî
Emoy va : «Qalê vengî».*

*Em-Emo, Emo Emo
Em-Emo, Ema mîran
Engura (ungura) bindê Hîran
Werê kalan û pîran.*

*Bexçê Tekya⁷ yew şiq o,
Bekçîbaşî sadiq⁸ o.
Guro ki Xaliq biko,
Qul Zikîfi rê se ko ?
Deli Maya Bayramî,⁹
Kena niştê yû qamî.*

*Hec-Hecî, Hecî, Hecî !¹⁰
Wirdî gillîyê to vecî !
Hec-Hecî, Hecî hecî,
Hec-Hecîyo tentene,
Erişî vista mengene.*

*Em-Emo, Emo Emo
Em-Emo, Ema mîran
Engura (ungura) bindê Hîran
Werê kalan û pîran.*

4. *Paşa* : Yew mîrdimê Bedrî Begî yo (Bedrî Beg mîrdey Emo yo).

5. *Kilise* : Gêl di, mehla Biné Dizi di verî yew kilisey Armenîyan bi, nika rijiyaye wo.

6. *Çillo* : Yew Armenî yo. Ciranê Emoy bi.

7. *Tekya* : Beyntaré Gêlî û Roy Deşta Hajîyan (Dicle) di, roy ver di yew dew a ki bostanê ya zafî.

8. *Sadiq* : Xal Sadiq (Sadiq Dayî), kirdanê Gêlî ra bi.

9. *Maya Bayramî* : Waya Emoy, Xanim a (namey lajê yay Bayram bi).

10. *Hecî* : Hecî Husnî Beg.

*Ti yena bê ez to bera,
Ti nîna ez to ra bera.
Zikif Bego dikanan di,
Sewlê surê lingan di,
Misheb (mishef) serê çokan di,
Cixara miyanê giştan (lewan) di.*

3 - XECO KEYNA M'

Na deyîri di, mari (may) û keyna (Xeco) veracê qalî kenî :
(Maya Xeco) :

- Xec-Xeco, Xeco Xeco,
Xeco keyna m' ano meke !
Xeco keyna m' bê bala marda xwi bide,
B'ewnî Huso Dirah wano¹ çîyo ?
Wano : «Ez biz û mêşnanê xwi weye kena
Xecoyê Mehmudî² rî veynena.»

(Xeco) :

- Serê kêdê ma tehran³ o
Binê kêdê ma tehran o.
Cor di yeno qaymeqamo,
Eno torinê Kê Began o.

Serê kêdê ma ro yo,
Binê kêdê ma ro yo ;
Cor di yeno Eybê Xaloy o,
Heway meşka doy o.
Ez nêgêna Eybê Xaloyo,
Ez nêgêna Eybe Xaloyo !

1. wano : vano

2. Mehmud : Gêl ra Mehmudê Roqi (Mahmut Fidan)

3 tehran : zinar.

4 - XECO

Xec-Xeco, Xeco Xeco,
Xec-Xeco, Xeco Xeco,
Bê ma sêrî eno heta,
Awka bîrdê ma nobet a.

Yew gilanga mi Xecoy het a,
Xeco nara cinabet a.
Sarî ma sero veta,
Deyri nîya ki zerbet a.

5 - ZEWNCÊ ÇIMBELEKÎ

Na deyîri erziyaya 'Ubeyd û Axay ser. 'Ubeyd û Axa, Pîran ra, key Axay ra yî ; Herbê Şêx Si'îdî (1925) ra pey perraye bî, mehkum bî. Roji, gerrey Bekê Haci Axay (Bekir Kılıçoglu) ra pey, nuzdî Gêli di Kurra Waran ra cendirmey Tirkan na zewnca birayan kişenê. Vatişbê Nurî Gêlici gore, Eminâ (cenîya Mehmê Çawusî), na deyîri eşta yînî ser. Deyîri ra fahm beno ki ay wextan hima Şêx Evdirehîm (Şêxo Siya) weş bîyo. Zanêno ki Şêx Evdirehîm Herbê Şêx Si'îdî ra pey, gelek zeman binê xeti (Sûriya) di maneno, dima ageyreno Kurdîstanê Tirkîya. Labrê eskerê Tirkan nizdî Bismîlî di, Salat di Şêx Evdirehîm û embazanê yê ca kenê û ayca di yînî xelî mîyan di ganbo ganî veşnenê. Tay Kirdê dîndarî bawer nêkenê ki Şêx Evdirehîm weyra veşawo, vanî «O xelesiyawo, hima weşo».

Rayirê Deredê Xenaqî¹ hok i-mok î,
Kurra Waran² ra kewtê zewnçê çimbelekî.
Eno yuzbaşîyo bêiman o,
Vista zewnca birayano.
Sefer³ biray mi, bê ma sekî,
Ma enê caya xwi hesir kî,
Ma veynî ma cay Şêxê Siyay⁴ kura ca kî,
Ma qesasê birayanê xwi icra kî.

Ena Kurra Zengîyan⁵ qay lerzaynî,
Axayê birayê mi, pa çok daynî.
Bêliga cendirman xwi ser tadaynî.
Bêliga cendirman xwe ser tadaynî.

1. Derey Xenaqî : Beyntarê Dêwa Selbetin (Kalkan) i ú Gêl (Egil) i di yew dere wo.

2. Kurra Waran : Beyntarê Dêwa Selbetinî ú Gêli di yew kurr (kîr) a.

3. Sefer : Pîran ra Sefer (Sefer Ağar).

4. Şêxo Siya : Şêx Evdirehîm (biray Şêx Se'îdî).

5. Kurra Zengîyan : Beyntarê Dêwa Selbetinî ú Gêli di yew kurri.

Serî Pîrani⁶ bi keyek î,
Binê Pîrani bi keyek î,
Têro şonî-yenî Key Hesdê Bekî,
Esker yeno lek⁷ bi lekî.
Eno Bek⁸ şiy kerdi zûri oynî yû dekî
Tebîştiş (Tevîştiş) day zewncê çimbelekî.

6. Piran : Yew qezay Diyerbeki, Dicle.
7. lek : des hinzari (10.000)
8. Bek : Bekê Hacı Axay (Bekir Kılıçoglu).

II - VATEY VERİNAN¹

- 1 - Aşik kelibiyeno, dawula xwi dirmeno. (G)²
- 2 - Aşik ki kelibe, det dirmeno.
- 3 - Awka çengan, k ... keynekan, firingê neheyen ; kê tira mird nêbenî.
- 4 - Aya ki destan kerda, may û piy nêkerda. (G)
- 5 - Balî, kulinçî ra vecêna, vana : «Qiya tû çend hera ya:» (G)
- 6 - Bi istorbê şarî, kê tim peye manenê (kê tim peyo). (G)
- 7 - Biza kermijin, serçime ra aw wena. (H)
- 8 - Bizi bi bizeyba xwi (Bizi ki biz a), hetana ki cay xwu duz nêko nêro-kwena.
- 9 - Camêrdo xirab, wa çinni bo.
- 10 - Çew nêşkeno qismetê çewî boro (biwero). /Çew nişno qismetê çewî boro.
- 11 - Çiy mîrdimdê çikusî şarî rî maneno.
- 12 - Daruy heme çî esto, daruy mergî çinno.
- 12 - Dayî û bawi yew ray yeni dîna.
- 13 - Dela ki boça xwi nêweşono kutik dimi nêşono. (G)
- 14 - Destê hukmatî derg o. (G)
- 15 - Dêso ez to rî vana, veyvekî ti b'eşnawi. (G)
- 16 - Dizd bibo şewê tarî zav î.
- 17 - Ebi yew guli wesar nîno.
- 18 - Ecelê merşî ame, perê nexşînî neyenî pa.
- 19 - Ecelê morcela bêro, pelî neyenî tira. (H)
- 20 - Ecelê meysi yeno, kuwena germda gawanî miyan. (G)
- 21 - Ella bid' nêvon ti Xelîl Meh Mella y, nêmey xet ra dano. (H)
- 22 - Emanet, daro qiyamet. (G)
- 23 - Erjelê bizi ame, şona nanê şanî wena.
- 24 - Erjelê mijlowri hame perrê ja yenî.
- 25 - Fekê luy unguri nêresa, va : «tîrş a»
- 26 - Fekê lû tirêni nêresa, wana : «werda to naw, çendi solin o ! ». (G)
- 27 - Fekê şarî nêbestêno. / Fekê şarî nê tewşêno (nêderzêno).
- 28 - Gan di camêrdey nêbena.
- 28 - Gi bi vowri nêlimiyêno. (G)
- 29 - Goşt û nengu céra nê aqitiyêni.
- 30 - Hefs, cay camêrdan o. / Hefs cay camêrdî yo.
- 31 - Hekim kam o ? Ay o ki darbi piro ginaya.
- 32 - Heleb durî yo, her û nerdiwanî zî dur i ? (G)
- 33 - Heq û neheq têdesti (têdest di) gaz-gaz a.
- 34 - Hermuşk timo herri erzeno xwi ser. (M)
- 35 - Herra cenî û mîrdî yew ca ra ya.
- 36 - Heş ki pîr bi, leyîrê yê (yey) pey hakanê yê (yey) kay kenî.
- 37 - Heta (heya) nêcawîyo, tiro nêşono. / Heto (Heyo) nêcawîyo, nêşono diwar.
- 38 - Hewn û merg biray cê yî. / Hewn û merg yew î.
- 39 - Hewt asnavê herî biy, şîyo roy (aw) miyan, heme xo vîrî kerdî.

1. *B'ewni : Zaza-Kürt Atasözleri, Armanç, No : 5, 6, 7, 8, Stockholm, 1979.*

2. *Nî vatanê verênan ra, vişanê dormarê Piran (Dicle) 'i ra ; ay bînî, ze ki ma yînî verdi nawito, nî cayan ra gitiriyayê :*

(C) : Çermûgi (Cermik) û Dowa Diktol'i ra

(G) : Gel

(H) : Hêni (Hanî)

(M) : Ma'den (dewa Kêzin'i ra).

- 40 - Heyana ki lêli nêbo zeng nêbena. / Hetana ki lêli nêbo zengi nebena.
 41 - Hukmat her bo (bibo) zî bere (bider) mewenîşe.
 42 - Hûmay kûy xwi veyneno vewri piro varnero.
 43 - Kamo ki estorda şarî wenîstewo, timo peyewo.
 44 - Karê eyro (ewro) neverdi nimajî (siba).
 45 - Karê wextî, paşay textî.
 46 - Kerga veşani, xwi karî hebî di veynena.
 47 - Kergi aw wena, xwi ra cor Hûma (Elle) y ra hewnêna.
 48 - Kerra girani cay xu da.
 49 - Kerra xişni 'elametê pironêdayîşî ya.
 50 - Keye, qûla pirjin a.
 51 - Kê çi biko (bikero), kê ay veyno (vîneno).
 52 - Kê çindi tê da, indi zirar tira vejêno. / Kê çindi ki tê dî, indi bûy tira vecêna.
 53 - Kê kerd, kê veyneno.
 54 - Kê mîrdimê bê'arî di serî nêşonî. / Kê nişnî mîrdimê bê'arî di serî şêrî.
 55 - Kê nani geyray, lete kê desti (dest ra) şono.
 56 - Ko çendî berz bo, linga şuwani ta kuwena. (G)
 57 - Ko çiqas berz bo, ninga kê ta kuwena.
 58 - Korî ra va : «To rî çi ?», va : «Mi ri di (di hebî) çimî»
 59 - Kutik, gostê kutikî nêweno.
 60 - Kutik, pay kutikî nênano.
 61 - Kutik qatqatî ra ci fa'm (fahm) keno.
 62 - Linga xo henda cilda xo derg ki.
 63 - Luya geyraya, şêrdê kewtî ra zanayêr a. (G)
 64 - Luya geyraya, şêrê vindertî ra hewlêr a.
 65 - Ma hemê ganî bimrî. / Ma pêro yewroj mirenî.
 66 - Mal, ey rojê siyay o.
 67 - Malo helal, vin nêbeno.
 68 - Mal, qandê rojê siyay o. (C)
 69 - Mar -zî- aw sero kê di nêdano (nêdono).
 70 - Maya kê timo laj nê ana (lac nê ona)
 71 - May hewt hebî lacan (lajan), siloy sero merda.
 72 - Merrî nêşîya şêro qul, gezî bûçtey xwu ra bestî.
 73 - Meruy awki, rayirdê awki di (aw ra) şikêno.
 74 - Meruy awi, rayirdê aw di şikêno.
 75 - Meyney kir d' xwi bilêsi, minet mew'. (H)
 76 - Mîrdim didz bo, şewê tarî zav i.
 77 - Mîrdimo neheq (xayîn), mîrdî nêweno.
 78 - Mêşna erqî ser di perrena, bîzi vana : «Qîya ca çindi sipî ya.» (G)
 79 - Mird hayî veşanî nîyo.
 80 - Mire pirdi b' sera meşo, qatiri b' pey ra meşo (paşkil dono to ro, vera meşo gaz dono to ro). (H)
 81 - Mûş çiqas herri bïkeno, xwi ser dareno.
 82 - Nanê to çantedê imbazî di bo, ti timo veşanî. (G)
 83 - Naşî ha firra, ha zirra.
 84 - Nefs, kê fineno hefs, / Nefs, kê dekeno hefs.
 85 - Nefs vano : «goşt», ti vaje (vacî) : «oşt ! »
 86 - Ninga (linga) xwi goreba cilda xwi derg ki.
 87 - Nîsanî, çilki bi kîsanî.
 88 - Panj giştî, yew nîy. / Pong giştî yew nêbenî.
 89 - Payedarey (Bitirey), gay citi rî nêmanena.
 90 - Pers pers, kê şonî Qars.
 91 - Pey bi yew guli wesar nîno.

- 92 - Peydi kê pirda padışay nanî.
 93 - Poşmaney pere (fayde) nêkena.
 94 - Qala camerdan yew (yew ray) a.
 95 - Qala weşi, mari quli ra ancena.
 96 - Qali, yew ray weş a.
 97 - Qaydê guli rî kê telu xwi pistan nano. / Kê qaydê guli rî telu xwi pistan
 nanî.
 98 - Qaz qaz ra, baz baz ra, imbaz imbaz ra.
 99 - Qina dizdî piznena.
 100 - Qisseyê raştî rî çiwewo çerxîn. (Ç)
 101 - Raştî pere nêkena.
 102 - Rim, gale di nênimêno.
 103 - Rîy siyay rî teney lazim niya. / Rîy siyay rî teney çi lazim a ?
 104 - Rojo siya -di- yew (çew) pey kê di nêhaseno (nêaseno).
 105 - Rojo teng çew pey kê di nêaseno.
 106 - Roj vêreno, qeza nêvêreno.
 107 - Saya ki bidereso, herkes çiwey xwi verdeno tira (H).
 108 - Say ki sayêri ra bîy, herkes çuwa xwi ver bere dano.
 109 - Sella ki haji virazo, rêxi tede nêvindena.
 110 - Serewo ki nêdejeno (nêdeceno), xafi (şasi, şutiki) pa mebesti.
 111 - Serewo ki nêteweno, destmali pira (pa) mebesti. (Ç).
 112 - Sindorê zorî çino.
 113 - Suc (suj) bînc o. (G)
 114 - Şe ki, bra (qe) meki.
 115 - Şerba aw, rayirdê aw di şikêna. (G)
 116 - Towrey zuray (Tewrey Zurayan) timo qlı o.
 117 - Vazday işe pisîngi hetanî pey kariyan o.
 118 - Xarmuşk çend bikeno, dono xwi ser.
 119 - Xayîn (Mêrdimo xayîn), mirdî nêweno.
 120 - Xeta çewti, qay (qadê) pillî het a.
 121 - Xirab, xirabey di şono.
 122 - Veyve durî ra weş o. / Durî ra vevye weş o.
 123 - Yew nêdebeno tirba yewerî. / Yewî nêdekenî tirba yewî.
 124 - Yew (çew) doy xwi rî nêvano tîrş.
 125 - Yew nişno qismetê yewî (yewerî) boro.
 126 - Yew sayâ ki sayêri ra bo, herkes çuwa xwi ver de dano. (G)
 127 - Zan (zon) di este çino.
 128 - Zenginî ra vanê : «Bimbarekên bo», feqîrî ra vanê : «To eno kura ra
 ardo ? » (G)
 129 - Zorî reydi gure nêbeno.
 130 - Zûra (zuriya) yew hewi (ray) taştî weno.

III - ÇIBENOKÎ¹

- 1 - Awki miyon ra şono hîy nêbeno. / SEY
- 2 - Azon veydono nimac nêkeno, cenî gîno mare nêbirneno. / DÎK
- 3 - Bêdeston bêningon ber akeno. / VA
- 4 - Çiydê mi esto, hetanî şan di bindê ardî ra geyreno, şan di yeno heway altunî bereqêno / SIRSÎ
- 5 - Çiydê mi esto şono nêşono xo ra pey nêewnêno / RO
- 6 - Ez bera (ber ra) şîyo zere, yew say mi çewres tenon ra bari kerdi. / SILOM
- 7 - Ez şona kura mi ra beste wo (Ti kura şerî to ra beste wo). / NAME
- 8 - Ez şonû yê (yî) vîndenî. / PAY
- 9 - Ez şonû, yû şonû ; hindey yew des qurişi ca vardono. / ÇUWA (BASTONI)
- 10 - Fekê yê esto, zonê yê çino ;
Destê yê estî, ningê yê çinî ;
Pizey yê esto, loqley yê çinî. / DÜRI
- 11 - Fek miyon di zon. / LULÎ
- 12 - Feqîrî arzenî 'ard, zengîni dekenî tonektey xwi. / ÇILONÇ
- 13 - Gonî weyşeno (wenişeno) bêgonî, bêgon weyşeno bêimoni. / KELEK
- 14 - Her bar ra şono zerre. / KOÇIK (KEWÇIKI) û FEK
- 15 - Ime (hame) se şono, şî se nîno. / XORTHEY
- 16 - Karê yê ay o ki roşeno, zirarê yê ay o ki gêno (gîno). / CIXARA
- 17 - Karga (Kergi ra) wîrdikêr o, însônî ra pîl (pîlêr) o. / KELAW
- 18 - Kelawa hutî, pirê nû tî / INCILI
- 19 - Kutiko siya, ber paweno. / KESEKI
- 20 - Mexrebî yeno, nîmacî şono. / HEWNÎ
- 21 - Serdê bûnî di yew nîmey nonî. / AŞMI
- 22 - Serdê gîlî di adir veşeno. / VILIKEY HINARI
- 23 - Yew çiy mi esto, bêadir veşeno. / ROC
- 24 - Yew çiy mi esto, binê yê hîy o, nîmey yê wişk o, serey yê di vilikî abenî. / KELEK
- 25 - Yew çiy mi esto, cora cir sîmsiya (çîlsiya) wo. / LOCINI
- 26 - Yew çiy mi esto, geyreno geyreno, wextano ki arriseno (şan beno), vindeno, fekê jey akerde maneno. / SOWL
- 27 - Yew çiy mi esto, îsotê dargî moneno, fektê yê ra dimo-n yeno. / IFING
- 28 - Yew çiy mi esto, mi karşî di girot siya, ez amewo keye, bi sur. / KOMIR
- 29 - Yew çiy mi esto, nîmey koçik o, dês ra dusnaye yo. / GÜŞ.
- 30 - Yew çiy mi esto, şew û roj dor-norey xwi şonû, timi cadê xwi do. / AYRE û SÎYA
AYRÎ
- 31 - Yew çiy mi esto, têşanayış rey di şonû, awki rey di vecîno. / HILKEY BÎRÎ.
- 32 - Yew çiy mi esto, tim bindê 'ard ra şonû-yenû. / SIRSÎ
- 33 - Yew çiy mi esto, tim mi rey do / SEY
- 34 - Yew çiy mi esto, yew çimê yay o. / DARZÎNI
- 35 - Yew çiy mi esto, yew estuni sero yo. / QAMPÎREKI
- 36 - Yew darey mi esta, kokê yay asmên ra y, gîlê yay 'ar dî. / ROC û ŞEW
- 37 - Yew gewa mi esta, hîris û di bizê sipî û yew kelo sur tede wo. FEK,
DINDAN û ZAN
- 38 - Yew pelasê mi esto, dinya wenaw. / ASMÎN
- 39 - Yew veyvey mi esta, tim û tim nêweşey 'eyelî bena. / RIŞTA
- 40 - Zerey yê kerey, teberê yê kerey, ha miyon ra bigeyri ha bigeyri. / MINARA

¹ Nî çibenokan ra : 4, 5, 7, 17, û 34. Gêl (Egil) ra, ay bînî dormarê Piran (Dicle) i ra arê bîyê.

IV - ESTANEKI (VISTONEKI)

Na estaneka cêrêni, mi 1979 di yew dewije Motkî (Mutki) ra girewti, nuştî. Motkî yew qezay Bedlîs (Bitlis) û yo. Dewanê Motkî ra mesela şarê dewanê Meydan, Mermend (Bağarası), Misî (Açıklan), Kolaz, Niç (Çatalerik), Şen (Kaşkılı) û Şenik'i bi dimilki (zazakî) qisey keno. Dimilkiyê dormarey Motkî ra heyânî ewro tenya na estaneki nusiyaya. Ci fayde ki a zî kilm a. Na estaneki hina verî yewna kovari di vejiyay, labrê tay kelimey ya şas nusiyay bî (B'ewni : Hêvî Kovara kurdî ya zarakan, no : 4, Stockholm, 1981, riperr : 9-10)

HEŞ¹

Bi w çinê bi. Di cinîye xo r' şî kulîya. Yo hep weş ame, yo hep wape mend. Haw ku weş ame, hîwiye cinîye vinderd. Şîye hon ra. Haw ku wape mend ame ko yo hon di. Ya ni hesna. Ami kehe. Cinîye bîni k' xo hesiye ko nêmi şaw kulî xo (xu) der we, niwaşt ra. Fetliye ko yo heş ya sera. Heş ya başî lan xo.

Yo lacek ci r' bi. Fek lan heş biroc qawno. Mîyen lan yo tîrinç roc fîna. Haw lacek xo den pero. Nişka devşa, teyşîya. Ma ci ci r' vano :

- Haw çiba w ?

Lacek vano :

- Yo çiba tiye bi, mi nişka deviştîni.

May ci ci r' vano :

- Hana tîrinç roc û law, roc esto bişaw esto.

Lacek vano :

- Ko hecuna êçi r' ma tiye vinderda ?

- Enê law fek lan qawnîyew.

Lacek fek lan ke a, xo r' şîye ko heş ko qoçık ti ; yo çenti pir qoçık kerdo, haw cinîye rî beşeni. Cinîye terso : «Hanhey ma kuşu»

Zey ci goy ci teyna man heş . Yo qul dan heş ri, heş miro. Cinîye o zey xo yenê daw. Merdi cinîye esto. Milet daw, haw mîrik rî vano :

- Zey to, zey heş o. Ya bikuşê !

Yo roc may ci bi parxêl ya rişiyên Çiyay Hati-Nehatî kulîya. Şen haw çiya xo r' kuli top kero, wînî tera ko yo şer gay wero. şer ri vano :

- E to r' vana mewu ! Ez to ker bin parxêl ...

Gay ci wero, haw lacek yeno ya ker bin parxêl gir dano. Don jî winî tera ko yo heş gay ci wero. Lacek heş rî vano :

- Mewu ! Ez to ker bin parxêl !

Heş gay ci wero. Lacek yeno heş ker bin parxêl, gir dano, yeno daw. Milet daw pêw ci ri remo. Yen kehe. Haw şer o heş ver do şena xorê. Haw lacek may xo r' vano :

- E zana ko şîma mi kîr vinî, ez xo r' şena.

May ci ci r' vano :

- Meşo law ! ..

Lacek vano :

- Bi xatir to.

Şen yo del (?) winî tera ko yo duman vaz ra. Şan widi ko yo kalik yo quşxani savar naw sera, pocu. Lacek vano :

- Selamo 'elek.

van :

- 'Eleykomeselam.

1 FERHENGOKÊ DIMILKÎYA MOTKİ

ami : ame, hame, (home)
başı : beno, bışûno
bikuşê : bikişe, bikisi
ci rî : ci rî, jey rî, yê rî, tira
centi : gente, çante, pèlek
çiba : çî, teba
çiya : ko
daw : dewe, dewi
den : dano, deno
fetiliye : feteliye, ageyra / ageyray
hep : heb, tene
haw : aw, ay, aya, ayo
hon : hewni, hown
kalik : pîr, extiyar
ke a : akera
kehe : keye
ker : keno
kér : kenê, bikerê
ko (ku) : ki, eke
kulî, izimî
lan : lane, lani, quli
man : maneno
mewu : mewere, mewri
miro : mireno
milet : şar, mileti
miyen : miyan

naw sera : ser nawo
nêmi : nême
nihesna : nêhesna
o : û
parxêl : ereba
pero : piro
pocu : pewceno, powjeno (pojeno)
qawno : padano, gêno, dugîneno
quşxani : quşxane, quşxani
rişiyên : erşawena
roc : roj, roz
savar : belxul
şaw : şewi, pesewi
şena : şono, şona
şîye : şîy, şî
tera : tira
teyna : tena
tirinç : tirij, tirêj
tiye : tiya, ewta, inca
vinderd : vindert, vinert
vini : vînî, vind
wape : apey, tepya, tepe
winî : hewniya, ewniya, winiya
yen : yeno
yo : yew, jû, zû
zey : lac, laj, zay

WA SUWEND BO WA ŞIRT BO

Enver GÖKÇE

*Eke ez
winî
kerran
û
çalan
miya di
mendo.
Eke ez tenya wo
eke
ez xwi ra cér diyaye wo,
bêpaştî yo ez eke
û
eke winî yo
bextê mino
sîya.
Bisuwend
biqesem,
wa suwend bo,
wa şirt
bo,
'ard di
nêmaneno
ecrê mi.*

Tirkî ra tadayox :
Malmisanij

CA'DEYANÊ MA DI ZÎ

Enver GÖKÇE

*Mevajênê
nêakena
nêşîna akera
caran
na vila
hinari.
Ku akera
elbet
ca'deyanê
ma di zî,
ku bibo
roşan.
Çiqas ki
wini ver bi
geli
derg bibê
luliyê çekan,
destê teresbavan
peynîya peynîyan
yew
bi yew
ku bisikiyê.*

Tirkî ra tadayox :
Malmisanij

MACERA Î SILEMONÎ GINCE

Silemonê Gince hazar û new se w hîris û heşt de Hereketê Dersim de menfi bi. Ama be Wilatê Çanakkale. Uca ra kî da be Qaza Bayamîç'i. Juy roje qaymaqamê Bayramîç'i pêro menfiyû dano arê, inûn ra vano ke :

- Emrê hukumatî esto, ita de milk danmê suma.

Uca ra Silemonê Gince quesê ceno, vano ke :

- Qaymakam Beg, rind quesê mi gos ser ne. Melmeketê ma de, Ergan'e Surbahane'e, Maxaçur'e Birastik'e de yane nî çar deûn de milkê mi esto. Vişto ponc hazarî darê herugê mi estê. Poncas hazar kok hengura mi esta. Ju kî axurade mi bîye, zurî mebo, hati ra mangî zenene kone zerre, çêberê doten de nalke ses asmî re piya vecîne tever. Naxirê mi, vişto ponc tenî şuwanê şuwarî çirayenene. I çax no Muzur kî kolê m' bî.

Uca ra Muzuri vat ke :

- He ... he ... he ...he ... heyya ka ...ka ...ka ...ymakam beg, e ... e...e ... ez ku ...ku...ku...koley Si ...si ... si ... si ...Silemon Axa yû.

Qesenê Silemon Axay rê qaymakam ìnam kerd. Ci re vat ke :

- Silemon Axa, wilatê Çanakkale daane rê gucê mi nesono ci. Qaza Bayramîç'i kî to rê des nedana.

Qesê qaymakamî rê pêy ra Silemon Axa ebe havalenê xo veciya teber. Raa ra hevalanê xo ra Alişan vat ke :

- Zana Silemon Axa ? Sirixade me esta, çengel ken tira, Koyê Gazdaxî'-ye ser ra Akdeniz de masiyû seyt ken.

Silemon Axa kî :

- La lao, a sirxe kot de darêna wê ?

Alişanî ci rê vat ke :

- A axuro sima pîlle de darêna wê.

Na qesê ser ra Silemon Axa miradiya :

- Heya heyâ bra. Hin ki axure bîye, nîya kî sirixe bena.

Wat pêra kî havalonê xo ra birîya ya. Hurdî hurdî na lawike vate :

«Koyê Muzurî duman o, pirnika mi lerze kena
Yare m' koûn ser ra yena xebera xeyre ana
Ti ya, ti ya, newe vecîya,
Beşliyê hermî ya, saatê vilî ya,
Taqatê zonî ya, dilega zerî ya.»¹

1. B'ewni : Roja Newe (Kürtçe-Türkçe Gazete), No : 1 (15-V-1963) İstanbul, r : 4

QAWXÊ NÉRIB Ú SÎWANÎ¹

Arêkerdox : Peter Ivanowîç LERCH

Verî coan yew lacekû Nêrbic şî Sîwan, Xorsige dizdey, banî Mela Ehmedî Qafan akerd, purtî Mela Ehmedî Qafan gerewt berû. Lacî Mela Ehmedî Huseynî di enoe dizd, tepîşt va ke dizdî ra :

- Ti kanca ra y ?

Dizdî va ke :

- Ez Nêrib² ra ya.

Lacê Mela Ehmedî va ke :

- Ti kam mehla dî ?

Dizdî va ke :

- Ez Mehlay Şeynan da.

Lacê mela Ehmedî va ke :

- Ti qewî amey malê mi benî ?

Dizdî va ke :

- Ez Nêrbic a ameya malê tue, dizdey bikera, bera tue ez dîan, lakin ke ez ha bena, zor bena.

Lacê Mela Ehmedî, wica serey dizdî tera kerd, xebere erşawute Nêrib, Xelef Axay rî va ke :

- We Hyeni³ nêbi tue tede qawxe kerdînî, tue Hyenicî pyêrû kiştî ardî emanî ser.

Xelef Axay, xebere erşawute Avdulah Axay Kelan, va ke :

1. No tekst kitabê P. I. Lerch'i ra giyriyawo û Malmîsanijî tada elfaba Kurdki. Kitabê Lerch' i St. Petersburg (Leningrad) di metbe'a ro gunawo (çap biyo). Bewni : Lerch, P., *Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nord-Chaldäer*, 1858, St Petersburg.
2. Qezay Hêni ra beste nî dewê Nêribi estê :

Nêribî Axan (Kuyular), Nêribî Çulagan (Abacilar), Nêribî Wusifan (Çukur), Nêribî Melikan (Bozok), Nêribî Elşyan (Atıcı), Nêribî Topalan (Topçular), Nêrib-Cimsat.
3. Hêni (Hyeni) : Ewro yew qezay Diyarbekir o (Hani).

- Mi Nêrib de qawxe kerd, lakin ke wextê xoe de hadre bi, tue mérđumî mi kişt, bizani ke ez vîst mérđumî tue yew mérđumî xoe vera kişena. Avdulah Axay xebere erşawute Xelef Axay rî va ke :

- Waxte xoe de hedre bi, ez meyşte eskerê xoe gêna, yena Awkey Şeli⁴ ver, ti zî wica ra eskerê xoe bigî, bye Ceyt⁵ ver, ma qawxe bikî nêwo ke ti serey mi wenî, nêwo ke ez serey tue wena.

Xelef Axay xeber erşawute Avdulah Axay rî va ke :

- Eskerî mi hadrew, enkay ez ameya Deyşte de, ti zî warze eskerê xoe bigî, bye Awkey Şeli ver, ma qawxe bikî. Enoe qawxê Tirkan nû enoe qawxê eşiran û, ti bye xoe rî vyêni.

Avdulah Axay xeber erşawute dewan va ke :

- Çew mevindî, meyşte awkey Şeli ver qawxey ma û Nêrbican û.

Dewan xeber erşawuti Avdulah Axay rî va ke :

- Mevinde, ciqas malî Nêribi estû bide ma, ma peyney dewanî Nêribi veşnenî.

Abdulah Axay xeber erşawute dewanî va ke :

Metersî, serê mi rî, mal şima rî.

Dewan va ke :

- Ma emşoe nêvindenî, ma wardenî, ma şuenî Awkey Şeli ver, qawxe kenî, mevinde, ti zî bye.

Sebah Avdulah Axa werişt be espar, eskerê xoe top kerd, va ke eskerî xoe ra :

- Oxil, mevindî, ma şyêrî qawxe, metersî, Nêrbicê tanî, qawxê eşiran û, serê mi rî, mal şima rî.

Dumilbazî day puroe, Avdulah Axa kewt eskerî ver, şî Awkey Şeli ver, eskerî Xelef Axay n'amew, erş kerd, va ke eskerî xoe ra :

- Serê mi rî, mal şima rî, dewan veşnî.

Eskerî Avdulah Axay şî dewî Xelef Axay gerewti, şes dewî veşnay, age-ray, amey keye, Avdulah Axay da mal eskerê xoe.

Yew aşme mend. Xelef Axay xebere erşawute Avdulah Axay rî va ke :

- Tue ehende eskerî mi kişt, tue şes dewê mi veşnay, talan kerdî, wextê xoe de hedre bi, ez ena gelanke yena, kancaû ke dewî tue mi dî ez veşnena, talan kena heta yew şewe çoacuxî nêverdana, hemînî sere birnena.

Avdulah Axay xeber erşawute xelef Axay rî va ke :

- Cay xoe de rehat vinde, eke ena gelanke ez ameya tue ra yew kerga kokerî nêverdanû.

Xelef Axay xeber erşawute Avdulah Axay rî va ke :

- Ti bye xoe rî vîne !

Avdulah Axa werişt be espar, dumilbazî dav puroe, eskerî xoe ame pye ser. Avdulah Axa va ke eskerê xoe ra :

4 Şeli : Ewro di dewê Hêni bi namebê Şeli estê :

Şelli (Yukarı Turalı), Şelli Sufla (Aşağı Turalı)

5. Ceyt (Cait, sergen)

- Coacuxî ma ha şuenî qawxe, metersî ena gelanke çewî meverdî hemîne bikşî, serê mi rî mal şima rî.

Eskerî va ke Avdulah Axay ra :

- Pekî efendim' Ala canî tue sax bidû, heta ke peynay ma nêmerû, tue rî çî çinû.

Avdulah Axay va ke :

- Aferem oxil !

Avdulah Axay dumilbazî day puroe, eskerê xoe erş kerd, şe dîyarî Mele-kanî, awna ke Xelef Axay tabure besta. Avdulah Axay eskerê xoe erş kerd va ke :

- Serê mi rî mal şima rî, metersî şyêrî bikşî hemîne.

Eskerî Avdulah Axay şe, eskerê Xelef Axay weta ame bi tawricye, qawxe kerd, eskerê Xelef Axay rema, eskerî Avdulah Axay pey ra kewt, banê dewi pêrû talan kerdî, şwaney Nêrbican pyérû kiştî, pesî cine pyerû ard.

WELAT WELATÊ KURDAN O

Xortê KURD

*Roj akewto biyo bol berz,
Werzi xortê Kurda werzi.
Milet serbestey wazena,
Werzi xortê Kurda, werzi,
Werzi keyna Kurda, werzi !*

*Welat welatê Kurdan o,
Ewro şaro xo rê weno.
Welatê ma yo nalenô,
Kes nalini nêaşnaweno,
Zalim ma rê zulum keno.*

*Hewn di menda mileta ma,
Bindest mendo welatê ma,
Zalimî wenê heqê ma,
Welat welatê merdan o.
Werzi xortê Kurda, werzi !*

XONA HECİ

Na deyîri (lawike), yew keyneka Bîngoliji eşta nîşanliyê xo ser. Nîşanlı na keyneki, Cengê (Herbê) Dinyawo Yewin (1914-1918) di şîyo ceng ow wi-ca di şehîd bîyo. Na deyîri, be'dî biya deyîra kay.¹

Serê bonê Hacî yo meydon o,
Binê bonê Hecî yo meydon o.
Yo meydonê astoron o,
Riza Beg mayîni kay dano.
Reş çawişo merdarin o,
Keno arê xortonê Kirdon o.
Verê yîne dono ci ca k' giron o,
Inşala yo tira nêmono.
Her way vona, he way vona,
Herway vona Xona Hecî.
Çimê to siya yê ze eçkicî,
Birîyê to qeytanê gicî.
Ti Homê kena ti gu mi rê vecî,
To vînî hema tiya ra vecî.
Ti şermayena etya vecî,
Mi rê bê verê bonê 'Eli Qicî.

¹ No izahetê vernîya deyîri, ma tîrkî ra tada dimilkt. B'ewni : Roja Newe (Kürtçe-Türkçe Gazete), No : 1 (15-V-1963) İstanbul, riperr : 4

BİBLİYOGRAFYA DIMİLİ (ZAZA) : 1858 - 1985

MALMİSANIJ

- 1 - Aliqemer, Çemê Muzir, Dengê Komkar (Kovara Federasyona Komelên Karkerêñ Kurdistan li Elmanya Federal), Frankfurt, No. 23 (Kanun 1980), r : 9
- 2 - Ali, Sabahattin, Estaneka Mêşna, tadayox : M. Dewij, Tîrêj (Kovara çande û pîseyî), Izmir, No. 1 (1979), r: 39
- 3 - Antranig, Dârsim, Tiflis, 1900.
- 4 - Arif, Ahmet, Sinayışê Tû, Zerre di, Tadayox : Malmisanij, Devrimci Demokrat Gençlik (Türkçe-Kürtçe Aylık Siyasi Gençlik Dergisi), İstanbul, No : 3 (Nisan 1978),
- 5 - Ayata, Eshat, Bir Zaza Destani-1 (İsimsiz Bir Gezegenden Notlar), Stockholm 1984, 109 sayfa
- 6 - Barışek, Roşan, 1860 di Zazakî, Tîrêj, No. 3 (1980), r : 38
- 7 - Başbuğ, Hayri, Göktürk - Uygur Zaza Kurmanç Lehçeleri, Ankara, 1984, Ayyıldız Matbaası A.Ş. VI. + 88 sayfa.
- 8 - Başbuğ, Hayri, İki Türk Boyu : Zaza ve Kurmanclar, Türk Kültürünu Araştırma Enstitüsü yayınları, Ankara, 1984, 89 sayfa.
- 9 - Bedir Khan, Emir Djeladet-Lescot, Roger, Grammaire Kurde (Dialecte Kurdmândji), Parîs, 1970, r : 17, 24, 28, 43, 55, 157.
- 10 - Bedirxan, Celadet Ali, Zarê Dumilî û Mewlûda Usman Efendi, Hêvî (Kovara çandıya giştî), Parîs, No : 2 (Gulan 1984) r : 77-85
- 11 - Bedirxan, Celadet, Zarê Dumilî û Mewlûda Usman Efendi, Hawar (Kovara Kurdi), Şam, No : 23 (27 Temûz 1933)
- 12 - (Sêx Seleheddinê Sêx Seidî), Beyatnanie.
- 13 - Bira, Roşa ma, Roja Welat (Rojnana siyasi û çandî), Ankara, No : 7 (22 Gulan 1977), r : 11
- 14 - Blau, Dr. (Ernest) O (tto) (Friedrich Hermann), Nachrichten über kurdische stämme, ZDMG (Zeitschrift der Deutschen Morgenländischen Gesellschaft), Leipzig, Bd. 16 (1862), p : 621-627
- 15 - Brîndar, M., Engistê Kejê, Tîrêj, No : 2 (1980), r : 32
- 16 - Brîndar, M, Zazakî dir Pronav (Zanîr), Tîrêj, Stockholm, No : 4 (1981), r : 54
- 17 - Butyka, D., Das ehemalige Vilayet Dersim, Mitteilungen der Geographischen Gessellschaft, Wien, 1892, Bd. XXXV, No : 2-3, r : 99-126 ; No : 4, r : 194-210
- 18 - Chater, Melville, The Kizilbash clans of Kurdistan, The National Geographic Magazine, Washington, oct.1928, vol. LIX., No : 4, p : 485-504
- 19 - Dapaxdzur (Çapaxçur) û Dersim, Armjanskij Vestnik, Erevan, 1916, No : 27, r : 21- 22
- 20 - Dengê Komkar, Frankfurt, No : 26, 27, 28
- 21 - Dersim, Armjanskij Vestnik, Erevan, 1916, No : 16, r : 11-13

- 22 - Dersimskie Kurdy (letter from Trabzon), Zapiski imperatorskogo Russkogo Geografičeskogo očbşestvo, 1863, vol. I, r : 5-12
- 23 - Dersim, Svodka Svednij o Sopredel nyx strana, 1-5-1913, Tiflis, No : 48, r : 9-20
- 24 - Dersim, Zarja Vostoka, Tiflis, 31-7-1925
- 25 - Dersimi, M.N., Kürdistan Tarihinde Dersim, Halep, 1952, r : 42-56, 110
- 26 - Dewij, Cibenokê Zazakî, Tîrêj, No : 2,3
- 27 - Dewij, Pîra Hewt sera, Tîrêj, Izmir, No. 3 (1980), r: 52
- 28 - Dewij, Zazakî dir Vatey Verînan, Tîrêj, No : 1,4
- 29 - Dilde Zaman (Zon de waqt), Kızıl Yol, Bobign (Fransa), No : 2 (1984), r : 27
- 30 - Dilin Devrimci Mücadeledeki Etkisi, Ronahi, Zürich, No : 18, r : 18-29
- 31 - Eli (Dersimli Ozan Eli), Şuare, Ala Sare Wedardayêna Karkêran, Özgürlik Yolu (Aylık Siyasi Dergi), Ankara, No : 44 (Ocak 1979), r: 77-80
- 32 - Evren Ci ra Milet Este Zere ? Dengê Komkar, No : 57 (27-9-1983), r : 14
- 33 - Farûq, È ma wo, Tîrêj, No : 2 (1980), r : 57
- 34 - Farûq, Xal û Wariza, Tîrêj, No : 2, r : 60
- 35 - Ferhad, Hüseyin, Vilê Kurdan, Tadayox : Malmisanij, Tîrêj, Stockholm, No : 4 (1981), r : 51
- 36 - Fırat, M.Serîf, Doğu İlleri ve Varto Tarihi, 5. bask1, Ankara, 1983, Ayyıldız Matbaası A.Ş., XXIII + 306 sayfa.
- 37 - Gelic, Ver Girotiş, Tîrêj, No : 3 (1980), r : 48
- 38 - Gordlevskij, V.A., Iz religionyx iskannyj V Maloj Azii (Kyzylbaşı), Russkaja Mysl, Moskva, 1916, kn. XI, r. 79-97 ; Novyy Vostok, Moskva, 1922 kn. I, r : 259-278
- 39 - Grenard, M.F, Une Secte religieuse d'Asie Mineure, Les Kysylbachs, Journal Asiatique, Paris, Mai-Juin, 1904, 10e série, vol. III, p : 511-522
- 40 - Grothe, (Dr.) Hugo (Von), Heine Vorderasienexpedition 1906 und 1907. Mit Beiträgen Von F. Broili u.a., Leipzig, 1911 (vol.I), 1912 (vol.II, Die Kurden und Kysylbasasch, p : 148-161)
- 41 - Gülensoy, Doç. Dr. Tuncer, Kurmanci ve Zaza Türkçeleri üzerine bir Araşturma, Ankara, 1983, Ayyıldız Matbaası A.Ş, X + 74 sayfa
- 42 - Hadank, Karl-Mann, Oskar, Mundarten der Zaza (Hauptsächlich aus Siwerek und Kor), Berlin, 1932
- 43 - Hakki, Naşit, Derebeyi ve Dersim, Ankara, 1932, 75 sayfa+ 23 fotograf.
- 44 - Hes ve Destê Kam Ame Kistene, Dengê Komkar, No : 51-52 (10-411983), r : 16
- 45 - Heyder, Ay Wext, Hêvî (Kovara Çandiya Giştî), Paris, No : 2 (Gulan 1984), r : 104
- 46 - Hikmet, Nazim, Ayê, Tadayox : Malmisanij, Tîrêj, No : 1 (1979) r : 36
- 47 - Hucra Mi, Kizil Yol, No : 2 (1984), r : 50
- 48 - Huseyn, Hesen, (Name), Berbang, Stockholm, No : 10 (Nisan 1983) r : 22
- 49 - Jaba, M. Auguste, Dictionnaire Kurde-Français St. Petersbourg, 1879
- 50 - Karkeren Kurdistan (Belavoka Partia Komunista Fransa-Section Chalon, Komela Zimanê kurdî û tirkî), 3-7-1982
- 51 - Kılıç, Ali, Dowa Mixeyli de, Hêvî, Paris, No : 2 (Gulan 1984), r : 107
- 52 - Kizylbaşı Dersima, Svodka Svednij, o sopredelnyx stranax ... za vremja, r : 15 go Ijulja po 1-Augusta-1911 g, No : 4, Tiflis, 1911 , r : 10-16
- 53 - Koyê ma, Kizil Yol, No : 2 (1984), r : 41
- 54 - Kurdoev, K.K, Haletekani Cins û Binay Berkar le Zaza da, Tadayox : İbrahim Eziz, Govarî Korri Zanyarî Kurd, Bexdad, 1977, berg : 5, r : 236-263
- 55 - Kurdoev, K.K, Kategoriya Roda i Obiektnaya Konstruktsiya V Zaza, Iranskeye Yazikeznaneye, Moskva, 1976, r : 104-119
- 56 - Latham, Robert Gordon, On a Zaza Vocabulary, Opuscule, Essys Chiefly philosophical and ethnographical, (Williams and Norgat), London, Edinburg, Leipzig, 1860, P : 242-244
- 57 - (Latham, Robert Gordon), Zaza Lügatçesi Hakkında, Süreç (Üç aylık Siyasal Kültür dergisi), No : 2, Sayfa : 11-13

- 58 - Le Coq, A.V., *Kurdische Texte*, Berlin, 1903
 59 - Le Coq, A.V., *Hikayeti Dunya Güzeli* (Tadayox : Omer ibn Ali Kose), r : 63
 60 - Le Coq, A.V., *Hikayeti Ibrahim Paşa*, r : 60
 61 - Le Coq, A.V., *Hikayeti Yusub we azîz* (Tadayox : Omer ibn Ali Kose), r : 66
 62 - Le Coq A.V., *Ekmekçi de Muşawere* (Vatox : Omer ibn Ali Kose), r : 68
 63 - Le Coq, A.V., *Latife* (Vatox : Omer ibn Ali Kose), r : 68, 69
 64 - Le Coq, A.V., *Die Kardinalzahlen in Zaza, Baba und Lolo-Kurdisch*, r : 70
 65 - Le Coq, A.V., *Eigine Sätze in Zaza, Baba und Lolo Kurdisch*, r : 72
 66 - Le Coq, A.V., *Wortsammlung ; Deutsch, Baba Kurdisch un Zaza*, r : 103
 67 - Lerch, P., *Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nord-Chaldäer*,
 1858, Petersbourg
 68 - Lerch, Peter Ivanoviç (Pôtr Ivanoviç Lerx), *Issledovanija ob iranskix Kurdax i ix
 Predkax Severnyx Xaldejax*, SPB., 1858
 69 - *Literarisches über Kurdistan*, PM (Petermanns Mitteilungen), 1864, p : 67
 (W.Strecker, Der Distrikt der Dersim-Kurden).
 70 - Maceraî Silêmanî Gince, Roja Newe (Kürtçe-Türkçe Gazete), Istanbul, No : 1
 (15-5-1963), r : 4
 71 - Malmîsanij, Bêrî, Hêvî (Kovara Çandiyê Gîştî), Paris, No : 2 (Gulan 1984)
 72 - Malmîsanij, Çend Deyirê ma, Berbang, Stockholm, No. 12, r : 16-17
 73 - Malmîsanij, Dimilkî di Ciayeya Vatisan, Hêvî, Paris No. 2 (Gulan 1984), r :
 86-103
 74 - Malmîsanij, Dimilkî di Daçek, Berbang, Stockholm, No : 15 (1983), r : 15-17
 75 - Malmîsanij, Dimilkî di Lêkerê Hevdudanî, Hêvî, Paris, No : 1, (Ilon 1984), r : 67
 82
 76 - Malmîsanij, Dizd û Qiral, Berbang, Stockholm, No. 10 (Nisan 1983), r : 16
 77 - Malmîsanij, Dil Konusunda bir Araştırma, Devrimci Demokrat Gençlik, İstanbul,
 1978, No: 1, 2, 3, 4, 5, 6, 7, 8, 9, 10, 11
 78 - Malmisanij, Etnik, Ktabê Ramitey, Tîrêj, No. 2 (1980), r : 27-29
 79 - Malmîsanij, Ganfiday Dêrsimî, Berbang, Stockholm, No. 11 (Gulan 1983), r :
 10-11
 80 - Malmîsanij, Gune, Yasax û Eyb, Berbang, Stockholm, No. 17 (1984), r : 11
 81 - Malmîsanij, Heş, Hêvî (Kovara Kurdî ya Zarokan), Stockholm, No. 4 (Gulan
 1981), r : 8-9
 82 - Malmîsanij, Ma çi Waşt ? Errik, Deza, Tîrêj, Stockholm, No. 4, r : 59-66
 83 - Malmîsanij, Sîretê Kalî, Tîrêj, No. 1 (1979), r : 43
 84 - Malmîsanij, Têkiliya Zaravayan, Berbang, Stockholm, No. 7-8-9
 85 - Malmîsanij, Zaza (Dimilî) Lehçesinde Yazan Bir Ozan : Melay Xasi, Devrimci
 Demokrat Gençlik, İstanbul, No : 2 (Mart 1978)
 86 - Malmîsanij, Zaza-Kürt Atasözleri, Armanç, Stockholm, No. 5 (Ilon 1979), 6
 (Çileya Peşin 1979), 7 (Çiriya Paşin 1979), 8 (Kanun 1979)
 87 - Malmisanij, Zerra Mi, Ewro û Meşti, Ma Bi Çiman Diy, Tîrêj, No : 3 (1980), r :
 22-29
 88 - Mehmed, Bi musnê, Tîrêj, Izmir, No : 2 (1980), r : 57
 89 - Müller, Fr., *Zaza-Dialect der Kurdensprache*, (Beiträge zur kennntniss der neuper-
 sischen Dialecte, Laut und Formenlehre, Sitzungsberichte der Kaiserlichen Akademie der
 Wissenschaften), Wien, 1864, No : 48, 21 p.
 90 - Qazî, Seyîd, Dersim, Tîrêj, Stockholm, No : 4 (1981), r : 50
 91 - Qazî, Seyîd, (Dersim), Dr. Şivan, Kürt Millet Hareketleri ve Irak'ta Kurdistan
 İhtilali, Stockholm.
 92 - Sevgen, Nazmi, *Yaşayışları Şimdîye Kadar Gizli Kalmış Bir Aşiret : Zazalar*,
 Tarih Dünyası Dergisi, Sayı : 14,15,16,17, İstanbul, 1950 / Türk Kültürü Dergisi, Sayı :
 299, 230, Ankara, 1982
 93 - Şeïx Saïd u Diarbekira, Zarja Vostoka, Tiflis, 5-4-1925, p : 3

- 94 - Tayfun, M., Zaza-Kürt Türküleri, Özgürlik Yolu (Aylık Siyasi Dergi), Ankara, No : 19 (Aralık 1976), r : 71-83
- 95 - Taylor, James G., Journal of a tour in Armenia, Kurdistan and upper Mesopotamia with notes of researches in the Deyrsem Dagh in 1866, JRGS (Journal of the Royal Geographical Society), London 1868, XXXVIII, p : 281-361
- 96 - The Faith of the Dersim Kurds, Gelawej, Takoma park, Maryland, Amsterdam, june 1964, p : 8-10
- 97 - Usman Efendi, Biyîsa Pêxember (Mewlûda Nebî-Bî Kurdiya Dûmîlî, Zaravayê Sêwrekê), Sam (Damascus), 1933
- 98 - Xagû Vera, Dengê Komkar, Frankfurt, No : 51-52 (10-4-1983), r : 16
- 99 - Xasî, (Mela) Ehmedê, Mewlid, Diyarbekir, Litografya Matbaası, 1900
- 100 - Xatê Xanim, Eliyê Evdirrehman, Erivan, 1959 / Eliyê Evdirrehman, (Gundê Mêrxasan), Rabûn (Organa Bahoz-Rêxistina Têkoşer û Şoreşgerên Kurdistan, No : 1 (Gulan 1975), r : 12-14
- 101 - Xezal, Roja Welat (Rojnama Siyasi û Çandî), Ankara, No : 3 (Çileya Pêşin 1977), r : 12
- 102 - Xoca, Welî, Bi dimilî, Hêlin (Kovara Kurdi ya Zarokan), Stockholm, No : 7, r : 11
- 103 - Xoca, Welî, Bi dimilî du manî, Hêlin, Stockholm, 1983, No : 8, r : 13
- 104 - Xoca Welî, Bi dimilî du manî, Hêlin, Stockholm, No : 11 (1984) r : 13
- 105 - Xoca, Welî, Tikûtenya, Berbang Stockholm, No : 16 (1983), r : 23
- 106 - Xonay Hecî, Roja Newe (Kürtçe-Türkçe Gazete), İstanbul, No : 1 (15-5-1963), r : 4
- 107 - Yavuz, Edip, Tarih Boyunca Türk Kavimleri, Ankara, 1968
- 108 - Yeka nek, Hêlin (Kovara Kurdi ya Zarokan), Stockholm, No : 3 (1983), r : 13
- 109 - Zaza (Dimili) : Türk Ansiklopedisi (Arya Maddesi): cilt : 3, sayfa : 425
- 110 - Zaza : Muin, Dr. Muhammed ; (Muhammed Huseyin bin Xelef Tebrizî mutexel lis be Borhan), Borhanê Qati' İntişarê Danişgahê Tehran, Tehran, 1330 (hicrî-şemsî), cild : 1, r : 39
- 111 - Zazacada Sayıların Yazılışı, Kızıl Yol, No : 2 (1984), S : 31
- 112 - Zazaî ; Dehxoda, Eli Ekber ; Loxetname, Tehran, 1956-1979, cild : XVIII, r : 37
- 113 - Zekî, M. Emîn, Kurdistan Tarihi, İstanbul, 1977, Komal Yayımları, sayfa 176, 177, 178, 187
- 114 - Zerteng, Pankisar, Zazakîyê Ezirganî û Diyarbekir, Tirêj, No : 3 (1980), r : 7
- 115 - Zerteng, Pankisar, Ziwanê Qisse Kerdisî û Nûştişî, Tirêj, No : 2, r : 10
- 116 - Zîlfî, Canî Canî, Özgürlik Yolu, Ankara, No : 36, r : 87-94
- 117 - Zîlfî, Dayê Mi Hêfê To Guret, Gaziya Welat (jibo şerê Azadî û wekhevîyê Rojnama Mehî), Frankfurt, No : 3 (1980), r : 10
- 118 - Zîlfî, Dayê Mi Hêfê To Guret, Berbang, Stockholm, No : 16, r : 16
- 119 - Zîlfî, Dersim Yöresinden İki Halk Türküsü, Özgürlik Yolu, Ankara, No : 30 (Kasım 1977), s : 91-98
- 120 - Zîlfî, Dimîlkî-Kurmancî-Tirkî ferhengok, Hêvî, No : 1, (Ilon 1983), r : 107-123
- 121 - Zîlfî, Folklore Kurdî ebe Zarava Dimîlkî, Hêvî, Paris, No : 1 (Ilon 1983), r : 83-106 ; No : 2 (Gulan 1984), r : 109-124
- 122 - Zîlfî, Piyakerê Koladarûnê Tirkî, Ronahî, Zurich, No : 22 (Gelawej 1977)
- 123 - Zîlfî, Xelîl, Hesenqela, Şevdîn, Pore, Ozgürlik Yolu, No : 43 (Aralık 1978), r : 87

HALETEKANÎ CÎNS Û BÎNAY BERKAR LE ZAZA DA¹

Nûsînî be rûsî : Profesor K.K. KURDOYËF

Pêseki

Le ser diyalêktî zaza kêşe w nakokî zor le do rûwewe heye. Rûyêkyan ewe ye, ke hendê le zanayan zaza ne be diyalêkt we ne be goverî zimanî kurdî dadenên. Ewekeytiryan ewe ye, ke zaza debenewe ser yekêk le diyalektekanî zimanî kurdî -ser diyalêktî kirmancî serû weyan xwarû- ca ême lêre da be pêwîstman zanî ke em wutare nusrawe le layen profêstor Kenat Kelaşoviç Kurdoyêv'ewe, ke be zimanê rûsî le kitêbî zanistî zimanî zimane Eraniyekan da bilaw kirawetewe werbigerrîne ser zimanî kurdî, bo ewey, ke zanayan û zimanewanîn berrêzî kurdman bixwininewe we belkû hendê şitî nwê triş le lay ewanişewe derkewêt.*

Her wek lem wutare da debînîn, ke mamoto K.K. Kurdoyêf be belgey zanistî rewan ewey ron kirdûtewe, ke zaza ser be zimanî kurdî ye û diyalêktî em zimaneg e, we basî ewesi kirdûwe, ke em diyalêkte le zor şit legel diyalêktî kirmancî xwarûş yek degrêtewe.

K.K. Kurdoyêf lem wutare da berawurdî zazay legel diyalêktî kirmancî xwarû nekirdûwe, belkû legel diyalêktî kirmancî serûy kirdûwe we diyalêktî zazay pitir be lay diyalêktî kirmancî serû da birdûwe.

Minîş le katî xwêndinewe em wutare w wergêrranî bo ser zimanî kurdî hewlî berawurd kirdineweim legel kirmancî xwarû dawe, belam legel em wutare da bilawî nekemewe, çunke demewêt be wutarêkî taybetî w serbexoym bilaw kemewe we qûlturiş bo berawurdeke biçim. Lêre da hewlî ewe'm dawe, zarawê rezimanîyekan le wergêraneke da kurdî bin û le pal ewanişewe zarawê rezimanîyekanî erebi w îngilizîm nûsîwin. Hendê şitî kurt kirayewe w zarawey taybetîsim bew mebestaney xwarewe bekar hêname :

K.K. : Kenat Kelaşoviç Kurdoyêf

K.X. : Karl Xadank

P.L. : Pêyutir Lêrx

l. : lapere

* Iranskeye Yazikeznanye, Moscow, 1976, p : 104-109

berkar : *tewawker, el-meful*

diyalékt : *lehcey mehelli*

gramatik : *rêziman*

grûp : *komele*

haletî diyar : *el-haletu'l-mubaşere (direct case)*

haletî nedîyar : *el-haletu'l-mubheme (oblique case)*

ber. : *berawurdi*

kr. : *kirmancî*

WUTAREKE

Qise be zimanî zaza le herême nawendekanî Kurdistanî Turkiya dekirê ew nawçê sêgoşeye degrêtewê, ke dekewête nêwan şarekanî Diyarbekir û Muş û Dersim. Zaza çend goverêkî heye ; her gover nawî ew nawçeyey wergirtûwe, ke lê bekar dehênrêt, wek : zazay Sêwerek, zazay Kor, zazay Çebaxçur, zazay Kêxi w zazay Palû. Ew goveraneş le roy cewherî reg û rîşey binaxey rêziman, fonetik û lêksîka we binçîney dirûstbûnî ferkeng yek degirinnewe.

Dananî zaza be şêweyekî zimanî kurdî le layen hendê zanayan kêşe w nakokî le ser e. Ta êsta şwêni zaza le naw zimane êranîyekan diyar niye. Her wek debînîn, ke zanayan A. Aboyan, N. Dersimî, P. Lérx, V. Ştrêker, Lê Kok, F. Miller, K. Bedirxan, K. Badillî we ewanîtir zaza be diyalêktêkî zimanî kurdî dadenên, belam zanayanîtir O. Mann, Rîç, K. Xadank, D.N. Mekkenzî û hîtit zaza ebnewe ser goran, ke be zimanî kurdî dananên, herçende emane neşyan tuwaniwe belge w qena'eti zanistî wa bihênnewe, ke bitwanin rakanî xoyan dûpat kenewe.

Hebûnî em kêşe w ew nakokîye le ser diyalêktî zaza le ber ewe ye ke binyatnanî rêzimanî zaza ta emro kem kewtûte ber nûkî qelemî kolînewey zanistî w lêduwan, legel eweş ke hendê têkst le diyalêktî zaza bilaw kiraw-netewe.

F. Miller, ke kurtey rêzimanî zazay nûsiwe ew têkste zazayaney bekar hênewe, ke P. Lérx bilawî kirdünetewe we degerrênewe ser goverekanî diyalêktî zazay nawçey Mûş û Palû*.

Her wehaş, K. Xadank tekste zazayîyekanî goverî zazay Sêwerek û zazay Korî bekar hênewin ke O. Mann le salekanî 1901-1903; 1906-1907 koy kirdünetewe we bilawî kirdünetewe. Be pêy em goveraneş nûserî nawbiraw berkolêkî le gramatikî zaza nûsiwe, belam boy rînekewtûwe, ke şwêni zaza le naw zimane êranîyekan da diyar xat**.

Hewldanekanî F. Miller we K. Xadank piley yeksanî binyatî gramatikî zaza w kirmancî diyar deken, awaş serkewtinyan le kareke da destgîr nebû. Çunke hêstan ewsa halet û diyar de bincinekanî gramatikî xudi kirmancî

* Müller, *Zaza-Dialekt der kurdensprache*, Wien, 1864

** Hadank, *Mundarten der Zaza*, Berlin, 1932

Leme bew lawe kurt kirawey K.X. bekar dehênenin le birîti K. Xadank.

der nekewtibû, bo ye kolînewe le forme dîyar xeryekan û diyar de gramatîkîyekanî diyalêktî zaza berawurdî legel kirmancî da betenhayî we be yeklayî derkewt.

Eme demanewe be şêweyekî giştî w bincî hebûnî cinse gramatikyekan we binyat û destûrî berkarî karî têperr le formekanî katî rabirdû da le diyalêktî zaza be berawurd kirdinewey legel heman dîyar de gramatikyekanî kirmancî pîşan bideyn.

Pêş ewey, ke dest be nûsînî halet û dîyar de gramatikîyekanî zaza w kirmancî bikeyn, debê hendê qise le ser hebûnî cins û binyat û destûrî berkar le kirmancî da bikeyn. Evey ke bo yekem car we here zor bas kirabêt, yaxud bayixî pêdirabêt le nêw basegramatikîyekanî diyalêktî bincî zimanî kurdî-kirmancî-, pirsiyârî haletekanî cins we binyatî destûrî berkare le karî têperr da.

Be pêy nawî heyî le roy cinsewe le kirmancî da boman der dekewêt, ke watay kes û giyanleberî mîyîne bigeyinin, we nave nêrînekanîş ew wuşanen ke, watay kes û giyanleberî nêrîne bêt. Balam nave heyîyekanîtir, ke watay kenkrêt «tewaw» we mefahîmî mücerred debexşin, detwanin bibin be cinsî nêrîne, yan mîyîne. Nişaney gramatikî cinsî naw le kirmancî da be pê yasay izafetewe bem cûre ye : -a bo mîyîney bê amraz, -i bo nerîney bêamraz, -ê bo nêrîney amrazdar e. Le yasay haletî nadîyariş da nişaney gramatikî na-wék, ke le grûpêk pêk hatibêt bo mîyîney amrazdar weyan bêamraz nişaney -e ye, bo nêrîney amrazdar nişaney - i ye, belam bo nêrîney bêamraz nişane niye ; be watay bêkotayî ye. Diyar e, ke nişaney izafet û nişaney haletî nadîyar ewe ye ke ew izafete w ew halete bo herdû cinsi naw le nawî tak da derdekewin, we le nawî ko da nîrîne w mîyîne lêk cîya nabnewe w yek nişaneyan heye. Bo herdû cinse nawekan tenha yek nişaneyan heye, ke ewîş nişaney -an e, ke bo haletî nadîyar bekar dehênrêt, we le haletî diyariş da tak û koy naw tenha be kotayî karekewe dîyar e.

Le binyatî berkarî têperr da le katî rabirdû da sobyekt (mentiqî)* be rîjey haletî nadîyar be derdekewêt we serinc radekêşê, belam berkarî rûdawewe -ebyékt- le rîjey haletî diyar be derdekewêt, lem halete da kar legel fa'ilî nadîyar da rêk nakewêt, belkû legel berkarî yekser (el-mef'ul'ul-mubaşır) be ser kotayî karekewe dîyar e. Em core binyate gramatikîye le kirmancî da be pesiv (karî karabizir -el mebnî li'l- mechul) dêt û be derdekewêt nek be ektîv (karî diyar -el mebnî li'l- me'lûm). Le kirmancî da binyatî pesiv be yarmetî karî yarmetîder, durust debêt paş ewey ke kare yarmetîdereke be karêkî têperrî watabexş durust debêt. Em cûre reg û rîşane le hemû ew rîjanewe dûr nîn, ke wezife w dewrî coreha we corawcorî nişaney haletekanî cins û nişanekanî izafet û formekanî haletî nadîyarî naw le kirmancî da debînin. Bo kolînewe le haletî cins û binyatî berkarî têneper le zaza da wa bebaş dezanîn, ke be şêweyekî rêk û guncaw le xasyetekanî diyar û aşkira we serinc rakêşî formî nawî nêr û nawî mî le yasay nişanekanî izafet û formekanî haletî nadîyarî naw da we berawûrdî legel heman cor le kirmancî da

* el-fa'ilul-mentiqî, el mustetîr

bikeyn, bem pilane zor baş hebûnî cins û binyatî izafet le zaza da bedîyar dekewê we detwanrê biryar le ser yeksanî w hawbeşî w lêkcûdayî w ciyawazî coreha formekanyan le herdû diyalekteke da -kirmancî û zazayî- bidrê.

Derbarey hebûnî haletî cins le zaza da K. Xadank tenha le ser ewe newestawe, ke çi core tipî nawî heyî le naw em cinsane da degerrêtewe ser em yan ew cinsî (nêr û mê), belkû serincî K. Xadank bo ewe royiştûwe, ke «cinsî rêzimanî le nawî heyî w awel naw ranaw rêjey karî diyxirraw heye w be diyar dekewê (K.X. 622)². K. Xadank hendê nîşaney izafet debatewe ser ew formaney rêzimanî aşkira w cins. Nîşanekanî izafeti nawî nêr le lay K. Xadank'ewe emanen : -e, -ê, -o, -i, bo nawî mîyîneş emanen : -a, -ya, -aî, -eî. K. Xadank sebaret aşkirayî w derkewtinî cins le haletekanî nadîyarî naw û ranawî tak le formî -e, -ê, hiç nalêt û em formane be formî «casus obligus»* -casus obligus- dadenê (K.X. 62, 63).

Le besî «zaza zimanî kurdi nîye» nîşaney lêkcûdayî zaza w kirmancî berçaw dekewêt, ke wayan le K. Xadank kirdûwe bawerr be kurdiyetî zaza nehêne we bilêt, ke le zaza da cins heye, belam le kirmancî da cins paşmaweye we mawetewe. K. Xadank denûsê :«Lék cûdayî cinsî gramatikî le zaza da zor be aşkira diyar e, awaş le kurdi rojawa da - kirmancî, K.K. - eweş detwanrê tenha be paşmawe dabinrêt» - K.X, 21. Piley êstay zanistî zimanî kurdi wutar derbarey paşmawetî weyan nebûnî cinsî gramatikî le kurdi da be diro dexatewe. Zimannasekanman em rayeyan ragirt, ke le serew da wutrawe, sereray eweş be endaze w pêwanî tewaw destnişanî hebûnî cinsyan le kiramncî da kird, herwehaş sebarêt nêr û mê le kirmancî da coreha form û nîşaneyan derxist her çun le nîzamî izafet da awaş le tesrifî naw da**.

Le zaza da nîşanekanî izafet bo tak emanen : -i, -ê, -a, -aî, eî, -o. Em nîşaneş keresten we cinsî gramatikî pîşan deden. Hendê nîşaney izafet le zaza da xasiyetî axawtinî goverekanî be der dexen. Nişaney «-i» yî izafet betenha we becûdayî le wanîtir le goverî nawçey Mûş û Palû da bekar dehênrêt, we formekanî izafet -e, -a, -aî, -eî lem gover û nawçane da bekemî bekar dehênrên (birrwane : têkstekanî P. Lérx, L : 88-110) ***.

Le goverî Sêwerek da formî izafet -ê zor bekar dehênrêt, belam formekanî -i, -aî, -eî ke ber çaw dekewen (K.X, 173-210), le goverekanî zaza Kor û zaza Kêxi da her formî izafet -i betenha bekar dehênrêt (K.X, 306-354). We le Cebaxcûr da formekanî -i, -ê, -o bekar dehênrên (K.X, 360-370). Lew têkstaney, ke le layen xomanewe nûsrawanetewe degerrênewe ser nawçey Batûm tenha formekanî -i, -ê, -a bekar dehênrên.

Wezîfey formekanî izafet le goverekanî zaza da le layek ciyawazî nêwan goverekan pîşan deden û le layekîtirîşewe têkelawî w yeksanî goverekan be-

* oblique case : haletî nadîyar

** birrwane : K.K. Kurdoev, *Grammatika kurdskovo Yezika (kurmanji)*, M.-L, 1957 ; N.I. Tisukerman *Ochirik Grammatiki Kurdskovo Yeziske - Trudi Institute Yezike znani ANSSSR*, 1956, T. VI ; - H. KH. Bakaev, *Govor Kurdov Turkmeni*, M.-L, 1962.

*** birrwane : P. Lerkh, *Issledevanie eb iranskikh kurdakh Ikh Predkakh - Severnikh khadankakh*, KN. III, SPB., 1858.

diyar dexen. Bewurdbûnewe le hemû têkstekanî goverekanî zaza be derdeke-wêt, ke formî izafeti here bekarhatû we bilaw le goverekan da, formî -î ye. Em formî izafete herwek gişt goverekanî zaza bigeynête yek waye we mîh-werêkîş e bo pîşandanî cins.

Pêş hemû şitek eme dêt, ke jimareyêkê zor le wuşe -formekanî -âi, -eî yan le zaza da be serewe diyar e, belam le kirmancî da formî «-a» ye. Em rewaletes binaxeyêkî waman bo destnişan dekat, ke bilêyn ew forme-izafet-yaney zaza legel ew wuşane bekar dehênrên, ke le cinsî mîyînen. Wezîfey formî izafet -âi, -eî, le zaza da legel wezîfey «a» y kirmancî tenasub dekat. Her em forme izafeteş detwanê bibête nîşaney cinsî nawî diyarxiraw.

Be temşaşakirdinî ew têkstaney, ke P. Lêrx û Lê Kok û K. Xadank hî xoman (mebestî Yekêtî Sovyet e -wergêrr) û herweha leser qisekanî K. Xadank sebaret hebûni cins le goverekanî zaza da delên, ke cins le zaza da herwek le kirmancî da taybet e be formî ranawî nîşaney tak ranawî kesî tak û ranawî heyî w hendê le rîjekanî kar. Formekanî cinsî gramatîkî diyar be ser nawyan ranawewe her nîşaney izafet û formekanî naw û ranaw in le haletî nadiyar da. Herwek le kirmancî da, ke derkewtinî cinsî nawî awelnawî dewestête ser nawî diyarxiraw, ke dekewne pêşeweyan. Derkewtinî cins be ser kotayı karekanewe yekêk e lew nîşananey, ke zaza le kirmancî cûda de-katewe. Haletakanitî derkewtinî cins le zaza da legel heman ho w halet deguncêt le kirmancî da. Nimûne :

zaza	Vaştûraî xo bide mi (PL, 88)
Keinaî ³ mi ha qonax da rûnişteî (PL.89)	Cinîâi dêwî va (PL, 80)
Ez cehanî estorê xu dana tu (K.X, 348)	Xalo xenceraî mi bide (P.L, 101)
Nameî eşireta te ⁷ çîna u ? (P.L, 96)	

kirmancî
Dasa xwe bide min
Keça ⁴ min wa qonaxê da runiştîye ⁵
Jina dêw got
Ez cenuya hespa xwe bidim ⁶ te
Xalo xencera min bide
Navê eşireta te çî ye ? ta d.

Komelewu şeyêk le zaza da heye, ke izafetî -âi, -eî werdegrin, belam le kirmancî da izafetî cinsî nîr werdegrin. Em diyar de gramatîkye teasubekî kem le wezîfey formekanî izafetî -âi, -eî we formî -a le zaza w kirmancî da bederdexat. Nimûne :

zaza	Hesenîk werişt, leşai dewî bird (P.L, 95) ⁸
Bin balışnaî dêwî ra şimsîrî dêwî vet, geraut (P.L., 95)	
To sereî xo taşt (K.X., 177)	
Qewxeî Sîwan û Abdula Begî (P.L. , 96)	
Awa nimûneytirîş hen.	

kirmancî
Hesenîk rabûrd ⁹ leşê dêw bir
Ji bin balgîyê dêw şimsîra dêw derxist. ¹⁰
Te serê xwe teraşt.
Qewxa Sîwan û Abdula Begê

Izafetî -a le zaza w kirmancî da betewawî wezîfey diyarxistinî mulkiyetî şîtek weyan danepalî şîtek bo lay nawêkewe debînê herwehaş le herdû diyâlêkteke da izafetî -a nîşanêkî gramatîkî cinsî mîyînaw e. Bo nimûne :

zaza

Nameî eşireta ti¹¹ çina u ? (P.L., 96)
 Pêy debara me¹² bibo (P.L., 87)
 Raya ma dûr a (K.X., 175)
 Ti¹¹ dersa¹³ xo wend o ? (K.X., 167)
 Bejna jaî kilm a (K.X., 160)
 Dergûşa jaî reşane (K.X., 175)

û nimûneytirîş.

Îzafetî -ê, -î be zorî le gişt goverekanî diyalêktî zaza da bekar dehênrêt, heman izafetiş, le diyalêktî kirmancî da tenha wek nîşaneyêkî gramatikî nawî diyarxivawî nêrîne diyar e. Îzafetî -ê, -î le zaza da nîşaney nawî diyarxivawî cinsî nêrîne w mîyîne ye, lew haletey, ke nîşaney cinsî nêrîne ye le-gel izafetî -e, -î le kirmancî da yek degrêtewe, leber ewe detwanîn bilên, ke izafetî -ê, -î le her dû diyalêkteke da nîşaneyêkî gramatikî cinsî nêrînen, serray ewey, ke le wezîfes da le her du diyalêkteke da yek in. Yeksanî w wekyekî naw le rûy qebûlkirdinî izafetî -e, -î le herdû diyalêkteke da be der-dekewêt, we le kirmancî da debinîn, ke hendê naw izafetî -e werdegrin hendi nawîturiş izafetî -a. Nimûne le bekarhatinî izafetî -ê le zaza da :

zaza

a) Namê to çicho ? (K.X., 173)
 Min goştê miyêr wardo (K.X., 174)
 Meîmanê ma (K.X., 175)
 Pêr laceki karwanî ra pers kird (K.X., 195)¹⁵
 Destê pêrê xo lau na pa (K.X., 197)
 Qismetê min (K.X., 204)
 Welatê Mêrdînê di (K.X., 204)
 Baxçê tu estu ? (P.L., 95)
 Qaulê camêrdan (P.L., 95)
 Serê xoe taîst, riê xoe taîst (P.L. 121)

û hîtir

b) Ricaê karwanî pîrê lacekî qabul kird (K.X., 196)¹⁵
 Merlatê xo kird¹⁵ xo dest (K.X., 195)
 Kilîtê qapî (K.X., 200)
 Dostê min (K.X., 328)
 Qawxê Nêrib û Sîwanî (P.L. 111)
 Kêfê ma haul u (P.L., 96)
 Texmînê xo va (K.X., 204)
 To cuabê kahit ard ? (K.X., 181)

û hîtir.

Bekarhatinî -î le zaza da :

kirmancî

Navê eşireta te ci ye ?
 Pê debara me bibe.
 Rîya me dûr e.
 Te dersa xwe xwendiyê ?
 Bejna wê kurt e.
 Dergûşa wê bihejîne.

kirmancî

Navê te ci ye ?
 Min goştê miyê xwar¹⁴
 Mêvanê me
 Bavê kur ji karvan pirs kir.
 Destê bavê xwe paç kir.
 Qismetê min
 Wealtê Mêrdînê da.
 Baxçê te heye ?
 Qewlê camêran
 Serê xwe teraşt, rûyê xwe teraşt.

Rica karvan bavê kur qebûl kir
 Mertala xwe kir destê xwe.
 Kilîta qapî
 Dosta¹⁶ min
 Qewxa Nêrib û Sîwanê.
 Kêfa me xweş e.
 Texmîna xwe got.
 Te caba kaxezê anî ?

zaza

- a) Babî min ez daya tu (K.X., 342)
 Birai pîlî (P.L., 87)
 Vengî xoe (P.L., 88)
 Goştê gaê surî (P.L., 91)
 Ahmed lacî Eli Axaî (P.L., 101)
 Destê xoe berd zereî şibakê (P.L., 101)
 Eskerî Ebdula Axaî (P.L., 110)
 b) Çeki xoê bide min (P.L., 110)
 Qonaxê mî (P.L., 89)¹⁷
 Kêfi tue (P.L., 89)
 Fincanî diyîni (K.X., 319)
 Roucî quauxê (P.L., 119)
 Malî mi (K.X., 316)
 Şimşiyêrî dêwî bîge (P.L., 94)
 Ina desmalî jinî min a (K.X., 328)

kirmancî

- Bavê min ez dame te
 Biraê mezin.
 Bangê xwe.
 Goştê gaê sor.
 Ehmed kurê Eli Axa.
 Destê xwe bir hindurê şibakê
 Eskerê Ebdula Axa.
 Çeka xwe bide min.
 Qonaxa min
 Kêfa te
 Fincana dudan
 Roja qewxê.
 Mala¹⁸ min
 Simşîra dêw hilde¹⁹.
 Ew²⁰ desmala jina min e.

û hîtir.

Ew nimûney serewe yeksanî w hawbeşyetî nêwan zaza û kirmancî pîşan deden, her wehaş diyar e, ke wuşe le zaza da be ïzafetî -ê, -î le naw qewarey terkîbî naw da xoyan degorrin û bedwayewe wek nawî cinsî nér û mî be derdekewin. Le kirmancî da beşêk le nawan be ïzafetî -ê denasrên le cinsî nér da, we beşekey duwemî ke nawî mîyîne ye be ïzafetî -a. Ger bêtû bigerrînewe ser nawehîyekan derdekewêt, ke cinsî naw le kirmancî w zaza da yek serçaweyan heye. Le qwarey nawêk da diyar e, le diyalêktî zaza da ïzafetî -ê, -î yek wezîfe debînîn we debine nîşaney cinsî nîrîney temellûkî na-wî diyarxiraw, bo ye gelê car wezîfeyan têkel yek debin. Em diyar de grammatîkyeş le zaza da zor berçaw dekewê le gelêk têkstekanî zaza da, ke degerrê-newe ser coreha goverekanî. Carî wa heye, ke wuşeyêk lem diyalêkte da legel ïzafetî -ê hatuve we carê waş heye legel ïzafetî -î. Nimûne :

Berawurd :

- | | |
|--|---------------------------------------|
| Îzmî mî ¹⁷ bide (P.L., 101) | Îzmî mî ¹⁷ bide (P.L., 84) |
| Malê şima (P.L., 105) | Malî tue (P.L., 101) |
| Jiniê xo ra va (K.X., 329) | Jini min (K.X., 328) |
| Dostê min (K.X., 328) | Dostî tu (K.X., 328) |
| Qaulê camerdan ya u (P.L., 95) | Qaulî camerdan ya u (P.L., 95). |
| Enoê quauxê Tirkan nu (P.L., 95) | Qauxî Siwan û Ebdula Begî (P.L., 96) |
| Ez cebabê dewî dana (P.L., 88) | Tu cuabî min nîarda |
| Wextê xoê da | wextî xoê da (P.L., 104) |

û hîtir .

Bem pêye formekanî ïzafetî tak -a, -e, -ê, -î kurte hawbeşîyek le nêwan diyalêktî zaza w kirmancî da pêk debênin. Le kirmancî da ïzafetî -a, -e, bes be nawemêyînekan delkêt, belam ïzafetî -ê, -î, be nîrînekan ; be watay ema-

ne wek nîşaney pîşandanî gramatîkî cinsî nawî heyî wezîfe debînin. Wezîfey izafet le zaza da ewîş le binc da her wa ye, belam be ciyawazî le kirmancî, ke wezîfey izafeti gramatîkî le zaza da lew halete da, ke cinsî gramatîkî nîşan dedat cûda debêtewe, debînin, ke hendê car be nawî nérîne delkên û hendê carîtiriş be nawî mîyîne. Em wezîfetêkelawîyey izafet le zaza da berew le nawçûn decêt le pîşandanî haletî cinsî gramatîkî.

We herweha haletekanî cinsî gramatîkî le zaza da le hendê formekanî kariş da be derdekewin be taybetî le karelikawekan û formekanî katî rabirdûy kesî sîyemî takî kar. Em rûdawe rîzimaniyeş nîşanêkî taybet e bezaza we le kirmancî cûda dekatewe, çunke le kirmancî da cinsî gramatîkî le formekanî kar da bediyar nakewin. Leme da formî karekan nîşaney nér û mî be diyar dexen.

Le diyaléktî zaza da formî -o be serkarekanewe nîşaney cinsî nérîne ye we formî -a nîşaney cinsî mîyîne ye. Nimûney cinsî mîyîne :

zaza	kirmancî
Ina cerîeî min a (K.X., 323)	Ew ²⁰ cariya min e.
Ina jinî rind a (K.X., 399)	Ew ²⁰ jina rind e.
Ina jinî niêweş a (K.X., 306)	Ew ²⁰ jin nexweş e.
Raya çend rojan a ? (K.X., 179)	Rîya çend rojan e ?
Dersa min ewro çetin a (K.X., 176)	Dersa min iro çetin e.
Ina desmali dosti min a (K.X., 328)	Ew ²⁰ desmala dosta min e.

û nimûney tirîş.

Nimûney cinsî nérîne :

zaza	kirmancî
Inuê merdim rind o (K.X., 369)	Ew ²⁰ meriv rind e.
Persê merdimîdê pîlê xerab nîo (K.X., 181)	Pirsa merivêd pîr xirab nîne.
Inî nîweşe (K.X., 306)	Ew ²⁰ nexweş e.
Inî rebbî ma o (K.X., 310)	Ew ²⁰ rebbê me ye.
Tutunê min rind o (K.X., 178)	Tituna min rind e.

û hîtit.

Formî karî katî rabirdûy kesî sîyemî takî kotayîhatû be pîti «-a» yî bîzwêni dengdar nîşaney cinsî mîyîne ye, belam heman formî kotayî sıfir (bêpit yan bêkotayî -wergérr) nîşaney nérîne ye. Bo nimûne :

zaza	kirmancî
Ina kauta	Ew ²⁰ ket ²¹
Inî ²² kaut	Ew ²⁰ ket
Tuyê ina jinî kişa (K.X., 469)	Te ew ²⁰ jin kuş ²³
Inê eslanî inê ²⁴ merdim kişt (K.X., 369)	

û nimûney tirîş.

Cinsî nawî nêr û mî le zaza da hemisan le haletî nadiyarîş da el haletu'l-mef'uliyye be derkewêt. Formî haletî nadiyar -î ye be nawî nêrîne delkêt we -ê be meyîne. Em xasiyetey nêr û mî le zaza da be tewawî legel kirmancî deguncêt û herweha legel soranîş -wergêrr-lêre da nîşaney -ê bo cinsi mîyîne bekar dêt deçête ser ew nawaneş, ke bê amraz in, we nîşaney -î, ke bo nêrîne legel ew nawane be derdekewê, ke amrazdar in. Ger hatû kotayîyeke bêamraz bo ewsa kotayî sıfır (bêpîti nîşaneyî -wergêrr) ew dewre debîne. Le zaza da hendê car ew nîşanane le haletî nadiyar da têkel debin, we carî waş heye le koy naw le haletî nadiyar hebê em nîşane cinsiyane be dernakewin. Nimûne :

zaza

- a) Weherî keyî kilîtê qapî veta (K.X., 200)
- Cinaî dêwî kaxit geraut, akird (P.L., 89)²⁶
- Çimî haşî (K.X., 309)
- Aukî embarî (K.X., 330)
- Cinazê 'Elî Axaî (P.L., 102)
- Pasaê Misirî (P.L., 111)
- Pêrdê lacakî (K.X., 195)
- Kenaî Axaî (K.X.)
- Qonaxî Temir Begî (P.L., 120)

b) Aukî Şêlê (P.L., 105)

- Merdumî hukmatê (K.X., 333)
- Kakilê gwîzê (K.X., 11)
- Roci qauxê (P.L., 113)

c) Têkelawî nêr û mî bezorî w betaybetî lew têkstaney, ke le layen P. Lêrx û min (mebest K.K. Kurdojêv e -vergêrr) ; berçaw dekewêt. Bo nimûne :

zaza

- Xelîf Axaî va (P.L., 113)
- Xelî Axa va (P.L., 112)
- Cinazê lacî (K.X., 6)
- Ningê lacek (K.X., 11)
- Jinî va (P.L., 118)
- Kéinek me re va (P.L., 118)
- Hesenekî va : biraryêni (P.L., 118)
- Hesenekî va : biraryêni

û hitir.

K. Xadank dû core riste dehênetewe legel karî têperr da le gerdanî serfi katî rabirdûy kar le zaza da, wek : corî ristey be berkarî yekser û corî ristey bêberkarî yekser. K. Xadank nawî em core ristane be «bînay pesîv» debat.

Sebaret carî yekemewe K. Xadank denûsêt «pesîvî karî tepêrr le katî rabirdû da kotayî kesî wernagrêt (L., 90). Em diyar de rîzmanî ye bem ni-

kirmancî

- Xudanê malê kilîta derî avîte derva²⁵.
- Jina dêw kaxez hilda, vekir.
- Çawê hirçê
- Ava embarê
- Cinazê 'Elî Axa.
- Paşâ Misirê.
- Bavê kurik
- Keça Axa.
- Qonaxa Temir Begê

Ava Şêlê

- Merivê hukumetê
- Kakilê guzê
- Roja qewxê.

kirmancî

- Xelîf Axa got
- Lingê kur
- Jinê got

(leweş da) Hesenik got : birano, em herin²⁷

mûnaney xwarewe ron dekatewe : Min kird¹⁵, toê kird, aî kird, ma kird, şima kird, ina kird.

Derbarey corî duwemî riste K. Xadank delêt bînay pesîv lêre da pêwîstî be mubteda «fa'ilî nadiyar» heye le «casus obligus» we herweha pêwiistî be berkar heye le haletî diyar da. Be nimûneş em ristaney xwarewe nîşan dedat : - To tuî werdi ?

- To çicî ardî ? (K.X., 90)

Eme ziyad lem çend kurteristekaneman nedîtun ne le karî têperr da, ne le karekey K. Xadank û ne le karekey Fridrix Miller, ke kurtebasêkî le ser zaza nûsiwe be pêy ew têkstaney, ke P. Lérx nûsiwyetî. Be pêy ew kurtebasy, ke K. Xadank nûsiwyetî weyan nûsinakanî hendê nûseritir detwanîn, ke ristes le kirmancî da bikeyn be dû cor ; riste legel berkarî yekser û corî ristey bêberkarî yekser. Lem diyalêkte da be corî yekem delên bînay berkar we be corî duwem delên bînay bêberkar we be corî duwem bînay bêberkar.

Herwek diyar e, ke em core bînaye le kirmancî da zor baş û be pêy pêwîst lêkoldirawetewe, we nîşanêkî rézimanî aşkiran le kirmancî da. Em bînaye le kirmancî da be pesîv dernakewin, bekû beektit, çunke pesîv le kirmancî da rîga w hoy dirûstbûni taybetî xoy heye.

Be wurdbûnewe le diyalêktî zaza derdekewêt ke lem diyalektêş da her heman çesn heye. Dwabedway ewe bekar hênanî zaraway «bînay pesîv» betewawî nawerokî riste bekari têperr le katî rabirdû da nagrâtew. Bo diyarxistinî tewawî em bînaye zaraweyêkitir heye, ke le kurdşinasî da zor baş bekar dê w deguncê w royiştûse, ke zarawey «bînay beberkar û bêberkar» e. We nebê yeksanî em bînaye le zaza w kirmancî da be nawerok û dirustbûnyanewe bêt belkû be wuşewe ye, ke le her dû diyalêkteke da formekanî cins û jimare w haletî nawî heyî yek in.

Debî eweş têbînî bikrê, ke le zaza w kirmanî da le bînay nawî karî têneperriş da em bînaye beramber yek dewestê. Le herdû diyalêkte da, xasiyetî legel yek guncanî formî kar û fa'il le haletî diyarî bînay nawî da we lew ristane da, ke karî têneperri katî rabirdûyan têda heye. Bo nimûne :

zaza	kirmancî
ez kautan	ez ketim
to ²⁸ kautî	tu ketî
o (yan aî) kaut	ew ket
ma kautîme	em ketin
şima kautî	hun ketin
înan ²⁹ kautî	ewan ketin
merdim ameya	meriv hat ³⁰
merdim ameyî	meriv hat ³¹

Nimûnekanî serewe wekyekî formekanî kar le kirmancî w zaza da pişan deden. Le herdû diyalêkteke da karetêneperrekan kotayı lêk ciyawazyan heye, ke jimare w kesî fa'il be derdexen. Lêre da ew fa'iley, ke ranawî kesî ye, le herdû axafineke da le haletî diyar da be derdekewin. Jimarey fa'il, ke

ranawî kesî ye, her çon bexudixoyewe awaş be kotayî karewe diyar e. Belam ew fa'iley, ke nawî heyî ye lêre da tenha be kotayî karewe denasrêt û diyar e.

Bem pêye le bînay nawî da hawbeşî bînayî w yekbûnî resenî formî beşekanî riste le zaza w kirmancî da yek degrinewe. Herwehaş hawbeşî le nêwan zaza w kirmancî be berawurdkirdinewey beşeserekyekan ristey beberkar û bêberkar le bînay karî têperr le katî raIRDû da be derdekewêt. Awa le bînay nawî ristey bêberkar da fa'il le herdû diyalêkteke da le haletî nadiyar debê, we jimareşî behoy xudî formekanyewe diyar e, xeberî ristekes le formî namumeyêz debê. Bo nimûne :

zaza	kirmancî
min kird ¹⁵	min kir
tuê (yan toê) kird	te kir
o ³² (yan aî) kird	ewî kir
ma kird	ve ³³ kir
şima kird	we kir
înan kird	ewan kir
nêçîrwan kişt	nêçîrvan kuşt
nêçîrvanan kişt	nêçîrvanan kuşt

Lew haletey, ke lem bînaye da fa'il nîye, formî kar, nîşaney kesî sêyemî tak werdegrêt (kird) û legel kariş le bînay nawî da xoy deguncenêt. A em xasiyetîye ye, ke le qewarey nawî bînay bêberkarîye le zaza da we be tewa-wîş legel heman cor xasiyet le kirmancî da yek degrêtewê.

Yekbûnî formeakanî gramatikî le zaza w kirmancî da le bînay berkarîş da bediyar dekewê. Hawbeşeti zaza w kirmancî lem ruweşewe be derdekewê, ke fa'il le haletî nadiyare we karî xeberî ristes be kotayî cûrawcûr be derdeke-wê we legel berkarî yekser da le roy kes jimare xoy deguncenêt. Em xasiyeteş betewawî w beronî diyar dekewê ger hatû berkar ranawî likaw bû. Bo nimune :

zaza	kirmancî
To ez êştam be rere çarsû (K.X., 90-91)	Te ez hiştim ³⁴ nav çarşuyê.
Ma şima kiştê (K.X., 82)	Me hûn kuştin.
Înan ma kiştîma (K.X., 369)	Ewan em kuştin.
Bira kamî to ardî ?	Bira kê to anî ?
Tuê îna jînî kişa (K.X., 369)	Te ew jîna kuşt ²³
Tuê ameî, ez arda (K.X., 330)	Tu hatî ez anîm
Çira înan ma kiştîma ? (K.X., 182)	Çira ewan em kuştin ?
Dêwî ez diyan, ez geraût, arda, besta enoe zîndan (P.L., 94)	Dêw ez dîtim, ez girtim, anîm, kirim vê zîndanê.
Babî min ez daya tu (K.X., 242)	Bavê min ez dame te.

Le nimûnekanî serewe da ranawî kesî le zaza da dû forman derkewtûn ; be formî haletî diyar û formî haletî nadiyar. Em herdû formaneş le binc û binewan û wezifeyan da legel heman cor form le kirmancî da rêk dekewin,

tenha ranawî kesî duwemî ko nebêt «şima», ke wek formêkî bêlayen erkî xoy cêbecê dekat û beramber formî «hun» ê haletî diyar û «ew» î haletî nadiyar dewestêt, ke ranawî kesî kirmancî n. Le herdû diyalêktekan da ranawekeseykanî haletî diyar le bînay berkar da wek berkarî yekser bediyar derdekewin, belam le haletî nadiyar da wek fa'îl.

Hawbeşî le durust dirdinî bînay berkar le zaza w kirmancî da nek tenha her le formekanî karî xeber da diyar e, ke le kes û jimare w berkarî yekser da, yek degrinewe, belkû leweş da be tewawî diyar e, ke formekanî fa'îl le nawî heyîyewe le roy halet û cinsî temelluk yek degrinewe. Halet û cinsî temelluk, ke fa'ili bînay berkar in, le kirmancî da be formî derewey naw be diyar dexirên, gor naweke kotayı be nişaney nadiyarî -ê hatibû, ewe nişaney cinsî mîyîne ye, belam eger naweke kotayı be -î hatibû yan be bêkotayı bû, ewe nişane ye, ke naweke le cinsî nîrîne ye. Le zazaş da her be heman nişane destnişanî haletî cinsî nawekan dekrêt le diyarxistinî nîr û mî da. Legel eweş hendê carî wa heye, ke lem diyalêkte da nişaney -ê, -î le haletî nadiyar da têkelawî yek debin. Bo nimûne :

zaza

Jinék jû mange da mîrdî xu (K.X., 370)
Eslanî pêşê min dirna (K.X., 195)
Ciniaî dêwî kaxet wend, ku dêw tê dâ
nosnu (P.L. 92) ³⁵

kirmancî

Jinik mehek da mîre xwe
Eslan pêşa min dirand
Jina dêw kaxez xwend, ku dêw tê da nîvisî-
ye.

Le herdû diyalêkteke da berkarî yekser, ke nawî heyî ye, le bînay berkar da le haletî diyar debêt, nişaney jimarekeyeş be ser kotayı karewe diyar e w xoy niwandûwe. Bo nimûne :

zaza

Min eslan kişt (K.X., 195-196)
Tu biraî min kişto (P.L., 117)³⁶
Tu cuabê kaxitê erd (K.X., 181)
To dikanê xo akird (K.X. 177)²⁶
Tue ehende eskerî mi kişt, tuê şes davî³⁷
mi veşnaî, talan kirdî (P.L., 105)³⁸

kirmancî

Min eslan kuşt³⁶
Te biraê min kuştîye.
Te caba kaxetê anî.
To dikana xwe vekir.
To ewqas eskerê min kuşt (in), to şes gundê
mi (n) vejandin³⁹, talan kirin.

Dîsan le zaza w kirmancî da yekbûnî gramatîkî be pêy em bînayaney baskiraw le serewe da le nawî heyî be derdekevê, ger hatû nawekê le jimarey ko bû we fa'ili bînay berkarî w bêberkaşî bû. Le herdû diyalêkte da amrazî -an nişaney nawî ko ye le haletî nadiyar da. Bo nimûne :

zaza

Ramiljan remil eşt (K.X., 310)
Nêçîrvanan wurg⁴¹ kişt
Jinian eşt

kirmancî

Ramildaran ramil hişt⁴⁰
Nêçîrvanan gur kuşt
Jinan hişt⁴⁰

Belam ger le bînay berkar da fa'îl û berkar le yek kat da nawî heyî weyan ranawî takbûn û karî xeberî ristekeş be pêy pêwîst kotayî rîk kewtû legel fa'îl yan berkar dexwazêt, lêre da natwanrê be aşkira w ron diyar bixrêt, ke kotayî karî xeber legel kameyan deguncêt ; legel fa'îl yan legel berkar. Em diyar de rîzimanîye le zaza w kirmancî da ladanêke le gerdanî karî teperr, le rastîs da karî em cûre ristane her belay berkar dadekewin, em riwaletes zor baş lew ristane da be derdekewin, ke berkarekanyan diyarxer-yan heye we diyarxerekeş bîryêtî ye le jimare yan ranaw. Lem cûre halete da kotayî kar le kirmancî da «-in» e we le zaza da «-î» ye herwehaş gerdanî kar «kuşt» le kirmancî da, we karî «kişt» le zaza da, ke nîşaney ranawî kesîyan be serewe niye, destnişanî jimarey berkarî yekserî bînay berkar deken.

Nûsînî formekanî cins be yarmetî nîşaney izafet û naw le haletî nadiyar da le layek we şî kirdnewey beşekanî riste le bînay nawî berkar da le layekî-tirewe, we berawurdikirdinewey legel heman cûrxasiyet le kirmancî da rîgây eweman dedat, ke bawerr be ray X. Abovyan, P. Lérx, lê Kok, F. Strêker, F. Miller, K. Bedurxan, N. Dersimî, K. Badillî û ewanitir bihênin, ke zaza be diyalêktêkî serbexoy zimanî kurdî dadenên. Le zaza da hendê şit hene deger-reñewe ser diyalêktî kirmancî xwarû, belam beramber ew şitaney, ke deger-reñewe ser diyalêktî serû kem in.

Wergêranî le rûsiyewe : Dr. İbrahim 'Ezîz İbrahim
mamostay ziman û rîzimanî kurdî le beşî
kolêcî perwerde da.

**1 Le çapkirawekanî Korri zanyarî Kurd (û le bergî pêncî Govarî Korri Zanyarî Kurd),
Bexda, 1977**

SAS

2	K.X., 622	K.X., 62
3	keînaî	keyney
4	keça	keçen
5	rûniştiye	rûniştiñe
6	bidîm	didim
7	te	to, tue
8	bîrd	berd
9	rabûrd	rabû
10	derxist	derxist, girt
11	ti	to, tue
12	me	ma
13	dersa	dersê
14	xwar	xwariye
15	kird	kerd
16	dosta	dostê
17	mê	mi

18	<i>mala</i>	<i>malê</i>
19	<i>hilde</i>	<i>bigre</i>
20	<i>ew</i>	<i>ev</i>
21	<i>ket</i>	<i>kettiye</i>
22	<i>îni</i>	<i>ino</i>
23	<i>kuşt</i>	<i>kuştîye</i>
24	<i>inê</i>	<i>ino</i>
25	<i>avite derva</i>	<i>derxistiye</i>
26	<i>akird</i>	<i>akerd</i>
27	(em herin)	<i>bo wergêrranî ristey zazayı «em herin» zîyade ye.</i>
28	<i>to</i>	<i>ti</i>
29	<i>înan</i>	<i>ê, yê</i>
30	<i>hat</i>	<i>hatiye</i>
31	<i>hat</i>	<i>hatine</i>
32	<i>o</i>	<i>ey, ay, yê</i>
33	<i>ve kir</i>	<i>me kir</i>
34	<i>hiştim</i>	<i>avêtîm</i>
35	<i>nosnû</i>	<i>nostû</i>
36	<i>Le wergêrraweke da em risteye dernekewtûwe</i>	
37	<i>davî</i>	<i>dewî</i>
38	<i>kirdî</i>	<i>kerdî</i>
39	<i>vejandin</i>	<i>şewitandin</i>
40	<i>hişt</i>	<i>avêt</i>
41	<i>wurg</i>	<i>varg, verg</i>

"سید" به قه‌لی رووی کرده مسئولی کومیسیونی ته‌شکیلات.
دیار بwoo بونی سکالای له ده م ده هات و گوتی : ئهوانه گوئی ناهنی!
مسئول : رووی له لای من کرد و گوتی کاکه گیان مه‌سله‌که زور
جدیه گوئی بدنه‌نی فشه نی‌یه!

منیش بُو ئه‌وهی نیشا ن بدهم که لم هه‌للاهه‌لایه مه‌به‌ستیکم
نه‌بووه و پرسیارم بُو هاتوته پیش‌ده‌ستی راسته زوو هه‌لینا تاکوو
بهم چه‌شنه تا وانه‌که‌م بشومه‌وه روم کرده "سید ئه‌بوو" و گوتیم
چاوه‌که‌م پرسیارم هه‌یه؟

- فرموو پرسیاره‌که‌ت چی‌یه؟

- سکا يه ئه‌گه‌ر ده‌کری بفه‌رموو کوزیلکه يانی چی؟

- گوتی کوز له شوللیکی ته‌ر و با ریکی سووره‌یی دروست ده‌کری
به چه‌شنبیک که شولکه‌کان به ده‌وری داری راست و بیریک ئه‌ستور که
لای ئه‌ستورا يان له‌نیو عه‌رز ده‌گرن ده‌تندریت‌وه، ئه‌گه‌ر سه‌وه‌ته-
تان دیبی به جیا وا زیکی که‌مه‌وه کوز وه‌ک سه‌وه‌ته ده‌چی و ده‌توانین
بللیین کوز له بنه‌ماله‌ی سه‌وه‌ته‌یه!! که له هه‌ندیک شوینی کوردستاندا
برا ئا زه‌لداره‌کانما ن قه‌در و حورمه‌تی کوز نازان به بی‌حورمه‌تی
له قوژبئی ته‌ویله‌کاندا سازیان ده‌که‌ن که به‌راستی جیگای داخه.
خولاسه کوز بُو راگرتني بدرخ له نیویدا که‌لکی لی وه‌رده‌گیری.

دیسان ده‌ستم به‌رز کرد و سه‌ری زمانم سووتا و گوتمه‌وه جا
کاکه کوز ج په‌یوه‌ندیکی به شانه‌وه هه‌یه؟ سید ئنجا به قه‌لی
له حدیفی من وه‌ک چه‌وه‌نده‌ری سوور هه‌لگه‌ریا بwoo و ئه‌گه‌ر پتەت لى
دا با ده‌قەلەتی به گه‌رووی پر له بوغزه‌وه گوتی : شانه‌ش کوزیلکمیکی
بچکولانه‌یه... له سه‌ری مه‌رو کاکه گیان!!

دیسان دووپا تم کرده‌وه کاکه ره‌خنەم هه‌یه. ئاخر قوربا نی
ئه‌و به‌زئن و بالایه‌ت بم که ده‌لیئی شوئه‌بی‌یه. خۆ من و کاک سه‌دیق و
ما مه قاله به‌رخ نین تو هه‌روا سووک و ئاسان له کوزمان ده‌کمە.
ئه‌گه‌ر ده‌کری باشتر روونمان بکه‌وه ۱۰۰۰!

X X X

بُوله‌یه‌کی لی هات و به زه رده خنه‌یه کچا وی له کاکی مه‌سئوول داگرت
بهو مانا یه که هه مهوو سه‌رشانه‌کان حازرن و هه‌ستیته سه‌ر پی جمله‌سه-
که‌ی بکاته‌وه . مه‌سئوولی ته‌شکیلات زور به ناقا یلی له‌سر جینگایه‌که‌ی
راست بووه و گوتی شانه و سه‌رشانه چنه و ئەركی یان چی یه ؟

خوشک و برا یان مه‌بهمستم له شانه شانه‌ی سه‌ری و سه‌رشانه‌ش
شانه‌کردنی سه‌ری بی مهوو وه ک "کاک فه‌تتاچ" و "سید ئەبوو" نی یه،
بەلکو مه‌بهمستم له شانه ئەوه‌یه که شانه‌ی حیزبی حه‌وت ددا‌نی هه‌یه و
ھەركام له ددانه‌کانی نیوه راستی پیان ده‌لیین ئەندامانی شانه و
دوو ددانه‌کانی لای قه‌را غی که ئەستوورترن بەلای چه‌پهی ده‌گوت‌تری
مه‌سئوولی ئا مهووزشی و هی لای راسته‌ش که برىیک ئەستوور و دریزت‌رە
پی ده‌لیین سه‌رشانه ۱۱۱ پاش هیندیک وتويزی دیکه کوتایی بە
ئا موژگاری‌یه‌کانی هینا و دانیشته‌وه .

"سید" به دوای ئەودا قیت بووه‌وه . وه ک سه‌ربا زیک له پیش
سه‌رۆکی را وه‌ستا بی دوولاقی به ئەندامانی نیو میتریک لیک دوور راگرتو
ده‌ستی چه‌پهی‌له سمرپشتیت‌نده‌که‌ی بwoo و پیچ و کلاوه‌که‌شی بەلای چه‌پهی
سه‌ریدا لار کردبۇوه ، لەشی له پشتیند بەره و سه‌ر بەلای راسته‌دا
که میک خوار ببۇوه ، کاغذه‌که‌ی هینا یه بەر چا وی و گوتی : به ئىزنى
خوشکانی خوشە‌ویست ، لووتی قرۇز کرده‌وه و چەمبوله‌یه‌کیشی له براکان
نا !!

فەرمۇوی شانه به مانا کوزیلکه‌یه که کوزیش وەک ئاگادارن
بەرخى تىدا کۆدەکریت‌وە و ھەر وەها له نیو و تەکەيدا هیندیک وشەی
گرانی کوردی هەلبىزاد بwoo و دەر خواردى ئیمەد دەدا که به پا‌ستی
ھیج شتیکی لی حالى نەبۇوم . سەرم بردە بن گۆئى "کاک سەدیق" بە
سەبرا یی‌مک پیم گوت : ئەرئى تو شتیک حالى بwoo ؟

سەری ھەلینا و بە دەنگى بەرز قاقا یه‌کى كېشا و دەستیکى بە
برۇکانی دا هینا و گوتی نا وەللا "کاک ئەبوو" يه ئىیدى ھەرجى دەیللى
با بىلى ... ئازاده ۱۱۰

ھەموو لايەک سەريان له لای "سید" را بۇ لای ئیمە سوورا‌ند .
چۈن بەپا‌ستی "کاک سەدیق" بە پیکەنینه‌که‌ی و دەنگى بەرزى ولاتى
شىواند و ھەموو شتیکى تىك دا .

رووی له لا کردم و گوتی: کاکه گیان نا مه کانت هه لگره نهیینی بپاریزه.
 نامهی لووله کراوم کردهوه، نووسرا بوو: نهیینی ... ها وریی
 به ریز و خوشه ویست سه ر شانه ژماره ۱۴۵ روژی دووشه مو سه عاتی
 چواری پا ش نیووه رؤییه له سالونی دویی دیموکراتدا بو ریک و پیک
 کردنی کار و با ری شانه کان کوبوونه وه ما ن پیکدهوه همهیه تکایه له
 کاتی دیا ری کراودا به یه ک بگهین زور سپاس ... خزمتکاری گهله
 نیشتمان "سید ئەبوو".

روژ و سه عاتی دیا ری کراو خوم ئاماذه کرد و ده مویست به
 سپا ییهک خوم له "خالله" و وان بشارمهوه و نهیینیش بپاریزم!
 ده رگای دیوه که م کردهوه که به سپا یی ویستم خومیان لئی بدزمدهوه له
 پراها و پریان به یه ک ده نئه گوتیان ئه وه بو کوئی؟ نا ... نا ... خومان
 لئی مه ذه وه چون ئاگا دارین که بو کوئی ده چی! ده رکه و توش سریشا -
 نهی! بە سه ر سورمان چاویکم لئی کردن و سه ری خوم دا خست و بەره و
 سالون و ده ر که وتم. له ریگا دا چهند که سه رشا نه کانیان
 خستبوه ژیر چاوه دیئری تا چاویان پیم که وتبه ده نگی بەرز لئیان
 له هوریا دام و به گالتنه دهیان گوت: ئای .. ئای وەرن بپروانن
 ئەمەش سه رشا نه یه ئای عاله مینه سهیر کهن ... گویم نه دانی و رویشتم
 تا گەیشتمه بەر ده رگای سالوندکه، کەوشە کانم ده ربنا و له جئی
 دیا ری کراو دام نا و چوومه نیو ژووره که و سلۇوم کرد و عەلیکیان
 پی دامدهوه . چون پیش چاوم تاریک بوو هەر بۆیه یه ک دا به دوو
 نەم زانی له کوئی دابنیش بەلام له و کاته دا گویم له ده نگی ها وری
 کاک سه دیق بوو که گوتی: وەرە لای من دانیشە . منیش بە کوپرە کوپر
 ئە مری ها وریم بە جئی هینا تا ورده ورده چاوه کانم به تاریکا یی نیو
 دیوه که راھات و ئە مجار به جوانی هەمۇویا نم ناسی یه وه کە به
 تەرتیب خوشکان له لای سەرە وە و برا کانیش لەلای خوارە وە، مەئولى
 کۆمیسیونى تەشكىلاتىش له ما بەینى خوڭىغان و برا ياندا پالى دا بۆوه.
 "سید ئەبوو" بەریز و شوینى كوردىيەتى له نزىك ده رگای ژووره کە
 كوتە كا غەزىك به دەست و پە روهندە يەكى ئەستوورىشى له پیش خەزى
 دانابوو و دانیشتبوو. منیش دەستىكەم وە بەر چەنەگەم دا بوبو و چاوم
 له "سید" بېرىبىوو کە بزا نم چ دەللى و چمان فىر دەكا . له پىر "سید"

عالهمه هر له خورا ودها له يهکتريان هدلکيلا بwoo و له يهکتريان ده کولی يهوه ببwoo جي سه رنج و سه رسورومن !
کوبوونه وه شانه ببwoo به مسهله ده رؤژ که رؤژ تاكوو ئیواری
له زار و زمانی که سنه ده که ده دهيا ن گوت و ده دهيا ن گوتهوه . "سهيد
ئه بwoo" وەک پۆسته چييه شق و شره کان بى وچان هدوراز و نشیوه کانی
دولى ديموکراتى ده پيوا و لمو وە زعه تاييەتى يهی که له نیو ئەندادا -
ماندا پىك هاتبwoo زور کەيف خوش بwoo ، خوش خوش نووسرا وە کانى
تەشكيلاتى له نیو شانه کاندا بلاو ده كرده وە و به باقه لووله کاغەزى
له باوهش دهنا و له ژۇورى سالۇندا بدر له هەموان باڭى ده كردم
و لووله نووسرا وە يەکى ده دايە دەستم . بەراستى منيش له وە رگرتىنى
ئە وە هەموو رېنۋىسىنى و فشارەي "سەيد" وە ئامان هاتبۈوم و له مالى
کۈولى كردى ببwoo به ناقا يلى وەرم دەگرت و به جيئى ئە وە بىزانم نا وە -
رۇكى لووله کاغەزە کان چنە لوولە كەم دەگرنە پىش چاوم وەک دوور -
بىنە کانى پىش شەرى يەکەمى جىهانى ، به نىيۇيدا دەم روانىيە بەزىن و
با لائى كاڭ سەيد و لەوكاتىدا به يەكىكىم دەشواباند و نەم دەزانى ئە و
كەسە كېيە ؟

زورم تین بو میشکم هینا چاویکم قووچاند و چاویکم هه لینا
پاش ماوهیدک دوزیمهوه که وهک کئی ده چئ ، چهند سال له مهوبه رله
شاری "ورمی" چاوم به کابرا یه کی نوشتوونووس که وتبورو ئه گهر "سید"
عه با یه کی دریئزی ها ویشتبا یه سه رشانی و ده فهیدکی به لاشانیکی
دا کردبایه و چهند میتر خامی سپسی هه لدرروا وی به شانه کهی تریدا
شوپ کردبایه و به پاستی ده بیو به کابرا نوشتوونووسی "ورمی" و لم
کاته دا پییم وا بیو که به دهستی خوم "سید" م خولقاندووه ... "ملا
حمسن" و "سرهدهنگ" له لام دانیشبوون له بیرون را یه کهی خوم
گهیاندن و به بونهی وتمکم دهستیان به گالته و پیکه نین کرد .
"ملا حمسن" خوی پی زه وتنه کرا هه ستا سه رچوکان وهک ده رویشه کانی
"زه مبیلی" هه دووک دهستی هه لینا و قامکه کانی به توندی بزاوت و
سه ریشی له گه ل راوه شاند به چهشنه ده فهزنه کان لاسای ده کرده وه
ئیمه ش به ئه دا و ئه تواری ملا حمسن پیده که نین .

سه پد که بهم چه شنه چاوی به ئیمه که وت له خوئی گه يشت به توروه يى

ده گهوت که به چه پوکان و هر ده گه را سه روگویلکی خوی و پر دی قیا مه تی
لی ده پسا . ئه وانی تریش هه ر کامیکیان له جی ده ست به ئه ژنون داده -
نیشن و شتیکیان ده گوت :
یه ک ده یگوت ئه و که سهی ئه م شانویهی پیک هینا وه ده بی له
حیزب ده ربکری .

یه کی تر : کا که گیا ن هه ر له حیزب ده رکردنی به بیرون باوه پی من
بەس نی یه ، ئه وه ندە سزا یه زور که م ده بی شه ش حه و روژ هه لی ئاوا سن
و لم ما وه یددا "سید ئەبوو" بی و چان دار کاری بکا !
یه کی تر : به نه زه ری من ئه و سزا یه ش که مه ...

مه سئولی ئا مووزشی : کا که گیا ن ئه م چه شنه ئینسانانه خوا هه ر
بی شعور و نه فا می ئافه ریده کردوون ، به کۆخه یه کی مامۆستایانه وه
ده یگوت نا توانم بهم شیوه یه ئا مووزشی سیاسی بده م . ده بی بچیسن
شوینی کا برای تا و انبار بیدۆزینه وه و بیهینینه لاما ن و ئا موژگاری
بکه م !

هیشتا فه رما یشه کانی ما مۆستای ئا مووزشی کوتایی نه ها سبسو له
پرا سه رشانه هه ستا سه رچوکان و ده ستی به ره خته و ئینتقاد کرد و
گوتی : نا ویری له هیچ شوینیک کۆبۈونه وه بگری کم جه ما عه تیکمان لى
پەیدا ده بن و له گەل پیا و ده ست به قدره قەرین ده کەن و کون بىه
کون به دوای شوینی خەلکدا ده گەرین ... پیا و ... کونه مشکمان بە
ھەزار تەمن ده سنا کەھ وی ھەستن با بىرۇین !!

ھەموو لایه ک ھەستانه سه رېی یه ک به دوای یه کدا به نېھ زم و
نیزا بۇ دۆزینه وهی جىگا یه کی تر و ده رکه وتن ، لە حالىکدا ئاۋپیا ن
لە راست و چەپی خۆیان ده داوه مەبادا بیان بیتن و نهیینی یه کیان
لی ئاشکرا بی .

کاری شانه و شانه بەندی هه ر بە ئه وه ندانه کوتایی پى
نەدەھات ، بەلکو لە کاتىکدا کە ها ورپیان لە سالۇنى چىشت خواردىدا
داده نیشن لە نا کا و یه کىك قا مکى بۇ لای ئەھوی تر را دەداشت و لە خۇۋە
دەھى گوت : من ئاگا دارم تو لە شانھى ژمارە ... داي !

یه کی تر : من دەزانم شانھى ... كىيانتەن ... با وەر بکەن ئە و

سەرشانە

سیا مەند شیخا گایی*

... رۆژیکی زستانی ۱۳۶۰ ده رگای ژوورەکەم کراوه، يەکی پالتو لەبەر کە كلاؤ پاتتؤیەكەشی بەسەر سەریدا كىشا بۇو بە پەله کا غەزیکی لەولەكراوی دا بە دەستم و گەرداوه.

تماشا م کرد (سەرشانەی ۱۴۵ نامى لەسەر نووسرا بۇو). نامە پېچرا وەکەم کرده وە چەند نووسرا وەيەكى وەك "تىكّوشەر" و رىزى چەند كەس لە ها ورپیانى تىدا بۇو و لە لايپەرەكدا ئا مۇزگارى تەواو، كرابۇو كە نەھىنى بېپارىزى، كەس نابى نىيۇ شانە، ئەندامان جىڭا و كاتى كۆبۈونە وە لە لای كەمى تر بىرىكىنى و ئەگەر شتىك گوترا و بىسترا ئەندامانى شانە نابى ما وە بىدەن كەمى دىكە گوئى لى بى. بە قەولى "خالىھ" ھەموو شتىك بە خىشكە، بە سېايى، بە سەبرا يى بى ئا زاوه و بە نەھىنى بەرپىوه بچى ۱۱ لە ژىرى لايپەرەكەدا ئىمزا كرابۇو و نووسرا بۇو خزمەتكارى گەل و نىشتىمان "سەيد ئەبۇو".

چەند رۆز پاش دا مەزرانى شانە سەرتلە هەر مال و كون و قوزبىنېك نابا بىرچا و دەكەوت كە ئەوە چەند كەس سەريان بە سەرىي يەكەوە ناوه و خەرىكى كۆبۈونە وەي شانە حىزبىن جا ئەگەر كەسىكى سەربىزىو لەم كاتەدا دەرگای دىبوي كۆبۈونە وەي بە ئەندازەسى چوار قامك كردىبا وە كۆخە يەكى بىچكۈلەشى كردىبا يە ئىدى بىاس باسى سەر بۇو بە دواي ئەم شانۆيەدا كۆبۈونە وە تىك دەچوو و ھەممۇ لايەك لە خۆپا دەپەشۈكان و نارەحەت دەبۇون. جارجار كەسى واش

* كورته چىرۆكى سا تىرىكى "سەرشانە" نووسرا وەيەكە لە كۆمەلىك دايتانى كورتى كوردى بە ناوى "زاواى زىنەتە خاتۇون" كە كاك سیا مەند شیخا گایی لە ما وەي جوارسالى را بىردوودا ويىرای بەشدارى لە جوولە وەي گەللى كورە لە كوردىستانى ئېزان نووسىيونى. لەو چىرۆكانەدا بە زمانىكى ساكار و قىسى خوش بۇچۇون و رەفتارى خەباتكارا نەخشائون.

(ھيوا)

- کوشتنی من هیچ ناگویری..

- بپریاره که سه رووی ده سه لاتی ئیممه يه.

هه ر يه که قاچیکیان گرت ، لمسه ر پشت تا لای داره که خشاندیان .
له پشته وه دهستیان بهسته وه .. يه کیکیان کلاشینکوفه کهی له شانی دا گرت ،
هینایه سدر پی ، لیئی چووه پیشه وه . ئه و سهیری دهست و نه و چوانی ئه کرد .
له دووری سی هه نگا و وهستا ، ئه و رووی بدو لاوه کرد .. ریزیکی بـ
لچا وانیه وه نا ، به شیوه يه کی زور توند ته کانیکی دا . سه ری به ره و
دوا وه چوو ، قژه کاله خاوه که بدره و دوا وه بژ بوبوه وه ، خوین له ده م و
لووتی فيچه هی کرد و به شان و مليا هاته خواری ..

ئه وان سهیری يه کتريان کرد و تفهنجه کانیان کرده شان و ملي
ریگه يان گرت .. داله کان نزمتر بوبونه وه و قايمتر ئه يان قريش کاند ..
ئه و هه ر پرخه لیوه ئه هات ، هه ر وه کو ئه و جارانه له باوهشی کالى
خه وی لی ئه که وت ، ئه ویش پاشان بوی شه گیرا يه وه ، که چون پرخاند وویه تی .

گویتنگن ۱۹۸۳/۹/۲۵

X

X X

که سیش بروای پیمان نه ما وه ، تهنيا به خوین ئەم لەکەیه له نیو چا وانی
ئىمە ئەسپىتە وە ..

- بەداخوه ئىيۇش وا بير ئەكەنە وە !

- ئەتەوى چۇن بىر بىكەينە وە ، وەكۈ بىر كردىنە وە ئا و پاكىت و
قوتوو؟

- ئەبى بىر كردىنە وە تا زۆر جىا وا ز بىت .

- ئەوەي تو كردووته پەيوهندى بە رەشتە وە ھەيە نەك بە بىر و باوه رىا

- وا مزانى ئىيۇھ ئەتەنە وى بە بىر و كار دونيا بگۇرن ، بەلام دىارە
شۇرۇشكىرىيەكەتان لە سنوورى قىسە و نۇوسىنى سەر كاغەز دەرنا چى ..

- گەر ئا بىرۇوتكان بە شۇرۇشكىرى دانرىت ، ئەوە ئەبى خۇما ن لە قور
بىگىن بۇ شۇرۇشكىرىيەتى ..

[... ئەترىسم كاللىش بىكۈزۈن .. لەم ولاتە ياساى سەير بۇ خوشە ويستى و
نووستن دانرا وە .. ئا فەرتەبى بە ئا رەزووی پىا و پال كەۋى ، جارى و
ھەيە يەكتريان خوش نا وى و پىكە وەش ئەنون . ئا فەرتەبى پىا وەكەي بە
ھەموو ئىيۇھ يەك را زى كات ، ئەگىنە خۆى لەنە و دۆزە خىيىكى بى سەنۇور
ئەدۆزىتە وە ، ئەوەي لەم ياسا يەھ لەگەرېتە وە خويىنى ئەكرىتە كاسە وە .
ئەترىسم سەروبىرى كاللىش بتاشن و خۆل و دۆى بکەن و بەرهە و پشت سوارى
كەرىيەكى بکەن دى بە دى بە هووها و تەنەكەلىيىدا بىكىرۇن .. ئىتىجا بە
درېندا نەترىن شىيۇھ بىكۈزۈن ..

- ئەبوا يە پىكە وە نەنۇوستىنا يە ..

- درەنگ بىن يَا زۇو ئەبىنە ئۇن و مىردد ..

- پیمان بزا نن ھەر دوو كەمان ئەكۈزۈن ..

- خوشە ويستى من سنوورى نى يە .

- منىش خوش ئەۋىى ، بەلام لە ئەنجا مەكەي ئەترىسم !

- چەند جار با وكم روېشىتە لى با وكت ، ئەو لە كەلى شەيتا ن نەھاتە
خوارى ..]

- ئەتowan ئەم دەستە سرە بە كاللى بىدەن ؟

- دوايى بىرلى ئەكەينە وە !

- ھەمېشە وەلامە كانتان پۇ پېچ و بەنا يە ...

- زۆر رۇون و ئاشكرا يە ..

پُولیک دا ل زور به به رزیه وه ئەفرین، ئەيان قريشكاند، بـالـه
ترسنا كە كانيا ن بو هىرىش و پـەلاما ردا ن بـلـاـكـرـدـبـوـوـهـ، يـەـكـ لـهـ دـواـيـ يـەـكـ،
بـهـ شـيـوهـ يـەـكـ باـزـنـهـ يـىـ ئـمـوـوـرـاـنـهـ وـهـ . ئـمـ مـلاـنـهـ شـبـوـنـ ئـكـەـنـ يـاـ هـسـتـ
ئـكـەـنـ مـهـرـگـ بـوـسـىـ بـوـ يـەـكـىـكـ تـاـ وـهـتـوـهـ .. ئـهـوـهـ ئـاـتـهـ بـهـ رـچـاـوـ، چـوـنـ
دـالـهـ كـانـ ئـهـنـيـشـنـهـ وـهـ، بـهـ زـنـدـوـوـيـهـتـىـ ئـاـبـلـوـقـهـ ئـهـدـهـنـ، هـيـرـشـ ئـهـھـيـنـهـ سـهـرـ،
هـرـيـهـ كـهـ لـهـ لـايـهـ كـهـ وـهـ چـرـنـوـوـكـىـ لـىـ ئـهـگـرـنـ وـهـ بـهـ دـهـنـوـوـكـيـشـ، پـىـ بـهـ دـهـ مـ،
گـوـشـتـىـ لـىـ ئـهـكـەـنـهـ وـهـ . ئـهـدـهـنـ شـقـهـ بـالـ، كـۆـمـهـلـيـكـ ئـيـسـكـ وـهـ پـروـوـسـكـ لـهـ
دواـيـانـ بـهـ جـىـ ئـهـ مـيـنـىـ .. زـوـوـ دـيـمـهـنـىـ دـالـهـ كـانـىـ لـهـ مـيـشـكـىـ خـوـىـ لـاـ بـرـدـ،
چـونـكـهـ هـرـ لـهـ وـهـ لـيـكـوـپـتـهـ رـاـنـهـ ئـهـچـوـونـ كـهـ پـارـ بـهـ لـامـارـيـانـ دـانـ وـ لـهـ
كـۆـلـيـانـ نـهـئـ بـوـوـنـهـ وـهـ لـهـسـرـ ئـهـرـزـهـ كـهـ سـيـبـهـ رـيـاـنـ درـوـسـتـ ئـهـكـرـدـ ..

- بو مـرـوـفـ مـرـوـفـ ئـهـكـوـزـىـ؟

- هوـىـ زـوـرـهـ .. هـنـدـىـ جـارـ خـلـكـ لـهـسـرـ هـقـ ئـهـكـوـزـرـىـتـ، هـنـدـىـ جـارـيـشـ
لـهـسـرـ نـاـهـقـ ..

- منـ هـيـچـ هـوـيـهـ كـبـهـ وـهـ نـازـاـنـ مـرـوـقـىـ لـهـسـرـ بـكـوـزـرـىـ.

- ئـهـگـەـرـ لـهـ سـنـوـوـرـىـ مـرـوـقـاـ يـەـتـىـ دـهـرـچـوـوـ؟

- كـوـشـتـنـىـ مـرـوـقـيـشـ لـهـ سـنـوـوـرـ دـهـرـجـوـنـهـ!

- ئـهـمـهـيـانـ سـنـوـوـرـ دـاـنـاـنـهـ بوـ پـارـيـزـگـارـىـ ئـهـ وـهـ سـنـوـوـرـهـ ..

- ئـمـ سـنـوـوـرـ خـلـكـ دـرـوـسـتـىـ كـرـد~وـوـهـ، لـهـ ئـاـسـماـنـهـ دـاـنـبـهـ زـيـسـوـهـ ،
خـلـكـيـشـ هـرـيـهـ كـهـ بوـ خـوـىـ فـوـوـيـ پـيـداـ ئـهـكـاتـ وـهـ رـيـهـ كـهـ بـهـ رـهـ كـهـ بـهـ لـىـ خـوـيـداـ
راـئـهـكـيـشـىـ.

[... هـمـوـ جـارـيـ قـابـيلـ هـاـ بـيـلـ ئـهـكـوـزـىـ، لـاشـكـهـيـ بـهـسـرـ شـانـداـ ئـهـدـاـ وـ
ولـاتـ بـهـ وـلـاتـ ئـهـيـگـيـرـىـ، پـەـكـىـ ئـهـكـهـوىـ، لـاشـكـهـشـ ئـهـرـزـىـ، بـهـ دـيـاـرـيـهـ وـهـ دـائـهــ
نىـشـىـ وـ نـازـانـىـ چـىـ لـىـ بـكـاتـ .. ئـهـوـيـشـ چـاـلىـ بوـ هـلـلـهـكـهـنـىـ وـ ئـهـيـنـىـزـىـ
بـهـلـامـ گـيـانـىـ هـاـ بـيـلـ وـهـ كـوـ تـاـ رـماـيـيـهـ كـىـ تـرـسـنـاـكـ هـرـ بـهـ شـوـيـنـيـهـ وـهـيـهـ وـ هـرـ
دواـيـ ئـهـكـهـوىـ وـ هـرـ رـاـوـيـ ئـهـنـىـ تـاـ ئـهـ وـ رـوـزـهـ ئـهـوـيـشـ ئـهـخـرـيـتـهـ چـاـلىـهـ وـ
دـهـ مـىـ پـىـ لـهـ خـوـلـ ئـهـبـىـ ...].

- جـارـيـكـىـ كـهـ چـاـومـ بـهـ كـالـىـ ئـهـكـهـوـيـتـهـ وـهـ؟

- زـوـرـ زـهـ حـمـهـتـهـ!

- جـىـ؟

- ئـيـمـهـتـ سـهـرـشـوـرـ كـرـدـ، نـاـ وـ نـاـوبـانـگـتـ زـرـاـنـدـيـنـ، ئـاـبـرـوـوتـ تـكـانـذـيـنـ،

قەت رووی چەکم تى نەئەگىردىن... من و كاڭى لە مائى خزمىكما ن خۆمان شاردبۇوه وە . ئەمان دى بە دى و كون بە كون، شويىن پىيان ھەلگىرتىبۇوين و تا ئىرىھەش ھەر بە دوا ما نەوە بۇون، من خۆم ئەمزانى مائى كاڭى لە لايىك و ئەما نىش لە لايىكى ترەوە ، ھەروا بە ئاسانى دەستمەن لىنى ھەللىنا گەن. لە ھەركۈش بەرچىنگىان كەۋىن تىكەتىكە ما ن ئەكەن... لە بەر ھەيوانەكە را وەستا بۇوم، سەيرى دە وروپشتى گوندەكەم ئەكىردى، كاتىيىك ئەمانەم لى پەيدا بۇون و تىيان خورىيم . خۆم ھەلدا يە پەنا دىوار ئېكەن، دايان گەرمى . نا چار بۇوم بەرپەرچىان بەدەمەوە . بە هوئى تارىكىيە وە يەكتىرمان باش بەدى نەئەگىردى . تەقەمان لە جىئى تەقەمى يەكتىر ئەكىردى... .

- با خويىن نەرىزىرى... .

- قۇوش لە دەستمەن دەرەنەنچى... زۇو وەرە دەرەوە ..

- تەنبا لاشەكە مەتا ن دەست ئەكەوى... .

- خانووه كە گېرىتى بەر ئەددەين . تەنبا پىيىنج دەقىقە مۆلھەتتەھىيە ... پاش تەدوا و بۇونى ما وەكە ئاگەريان لە گوئىسى بانەكان بەردا . چەند تەقەيەكم لىنى كردى ويستم جى گۆرگى بکەم، چونكە دووكەل خەرىك بىسو ئەيختىكىندىم و ئا ويش بە خور لە چاوم ئەھاتە خوارەوە، لە دەرگا يەكەوە بۇيى دەرپەریيم . دايان گەرمەوە . بەزكەوتىم . دوو سى تەقلەم دا .. خۆم گەيانىدە ژۇورىيەكى تر . ھەستىم كرد ئا ويىكى گەرم بە قاچىدا دېتە خوارى، بېر نا و پىلاۋەكەم ئەبىي . دەستىم بۇ سەر را نىم بىر، بەنچەكانىم بىمه بىرىنەكەدا چەقىن . قاچم ئەجۇولالىيەوە . زانىيم كارىگەر نىيە و ئىيىك نەشكەوە .. پاش ما وەيەكى تر ئەو ژۇورەشىان سووتان . لە سەرەتىدا ژۇورەكە پىرى بۇو لە دووكەل، پاشان ئاگەر تىسىنى بۇ ھېنام خەرىك بىسو ئەپىشا م... .

گۈئىم لە دەنگى كاڭى بۇوا!

- رىبۈار گىان وەرە دەرەوە .. سويندىان بۇ خواردم كە ھىچتلىنى نەكەن.

- بىرپايان پىيەكە، من ئەيان ناسىم .. ھەردووكمان بە سەر يەكىدا ئەكۈزۈن... .

- لە خانووه كە ئەسۋوتىيەت .. گوللەت پىي شا مىيىن.. .

-

- رىبۈار گىان لە پىسَاوى من وەرە دەرەوە

- هـ لـ مـا تـيـنـما نـهـكـرـدـا

- هـ لـ مـا تـيـنـى چـى و قـوـزـهـ لـقـورـتـى چـى . كـه وـوـتـم يـاـرـيـانـ لـهـگـهـلـداـ مـهـكـهـ ، ئـيـتـرـ نـابـىـ يـاـرـيـانـ لـهـگـهـلـداـ بـكـهـ . نـازـاـنـمـ چـوـنـ تـىـ ئـهـگـمـىـ وـ كـمـىـ تـىـ ئـهـگـهـىـ ؟ ئـهـمـانـهـ كـهـسـنـاـ زـانـىـ خـلـكـىـ كـاـمـ وـلـاتـنـ وـ لـهـ كـاـمـ تـىـيـرـهـ وـ تـاـيـفـهـنـ ! هـمـوـوـ كـهـسـ بـهـ مـذـهـنـ بـاـسـىـ ئـهـوـهـ ئـكـاـتـ ، كـهـ پـيـاـوـهـكـهـ زـنـدـكـهـىـ هـلـگـرـتـبـىـ ، ئـهـگـيـنـاـ بـوـچـىـ خـزمـ وـ كـهـسـ وـ كـارـيـانـ سـهـرـيـانـ لـىـ نـادـهـنـ ؟ ئـهـمـانـهـ دـاـ وـيـنـ پـيـسـ .

- دـاـ وـيـنـ پـيـسـ !

- بـهـلـىـ دـاـ وـيـنـ پـيـسـ .. باـ وـكـتـ بـزاـنـىـ سـهـرـتـ ئـهـبـرـىـ . جـاـرـىـكـىـ كـهـ نـهـكـهـىـ يـا~ رـيـانـ لـهـگـهـلـداـ بـكـهـ ، ئـهـگـيـنـاـ . هـمـوـوـ بـوـ ئـهـگـيـرـمـهـوـ . . .]

- گـهـرـ زـوـوـ خـوـتـتـ بـهـ دـهـسـتـهـوـهـ بـدـايـهـ ، توـوشـىـ ئـهـمـ بـهـزـمـهـ نـهـئـهـبـوـوـينـ .

- بـهـ لـايـ منـهـوـهـ مـرـدـنـ وـ خـوـبـهـ دـهـسـتـهـوـهـ دـا~نـ وـهـكـو~ يـهـكـنـ ..

- جـازـىـ وـاـ هـدـيـهـ مـرـوـفـ خـوـىـ بـهـ دـهـسـتـهـوـهـ ئـهـدـا~ بـوـ ئـهـوـهـىـ سـهـرـىـ نـهـدـوـ .

رـيـنـىـ . . .

- جـارـىـ وـاـشـهـيـهـ مـرـوـفـ هـلـئـهـ خـلـهـتـىـ . . .

- ئـهـتـتـوـاـنـىـ خـوـتـ بـهـ دـهـسـتـهـوـهـ نـهـدـهـىـ .

- لـهـ پـيـنـا~وـىـ كـالـىـ وـ لـهـسـمـرـ بـهـلـىـنـىـ ئـيـوـهـ . . .

- هـيـجـ رـيـگـهـيـهـكـىـ تـرـتـلـهـ بـهـرـدـهـمـدا~ نـهـمـا~ بـوـوـهـوـهـ .

- ئـهـمـتـوـاـنـىـ تـا~ دـوـا~ هـدـنـاسـهـ شـهـرـ بـكـهـمـ . . .

- زـوـرـ مـنـاـلـانـهـ بـيـرـ ئـهـكـهـيـتـهـوـهـ !

[... تـهـقـهـكـهـ زـوـرـىـ نـهـخـا~يـا~نـد~ . لـهـ هـمـوـ لـايـهـكـهـوـهـ هـا~وار~ و~ قـيـژـوـقـاـژ~
بـهـرـز~ بـوـوـهـوـهـ . . .

- وـهـرـ دـهـرـهـوـهـ . . . نـاـتـكـوـزـيـنـ . . .

- بـرـوـا~تـا~ن~ بـيـن~ نـا~ك~ه~م~ .

- ئـيـّمـهـ جـارـانـ هـا~ورـى~ و~ هـا~وـسـنـگـهـر~ بـو~و~يـنـ ، ئـيـّسـتـا~ش~ بـيـر~و~رـا~ م~ان~
لـهـسـهـر~ نـهـگـوـر~ا~و~ه~ .. دـلـنـيـا~ بـه~ يـا~ر~مـه~تـيـت~ ئـهـدـه~يـن~ و~ نـا~هـيـلـيـن~ كـهـس~ دـه~سـقـت~
بـو~ بـهـيـنـى~ . . .

- لـهـوـهـ نـا~چـى~ نـيـا~ زـتـا~ن~ پـا~ك~ بـيـت~ . . .

هـر~ جـارـه~ لـه~ پـهـنـجـرـه~يـهـكـهـو~هـ تـهـقـم~ ئـهـكـرـد~ . مـن~ بـه~ دـه~م~انـچـه~ و~
ئـهـو~انـيـش~ بـه~ كـلاـشـيـنـكـوـف~ . نـا~چ~ار~ي~ان~ كـر~د~م~ تـهـقـه~ي~ان~ لـى~ بـك~ه~م~ ، ئـهـگ~ي~ن~ا~

لای چالاوه که رایان کیشا . بوگه ن پیاوی کاس ئەکرد . کەس نەيتوانی نزیکى
دەمی چالاوه که بیتەوە . بە چمکی جامانە کانیان لوتیان گرت . چالاوه که
ئەگەرچى زۆريش قولل نەبوو ، بەلام ئەۋەندە قوراولە بىندا ما -
بۇوه وە تىنۇوېتى پى بشكى . ئەو نەيتوانی دابەزىتە خوارەوە ، لەبر
ئازارى قاچى . بە تەما بۇو بەسىر سەردا خۆى ھەلدا تە خوارەوە ، ئەوان
لە پشتەوە پشتى مiliان گرت و نەيان ھېشت .. نەيان زانى بە چى چۈرى
قوراوى بۆ دەركەن . تايىدكە پىلاوه لاستىكە كانى داکەند و بۆى ھەلدا .
ئەوان تىيا راما . سەيرى يەكتريان گرد . سەيرى پىلاوه لاستىكە كەيان
گرد . سەيرى دەم و چاوى ئەۋىشىان گرد . ئاوه کە لە پىلاوه کە پاكىز
نەبوو .. ناچار بۇون ، يەكتىكىان دابەزىتە خوارەوە و ئەوي كەشيان لە
سەرەوە وەستا . پى تايىدكە پىلاوه قوراوايان بۆ ھەلگۆزى . پەلامارى ھەردوو
دەستى دان ، چاوى نۇوقاند و بە سەرىيەوە نا و مۇزى لى بىرى .. حەوت
تاکە پىلاوه ئاوى خوارەوە . بە تاكى پىلاوى ھەشته مىش دەم و چاوى
فيڭىكىرده وە . قوراولە نىوان ھەردوو لىيۇيدا ھاتبۇوه خوارەوە ، سەر
سەنگىشى پىوه بۇو بۇو .

- چەند جارمان پى ووتى : بە گران لە سەرت ئەكەوى .

- پیاو خۆپى دا بىن نا كرى .

- ھەموو شتىكەت دۆراندا !

- ئىيۇەش ھەموو شتىكەت دۆراندۇوە ، ئەوهى من كەوتۇتە سەر ئا و
ئەوهى ئىيۇەش جارى لە بىنەوە يە .

- ئەزانى چۆنت باس ئەكەن ؟

- ھىج پەشىمان نىم !

[...] سەرۇو با بۆلە يەكمان بە دەستەوە بۇو . دەرگا كەمان داخرا بۇو .
بە دىوارە كەدا سەركەوتىن ، خۆمان ھەلدا يە خوارەوە . دەستىمان كەردى
قەلەمباز و راکەراكە . دايىم جارى لە دالانەكە نويزى ئەكەن . كە
منى لەگەل مەنالى مالى درا وسىكە ما ندا بىنى چاوى چۈوه تەوقى سەرى ،
دەنگى بەرز كەرده وە . يەكسەر زانىم شتىكى نائاسا يى رووی داوه و ئەو
زۆر پى زىز بۇوە . راوهستا وە . پاش نوبىز و دوعا كەردن پى ووتى :

- چەند جارمان پى ووتى لەگەل ئەو مەنالانەدا يارى مەكە ؟ كەمى كەت
بىنیوە لەگەلىاندا يارى بکات .

نهدا وه ...

- گهر تو سهنجه ره که تچوّل نه گردا يه ئهوان گرده كانيان لى
نه ئه گرتين و ئيمەش وامانلى بى سەر نەئەھات ...
ئەرزە كە گرەيەكى سەيرى لى بەرز ئەبۇھەدە . لەسەر ٥٥
راكشا بۇو . ئەوهندە هيلاڭ و ماندوو بۇو، بىرى لاي ئەو گەرمە و ئاگر
بارانە نە ما بۇو . ھەستى كرد ھەتا و بە شاقۇولى لە رېكى ناوه را سەت
پشتى وەستا وە ، زۆر بە شىئەنەسى ئەجۇولۇتەدە ، شۇر ئەبىتەدە ، بە خور
و بە لېزىمە ئاگر بە سەريا ئە با رېننى . يَا ھەر وەكۈچۈن خانوو دلۇپە
بکات ، واش دلۇپە ئاگرین ، تكتك ئەتكا يە نىيۇ شانىدەدە ، تا سەر ئېسک
و پرووسكىش ئەسووتا ن . سەرىي ھەلبىرى . ئەوان شلەۋان . داواي ئاوى لى
كردن ، يَا ئەگەر دەرمانىكىيان پىي بىت بۇ سەر بىرىنەكە قاچى . ئەوان
وەلاميان نەدايدەدە .. لە پېرى كە وەتەدە ، كە پېش ئەوهى بىگەنە لاي
ئەم دارتۇوە ، چاوى بە چالاوىك كە وەتۇوە و نەختىك تەرا يى تىدا بۇوە .
يەكسەر ھاوا رى كرد :

- چالاوىك لەم نزىكەدا ھەيە .

- بۇگەنى كەردىوە .

- قەنى ئاكا .

- قورا ويىكى پەتىيە .. پرى كرم و زەرۇوە .. بەرازىش ناتوانى
توخنى كە وېت .

- گرنگ نىيە .

- هيچما نىيە تىي كە يىن !

- مەتارەثا ن پىي نىيە ؟

- پىس ئەبن ..

- ئەتوا ن بۇ ئەۋىم بەرن ؟

- ئەتوا نى رى بىكە ؟

- گەر يارمەتىم بەدەن : بەلى .

ويىستى دەست بە دارە كە وە بگرى و ھەستى ، نەيتوانى . بىرىنەكە قاچى زىريكا ندى . ھەر دووكىيان بن بالىان گرت و بەر زيان كەرددەدە . بە سەر دەمدا كەوت . زۆر ھەولىان دا ، هيچ سوودىكى نەبۇو . ھەر يەكە قاچىكىيان گرت و لەسەر پشت ، بەناۋ ئەۋدرىگە دالل و چالل و بەر زىيەدا ، تا

لیدانی دلشیان و هکو یه که ، هیچ سوْز و خوش ویستی یه کیش ناگا ته ئه و سوْز و خوش ویستی یه ئه وان ئه بیه خشن . زورم تینوو سوو ، گبمه روم ها تبووه یه که ، خدیریک بwoo کوپر ئه سووم بو قومیک ئا و . هه لیکوپته ره - کانیش له کولم نه ئه بونه وه ، هر جاره ده سریزیکیان لئی ئه کردم ، هر جاره ش پارچه یه کم بهر ئه که وت . نازام بـ کـ اـ تـیـکـ مـ رـوـفـ تـهـ قـهـیـ لـئـیـ ئـهـ کـرـیـ یـهـ کـسـهـ رـهـ دـهـ مـیـ وـشـ کـ ئـهـ بـیـ وـ هـهـ نـاـ سـهـ شـیـ سـوـارـ ئـهـ بـیـ؟

هه لیکوپته ره کان زور نزم بونه وه ، سیبه ری پهروانه کانیان هه موو گیانیان دا پوشیم . سه رله نوی دایان گرتم . ئه و ناوه بوبه چدره دووکه ل و تهپ و توْز . خومم هه لدا یه که نده لانیکه وه . خوین و تینوو . یه تی و گه رما خدیریک بونه ئه یان خنکا ندم . به سنگه خشکی رویشتم . په کم که وت . به نه خویته که م کرده وه و هردمو ده ستیشم گرته وه . ویستم میزه کهی خوم بخومه وه . په شیما ن بومه وه ، له ترسی ئه وهی نه وه که ویش بخومه وه و هیچم ده ست نه که وی له کا تیکی ناخوشترا . . .

- له شره کهی پاردا کن ده ست پیشکه ری کرد ؟

- به سه رماندا سه پینرا !

- به هوی هلهی فهرما نده که توشی شکان و ژیرکه وتن بوبین .

- ته نیا هلهی زه لامیک بس نی یه بو دو راندنی شه ریک ..

- ئه و زه لامه دوا بپیاری به ده ست وه بوبو . . .

- شره که شه ریکی ناها وتا بوبو ، به توشمانه وه بوبو ، شویـن و کا ته که ش به گویـرـهـی ئـارـهـ زـوـوـیـ دـوـزـمـنـ بـوـوـ ، دـهـ ستـ پـیـشـکـهـ رـیـشـ بـهـ دـهـ ستـ ئـهـ وـاـنـهـ وـهـ بـوـوـ . . . بـوـیـهـ فـهـ رـمـاـ نـدـهـ کـهـ هـیـچـ یـهـ کـیـ تـرـیـ بـهـ دـهـ ستـ وـهـ نـهـ ماـ ، تـهـ نـیـاـ رـیـگـهـیـ پـاـشـکـشـ نـهـ بـیـ .

- هـرـ لـهـ سـهـ رـهـ تـاـ وـهـ ئـهـ بـوـاـ یـهـ ئـهـ مـ خـالـهـیـ رـهـ چـاـ وـ بـکـرـدـاـ یـهـ !

- ئـهـ تـوـ توـوشـیـ لـیـپـرـسـینـهـ وـهـ نـهـ بـوـوـیـ ؟

- گـهـ بـرـینـدارـ نـهـ بـوـوـمـاـ یـهـ هـهـ لـیـانـ ئـهـ وـاـسـیـمـ !

- ئـهـ بـوـاـ یـهـ ئـهـ وـ کـاـ تـهـ سـزـاتـ بـدـهـنـ ، چـونـکـهـ تـوـ ئـیـمـهـتـ بـهـ دـوـرـانـدنـ دـاـ .

- خـوـ منـ فـهـ رـمـاـ نـدـهـ نـهـ بـوـوـمـاـ !

- تـفـهـ نـگـهـ کـهـتـ بـزـرـ کـرـدـاـ !

- منـ خـوـشـ لـهـ مرـدنـ گـهـ رـاـ مـهـوـهـ ، بـهـ ئـهـ نـقـهـ سـتـیـشـ تـفـهـ نـگـهـ کـهـ مـ فـیـپـرـیـ

بۇوينه يەك. قىئە شەوهىيە شەمىزىنرا وەك
لەنا و دەست و پەنجە و ھەناسەمدا ئەفريين. لىيۆھ ئالەكا نىش وەك
كۆتۈرىكى سەربىراو لەنا و كۈورەدا ئەسووتا ن. ھەستما ن ئەكىردى، ئەنەرز
لەبن پېماندا دېتە يەك، ھەر ئەھاتە يەك و ئىيەش وەكوبىرى لېپوارى
چەمى بەھاران ھەر بەرە و ھەوراز ھەلئەكشاين... ھەموو شتىپراۋەتە وە.
با وکى ڦۇن بە ڙىنى پى كردووھ... ئەم بۇ پيا ويکى پىر، كچەكەي ئەويش
بۇ با وکى ئەم. كالى و كچەكەي ئەو ئەبىئىبىچەند وچوون را زى بىن و
ورتەيان لىيۆھ نەيەت...]

- لە تىينووپەتىدا خەرىكە كۆپر ئەبم.

- ئەمە دەشتىكى قاقرە، بۇ دەرمانىش چۆرپىك ئا وى تىيدا دەستت
ناكەوىّ.

- ھەروا زۇو بىرتا ن چووھە؟ چىم بۇ نەكىرىن؟ پىنج سال ڇيانىم
نەخستىووھ سەر لەپىمە وە؟ ئىستاشوا ھەلس و كەوتىم لەگەلدا ئەكەن...
ئەمە ئىيمە ھا ورپىي يەك نەبۇوين؟

- مەتا رەكان ئا وى تىيدا نەما وە...

- ھەر تۆزى دەمم تەر ئەكەم.

- خۆشمان بىر ناكەين. خۆشمان مەترسى ئەوهەمان ھەيە لە تىينووپەتىدا
كۆپر بىن..

- ئەتوا نەختىك دەست و پىم بىكەنە وە؟ ناتوانىم لە وە زىاتر خۆم
راڭرم. جومگەكانم ھەموولىك پىچرا... ئەمە وى لەسەر ئەرزاڭە راكشىم.

- ئەرزاڭە وەك دۆزەخى لىنى تۈۋە!

- گۈریسەكە دەست و قاچمى بىرپىوھە، دۆزەخ لەم بەستەنە وە يەنە
خۆشىرە. دەست و بېيان كرده وە، يەكسەر خۆى بەسەر دەمدا خست، لەسەر
ئەرزاڭە، جارپىكى تر، دەست و قاچيان بەستە وە...

[... دەمم چەقىيە زەوييەكە... كاتىك ويستىم سەنگەر بگۈرمە وە، گوللە-
يېك بەر سىنگەم كەوت... نازانىم چەند جار تلىم خوارد. تەنگەكە لە
دەستم پەرى. خۆم لەنا و چالىكدا دۆزىيە وە. دەمم چەقىبۇوھ زەوييەكە و
با وەشم بە ئەرزاڭەدا كردىبوو و توندىش چىنگەم لە و خاكە گىر كردىبوو.
دەمم وشك بىو و ھەناسەشم سوار بىو. يەكم جار بىو لە ڇيانىدا ھەست
بە وە بىكم، زەويش ھەناسەمى ھەيە، ھەناسەمى ئەويش وەكوبىرى كالىيە،

هیینده به تین بwoo، کەس هەنا سەی بو نەئەدرا .. هەتا و توپیکی ئاگرین بwoo، لەسەر سەری لەنگەری گرتبوو، داشەكشا، زمانە درکا و يەكانى وەکو پەنگر بە بريئەكانى وە ئەچزاند. گەرمە و ئازار بە هيچگا رى ئۆقرە- يان لى برييپوو، گەر گوريس و دارەكە نەبوا يە نەئەتowanى بو ماوه يەكى وا درېز خۆى لەسەر پى راگرى، بريئەكەي سەر رانى زۇر ئاوسا بwoo، هەستى كرد كە گوللەكەي تىدا مابىتەوە، ئازا رىتكى شىتاتە لەلولىدا.. ئەوان تەنگەكەن ئىيان هيپىنا بwoo سەر پى، لە سېبەرى تاشە بە وەدىكدا هەلتەرووشكا بۇون، جار جار سەپىرى رېبوا رىيان ئەكرد، جار جار يىش بە دووربىن سەپىرى دەورۇپشتى خۆيان ئەكرد. ئەيان زانى نىچىرەكەي يان لە پەل و پۇ كەوتۇوه و تواناي ھەلھاتن و دەربا زبۇونى نەما وە ...

- كالىي ما وە؟

- ئەيپەندەوە بو مالى خۆيان.

- نا يىكۈژن؟

- با وکى ئەزانى.

- ئەو تاوانىكى ئەوتتۇي نىيە .. ھەرچىم لى ئەكەن قەنى ناكات، بەلام ئەو هەق نىيە هيچى لى بکەن... .

[...]

- با من بکۈژن..

- منىش خۆم ئەكۈزم.

- ئىمە بە بى يەك نا ژىن.

- ئەبى بىرى لى بکەينەوە و خۆمان بە دەستەوە نەددەين.

- چۈن ئەم كېشەيە چارەسەر ئەكرى؟

- با پىكەوە بىرۇين!

- بو كوى؟

- سەری خۆمان ھەلتەرین..

- ھەر دووكما ن ئەكۈژن و ئا بىرۇوشما ن ئەچى..

- ھەر ئەوهنە دەربا ز بۇويىن... .

فرمىسىك پىر ھەردوو چا وي بwoo، دەنگىشى پى لە گريان بwoo. بە سۆزەوە سەپىرى كردم، سەپىركەنلىك ھەموو شتىكى ترى بىر بىردىمەوە .. با وەشمان بە يەكدا كرد، يەكتىرما ن گۈوشى، سۇورەكان توانىمەوە ،

لەرھات

فاضل کەریم ئەحمدە

- بۇ ئەمکۈژن؟
- ئەبى بىكۈزۈرىيەت.
- بى تا وانىش ئەمكۈژن؟
- تو كەى بى تا وانىت! هىچ شتىك ھەيە پاكانەت بۇ بىات؟
- چەند جارم بۇ رۇونكردىنەوە . زماشم مۇوى لىنى دەرھات ھەر بىرۋاشم پى ناكەن .
- بىپيا رى ئىيمە نىيە، ئىيمە ئەرك و فرمان جىيەجى ئەكەين.
- كويىرانەش جىيەجى ئەكەن؟ ويىزدانىن ئازارتاڭ نادات؟
- تاوانەكەت زۇر گەورەيە، بەلام ...
- ئى ... ئى ...
- گىيرە وكىشەكە زۇر ئاللۇزە ...
- ھەمو شتىكىم بۇ باس كىردن ...
- ئىيمە ئەو ھەل و مەرچە چاڭ تى ئەگەين ...
- بىرۇن ئەوانىش تىگە يېتىن ، بۇيان رۇونكەنەوە ، با نەمكۈژن ..
- كارەكە سەررووى دەسەلاتى ئىيمەيە .. بەداخوھە ناتوانىن ھېچت بۇ بىكەين.

بە گورىيس ، لە پىشىدە ، ھەردوو دەستىيان بە قىمىتى دار تۈۋىيەكى پىرىھە وە گرى دابۇو. لە خوارەوەش ، ھەردوو قاچىان شەتەك دا بىسو . رېگەى خۇ جۇولانەوەي بە ھەمو شىوه يەكلى بىرا بۇو. چاوهشىنەكانى بە ئاستەم لەزىز قىزە كالە خاوهكەيدا بەدى ئەكرا . لىيۆھ وشك ھەلگەيرى - وەكەى ھەر لە قىلىشى سەر قورى و لىيەتى قەراخ چەم و رووبار ئەچوو. دەم و چاوه خەمبارەكەى لە ھەمو لايىكەوە تويىخى ھەلدا بۇوەوە ، بىرىنەكان قەتماخەيان بەستبۇو. بىرىنى كۆن و نوئىش لەزىز رانك و چۆخە شىرى و دىراوهكەيدا قەتماخەيان بەستبۇو .. دەمەو نىيەرۇيەكى ھا وينىسى زۇر گەرم بۇو. ھەمو شتەكۈلا، قولپەي لىيۆھ ئەھات . گەرە و ھالاۋىكى

وه يا تهور به دهستيکه له دارستانى چرى شه و
 خوريكه تى ئەپەرې روو له شاري رووناكي؟
 ئەهات... ئەهات... ئەهات و شەو شەق ئەبۇو
 شەعورى گەرمى ھەبۇون
 بە گيانما ئەگەپا
 جى به سامى شەو لەق ئەبۇو
 ئەهات... ئەهات... ئەهات و گەورە ئەبۇو
 گەورەتر ئەبۇو
 ھەيھات... له سامى شەوه كې بۈوم
 له سامى دەنگ پې بۈوم
 دلەم كولابه بە زرمى ھەناسە تاسىنى
 ئەهات و گەورە ئەبۇو
 گەورەتر ئەبۇو
 شەقۇنى تالى وەكۈو مەرگى ناگەھانى بۇو
 ... ھەيھات
 تەنینەوهى وەكۈو ژەسىرى ھەلاھەلانى بۇو
 ھەراى دەرۇون ئاخن
 پەسا... پەسا پەرەگر بۇو
 وەكۈو شەوى لاسار
 پەسا... پەسا پشۇوبېر بۇو عەزا بى گورە و شار
 وەرن... وەرن... شەوه گرتۇومى بىمگەنلى!
 (*) هاوار... هاوار...

(*) كاك سواره ئەم ھۆنرا وە خۇيى به سورەت و ويىھەي پەخشانى
ئەدەبىش نۇرسىۋەتەوە.

نه ما نیشانهی بعون
نه ما نیشانهی بعون
لهشم توا یه و ده رونوی شه و یکی بی روچن
پهسا ... پهسا په رهگر بwoo
به ره و فهزادی بی بن
به چا وو گوئی په لهقا زهی شه عوری بعونم بwoo
سه رنجی چاوی به هله لپه م شه و هی سپی
له هه مهو لاوه بو تروستکایی
به لدرز بو گیانی به سوئی
دلی به خورپه له بن گوئی
وه گوئی به وریا یی به کول مهلاسی جریوهی ژیان
به لام هدیهات ...
مهلوولی کردم شه و مهلوولی کردم شه و گار
عده زابی دامی شه و هی بی رهزا به گوپه و شاد
که چی له دوورترین سوچی شدم شه و
نا کا ... به نه رمه ئا هه نگی
درنگ ... درنگ ... ده نگی
وه کوو تپهی سه رئا و
شه پولی خسته ده رون
له گوییم ته نینی له گوین هه لقولینی کانی بwoo
ته نینه و هی وه کوو بونی گولله ئا بی بwoo
شنهی بلاویینی دنهی ئه دا به خهیال
هه را هه رای سوچه گهی ئه خولقینی
که دیوی زالمی شه و هه والدکانی به لافا وی رهش
نه خنکینی
به یاخی کا و هیه ئاخو؟
به ره مزی فهتحی به یانی
له جه رگی شه و ئه چهقی
مهلی به یانه له شه و زیزه بی وجان و هه را
ده نووکی سه ختی له په رژینی قایمی شه و ئه دا

پیم مدل که ئالی زالی شەو
 چا وی بى خەوی چەر
 مەگرى بو خەسارى بى گەرانەوە
 ئەوەی کە چۆن رىگە ما ن دوورو سەخت و قاقرە
 خۆشە ويستەکەم
 لە پەنجەرەي نېوە تاکى بۇومەلىلەوە
 چا وم لە دىيمەنلىقى بەيانى يە
 گۆبىم لە زەمزەمىز زولالى خىزە وردەكانى كانى يە .

(۲) كۈرپەي لىيوبەبار

لە شەوقى رووى مانگ
 لە بژوینى ئا و
 گولى سېۋەرە بە زىيۇ تەنرا و
 ھەناسەي ساردى
 كۈرپەي لىيوبەبار
 رووى مانگى دايىكى
 دىلى دەستى شەو
 ھاوار ئەكا مانگ
 لە ھەوري رەثى زولۇم و دزىيۇ
 گەر خۆنە بويىزى
 رۆزى رووناكى ئا ويتدى ديدار
 رەشا يى شەو و تروسکەي ستىر
 نابى لە ئاسۇ .

(۳) شەوه

پەسا ... پەسا پەرەگر بۇو
 شەوى كىرى لاسار
 نەما شىنى شەوابا
 نەوى بۇو چەسپى زەوى بۇو
 لە سامى شەو پاسار
 بە سىحرى تارىكى ھەبۇو نەبۇو يەك بۇو

(۱) کچی به میان

سواره

من ئەلیم پەپوولەیەك فرى
بە بالى سەوزو سوورە وە
من ئەلیم كولى بەدەم شنەي شەمالە وە بزەي بزۇوت
تۇ ئەلیي ج بۇو پەپوولەیەك فرى؟
يا نە سوورەگول زەرەدە كەوتە لىيۇي ناسكى
من ئەلیم هەتا هەتا يە دەورى جوانى يە
ئەمرو گەر هەتا و كەسىرە يَا نەما وە ئاگرو گرى
مېرگى ئاسمان بە سووتىمانى ھەورى لۆكەيى نەزۆك
پەلە خال و قۆپەنە
جەنگەللى كە جىيى ژوانى پۆلە پۇرپى با رېيە
جىيگە مۆللى كە متىيا رو گورگ و رىيۇيە
شۇرەبى كە بۆتە دارى چاكى بى شەش و شە
زەل كە گەر تەيارى سىرە قوشەنە
خوشە ويستەكەم
لە پەنجەرهى نىيە تاکى بۇومەلىللى وە
چاوم لە دىيمەتى كچى بەيانە
لە حەنچەرهى زەمانە وە
گۈبىم لە زەمزەمى زوللائى
خىزە فەردىكەنانى كانى يە
با سى شە و مەكە نە شايەرى شەدوم
با سى خە و مەكە لە لاي ھومىيىدى فيرە سەر روهەم
بە و دەمەت كە بۇنى سەد بەها رى لىيۇه دى
بۇنى دەشتى بەختىارى، با وەشى چىاي بە دەستى با بە گول چنا وى
لىيۇه دى

بۇنى سەر سەكۆي بە كاگل ئا وېزا وى لىيۇه دى
پىيم مەلى كە دا كە و م -

رییه یه . هه لبهست و شیعره کانی کاک سواره لهمه زور زورترن . هیوا مه دلسوژیکی کورد بتوانی هه موویا ن کوبکا ته وه .

کاک سواره ، به تایبه تی له نووسینی په خشانی ئه ده بی کوردیدا کم ویته بیو . همرو چهندان چیزگ و داستانی نووسیوه . ئه ما نهی که ههتا ئیستا ئه من کوم کرد وونه وه و له لام هن بریتین له :

(۱) داستانی " چه کوش وه شیئنی روّله کوژرا و " ، نزیکه ۲۰۰ لایه ره یه ، به سرهاتی کاوهی مه زنی کورده که کاک سواره به شیوه یه کی ئه ده بی رازاندوویه ته وه .

(۲) " لاس و خه زال " بمرداشتیکی نوییه له داستانی کونی لاس و خه زال ، نزیکه ۲۰۰ لایه ره یه .

(۳) " ئافرهت " وه رگیرا نیکی ئه ده بی زور جوان و ریکوپیکه له به شی ئه وه لی کتیبی " هزارو یک شب " ، نزیکه ۱۲۰ لایه ره یه .

(۴) " خالهی ریبوار " داستانیکی ئه ده بی زور به نرخه که له رواله تیکی نه هیینیدا باسی جولانه وهی ساله کانی ۱۳۴۶-۷ ای کوردستانی ئیران و شه هیدبوونی سما یلی شه ریفزاده " فهقی عذریز " ده کات نزیکه ۶۰ لایه ده یه .

(۵) " حمکو " داستانیکی کومه لایه تی ئه ویندا رییه ، نزیکه ۳۰ لایه ره یه ده بی .

(۶) " سهیده وان " خولقانیکی نوییه له سه ربیتی سهیده وان که به جوانترین شیوهی ئه ده بی رازاوه ته وه ، نزیکه ۶۰ لایه ره ده بی .

(۷) " پیا وه تی " کورته به سرهاتیکی هه مزه ئاغای منکوره که به شیوازیکی نوی و کوردانه نووسراوه ته وه ، نزیکه ۳۰ لایه ره یه .

(۸) " تا پوو بومه لیل " نووسراوه کورته کانی ئه ده بی و کومه لایه تی کاک سواره ن ، نزیکه ۲۰۰ لایه ره ن .

(۹) هییندی شیعرو نووسراوی سه باره ت به کورد به زمانی فارسی که نزیکه ۱۵۰ لایه ره یه ک ده بن .

* * *

چهند نمودونه یه ک له شیعره کانی سواره .

سواره

ئا ماده کردنی
ئەممەد شەریفی (*)

" ئەگەر رۆژیک لە پىینا وي گەلا نەبى ئە و
رۆژە لە ژیانتدا بە فېرو چىسووه ،
ھەنا سەكىشانت ، رىگا رۆيىشتنت دواتتـ،
بە كورتى ھەموو شىيىكت دەبى سوودىكى
كۆمەللى تىيدا بى " .

سوارە
لە " داستانى ئافرهت "

" سوارە " كورپى ئەممەد ئا غاي ئىيلخانىيە . لە سالى ۱۳۲۰ ھەتا وي
لە شارى سەقز ھاتوتە دونيا وە . خويىندى سەرتايى و ناوهندى لە سەقز ،
بۇكان و تاران تەواو كردۇوھ و پاشان چوّتە زانكۈچى حقوقى زانستگەمى
تاران . كاك سوارە لە پايزى سالى ۱۳۵۴ كۆچى دوايى كردۇوھ تاران وە
تەرمەكەيان هىينا وە شارى بۇكان و لە گۇرستانى گوندى " حەمامىان
تەسلىيم بە خاک كرا .

" سوارە " كارمەندى بەشى كوردىي " سازمان راديو تلوزيون ملى
ايران " بۇو . بەرنا مەيەكى ويىزەبى و ئەددەبى بە نا وي " تاپۇو بۇومە
لىل" دەننوسى كە باشترين و پىرى گوئىگەترىن بەرنا مەي كوردى رادىيە
ئىرماق بۇو . ماوهىيەك پىكەوە لە تاران و كرماشان ھاوكار بۇوين . ئەم
شىعرانە كە لەم دەفتەرەدا كوكرا ونەوە يادگارى ئە و چەند سالە ھاوكاـ

(*) كاك ئەممەد شەریفی لە مەها باادەوە دەفتەرەكى بۆ ناردوویىـ،
تىيا يدا بە كورتى لە ژيان و بەرھەمى سوارە دوا وە ھەندى لە شىعرە كانى
تۆمار كردۇوـ . ئىمەش لىرەدا ، بە ئومىدلى زياتر ناساندى ئەم شاعيرە
كوردستانى ئىرماق ، بەشى لە دەفتەرە پىشكەش بە خويىنە ران دەكەيـن و
ھەروا سوپا سىكى گەرمى كاك ئەممەد دەكەيـن .

(ھيوا)

توش به شمشیر یه کسر سه ری دوو لهت شه کهی؟!
 شهی له گری شه ری سه ختی چینا یه تی دا گیرسا وا ،
 هدر پشتگیری هه زاران و
 دوژمنه کهی با وه کوشتهی زوردا رانی؟!
 ئیسته شهوان ، له ده ریا ئاسما نه کانا ،
 لهنا و تافی هه وره کانا ،
 هدر خه ریکی گهشتی دوور و ویلی دووای بالی ئا زیزی؟!
 به گه می نیوه فه وتا و به / لهه / سه ولی شکا و و
 به دلی بریندا ره وه ،
 به لهشی کفت و شه کهت و
 ده ست و پلی زا ماره وه ..
 ده مه و بیان ، ئه گه یته وه که ناری په زاره و گومان؟!
 له گه لی یه که م لیزگی خورا ،
 به چا و دلی روونه وه ،
 به کولی و ورہ و تینه وه ، هه متر قوربا ان!
 ئه که و بیته بینه و برهی نه خشې یه کی ریک و پیکتر
 بو سه فه ری دوور گهی دووری چا و که ژا لان؟!

لینینگراد

کانوونی دووه م - مارت ۱۹۸۳

"ئەتبىنم شىخ (۲)، لە دوواي ئەوهى ئينگلiz (نەوتى) (۳) ئى بوردىمان كرد،

بە هەلەداوان ئەتنىرى بۆ (قەرەداغ) ،
نا مەكەمى شىخ لە دلتا ئەشارىتەوە و
ئەسپەكەت خىرا تا و ئەددەمى ،
ھەلت ئەگرى و ئەتفېرىنى ،
تو ئەبىنم بەرز ھەلچووى وەكو ئالا " ...

ئەي توخوا چون بىروا يىم بى ، تو كەفتەكە و تۇووى نا و جىگاى ؟!
با به ئىمەشە و ! با به ئىمەشە و !
بە بى و چان بەفرە بارى ...

بىرە وەريم ، كلوو... كلوو وەكۆ زستانى كەزەكان ،
كلىلە ئەكا تا بەيان ...

" مىزەرى سپى و شىريىنت ،
كۆترى شاباڭ چورپى شير ،
قىزە سپىيەكەي " گۇران " (۴) م ،
لە حوجرەكەي تۆدا بىنى ...
وەك بەھەشتى پېرىشىتە ،

وەك خەلۋەتى شەوانى مانگەشە و نۇور با رىن ؟
وەك شەوانى بە لەيل شاد بۇون ،

وەك حەقىقت ، حوجرەكەي تۆ ، سپى ... سپى
ئا وى چا وى مىرى ئەبرەد " ...
ھىدى ... ھىدى بەفرە بارى ،

قوربا ان ئىستەش :

" دەرەبەگ وەك درىنەيەك دىيىتە خەونت ،
لە پىيىنى با غەچەكەي لاي مىگەوتەوە ،
بۇت دىيىتە نا و مىحرابەكە ، نويىزى شىپوان ؟ !

(۲) مەبەست پىشەوا شىخ مەممۇودى حەفيىدى نەمرە .

(۳) نەوتى، گوندىكە لە نا وچى قەرەداخ .

(۴) مەبەست گۇرانى شاعىرى مەزنە .

سه روهری من ، وا شه زانم ، که ئیسته يه :
 " پرشهی چرا دیوار کۆکه ،
 له گەل ئاھ و تاسەی گەرمى فەقیکانا ،
 له پەنجه رەھ خنجیلانەی حوجرە كەوه ،
 ئەپرژیتە حەۋە كەھ مۇگەوت ،
 ئەئالیتە با لای شەنگى دارتۇوه كان ،
 ئەپرژیتە شینا يى دەشتى بەرمالان ،
 فەقیی زانا ، فەقیی دلدار ،
 فەقیی دەنگ خۆش ،
 فەقیی رېگا نيشاندەرى خەلکى هەزار
 فەقیی را پەرپيو له زۆردار
 تا ئیستا كەش لەبەر چاومە ،
 دايكم هەموو بەيانىيەك ،
 به چا وي رەش و نما وي و خەمنا كەوه ،
 ئەيرۋانىيە لوتکەكان و سەرەرېگا
 " له گەل زەھى زەنگى هەموو كاروانىيکا ،
 ژىلەی غەربىيى كەزەكان ،
 لهنا و دللىا هەلئەگىرسا ،
 به سۆز دايكم ، ئەيلواندەوه و ئەگريا ،
 ئىيتر باس هەر باسى : تافى شىرينى " سېروان " بۇو ،
 براى گىراو ، مزگەوتى چرا كۈزاوهى با پېران بۇو
 ئەدى دا يە كىان !
 زىد (۱) الله تۆوه بە پىچى ، رۆزەرېيەك دوور بۇو ، ئا وات ئەگرد ،
 سا / شا / بە تا قەتى ئىيمەي پەرائەندەي كۈوچەي دنبا و
 چارەنۇسى نادىيا رېبى !
 هيىدى . . . هيىدى بەفرە با رى ،
 ئىيمشەو با به ، وەكۈ ئەو رېزىنە با رانەي ئىقلیم گىرە و دەم بەھاران ،
 دەشتەكان داشەگرىتەوه ،
 يا دگا رت بە بەرچا و ما دائە با رى . . .

(۱) زىد : نېشتمان ، ئەو شويىنەي مەرۆفلىيى لە دايک ئەبىت .

نه تریقه‌ی کچ و کالی سهر ده ریا چهی سه هول به ندانی ته نیشتمان ،
 روشنی ناخنه دلم ،
 دوژمنه کدت به حالم بی ،
 ئیمشه و با به ، دوور له عومرت ! ژووری غدریب ،
 له ئیواره‌ی پایزیکی پر شین ئەچوو ...
 هه والدکدت دای له دلم ؛
 " به سه دشا خا هەلزنا م و نامه ملى دهیان رووبار ،
 ده شته کانم هه مووی تهی کرد ،
 له دووره‌وه دهستی سۆزت ،
 بۇ روخسار و قزی ئالۇزى غەریبیم رائەکیشا و سوودی نەبوو ...
 ئیمشه و با به ، هەر دارستانی نیزه بwoo ،
 ئەکەوتە نیوان من و تو ،
 بەلام نیزه نەيئەتوانی ،
 لەناو دلی زا مارماندا
 خوشە ویستى له گیان بکا ...
 ئەی خىلە چەقۇ كىشەکەی ؛
 سەر تاكۇ پا خوین و تاوان 1
 لەگەل عەشقا پیتان ناکرى ، ئە مجا رەیان
 بە بئى نامه و هەوالل پرسین
 (نالى) يە دوور ولاتەكان ،
 بەربەيانى ، بومەللى ئیوارانى ،
 خۆيان ئەکەنەوه بە شارا و
 تىر ماچ ئەکەن ، خاکى با با ان ...

- ۲ -

هيّدى ... هيّدى بەفرە با رى ،
 دەنگى پر سۆزى با وکىھەتىت ،
 سيماي شيرىن و نوورا نىت ،
 ئیمشه و با به ، هەللىكى كورى غدریب و ئاوارەبوون ،
 كورى دوورىش ، هەللىكى دىدەننى تۆ بwoo ...
 من چۆن دلم بىروا بىي بات ، تۆ كەفتەكە و تۈۋى نا و جىڭكاي ؟

زرهنگولری پار

هدر له زووهوه مهيلهکهی مهستین
هدر جان فيداکهی رۆکهی ئەلەستین

"مهوله وی"

- بۆ با وکی هیّزا م -

ئەنوهور قادر جاف

- ۱ -

هیّدی .. هیّدی به فره باری ،
کۆترە کانیش بە خەمباري ھەلنىشتۇون ،
ئە و گلۆپە شىرىييانەش ،
وەك عاشقى لە تارىكىدا ئەسووتىن ، ..
پەنجەرەي ماتى ژۇورەكەم ،
رۆخساريشم ، ئەرپوانى دارستانى سېپى و خاموش ،
ئەرپوانى شەقا مى چۆلى نىيەشەو ، سەرا سىيمەن ،
تىيى كردووه و هەر ئەبارى ، ..
ئاسمانى ئەم شارە شەنگەش ،
ھەر لە چا وى دايىم ئەچى ،
ھەموو دەمى بە فرمىسىكە ..
ھىّدی .. هىّدی به فره بارى ،
ئىمشەو با به ! ھەوالەكت داي لە دلّم ،
نە پىيکى مەي ، نە ئەفىينى كچىكى شەنگ ،
نە / زمانى ئە و شىعرا نە لە لاي لايە دايىم ئەچن ،

*Ke min xôm bim,
 kiwa derfet ?!
 Ya min ya mérû !
 nokerin ewaney delên :
 «dan u mérû biray yekin»
 nokerin ewaney delên :
 «xôn u zîrû biray yekin»
 nokerin ewaney delên :
 «masî w çigal,
 dest u çizû,
 pet u gerdin,
 gözan u mü biray yekin»
 werin xelke !
 le néçîr u zam bipirsin,
 bilên tuxwa
 xencer heye zam tîmar ka ?!
 rawçî heye néçîr nexwa ?!
 de xelke le ka bipirsin qet agirî sardî dîwe ?!
 Le hêlaney mel bipirsin,
 be niyazî maç,
 qet mar demî tê jenîwe ?!
 qet le darbarû bipirsin,
 tewrî dîwe darbir nebê ?!
 De le keñekîş bipirsin,
 gurgî dîwe kerdir nebê ?!
 nokerin ewaney delên :
 «marî şîrîn jarîş heye».
 nokerin ewaney delên :
 «tewrî biray dariş heye».
 min piştêkî birindarim, le qamçîy xom raperîwim,
 min lafawékî lasarim, lew kenarane helsawim.
 Nanîsmewe.
 Nanûmewe.
 Bê aramim,
 (aramî min çirayak bû,
 reşebay dewrim xönü rişt.)
 Bê bezeyîy min zeryayek bû,
 bînyen pêwe na w helyan mişt !*
 * * *

Ferhengok

kitke kor : pişile köre.
 saroçke : mérûstan, şare mérû.
 helyan mişt : helyan mijî.
 zérû : zerû.
 tilş : qilêş, dirz.
 bînyen pêwe na : demyan pêwe na, xiwardiyanewe.

ته وری دیوه دار بِر نه بی؟!
 ده له که ریکیش بپرسن،
 گورگی دیوه که ردر نه بی؟!
 نوکه رن ئه وانه ده لیّن:
 "ماری شیرین ڙاریش هه یه".
 نوکه رن ئه وانه ده لیّن:
 "ته وری برای داریش هه یه".
 من پشتیکی بربیندا رم،
 له قامچی خُوم را په ریوم.
 من لافا ویکی لاسارم،
 لهو کمنارانه هه لساوم،
 که ته نگیان پی هه لچنیوم.
 نانیشمده وه.
 نانوومده وه.
 بی ئارا مم،
 (ئارا می من چرا یه ک بوو،
 ره شه بای ده ورم خوینی رشت).
 بی زه بی من زه ریا یه ک بوو،
 بینیان پیوه نا و هه لیان مشت!

× ×

یا من یا زیروو!
 نوکه رن ئه وانه ده لیّن:
 "دان و میروو برای یه کن"
 نوکه رن ئه وانه ده لیّن:
 "خوین و زیروو برای یه کن"
 نوکه رن ئه وانه ده لیّن:
 "ما سی و چه نگال،
 ده ست و چزوو،
 پهت و گه ردن،
 گویزان و موو برای یه کن"
 وه رن خلکه!
 له نیچیر و زام بپرسن،
 بلیّن تو خوا
 خنه مجره هه یه زام تیمار کا؟!
 را وچی هه یه نیچیر نه خوا؟!
 ده خلکه له کا بپرسن،
 قدت ئا گری سار دی دیوه؟!
 له هیلانه مه ل بپرسن،
 به نیازی ماج،
 قدت مار ده می تی ڙه نیوه؟!
 ده له دار بِر روو بپرسن،

فه رهه نگوک

کتکه کور : پشیله کویره.
 شاروچکه : میرووستان، شاره میروو.
 هه لیان مشت : هه لیان مژی.
 زیروو : زه روو.
 تلیش : قلیش، درز.
 بینیان پیوه نا : ده میان پیوه
 نا، خوار دیانه وه.

SEDAN SALE

'ebdulla Paşew

Sedan sale :

*le wêranemalî xomda,
kitke korî goşey mitbeqî sultanim,*

sedan sale :

*hewş u berey xom walaye w
leber dergey dizanî xom pasewanim,*

sedan sale :

*weku çengêk danêwêle
aşî mêtjû firêy dawim.*

*her ciwar dewrim saroçkeye w
mêrûle demyan tê nawim.*

sedan sale :

*kaseserim - minareye,
kê bê, dengî tiya helbirê,*

sedan sale :

*nîştimanim - nergeleye,
kê bê, be demyewey degré.*

Sedan sale :

*leber dergey tekyey cîhan
cûtêk solî pînepînem,*

kê le pêm ka bo ew deşêm,

sedan sale :

diway pîneyek le pê dekrêm.

* *

*

*Min piştêkî birindarim,
le qamçî xom raperîwim.*

*Min lafawêkî lasarim,
lew kenarane helsawim
ke tengyan pê helçinîwim.*

Nanûmewe.

Bê aramim.

*(aramî min çirayek bû,
reşebay dewrim xônî rişt.)*

Bê bezeyîm.

*(Beezeyîy min zeryayek bû,
bînyan pêwe na helyan mıst !)*

Nanîşmewe.

Nanûmewe.

Ke min dan bim,

kiwa derfet ?!

Ya min ya mérû !

سەدان ساله

عەبەدوللە پەشىو

سەدان ساله :

دواى پىنەيەك لەپى دەكريم .

× ×

من پشتىكى بىرىندارم ،
لە قامچى خۇم راپەرپۈرم .
من لافا وىكى لاسارم ،
لەو كەنارانە ھەلسا
كە تەنگىيان بى ھەلچنىوم .
نا نىشىمەوه .
نا نۇومەوه .
بى ئارام .

(ئارامى من چرايدىك بۇو ،
رەشەباي دەورم خويىنى رشت .)
بى بەزەبىيم ،

(بەزەبىي من زەرييا يەك بۇو ،
بىيىيان سېيۇھ نا ھەلىيان مشت !)
نا نىشىمەوه .
نا نۇومەوه .

كە من دان بىم ،
كوا دەرفدت ؟!
يا من يا مېروۋا !
كە من خويىن بىم ،
كوا دەرفدت ؟!

سەدان ساله :

لە ويّرانەمالى خۇمدا ،

كتكە كۆرى گۆشەي متىھقى سولتانم ،

سەدان ساله :

حەشۈر بەرەي خۇم والا يە و
لەبەر دەرگەي دزانى خۇم پاسەوانم .

سەدان ساله :

وەكى چەنگىك دانەویلە
ئاشى مىزۇو فەرىدى داوم .
ھەر چوار دەورم شارۇچكەيە و
مېرۇولە دەميان تى ناوم .

سەدان ساله :

كا سەسەرم - مئارەيە ،
كى بى ، ھەنكى تىا ھەلدە بېرى .

سەدان ساله :

نىيىتمانم - نىرگەلەيە ،
كى بى ، بە دەمەيە وەي دەگرى .

سەدان ساله :

لەبەر دەرگەي تەكىيە جىها ن
جووتىك سۆلى پىنەپىنەم ،
كى لە پىم کا بۇ ئەو دەشىم .

سەدان ساله :

دواى تلىشىك فەرى دەدرىم .

ههزار چی و پهلى چهند ديني.

ئه و نموونه يه كى بچوو كه له فولكلورو ئهده بى عاميانه كه نه نووسه رىك به رىك كوشينى مىشكى دا يرستوه نه نووكى قەلەمى بى نووسىنە كە سواوه . كەوابوو كۆكردنە وە لىكۈلينە وە شى كردىنە وە فۇلكلۇر وە كە ئهده بى پەسەنى نەتە وا يەتى ، خزمەتىكى گەورە يە بە كەله - پۇورو كولتوورو ئهده بى نەتە وە كەمان كە لەبەر بى دەسەلاتى سياسى مەترسى فەوتان و نەمان هەرەشەي لى دەكا .

لە دنياي ئەمپۇدا فەرەنگ و فولكلورو ئهده بى گەلى ، لە گەل تىكىنیك و مۇسیقاى مۇدېرىن و تازە با بەت روو بە روو دەبى : ئەگەر لە بەرا مېھر ئال و گۇرى خىرا و پەرەگرتىنى هەرا وي زىيانى مۇدېرىن دا نەپا - رىززى و خزمەتى نەكىرى ، نەكەدر بە رەسەنى و پاكى نامىنىتە وە ، بەلكۇو لەوانە يە بشەوتى و تىدا بچى .

ئەنسىتىتى كورد لە پاريس جىگاى هيوا يە كە بو كۆكردنە وە ساخ كردىنە وە پاراستنى فولكلورى رەسەنى كوردى ھەنگاوى لەبارو پىيويىست با ويىزى .

* * *

با سی خیلی کویستا نچیه کان ده کاو ده لی:

" له ژیرا هاتن گهینه قهرا چی چا دریان ده خستن له دم رو باران"

" ئیستری بالهبان له پیش کوچی دا

سه ریان ده کیشن مه مکه هناران"

" به کراسی خارا بن که وی خامدک

به رانپیل مه ره ز ده ستوری جاران"

" خونگهی با زنهیان عاله م که ر ده کا

هر که ده کوتون رسته ره شمالان"

گورانی بیزی نه خوینده وا ریش لم پارچه ئه ده بیه فولکلوریمه دا
کیزی شوخ و شنگ و کویستا نجی و ره شمال و هه او و باره به رو شتی تر
وه بیر ده خاته وه که له ژیانی واقیعی کورده وا ری دا هون و له ناخنی
کومه ل هلقولیون.

بهندی ئا خرى گورانی بیزه که ما ن چه پی ده به ربه نده کانی دیکه دا نیه.
لم به ندهش دا ویزه ر به چه شنیک به یاره نازداره که هله لی و زارا و
ته عبیری ئه وتو به کار دینی که له کم نووسینی نووسه ره کاندا به رچا و
ده که وی.

" ده لین کویتی حدوده ، په لی چوته هزاری "

" کویتی حدوده " وشهی " کویت " له کورده وا ری دا بو ئه سپ و ماينی
باش و زهمن به کار دی. یه کسمی " کویت " گه لیک په سندو مه قبوله . خو
ئه گه ر " کویت " و " حدود " يش بی، هه ر قيمه تی ته وا و نابی. " حدود "
ته عريفیکی فره باوه بو ولاخی باش و ره من. له کورده وا ری دا وشهی
" حدود " بو ژنی جوان و شوخ و لمباریش به کار ده هینتری.

لیزه دا گورانی بیز یاره که به " کویت و حدود " ناوبردوه . به لام
هر به ونه ندهش وا زی نه هینا وه . ته عريف و ته عبیریکی تری به کار هینا وه که
مرؤف هر وا به هاسانی ناتوانی ساخی بکاته وه و حوكی له سر بدا .

" په لی چوته هزاری " له کورده وا ری دا باوه ، ده لین ئه م ئه سپ
یا ماينه هر په لیکی ئه ونه پاره دینی . به لام گورانی بیز دیاری ناکا
په لی " کويتی حدود " هزار ئه سپ ، هزار لیره ، هزار دینار " هزار
تمهن ، هزار و شتر ، هزار ئه سپ ، هزار چی دینی . هیچ دیار نیه . مرؤف بسوی
ناچیته وه سه رید که مه به ستی گورانی بیز له و هزاره چی بیه ؟ هر خسوی
ده زانی ، به و ئه قین و حه زی به یاره کمیه وه هه یه تی ئه م هزاره جسی بیه و

فولکلورو بهیت و حهیرانی کوردی زورجار باسی " ران و رکیفی " شووره سواری کوردو سوار چاکی و جوا میری لاوی کورد دهکا .
چهند خوش به مهزله بسی ده جحیلان بیوه له سه‌هه‌ری ده گهوره و گران، شل کهیوه " راسی ده رکیفی " به‌ردنه‌یه و دهستی ده ددستی جله‌وی به‌را مبهرو پیشاپیش به مه‌وت‌هشی ده‌کهونه باران ".
شهوه ژیانی واقعی کۆمەلی کورده‌واریه که له گورانی عاصیانه و یا فولکلوری کوردیدا خو ده‌نوینی.

"نازداری شوخ و شهنجم دینیته خوارپیش با ری"

گوراني بيژ به نيو ئەم گول و گولزارەدا رادەبرى و توشىسى
يارى شوخ و شەنگى " دەبى كە ئەوه پىش بار رادەكىشى . بەلام بۆچى
ستران بيژ ئەو مەزرايدى نىوان گوندى " خالدار " و " سېلىۋىي " ئەلبىزادە ؟
چونكە مەردا رو كويستانچى نا وچەكانى سندوس و شار ويئان و لاجان بەھو
مەزرايدا بۆ كويستانەكانى " بارزىن و مىرگە چەكۈشكە كانى خودا و قەبىرى
ھەندىوو " دەچن . گوراني بيژ ئەوه دىوه و ھەرچەند نەخويىندهوارە ، خەرىكە
لەم شويىنهدا بىگاتە ئەم لووتکە يە كە " هيئىنى شاعير " خۆى لى داوه كە
دەللىز ؟

"که با رگهت بو هوار تیک نا عه زیزم

شکا ئەستن دوندەكى تا ولۇي مرا دەم
بىيگومان هييمن ئيلها مى ئە و شىعرە لەو كويىستا نچى و رەشما لانە
وەرگرتوه كە لە نزىك گوندى خۆي "شىلانا وى" لە كويىستا نەكاكى
"چەكەچ و مالۇك" چا وى يې كە وتوون.

گوراني بيژي ئىمەش هەرچەندە نەخويىنده وارە بەلام دىتتۇويە كە
كويىستا نچىيەكان لە خالدارەوە بەرە و كويىستان بە " كەندە كور"دا دەرۇن
و يَا بەرە و خوار دەگەرىيەوە " نازدارى شۆخ و شەنگىش"- ئەوا " پېش
ياد،" دادەكىشى؛ لەسىر ئەم گول و گولزارە ناز دەكى.

"پیش بار راکیشا" یا "هینانه خوار" ته عبیرو ره نگدا نمه و هی
واقعیه له ئیانی کویستا نچیه کان. کاتیکی مهربادار بو کویستان ده چن و
یا ده گه رینده و ه، هینندی ولاخی چاک و جوان له پیشدا بار ده کهن و کینزو
بووکی جوان و شوخ و شهنج هه وسا ریان زاده گیشنه و له پیشه وه ده رون .

به وانه ده لیں "پیش بار" و زووتر ده گنه جي ههوار.

شا عیریکی کورد لهو باره وه پارچه هەلبەستیکی جوانی هەیه کە

"...سویسته و هـلـله و بهـیـبـوـون دـهـگـهـ نـه رـکـیـفـی سـوـاـ رـیـ"

"نازداری شوخ و شهنگم دینیته خوار پیش با ری"

"دەلين كوييٽى حدووده، پەلى چۆته هەزارى"

لەم بەستە گۆرانىيەدا ، گۆرانى بىزى نەخويىندهوار ، ئەوهندەي وشەو زارا و تەعبيرى جوان و رەسەنى كوردى بە كار هيّناون كە بە زەممەت لە نۇوسيىنى نۇوسەرەيکى شارەزادا ئەوانەي وىزەر لەم گۆرانىيەدا هيّناونى و رىزى كردىپۇن و ھۆندۈونىيەوە ، گشتىيانى لە واقىعى ڦىانى روْزا نە وەرگەرتۇۋە لە ولاتدا ھەن و دەبىنلىكىن . لەبارى وشەو زارا و تەعبيرىشدا كوردىيەكى رەسەن و بەكارھىنیان لەنئىو كۆمەلدا باوه . بايزانىن وىزەرى نەخويىندهوار چەندە جوانى رەنگا ندوه :

"لە كەنده كوري سىلۇي تا دەگاتە خالدارى "

"سیلوی" گوندیکی گهوره و خوش و بهنا و بانگی کوردستانه لە نا و چەی بەر بینەلاجانی ما مەشان. کەوتۆتە دا وێنی کویستانە کانی با رازبێرو میرگە چەکۆ. لەسەر رووباری لاوین خوي پا ان راکردوه. گوندیکی زۆر کۆنە له نا وەکەی دەرددەکەوی کە له ناوی ئوروپی نزیکە. چونکە له زمانە کانی "سلاو" یشدا "سیلو" بە گوند دەگوتري..

"کمنده کویر" بهره مداریکی ئە و گوندەیە، دىئته خوارى، تا دەگاتە پشتى خالدار. "خالدار" گوندىكە سەعاتە رىيىك لە "سېلسلىرى" دوورە. كەوتۇتە پشتى جادەي نیوان نەغەدەو پېرانتشار. لام وانىيە گۇرانىبىتىز ھەروا بە خۇرايى تاوى ئەم دوو گوندەي ھىپا بى. كابرا ئەم ناوجەيەي دىووه، بە ويىدا روپىشتوه. دېتۈويە لەو مەزرايدا "سوپىسىنە و ھەللالىمە و بېبۈون" كە گىا و گولالىمە بۇن خۆشى چىا سەركەشەكانى كوردىستان، خۇيانلىك دا وەو مەزرايان رەنگاندۇوە. كەسيكى ئە و با توهى دىبىي پىيىدا تىپەر بۇوبى، دەزانى كە سترانبىتىز نەخويىندهوار چۈن لە دەريايى گول و گوللىزادا مەلە دەكە و بۇنى گولان سەرخوشى كردوھ! ئەم گىا و گولە جوانانە بەرز دەكەتەوە تا دەيانگەيەنىتىھ "رکىپى سوارى".

"رکیفی سوار" ته عبیریکی زۆر جوانی کوردییە . کورانیبێز له لایەک زین و ئاوزەنکی و رکیفی شوڕەسواری کورد وەبیر دەخاتەوە و له لایەکی دیکەش قشلاخ و پاوان و میئرگ و میرخوزاری کوردستان دینیتە بەرچاو . له و "کەندە کوپە"ی کورانیبێز باسی دەکا ، نەک هەرسویین و هەللاه بەلکو کەنیرو قورینگان و گیاگەنمهو رەشە گیاش له رکیفی سواری دەدەن .

خوشه وه سه لماندی. زوری پی جوان بیو. بهلینی دا له کوری زانیا ری کورد
بیخاته به رجا وو توماری بکا.

گه لیک نمودنی ئه وتو هن که له نیو خەلکدا باون، دەگوتريین،
رەسەن و جوانن بەلام خويىندهوارەکە نەبىستوه، نای زانی، ناچار و شەھى
ئه وتو له نووسىندا دەتاشى کە نەک هەر رەسەن نىيە، بهلکوو به رەنسەدەو
سما تەش لیک و لۇوسى ناکرى.

ئەم جۆرە خويىندهوارانە کە له رىگاي مەدرەسەو زانكۈو زانستگا وە
پى گەيشتۇون و دەستيان دا وەته قەلم، لەزىر تەئسىرى فەرەنگ و زمانى
بېگانە دوورى لەنیو خەلکى رەمەكى و سادەي گوندى، نەک هەر گرنگى بۆ
ئەددەبى عا مىانەو فۆلكلۇرى نەتەوهى دانانىن. بهلکوو به بىانووی لاسا
كردىنە وە ئەددەبى بېگانە موڈىرن و تازە با بەت دەيا نەۋى ئەددەبى رەسەنى
عا مىانە فولكور وەلابىنن. به لاي منەوە ئەم روونا كېيرانە نەک هەر خۆيان
فيىرى كوردى رەسەن نا كەن، وەكۈولە خزمەت بە پەرەپىدا ن و گەشاندىنە وە
فەرەنگى نەتەوهە كەشىان دوور دەكەنە وە.

بە خۆپاپى نىيە له كوردىستانى ئىران تەوا وي ئە و كەسانە كوردى باش
دەزانن و نووسەرى باشىن له گوندى گەورە بۇون و لەگەل كۆمەللىنى خەلک
تىكەلاؤيان بۇوه نەچۈونە ژىر تەئسىرى فەرەنگى بېگانە و چەند كەسىك نەبى
له زانكۈو زانستگاش نەيا خويىندهو. بۆ نمۇونە وەك: ھەزار، ھىمن، حەسەنى
قۇلچى، مەلا عەولاي حەسەن زادە، كاك سەلەھى مۇھەممەنگ و ھېي دىكە.

لەم باسە واز دېئم و دەگەرېفەوە سەرتاپەتىيەكانى فەرەنگ
ئەددەبى عا مىانە (فۆلكلۇر). يەكىك له تاپەتىيەكانى ئەددەبى فۆلكلۇر
ئەوهە كە له ناخى كۆمەلەنلىقۇلى و لەگەل ژيان و ئەزمۇونى رۆژانە
پىوهندى ھېيە بنا خەى لەسەر واقىع داندرا وە. له بارى تەعرىف و نرخ بۆ
دانان و جوانى و بە بالا بېرىنەوە، ھەرچەند پى لى ھەلەينا نىشى لەگەل بى،
واقىعى ژيانى كۆمەل نىشا ن دەدا.

بۇ ئەوه بگەينە سەر ئەسلى مەبەست و ئەم واقىعەتە نىشا ن بەدەين كە
لە ئەددەبى عا مىانە (گۇرانى و ستران و فۆلكلۇر) دا ھېيە، بەستەيەك
گۇرانى شى دەكەينەوە كە گۇرانى بىزىكى نەخويىندهوارى كوردىستانى ئېپران
گوتۈويە. خا وەنە ئەسلىكەمى مەعلۇوم نىيە. ھەمو گۇرانى بىزىھە كان دەيلىن و
دوپاتى دەكەنەوە. ئەمەش دەقى گۇرانىيەكە يە:
"لە كەنە كورپى سېلىۋى، تا دەگاتە خالدارى"

فولکلوری نه ته وايدتیه وه ، دواكه و توویی به و کاریکی بی جی و بیهوده به . روونا کبیری ئه و توشمان هه يه که به ئانقدست له و شهی قولمبهی بیگانه ده گه ری و نایه وی و یا نازانی و شهی ساده و پاراوی زمانده کهی خوی به کار بینی .

بەلام له راستیدا هەر ئەدەب و فەرهەنگی عامیاند و گەلیيە كە رەسەن و مانەوهی زمانی زکماکی پاراستوھ . هەر ئە و خەلکی نەخویندەوارو رەمه کین کە نەقل و نەزىله و ھەلبەست و چیروک و بەيت و پەندو مەتطلۆکی نەتەوه بیيان پاراستوھ و زاربەزار گیپرا و یا نەتەوه و شەو زاراوی ئە و نەنە جوان و رەسەن و ریک و رەوانیان بەكار هیانا وە کە زۆر له نۇوسمەرو ئەدىبە روونا کبیرەكان رئیان بی نەبردوھ . زۆربان ھەول داوه کە بسو نۇوسيين و شەيەك بدوزنه وە یا داباتاشن کە خەلک و اته نەخویندەوار قسمی پی کردبى . زۆر جا ریش داماؤن و سەر نەکە و تۈوون و ناچار و شەی ئە و توپیان داتاشیوه کە بە چریشىش بە زمانی کوردىيەوه نانۇوسى ولىي بیگانە يە . چەند سال لەمەوبەر لەگەل ما مۆستايەك کە ئەندامى ليژنەی زاراوه دانانی کوردى زانیارى کوردى بۇو قىسەمان لە و شەو زاراوی کوردى دەکرد . لیم پرسى بو "شط العرب" چ و شەيەكى کوردىتا ن داناده . وەک لە بىرم بی ما مۆستا چەند و شەيەكى گوت بەلای منه و رەسەن نەبۇون و دا تاشرابۇون . دەيگوت هيچى دىكە ما ن نەدوزىيەتەوه .

بەھەلکەوت چەند شەو دواي ئەم باسە میوانى برا دە ریکى نەخویندە - وارى زەحمەتكىشى گوندى بۇوم . دانىشتبووسين و قىسەمان دەکرد . باسى برا دە ریکى ناسيا رەتە گورى ، خىزانى خانەخويى نازانم لەسەر چى لە برا دە رە تۈورە بۇو ، وە دەنگەتە و گوتى :

- دە باسى مەکەن ، رەببى خوا بىبا دە "يەکاوى عارەبان" كا ! و شەي "يەکاوى عارەبان" سەرنجى راكىشا م . گوتىم : ئەرى خوشكە شەمى "يەکاوى عارەبان" چى يە ؟ گوتى : "ئەوه نېھ دەلېن ئە و چەمانە لەو خوارە تىكەل دە بىندەوه . دە رکەوت بى ئەوه بىزانى لە كويىيە و "شط العرب" چى يە بە يەکاوى عارە - بانى نا و دەبا . خەلکى نەخویندەوارو رەمه کى ، بى ئەوه کە ليژنە - كۆمیتەتى بى ساز كا و لە قامووسدا بۇي بگەری "شط العرب" ئا و ئا و دە "يەکاوى عارەبان" و پىر بە پېستىتەتى .

كاتىك چاوم بە ما مۆستا كە و تەوه مەسەلەكەم بۇ گیپرا وە . بە

سەزبەئى سەرەتى پى - فۇلەڭلۇرى گوردى

کہریمی حسامی

ئەم و تاره له ژير سەرخەتى "كەننە كورى سىلۇي" بە نازىنـا وى
"شۇويى" شەش سال پېش جا رىكى تر بلاوكرا وەتەوە .
ئەدەب و فۇلكلۇرى ھەر گەل و نەتەوە يەك، گەشانە وەو پېشۈتن و
پەرە گىرتىن، يان دوا كەوتۇويى و دا مىركان و وەستا نى ئەم ئەدەب و فۇلكلۇـ
رە، زىيندەووپەي و شادى و خەم و پەزىزەرى ئەو گەل و نەتەوە يە نىشان
دەدا .

به بیرونی از من له واقعیه ت دوورنا که وین و زیانی شمان پی ناگا
ئه گهر ئه م راستیه بسه لمینین که ئه ده بی فولکلوری (ئه ده بی عامیانه)
خا وینترین و ره سه نتیرین ئه ده ب و کولتووری هه مهو گه ل و نه ته وه یه که .
ئه گهر بمانه وئی به وردی بچینه قوولایی ناخی کۆمەل و شته واقعی
و نهینیه کانی کۆمەل بدوزیشه وه ، پیویسته به لئی زانی و به شیننوهی
زانستی له ئه ده ب و فولکلوری نه ته وه یی بکۆلینه وه و بیهینینه سه رکاغه زو
له فه و تان و نه مان بیپا ریزین .

ئه گهر ته ماشای روالدت و رووکاری ئه ده ب بکهین، فولکلورو ئه ده بی
عا میانه له نووسین و ئه ده بیما تی خویندہ وارو روونا کبیران له پاشتره و
دا واکه و تووتر دیتھ به رچا و شوینی تایبھتی نیه . به لام ئه گهر دوور له
ده ما رگیری روونا کبیری ، به وردی سه رنج بدهین و شی بکهینه وه ، ئه م
راستیه مان بو ده ر ده که وئی که ئه ده ب و فدره نگی روونا کبیری له ئه ده ب و
فره نگی عامیانه کەلکی و هرگرتوه . ئه دیب و نووسه ره کان هه ر به کەلک
و هرگرتن له ئه ده بی عامیانه توانیویانه رۆمان و چیروک و تەناننەت
شیعریش بیتنە سه ر کاغه زو ریک و پیکی بکەن و وەک ئه ده بی نووسرا و بلاوی
بکەن وە .

کاتیک قسه له فولکلورو ئەدەبى عاميانه دەكرى، له وانە يەھىنىدى
كەس لايادا وابى كە فولکلورو ئەدەبى عاميانه له پلهىيەكى فره نزم دايى
و له ئەزمۇون و لىكۆلىنەوهى زانستى بە دوورە. وشەو رستەو زاراوهكان
لەگەل رىزمان و شىۋىزى ئەدەبى رېك ناكەۋى و يەك ناگىرەوه. تەنانەت
رەنگە رۇوانا كېبىرى ئەوتۇشمان ھەبى كە بىئى، وابى خۇخە رېك كىردىن بىمە

که مانای سوژو خوشی و دلسوژی و بیونیتی لهتهک چهوساوه کانسی
ولاتهکه ماندا ، بهوهش که خوی له نزیکهوه له نیو زورا نبا زییه کاندا
بووه و هدلویستی ها وکاری لهگه ل بهرهی میلهه تدا دیا ری کردووه ئوهندی
دیکه بهرهه مهکهی راستگویانه وهدیار دهکه وی ، ئا لهم لایهنا ندهوه ئهگه
لهتهک "خه لکی دبلن" دا پیک بگیرین ، ویکچوونی ئهده بیان له نیواندا
هدلدهستی .

"بومهله رزه" له قۇنا غیکی ناسکدا روویدا ، به دوو مەبەست
بومهله رزه بورو ، هەم جوّری نیو رۆکەکەی کە راسته و خۆ لەسەر شۇرۇشى
کوردو چهوسا ندنه وەی چینا يەتى و ئافرهتن ، هەم لەدواى كېيىھەکى چەند
سالەی ئەده بیات و چاوه روانکردن و تامەزروئى خويىنەران بورو .

*

* *

له نیوانی ده نگی زه نگی ولاخ و مژدهی ژیانه و هدانا بینم، له کوردستانی دواکه و توودا تا ئەمروش ده نگی زه نگی ولاخ له برەودا يەو بۆ زۆر کارو با رى گواستنە وە ولاخ بەکار دئ. كەچى جىهانى پېشکەوتتو لەگەل ئىمە ئاسمان و رىسمانىن، هەرگىز دىارەتى پېشکەوتن و ژیاندە لە دەنگى زه نگى ولاخ وە سەرچا وە هەلناگرى و بۆ ئەم سەردەمە نيشانە دواکەوتتن نەبىچى دىكە نىيە!

كاکە مەم ما مۇستاكە لە پەيوەندى كۆمەلایەتىدا زۆر بە نامۇ پېشان دەدا، كە لە راستەقىنەدا ما مۇستاي قوتا بخانە بە تايىھەت لە دېھاتدا مەرچە دۆستا يەتى و تىكەللاوى لەگەل خەلکەكەدا ھەبى و ھاوكارى كارو فەرمان و خۇشى و ناخوشىيابان بىكا. ما مۇستا رۆلۈكى ئىچگار پىرۇز دەبىنى ئەگەر بە راستى ما مۇستا بىي. ئەوهى لە ما مۇستادا نابى بىبىي، دوورە پەريزى و خۇچەپەك گرتە.

چىرۇكىنووس بە دەم مەلاوه دەلى: "ئەگەر راستت دەھوي من نەبوومايمە، ھەر مەلایەكى دى بوايە لە جىگاي من كفن و دەفنيشى نەدەكرد" (٤٧).

ئا فەرسى مەدوو، دەبى ئا فەرهەت بىشواو كفنى بىكا، ناشتەكەشى چاڭ وايە پىا وي مەحرەم كارەكەي ئەنجام بدا، كە دادەھىللىرىتە گۇرە وە نەرىت وايە جامىك يا پۇپەشمېينىكى بە سەردا دەگرن. كارى مەلا لەۋىدا تەنها تەلقىن خويىندەن و فاتىحە دادانە، نەك ئەوهى كفن و دفن بىكا، وەك كاکە مەم دەلى!

كۆمەلە چىرۇكى بۇومەلەر زە لە گۆمى مەنگدا يەكىك لە چاكتىرىن كۆمەلە چىرۇكى سالانى شەختەكانە، چىرۇكىنووس توانىيەتى با وەرى شانا زى كردىن بە كوردى وە بلاوبكاتە وە، بۆ نيازى هەلنان و ئا راستە كردى جەما وە رانى زە حەمەتكىش نۇوسرا وە، نوينەرىكى گونجا وى قونا غەكەي خەلکى كوردى تىدا بەدى دەكرى.

جىمس جۇيىسى چىرۇكىنووسى گەورە ئىرلەندايى بە نىيۇي (خەلکى دېلىن) وە كۆمەلېك چىرۇكى بلاوكىردىتە وە، ھەموو لە خۇشەيىستى و ھەستى ئەو چىرۇكىنووسە بەرا مېھر شارەكەي باس دەكەن، ئەگەر چىرۇكىنووسە كەمە ئىمەش نىيۇي كۆمەلە كەي بنايە "بۇومەلەر زە خەلکى كوردستان" چاڭ لەگەل نىيۇرۇكىدا دەگونجا.

كاکە مەم توانىيەتى رىالىزما نە بۆ با بهتەكان بىچى، رىالىزمىيەك

(٤٧) كاکە مەم، ھەر ئە و سەرچا وە، ل/٩٢.

روودا وی چیروکه که دا یه کیان گرتۆتەوە، یه کیکی بە سەلیقە کە نىا وى چیروکیکى خويىندبىتەوە دوور يا نزىك شتىكى لە نا وە رۆکەکەی هەلگرەندووە، بەلام لە ووشەي "کەزا وە" دا کە بۇ گالىسکە و شويىنى رازا وە بۈوك لە فەرەھەنگدا بەكار دى، لېرەدا کەزا وە لاشەي بۈوكە، کەزا وە داخ و ئازارە، کەزا وە ناسۇرۇ بىرىنە.

سەرەتاي چیروکەکە بە پىشەكىيەكى وەسفى درىئە دەست پىيەدەكا و شىۋەي مۇپا سانى پىيوه يە، بەلام لەوەدا کە يەكا و راست و لە پىرىكدا فاتىئى شۆخ و نازدار دەمرى، خويىنەر وا لىيەدەكا بە پەرۆشەوە سو كۆتا يىيەكە بچى، ئەوجا ما مۆستا بە چوونە مزگەوت و چا و پىكەوتتنى تەرمى فاتىئى جوانسە مەرگ بە تەدا عى پەيوەندى قالدو فاتىئى بىرەدەكە وىتەوە، ئەدو لە وىيە دەست بە گىپەرا نەوەي چیروکەکە دەكا، تا لەگەل مەلائى دىيەكەدا بە شىۋەي دەمە تىقە لە هەموو نەھىنى و شارا وەيدەك ئاگادار مان دەكەن.

كۆتا يى "کەزا وە" بەوه دى، شۇرش دەگاتە دىيەكەو كويىخا و كورەكەي بە شەتەك درا وى لە دى دەرەدە كرىن... لېرەدا بە پىويىست دەزا نرى ئەمە پرسىارە لە چیروکنۇوس بكرى، ئا يَا تۆلەت تا وانى گەورە بۇ ئەوانسەمە هەموو ژىانىان ھەر چەسەنندەوە ئا زاردا ئەنلىكىيە، ئەوەندە يە لە دى دەرەدە كرىن و هيچى دىكە؟" (٤٤).

چیروکنۇوس لە "کەزا وە" دا تووشى بىرىك بىئاگا يى سووه دلنىام گەر بەشىنە يى و تۆزە لە سەرخوئى يەكى فەرەتەوە بىرى بىردىسا يەوه يا بۇ چەند جا رىك پىيەدا بچوپا يەوه، دەيتوانى بە سەر ئەوانەشدا زاللى بى، بۇ نموونە: لە كوردىستاندا تا ئىستاش شارەكانما ئەوەندە فراوان و زورى تىرو- مېيل و كارگە نىين کە هەوا يان پىس بۇو بى، بۇ يە ئەو جودا وا زىيە گەورەمە ئابىنرى تا ما مۆستا يەك لە دىيەكدا "بە پەرۆشى هەواي پاك هەلمىزىن بى چونكە لە ثار بە دەست كەس نا كەوى" (٤٥). ئەو بە يەكىرىتنە بۇ ئەوروپا دروستە، گەلەك شارى واي ھەيە بە قەددەر سەرانسەرى كوردىستان و بگەرە زۇرتىش كارگەي گەورە گەورەي تىدا يە.

چیروکنۇوس دەلى: "دەنگى زەنگى ولاخە كان لە دوورەوە مەددەي ژىا- نەوەي بە دارو دەوەن دەدا" (٤٦). ئەمن بەش بە حالى خۇمچ پەيوەندىيەك

(٤٤) صەبا حى غالپ، ھەر ئەو سەرچا وە، ل/١٠٨.

(٤٥) (٤٦) كا كە مەم، ھەر ئەو سەرچا وە، ل/٠٨٢.

- ئەی نازانی خۆشم دەوی.. حەزمان لىك كردووه.

- وسھەي بەدووكەوتوا! " (٤٣) .

لە ئەنجامدا كورپى كويخا بە خەنجهەكەي بەرى فاتى دەكۈزى و بو
با وکە جىڭر سووتا وەكەي بەجى دىيلى.

كا شىك كىشىيەكى گەورە رwoo دەكاتە هەر كەسىك، ئەو كەسە بە پىي
مەوداي ھۆشيا رى و بىركردنەوەي ھەولى ئەوە دەدا بەسەر كىشەكەدا زال
بىي، بو ئەۋەشچ رىگا يەكى گونجا و ھەبىھە ھەلېدەبئىرى، لىرەدا كە فاتى
ئەو گەورەترين تەگەرەبىھ رووی تى دەكا ، سەرى لىدەشىيۇ، بىرپارى سەر-
كىشى و لەپى دەدا ، دەنا نەدەبوو ئەو كچە بە بى كەسى ھەر بەو شەمەوە
بىروا ، يا ھەر كە دەرۇشتە بوايە يەكىكى دلسۇزى ئاگادار بىردايە، يا
رۇشتەكەي دوا خستا يە، تا قالەي خۆشە ويىشتى ئاگادار بىردايە بۇ ئەۋەي
بە دەنگىيە وە بىچى، ئەو ھەلۇيىستە، لاوازى و بىر تەسکى فاتى دەرەخا ،
لە كاتىكدا فاتىيەكى گورج و گۈلەدە لە چا و تەخويىندەوارىيەكەيەمەوە
زۆرزا ن و بىزىو زىرەكە، ئەو دوو پىناسىنە دژوارو لىك دوورن، رەنگە
ئەمە شانى كاكە مەميش بىرىتەوە و بە لىپرسرا وى چارەنۇوسى فاتىي قا -
رەمانى چىرۇكەكەي دابىرى.

كە ھەوالى كۈزرانى قالە لە لايەن پىا ويسكى كويخا وە بلاو دەبىتىمە
دەبوايە كەس و كارى فاتى ئەۋەندە ئا راميان ھەبا يە تا بىان زاشيا يە
ئەو دەنگە راستە يَا درۆيە، خۇ بە تا يېتىكە لە لايەن دەست و پىمۇھندى
كويخا وە كە گومان لىكرا وو فىرو فىللاۋىن بلاو بۇتەوە، نەك وا بە دەست و
بردى بە شىربايى فاتى لە كۆل خۇيان بىكەنەوە، لە لايەكى دىكەوە منەلائى
دىيەكە بەوه تا وان باره كە بىرەزامەندى كچەكە چۈن ما رە دەكىرى؟!
مەگەر مەلا نازانى ھېج بىانوو يەكىنى بۇ پېرس بە ئافرەت نەكىرىن و بىي
بىرپارى ھەر دوو لا نىكاح نا يەت؟ دىيارە ئەو مەلا يە دوزمىنایەتى ئىسلامى
زۆرتە بۇوە تا مەلا يەتى و ئىماندا رىتى، يَا دەبى مەلا يەكى بى ئاگا و
رىگا بۇوبى لە ياسا و دەستتۈرۈ ئا بىين كە ئەو كاتەش ناشى بېي بە مەلا،
چونكە مەلائى بەراستى زۆر لەوە گەورەتە كارىكى نادرۆست و نازانى يىلى
لىبۇھەشىتەوە.

نا وى چىرۇكەكە لە چا و سەردەمى نۇوسىنەوە داھىنان بۇوە؟ لەوە
پىش زىاتر نا ونىشانىوا بەكارەتتۇوە كە يەكاكا و راست لەگەل بەسەرھات و

یەکەیان بەھا نەی پەلاماردا نى يەکدىان بۇ ساز دەبىٽ و مەيدان كىشىيەن
پەكالا دەكتەوە.

لەم بارهە داخ لە دلى كورى كويىخا لە خوشە ويستى قالە و فاتى،
بنا وانى كۆنى ھەيە، ھەر لە سەرەتا وە درو دەست پېيىدە كا، تا دزۇ، گەورە تر
دەبىٽ، پاشان ئاكا مى درو بەوە دېتەوە كە درېندەيەتى و نامەردى كويىخا
بچووك وەديار بکەۋى.

ما وەيەك بە سەر چۈونە دەرەوهە قالە بۇ شاخ تىيەپەرى، لەم وە
دوا چەند كەسىك دەنېرىتە داخوازى، با بى فاتەش پىا وانە دېتە دەست و
دەللى: "كۈر كورى خۇم و كچ كچى خۇم". "ھەردوو دلدار لە خوشىاندا
پاشا يان بە نۆكەرى خۆيان نەددەزانى" (٤١).

دواي ئەم نۆكەرىيىكى كويىخا بە دەلمىسە بلاوى دەكتەوە كە قالە
برىيندا رىكرا وە مەردووە، بەو ھەوالە ھەلېستە" كورى كويىخا كە خزمائىتى
لەگەل ئاغاى ئەو ھەرىيەمە دەبىٽ، پىا و ما قولانى دئ كۆدەكتەوە و لەتەك
مەلادا دەچنە مالى مام فەتاج، بە دوو سەد دىنار شىربابى و چوار دەست
جل "فاتى" لە مام فەتاج دەكىن، ھەر بەو پەلەيەش مارەي دەپىن... بەلام
ھەموو كەس لاي روون دەبىٽ "فاتى" وا بە ئاسانى بە مال و مىردىمە وە
دانانىشى، چونكە ئەدۇشەو بە ھەرپەشەو نۇوكى خەنچەرى دەبان رازىيان
كردبۇو" (٤٢).

ئەو كەين و بەينە دەكىرى و فاتى بە زۆر لەزىر دەستى مام فەتاجدا
دەردهھىنن، ھىيندەپىيىنا چى سۆراخى قالە پەيدا دەبىٽ و سى چوار سپا و
دەنېرى بۇ ئەوهە مەسىلەكەي بېرىيەننەوە، مام فەتاج لە وەرامىاندا
دەللى: فاتەم داوه بە كورى كويىخا و پەشىمان بۇونەوە نىيە. فاتە كە لە
سەر گۈزەشتەكە ئاگا دار دەبىٽ، بۇ شەھى كەل و پەلى پېيىستى خىنلىقى
دەپېيچىتەوە بەرە و ئەو دېيىھى قالەلى لىيە دەكەۋىتە رى، كورى كويىخا و
ما م فەتاج كە بەوە دەزانن شوين سېيى ھەلەگەرن" لە دوورەوە تارمايى
فاتى دەبىنن، لە سەر لەغەكەي دادەبەزى و ھەندىيەكى لى دەدا... فاتىش
بە گريانەوە لىيى دەپارىتەوە:

- توخوا وازم لىيى بىيىنە... من بۇ تۇ دەست نادەم!

- ئەي بۇ قالەمى ھەتىوي بەدەفر دەست دەدەي؟!

(٤١) كاکە مەم، ھەر ئەم سەرچا وە، ل/٠٨٩

(٤٢) كاکە مەم، ھەر ئەم سەرچا وە، ل/٠٨٦

جۆریک لە بیرو لیکدا نه وە کانیدا لە ئاستى کا درىكى پېشکە وتوو باشتىر
نه بوبى، بە قەدەر ئە و بووه. وا دەزانىن بۇ ئە و مندا لە و نەخويىنده وارە،
ئە و هەمۇ زانىن و تىيگە يىشتنە گەللىك بى، رەنگە لەبەر ئە و بوبى
دلل بە و خوش بکا و بلى: "دەبى قوتا بخانە كە ما ن بەرەھە مى واي پېگە ياندىبى؟
گوا بە ئە وەندە بەس نىيە شانا زى پېيە سكەين؟ ج بىرسكە يەك بۇ ئەم مىشكەمى
وا وشىار كردۇتە وە! بۇومەلە رزە گىانى نەتە دا يەتى كارى لە ساوا يەكى
واش كردووھا! گوا يە دەرەبەگ و خىلە كە ج هيوا يەكى بەمانە ما وە" (٤٠).
لە كۆتا يى چىرۆكە كەدا حەممى حاجى خۆي دەخاتە با وەشى دوژمنە وە.
بەلام روڭى سوارە و ئەوانە گوا يە لە قوتا بخانە پېشکە وتندا گۆشكراون و
لە خىلە ئە و كاپرا يە بۇون، دواي خۇ بەدەستە وە كە سەر خىلە ج دەكەن و
ھەلۈيىستىيا ن ج دەسى؟ چىرۆكتۇوس شتىكما ن لەو با رەوە پېئنا كە يەشى. لە
كا تىيىكدا دەزانىن چىرۆكە كە كورتەو بوارى هەمۇ باس و خواسېكى نىيە.
بەلام ئاشكرا كردىنى مەبەستىك دەسى ئاكا مەكەي بگەيەنرى.

چیروکی "کهڙاوه" به یه کهوه به ستنه وهی هیواي تایبہت و ئاواتی کومه لایه تی و نهته وهی یه . ئاره زووی تاکه کھس و دهنگی گشتی له یمه کا تدا کوڈه کاتھو .

قاله و فاته چ وهک دوو خوشويست و چ وهک دوو مروف له بهره و رووی
نهبوونی ما في نهته وهی و چوساندنه وهی چینا يهتيدا ، ئهوجا ديلی بارى
كۆمەلایه تى وهک يەك وەھا، بەرە باسی ئاغا و كويخاش ريزى پىچە وانسى
مه بەستى ئەوانىيَا ن گرتۇوه .

قاله بهره و با نگه وازی سه ربه رزی و تیکوشانی رزگاری میل متمده روا،
له هیزی پیشمه رگهی به رگری له مانه وهی پیروزی جیگای خوی ده گری، به و
کارهی قاله روودا وی درا ما شیکی چیر و که که دهست پیده کاو شهنجا مه کاره-
ساتا و یه که می به سه ر فاتحی ئینسان و فاتحی ئافره تدا ساغ ده بیته وه .

له ڙيان و راسته قينه دا زور ناوه روکي دڙوا رو پيچه وانه يه کدي هن که جه و هه رى شته کان ده ر ده خهن. ئه وانه مه رج نيه هه ميشه به ئاشکرا و روونی له بدر چا و بن. به لکوفره وا ده بي شارا و هه نهيني بن. دڙا به تسي زوردارو زوٽلکرا ويشه هه موو ده راسته و خوٽه ديار ناکه وئي. به لام کاتسي پيشنه کي بوٽ ناکوکيه که یا ن هات گوئي، ئه و حله گريکان ده کريتنه و هه ر

ههندی خالی ها و بهش . که له شوینیک توانرا بی به خواستنا مهیهک ما فی نهته وه یهک سه نرابی ! که نه بوروه !! مانای ئه وه نیه ، ئه وه ده بیتھ یاسا و ئیدی کار تهوا وه و ئیمەش چەند سەد هەزاران ئیمزا کۆوه کەین نامان به رون دەگا .

له هه مان کاتدا دروسته و مه رجیشه له پال شورشی نهته وه ییـدا خەباتی هەزاران و زۆرانبا زى ھیزو باز و دزرا ویش بکری ، یا به مانا یەکنی دیکه ۋۆرۈش دەبى شورشی رەنجدەر و زەحمدەتكىشا ن بى ، دەبى شورشی هەزارا ن و بەشخورا وان و زۆرلىكرا وان بى ، دەبى له رەگە وە ھەلکەندنی ھەموو چۈرە چەوساندنە وە یەکی مروقە وە بى و نرخى كەسى راستەقینە بە خزمەتكىردن و كەلکى بى بو جەما وەر . پەيمى شۆرۈش پەيمى گەپان نەھە وە بەھا ئى و نەھە وە مروقە كورد بى .

حەممە حاجى سەر خىلەتکى نا وچەي " بتويىن " ، سەرزارەكى خۆى وا پېشان دەدا لەتەك شورشى كورددادىه ، وە گى دى دە یە وى " لە نزىك شار بى . تا زىانى لى نەھە وى " (۳۹) .

دياره چىرۇكىنۇس بە زىرەكانە نىازى سەر كۆمارى دەربىريوه ، چونكە نزىك بۇون لە شار بۇ ئەو ، مەبەست چۈونە نىيۇ دەولەتە ، بۇونە جاشە ! لە و چىرۇكەدا بە ئازايانە و بە ئاشكرا توانرا وە جىگا ئىچىنى دەرە بەگ دەست نىشا ن بکری و بخىتى بەرە دوڑمنەوە ، لە واقىعىشدا دەرە بەگ چ راستە و خۆج بە پىچ و پەنا خيانەتىان لە شۆرۈش كرد . لە سا لانى " ٦٢ " بەدوا وە شورش توانى دەسەلاتى دەرە بەگ و ئاغا تا ئەمتدارە یەكى زۆر نەھىللى . بەلام لەنا و خۆيىدا بەچە ئاغا ئەگەر لە كەپىن بۇويتايە گران نەبۇون . يەكىك لە كەم و كەسىر بزووتنەوە و شورشىك ئە وە یە كۆمەللىك بە نىيۇ زۆردا رىيە وە لەنلىي بەرى . كەچى كۆمەللىك كەلەگا ئى دىكە دروست بىكا ، جا كە كار وا بىروا چىنېك لە زۆردا رىدا جىگا ئىچىنى ك بگرىتى وە ، يىدا دەستە و تاقمىك لە تىيەلدىان و تۆقانىندا بچىتە جىگا و رىگا ئى دەستە و تاقمىك دىكە كەواتە ئە و ھەموو قوربا ئىيە بو ؟ ئە وە ھە مۇو سەرما و گەرمە چىزىتنە لە پا ئى ؟ ئە و گشت دەربىدەری و زىان لىكە وتنە بو چا وى كى ؟

چىرۇكىنۇس لە دىارى كردىنى رۆلى سوارە كە بە مندال و سەخويىنە وار پېشانى دەدا ، لە دەمەتەقىدا زۆر بە روونا كېپىر و چالاک دەرى دەخا ، بە

لە بەندى سىيى دەستورى كاتى كە دانى بە ها و بەشىتى كورد لە خاكى عىراقتدا نابوو، وەدىيار كەدۇت، لە پال ئەوهشدا ھەندىك ھىزى سياسى لەو كاتەدا را زى بۇون كە دام و دەزگاي تا يېت بە كورد دروست بى.

به هه رحال، ثورشی نيشتمانی و ديموكراسي گهلى عيراق بسووه تاک رهوي و ديكتاتوريهتي تاکه کهسي، کاري خوي له تهک هه مووا ندا كرده، ئوجا بهره و ليداني كوردد با يدا يهوه و زورى بو هيينا.

ئىرە جىي نۇوسينى مىزۇوى ئە و قۇناغە نىيە ، بەلام ئە وەندە بەسى
بۇ سەلما ندىنى شۇرىشى ئە يلىوول كە زۆرۇ دوزۇمنا يەتى كردىنى گيانى نەتە-
وهىي كورد بلىيسيە بەرز كرده وە . بۆيە ئىيمە با وەرمان وايە لە بارو
دۆخى وادا كە نەتە وە كە خۆي لە مەترسیدا بى و هەولى نەمانى بىزى ،
ھەركىز ناكرى و لە عەقل دوورە چىنىيکى دىيارى كرا و بتوانى خەباتى خۆي
بەرهە پىشە وە بەرى و لە ململاشىدا تەنها بۇ چىنە كەدى سەركەۋى . كە
كورد خۆي نەبى كوا كرىكاكى دەبى ؟ كە كورد خۆي نەبى كوا جووتىرى
دەبى ؟ كە كورد خۆي نەبى كوا چى دەبى ... نيازم لە وە دانمۇھىيە كى
پىرى ئە و سەردەمەي "كاڭە مەم" كە لە دايەلۆگىكى "راستى رووت" دا لە
زمان چىرۇكىنوسە وە پالەوانە كانى دەلىن :

"- کهوا بیو، له دوو شورش دان ا"

- به لکو له سی شورش داین... کومه لایه تی، چینا یه تی، نه ته وا یه تی.

- باشه نه تان ده توانی ههندیکی دوا بخنه، تاکو لسه وانی دیکمه

دہ بندھوں؟

- با .. به لام شورشی نه ته وا يه تی، به زور به سه رماندا سه پینرا !!
 چونکه مه رج نیه مه سله دی نه ته وا يه تی به چه ک چاره سه ری بکری " (۳۸) .
 و اتا مه به ست بووه خد با تی چینا يه تی بکری، به لام تیکوشانی نه ته -
 وهی و ئازار دانی گشتی خه لکی کورد بوته سه ریا را

وا ده زانین بیزکردنەوەی مرۆقی کورد ده بى لە چوارچیوهی کتیب و سەپاندنی بەزۆر تیپەری، ناپەوا بیلهکی سەیرە، تاقیکردنەوەی هەمەر شوینیک و کاتیک، بى رەچا وکردنی هەل و مەرجی کوردستان کت و مەت بھینری بەسەر کوردو ولاتەکەماندا بەپێنری.. مەسەلەی کورد جوداواز بیلهکی تا بیهتی لە مەسەلەی ئەمریکای لاتین، ئەفریقا و میللەتاوی ئاسیا ھەیە، لە مەسەلەی گەلی فەلهستین، ئیریتریا و باسکیش جودا یە، لەگەل بۇونسی

(۳۸) کاکه مهم، هه روئه و سه رچاوه، ل/۷۷.

لەم چیروکەدا ھەندى ھێلی سەرەکى خوینپیزى و بى ويژدانى سەرمایەدارى تىیدا يە، يەكىكىان ئەوهەيە، كاتىك سيروان بە هوى تل بۇونەوهى گاشەبەرب دېكە وە دەمرى، كريكارانى ھا وەلى لەسەر لاشەى سارده وە بۆي گرددەبنەوه " كا براي بىگانە دى، تەماشا دەكا ھەموو لەسەر جوانە مەرگكۈپۈنەتموھ، بى ئەوهى هېچ دلى بى بسووتى سەر با دەدا، خەرىك دەبى داوا بىجا بىنەوه سەر ئىش بەلام كە دەبىنى ئەو ھەموو چاوه ئاگریان لى دەبا رى، ھەموو ش روويان كردۇتە ئەو، يەكسەر وەك مشك ملى خۆي شۆر دەكا و بەجىيان دەھێلی" (٣٢).

يەكىكى دىكە لە رەوشتى سەرمایەدار ئەوهەيە كە كريكارىك لە ئەنجا مى تەقىيەتە وهى بۇمبا يەك، تەلىسمە بەردىكى بەر دەكەوى، يَا بە قەزا و قەدەر نویلەكەي قاچىكى زامدار دەكا ... ئەو كاتە چەند رۆزىكى مۆلەت دەدەنئى و سووکە چارە سەرىيکى دەكەن. لە ئاكاما كە زانيان وزەي جارانى نەماوه، دەست بە روويەوه دەنئىن و نايختەوه سەر كارەكەمى، وەك لەم چیروکەدا لە "لالو" دەقهومى، نەختىنەوه سەر كارى لالو وەك بۇ ئەوه دەگەرپىتەوه، هوپىكى دىكەشى ھەبووه، كە چالاکى و هوشىارى بۇوه لە رووي چىنا يەتى و كۆكىرنەوه و ئاراستە كردىسى برا دەرانى، دىارە مەتسى ترىن دىار دەيدك بۇ ھەموو زۆردا رو چەوسىنەرپك وریا بۇونەوه و دروستكىردىشى رىكخىستنە.

لە چیروكى "راستى رووت"دا جەوهەرەكە دوو لايەنە، خمباتى نەتە وەسى و تىكوشانى چىنا يەتى.

شۇرشى "شەيلوول" بەر لە ھەموو شتىك شۆرپىكى نەتە وەسى بۇو، دوو سالىك بە سەر شۇرشى چوا رەدىتە مەمۇوزدا تىينەپەپى بۇو، زۆرانبا زى لە نىوان سەرمانى دەولەت و ھېزە سياسييە عىراقىيەكان و كوردىستا نىيەكە پەيدا بۇو بۇو، بە جۆپىكى ليتەتھەر لايە ورده ورده دەولەت زۆرى بۇ دەھىنان ولە ئاشكرا كا ركىدىنى سەرپەستى بىزى دەبۇون. لايەنە كوردىستا - سىيەكە ھەلگرى بىرۇ با وەرى نەتە وەسى پىشكە و تىخواز بۇو، مەبەستى بۇو كورد لە تەك عمرە بدا يەكسان بى و ھەمل و مەرجى پىشكە و تىنە نەتە وەسى، ئابۇورى، كۆمەللايەتى و كەلچەرى بۇ دا بىن سکرى، كەسا يەتى و سەرپەخۆپى مىللەتى كورد بىپارىزى، بەلام رۆز بە رۆز تارما يى رەشى پاشەمىز بۇونەوه

که ئەم پرۆژە يە خويىنى چەندان كريکا رو جوتيا رى كوردى تىا رئاوه تا
ئەم دۆخى وەرگرتۇوە، ئىجبارىشى دەكات و پىيى دەللى "كە چۈپىتە و شار
باڭ را بەھىلە و بلى، هەر ھىزۇ بىريا رو رىكھستە ئامانج وە دەست دىشىـ .
ھىچ ھىزىك نىيە بەرانبەر يەك بۇون خۆرى راگرى" (٣٦).

ئەو چىرۆكە گىرما نەوەي با دىگارى كاركىرىدى دەستە يەك كريکارى
كوردە لە لايەن كريکارىكى كارامەي ئەو پرۆژە يەوە. لە ويىدا ھەندىيەنەمای
سەرەكى ململانىسى خەباتى چىنى كريکاران لە رووى بورۋازى و مۇنۇپۇلدا
دىا رى دەكرىـ.

كۆمپانيا يەكى بىگانە كونا وە رەكىدى كېيى دەربەنیخانى لە ئەستۆ
گرتۇوە، كەزەسەي سەرەكى ئەنجامدانى ئەو كاره ھىزۇ بازۇوی بەتوا نىستى
مروققى كريکارى كوردە. ئەمەم گىرىي چىرۆكە كەوەم دوو لايەن زۆرانباـ
زىھەكىيە لە نىيوان جووته جەمسەرى ھىزى پېچەوانەدا. كە مەبەست و نياز،
ئاوات و خۆزگە، جۆرى ئىشىكىرىن، سەرچا وەي دارا يى، كەرەسەي پېيىستىسان
لىك دوورن.

سەرمائيدار دەست ما يەكەي لە قۆل و باھوي كارگەرانەوە سەرچا وە
ھەلددەگرىـ. ئەمن پىيم وايە گشت پارەدا رىكى ناپەوا، نەخۇشى دەرەنەنلىقى
نا دروستى لە پەرەودەي گۆشكەرنىدا ھەمە. پېيىستى ئەو، تىرپۇونى بۇـ
نېيە. بە تىرى قايل نابىـ. ئەمە وايە كردووە سەرمائيدار ھەر لە شالاودا
بىـ. ھەر ناھق بىـ كەنەنەوەي جەسيك بىـ، بۇـ كەلكىـ
خۆى، پەميرە و بىـ، ئاكا سى ۋىزىان لەو بەرەوە با زىيەتىر بىـ، بىـ باكتەـ.
مروققى تىيەكەيىشتوو لە ۋىزىان، تەنها بۇـ خۆى و بۇـ ئەورۇـ كار ناكاـ،
بۇـ خەلکىش و بۇـ بەيانىشـ. بۇـ وەچەي دابىـ و بۇـ ئايىندەشـ. كريکارىـ
ژيرىش بەو شىۋەيەـ. لە كاتىكدا كارگەران دەيىانلىقى و زۇو رەزىمىـ لە
قازانچى خۆيان لە عىراق و كوردىستاندا دروست نابىـ، بەلام ھەر ھەولقىـ
كاركىرىدى دلسۇزانەيـان بۇـ تەواو كردىنى تونىيەكە دەداـ. رىكھستەن و ھوشيار
كەردىنەوە وايـان كردىبوو ئەو خەلکە سادە و ساكاـرەي دەستى شارەزۇورو گۈـ
چۈـمىـ سىرواـن و تانجەرۇـ بگەيەننەـ با وەپىـ مروقـ دەتـوانـنى كېـ كوشـاـ وـدـەـرـ
بـكـاـوـكـاـ رـىـ مـەـزـنـتـرـىـشـىـ لـەـ دـەـسـتـ دـىـ. ئـەـوـهـىـ باـ وـهـرـىـ بـەـ تـوانـتـىـ مـروـقـقـىـشـنـبـوـ
ھـەـرـ لـەـ سـەـرـەـتـاـ وـ چـۆـكـىـ ئـكـاـ وـ پـىـكـىـكـىـ نـەـوـهـشـانـدـ.

(٣٦) حسین حارف، چىرۆكى ھونەری كوردى، چاپخانەي دارالحرىمة،
بەغدا، ١٩٧٧، ل/١٥٠.

ران بیزان، ئەویش بەرگەرتىنى ئازارو لىدان و گشت جۆرە ناخوشىيە كە لهو رىگەدا، ئەم سەرو ئەو سەرى كاروانى ھەول، بهدى بكرى. پىش ئەوهى دەست بدهىنى بىرى ژيرانەي لىبکرىيەتە، با وەريان وا بى "ئەمەنە توانى با رىك ھەلگرى و تا سەر بىبا، شانا زىترە ھەر لە سەرهەتا وە پىشتى بىو دانەنە ويىتى" (٣٤). وەك پەروين و نەسرىن لە "شارى خاموش"دا لە گەمل ئەمەن راستگۇن و بە تاقىكىرىدەن و دەيسەلمىيەن، كاتى ئازار جىگاي ساغ بە لهشيانەن و ناھىلى، ئەوان چاكتىر خۇ دەگرن و ورتەيدىك كە خزمەتى دوزىمن بكا لە دەميان دەرناچى، تا زياتر لىيان دەدرى و ئازار دەدرىيەن، با وەريان بە سەركەوتىن زۆرتر دەبى" (٣٥).

ئەوانەنەی ھۆشیاریيەکى پەتريان ھەيە و خۇپىان و اپىشا ن دەدەن ئاما-
دەيى را بەرەيەتى و پېشەوسيان لىيەدە وەشىيەتەوە . خەلک كۆدەكەنەوە راستى
مەسىلدەكە يان تىيەدەگەيەنن، دەبىي گشت قوربا نىيەكى گيانى و مادىسيان لە
دەست بىي، وەك ما مۆستا لە چىرۆكى "خۆر وە دەست دىيىن" و نەسرىن لە
"شارى خا مۆش"دا لە رىزى پېشەوەي تىكۈشاندان و ھەردووكىان شەھيد
دەبن و جووتىيک با وەشە تىشك دەختە سەر خەرمانى درەوشاندەنەوە . دىيا رە
بە و جۆرە كەمانە تىن و گۈرىپەتىر بە جەما وەران دەدروي و خۆر ھەللاتىن
نزيكتىر دەبىيەتەوە .

سی چیروکی دوایی کومه له چیروکی "بومده رزه ..." له بآس و خواستا جودا وا زیبه کیان لمگه ل سی چیروکی به ره وه یاندا ههیه، ئەمان : یەکه میان خداباتی چینا یەتییه، دووا نهکەی دیکەیا ن خهبا تی چینا یەتیین له نیو شورشی نەتمووه بیدا، به لای ئىیمەوە ئازار نەھیشتەن و بن کۆلکردنی چەوساندنه وە هەر تا ویکیان ھەبى، پیویستە پاکیان پیکەوە نەھیلتىن. "تونىلى دەربەندەکە بریتییە له پیشا ندانى دىمەنی چەوساوه يەکى رەنجدەرى كورد كە به هوئى رەنجى ئەوو هەزاران چەوساوهى دى پېرۋۇزە بەنا وبا نىگەكەى دەربەندىخان پىكەتات، كەچى ھەندى كەساشى نىھەزان و روشنېپىرى بورۇزا زىيى بەرچا وتا رىك ھەرچمندە دان به گرنگى كارەكتەدا دەنپىن وله ئاستىيا سەرسامن ، بەلام به بەرى زەنجى بىڭاشەي دەزانىن و چا ويان به كردا رى خۇمالى ھەلنى يە، جو سىيا رەكەش بە وردى له سەرتەتاي كارەوهەممۇ راستىيەك بۇ خۇپىنده وارەتكە شە دەكەتەوهە بىۋى دەرەخات

(۳۴) کاکه مهم، هر یه و سه رجا وه، ل/۰۳۶

۳۵) صهبا حی غالب، هم رئه و شهر چاوه، ل/۱۰۹

فره لایه‌نی که لک وه رگرن و په روهرده کردنی تیدا يه که ده بی پیشمه رگنهی کورد، گشت کوردیکی دانه براو له ميلله‌تی هستی پیبکه ن.

ئه وه ما ن بو ده رده که وئی که بو وه ده ست هینانی مافی کورد، ده بی گیانی خو به کورد زانین و ئه و هسته که ميلله‌تیکی خاوهن که سا یه تیبه، له زمان، ئا یین، میزونو، ئا بوروی، خاک، هه یه‌تی، بی دیاری کردنی نه خشنه‌ی سهربه خویی، بی باوه رو ئا مانج، هرگیز ناکری به ساده‌یی و ساکاری را په رین دروست بی. له تهک ئه وهدا بعوونی ریکخستن و دروست بعوونی گیانی برا یه‌تی و ها وکاری له سه رانسنه‌ری ناوجه‌که دا مه‌رجیکی دیکه‌ی خهباتی نه ته وه‌یی و تیکوشانه. ئه مهش پیتی ده لین ژیان؟! هدر ده بی کورد ژیرده - سته بی؟! بو ده بی جله‌ی ژیان و مافی به ده ست خلکه‌وه بی؟! هدر کاتی ویستی بیداتی و که لیتی زویر بعو لیتی وه ریگریت‌هه‌وا! (۳۰). خلک بمه و هسته واي لیدیت. هه موو "ئا ماده بن بو ئه وه‌ی خور له ودیو که لیش بی، به زور جله‌ی بکه ن و رایکیشن بو ریونکردن‌هه‌وهی دنیای تاریکیان" (۳۱).

دیاری کردنی رولی هر تیکوشه‌ریک، چاکتر کامل بعون ده‌گه‌یه‌نی، ده بی ئه وه بزا نری شورش پیویستی به زور لایه‌نی پرووسیس هه‌یه، دروست نیه قورسا یی گرنگی دان بخیریت سه ر لایه‌ک و ئهوانی دیکه فهرا موش بکرین.

بؤیه " له شه‌ردا مه‌رج نیه هه موو که س‌چه‌کدار بی، هدر که سه کاریکی تابه‌تی خوی هه‌یه، شانا زیش بو ئه وانه‌یه له شالاو خوگرتنداده ست‌هه و ئژنون دانانیشن" (۳۲).

ده میک که هیرش ده کریت سه دییه‌ک، ئاشکرا یه ئه و دییه فره په بیوه‌ندی گیانی و ریگه و بان و ستراتیزی و جوغرافیا و ئا بوروی به ده ورو بدراه‌که‌یه‌وه هه‌یه. زانینی ئه وه وا ده‌کا، کاتی ته‌نگانه پیکه‌وه کوبن‌هه وه ک له و چیروکانه دا ئه وه ره‌چا و ده‌کری.

شه‌وی هیرپه‌که به رگریکه رانی دییه‌که "هه موویان گه یشتنه لای چه‌کدا - ره‌کانی دیکه‌یه ئه و هه‌ریمه که بو به رهست کردنی شالاو کوبوبوونمه" (۳۳).

له ره‌وی خهباتدا راستییه‌کی دیکه هه‌یه، پیویسته تیکرا تیکوشه -

(۳۰) کاکه مه‌م، هدر ئه و سه‌رچاوه، ل. ۲۸۶

(۳۱) کاکه مه‌م، هدر ئه و سه‌رچاوه، ل. ۱۱

(۳۲) کاکه مه‌م، هدر ئه و سه‌رچاوه و لانه‌ره

(۳۳) کاکه مه‌م، هدر ئه و سه‌رچاوه، ل. ۱۴۶

ده‌که‌وته سه‌ر ریوی بریندارو له‌شی هه‌نجنا و م" (۲۷).

له خولیکی دیکه‌ی پرسیار لیکردندا که په‌روین خو به ده‌سته‌وه نادا ته‌وه هه‌ر ده‌لئی ئاگام له هیچ شتیک نیه، دروشمه شو‌فینیه‌که‌ی کاربـ ده‌ستان دیتـه‌وه پیشـی و پیـیده لـیـتهـوه: " - ئـهـمـ قـسـانـهـ هـهـمـوـوـیـ بـاـ بـیـ یـهـکـ پـوـولـیـ قـهـلـبـهـ،ـ ماـ دـاـ مـ کـورـدـیـتـ بـیـ تـاـ وـانـ نـیـتـ" (۲۸).

به دلـنـیـاـیـهـوهـ،ـ هـهـرجـیـ بـاـ وـهـرـیـ شـوـفـینـیـ هـهـبـیـ،ـ نـهـخـوـشـیـ سـاـ دـیـزـمـیـشـیـ هـهـیـ،ـ لـهـمـ چـیرـوـکـهـ دـاـ ئـهـ وـ رـاستـیـهـ مـاـنـ بـهـ چـاـکـیـ پـیـشـانـ دـهـدـرـیـ.ـ بـسـاـ وـهـرـیـ شـوـقـینـیـ وـ نـهـخـوـشـیـ سـاـ دـادـیـ وـ اـ دـهـکـهـنـ،ـ ئـاـ هـهـنـگـ بـهـ بـهـنـدـ بـگـیـرـنـ.ـ ئـاـ فـرـهـتـبـکـرـیـتـهـ مـهـزـهـیـ خـواـرـدـنـهـوهـ.ـ بـهـ زـهـبـوـونـ دـلـشـادـ بـنـ.ـ ئـاـ رـاهـزـوـوـیـ دـرـنـدـاـنـهـیـاـنـ بـشـکـیـنـ.ـ بـهـ هـاـ وـارـوـنـالـهـ،ـ لـهـ قـاـقاـ دـهـنـ.ـ بـهـ گـرـیـانـ وـ ژـانـ،ـ زـهـرـدـهـخـدـهـیـاـنـ بـیـتـ،ـ بـهـ کـوـشـتـنـ،ـ خـتوـوـکـهـیـاـنـ بـیـتـ.

"ئـهـ وـ چـیرـوـکـهـ تـهـنـهاـ کـارـیـکـیـ بـهـرـ پـهـرـجـ نـیـهـ بـهـرـاـ مـبـهـرـ چـهـنـدـ کـهـسـیـکـ،ـ یـاـ خـدـیـاـلـ وـ هـهـلـچـوـوـنـیـکـیـ دـهـرـوـوـنـیـ لـهـ پـیـ نـیـهـ،ـ بـهـلـکـوـ چـیرـوـکـنـوـوـسـ زـوـرـ بـهـ ئـاـگـاـوـهـ پـیـوـیـسـتـیـ قـوـنـاـغـ وـ نـاخـیـ نـاـوـهـوـهـ ئـهـوـهـیـاـنـ پـیـنـوـوـسـیـوـهـ،ـ سـوـانـیـوـیـتـیـ ژـیـانـیـ نـهـتـهـوـهـیـ وـ خـدـبـاـتـ بـوـ سـهـرـبـهـسـتـیـ بـهـ پـیـشـکـهـ وـتـنـیـ بـزـوـوـتـنـهـوـهـ کـورـدـاـ بـهـتـیـهـوـ بـبـهـسـتـیـتـهـوهـ،ـ ئـهـدـهـ بـیـشـ بـهـ سـهـرـکـهـ وـتـوـوـاـنـهـ بـهـ هـهـمـوـوـیـهـوـ گـرـیـ؟ـ بـداـ،ـ بـهـرـهـمـکـهـ بـوـتـهـ چـهـکـیـکـ وـ لـهـ رـیـزـیـ پـیـشـهـوـهـ پـیـیـهـوـهـ دـهـجـهـنـگـیـ،ـ جـهـنـگـانـیـکـیـ وـ کـهـ گـوـرـانـگـاـرـیـهـکـاـنـیـ کـوـمـهـلـ وـ ژـیـانـیـ کـوـمـهـلـایـهـتـیـ وـ سـیـاسـیـ بـهـرـهـ وـ پـیـشـ بـهـرـیـ" (۲۹).

له "شارـیـ خـاـمـوـشـ"ـداـ یـهـکـیـتـیـیـهـکـیـ کـرـدـارـوـ باـ وـهـرـ هـهـیـ،ـ بـهـ درـیـژـاـیـ چـیرـوـکـهـکـهـ پـیـکـهـوـهـ بـهـنـدنـ،ـ بـهـ گـشـتـیـ وـ بـهـ پـیـیـ درـاـمـایـ هـهـلـچـوـوـنـ تـاـ وـیـکـیـ دـلـ تـهـزـیـنـ بـهـجـیـ دـیـلـیـ،ـ باـسـ وـ روـودـاـوـهـکـهـ ماـوـهـیـهـکـیـ زـوـرـ دـهـخـاـیـهـنـ،ـ بـهـلـامـ لـهـ شـیـوـهـیـ نـاـمـیـهـکـداـ دـهـتـوـانـیـ بـهـ چـرـیـ پـیـشـکـهـشـیـ بـکـاـ،ـ ئـهـگـهـرـ چـیـ ئـهـوـهـ هـهـلـدـهـ گـرـیـ بـکـرـیـتـهـ کـهـرـهـسـهـیـ نـوـفـلـیـکـ،ـ خـوـشـیـ سـرـوـشـ وـ ژـیـانـ هـهـمـوـوـیـ بـهـ سـهـرـبـهـسـتـیـ وـ کـاـمـرـانـیـ مـرـوـقـهـوـهـ دـهـبـهـسـتـیـهـوهـ،ـ هـیـوـاـ وـ ئـاـواتـ بـهـبـهـرـداـ دـهـکـاـ وـ بـوـ زـیـدـهـ تـرـ کـوـلـنـهـدانـ وـ نـهـبـهـرـدـیـ بـاـنـگـ بـهـرـزـ دـهـکـاـتـهـوهـ.

له سـیـ چـیرـوـکـیـ یـهـکـهـمـیـ بـوـوـمـلـهـرـزـهـداـ باـ وـهـرـ بـوـوـنـ وـ خـوـ بـهـسـتـهـوـهـیـ بـهـ نـهـتـهـوـهـیـ کـورـدـهـوـهـ.ـ پـیـوـیـسـتـیـ خـدـبـاـتـکـرـدـنـ لـهـ پـیـشـاـوـیدـاـ دـهـچـهـسـپـیـنـیـ،ـ

(۲۷) کـاـکـهـ مـهـمـ،ـ هـهـرـ ئـهـ وـ سـهـرـجـاـوـهـ،ـ لـ/۴۱ـ

(۲۸) کـاـکـهـ مـهـمـ،ـ هـهـرـ ئـهـ وـ سـهـرـجـاـوـهـ،ـ لـ/۴۶ـ

(۲۹) صـهـبـاـحـیـ غـالـبـ،ـ هـهـرـ ئـهـ وـ سـهـرـجـاـوـهـ،ـ لـ/۱۶۱ـ

چیروکه‌کهدا نووسراوه، چون به ته‌تی ما یه‌وه و نه‌چووه مالی ما می‌وه ک
با بی رای سپارد بیو یا دراوی و دهسته خوشکیکی؟ اچونکی ده‌بوایه بیزانیایه
بانگ کردن بُو سراله شه‌وی زیا تری پی ده‌چی" (۲۵).

لهو سالانه شورشی ئەیلول له جوانیدا بیو، هه رهشهی تۆلّمەی
پیروزی له دا گیرکەر ده‌کرد، هیندەی رووناکی و ئا واتى به رۆزگاری کورد
ده‌به‌خشى، پتىر هسترياي له مىشكى فەرمانە واياندا دروست‌کردىبوو. بۇيە
له بەر بەستكىرىنى شەپسۈلى تىكۆشا ندا، زانيا رىيان له شەيتان و كاول
كەرانى مىزۇو وەرگرتبوو.

دوژمن له دوو قۆلەوه هەولى خۆی بُو تروسكا بى لىېرىپىنى رۆزى کورد
تەرخان کردىبوو، قەلاچۆکەرنى مرۆف و خاپورکەرنى وولات . بُو مرۆقەکە
حسىبى تەمدەنی بیوون و دوا ھەنا سەو بى جوداوازى ژن و پیا وى کردىبوو،
بیوون، يانى لهو کاتەوه "پز" "چىنин" له پىزدانى ئافرهەتدا يە، لىمو
بۇچۇونەوه، سكى ئافرهەت‌ھەلدەدرا، تا به تىرىيەك دوو نىشانە بشكىن،
دوو گیان بىمرىيەن.

چیروکى "شارى خا مۆش" نمۇونەيەكى بى ئەزمارى تاوانە به را مىھر
ما فى ژيان، رىشمەتە وەبى، خۆشە ويسىتى و تەمن، تاوانە كا نىشتنەك
ئا سا بى ھېلى خۆيان بىگىن، بەلكو، خودى تاوانە كە چەندە قورس بىسووه،
ئەنجا مدانە كەمى لە تاوانى تىپەپاند بیو. ئەوان كە ويستوويان
ئافرهەتىكى كورد لە ھەناسە بخەن. نەھاتۇون ھەر بى خنكىن، يا رىزە
فيشەكىكى پىيە بىنىن !!

پەروپىنى قارەمان دا واي لى دەكىرى وەرا مى ئە و پرسىيارانە بىداتەوه ،
" - ج پەيۋەندىيەت بە ئافرهەتەنى كوردىستانەوه ھەيە ؟ چەند كەسن ؟ لە كوى
كۆبۈونەوه ؟ بىپىارەكانى دواجا راتان چى بىوو؟" (۲۶).

كا برای سىخۇر "كە دىتى لە پارانەوه و گەريان و ھاوار بىھە و لادە
ھىچى دىكەي دەست نەكەوت ، لە پەنچەرە بەستىمۇھەھەتا لە ھۆش خۇمۇم
چۈوم بە تىپلا داركارييان كردم، كراسەكەيان لە بىرما پارچەپارچە كىرىد..
كە بە ھۆش خۇمەتەمەوه، فەرىييان دابۇممەوه ژۇورەكەي خۇمان و خوشكە
دلشقا وە كان بەسەر سەرمەوه كۆمەلىان كردىبوو. دلۇپ دلۇپ فەرمىسىكىيان

(۲۵) صەبا حى غالپ، ئافرهەت لە چیروکى كوردىدا، چاپخانەمى دار
الحرية، بەغدا، ۱۹۷۹، ل/۳۱۵.

(۲۶) كاكە مەم، ھەر ئە سەرچاوه، ل/۴۰.

شەو درىنده يەدا نايى" (٢٢).

لە كوردىستاندا ، تىيۆه رۆكى ئەو چىرۆكە بە چەندان شىوهى جودا جودا دووباره بۇتەوە ، لەو رژىيما نەدا كە بەسەر وولاتى ئىمەدا سەپا بۇون يَا سەپا وون ، هەر چەرمەسەرى دەسەللاتى نا وەندىمما نە تووشەوە نەبووە ، بەلكو بە ژمارەي پيا وە پەنگا ورەنگەكانى دەولەت فەرما نېھوا يەتى خۆيەتىيان هەبووە . بە ئارەزوويا ن چىيىان ويستبىٰ ، ئەنجامىان داوه . چىرۆكىنوس لەم رووهە بە ھۆشىارىيەوە لە زمانى نا وەوهى ما م ھۆمەرەوە ئەوهەمان پىى دەلىٰ كە ئەوان بە بىانوو بىسيا نوو كەلەگا بى خۆيان دەنويىن... دلى مام ھۆمەر وە دەخويىنرىيەوە "ھەرچەند سەرى دەھىتا و دەبرىد نەي دەزانسى قۇمىسىرە فەندى بۇ بانگى دەكا . نە شەرى بۇوە ، نە دەمەقالى ، لە دىيىش ھىچ رووی نەدا وە تا بۇ شايىدە بانگى بىكەن . خۇ شەريش وەستا وە كە بىيانوو دىكەي بىنگەن و لە زيندا ن توندى بىكەن" (٢٣) .

تەواو يەكىتى بىرۇبا وەر لە بەينى باب و كچدا ھەمە . ئاشكرا يە زانى ھەردووكىيان ، يەك ژانە ، نەبۇونى سەربەستى و ھەست بە خۆشى ژيان نەكىرنە ، سوئى پىشىل بۇونى ما مافى مەرقانە سروشتىيە ، رووت كردنە وەھى ھەستى بە كورد بۇونيانە . بۆيە ليكدا نەوهى "ئا مە" ليكدا نەوهى دووه مى با وکىتى . ھەر وەك بىرەكەي ما م ھۆمەر ھى كچە كەيىشىتى . "ئەمەش پىتى دەلىن ژيان ، ھەر دەبى كورد ژىرەستە بىت ؟! بۇ دەبى جلەوى ژيان و مافى بې دەست خەلکە وە بىت . ھەر كاتى ويستى بىداشى و كە ليتى زووير بۇو لەي وەربىگىتى وە با ! شەو رۆزە دىت كە با وكم و با وکى خەلکى لە زيندا نەمەستن ، لە بەر ئەوهى كوردن" (٢٤) ئەوھە چەند دىرپىكى كتىپى دلى ئامەيە كە بەقەدەر چەندان كتىپگە ورەيە .

ئامەو ما م ھۆمەر ، يانى ژن و پيا وي كورد ، ويئەي ھەر دووكىيان بى ژمارەن ، جا با شوئىن و كات و چۆنپىتى تا وان كردن بەرا مېرىيان شىوه شىپە بى .

"ئەوهى دە مېنىتە وە ئەوهەيە كە ئامەيەكى ژىرۇ خۆشىار بە چەواساند - نەوهى نەتهۋا يەتى و ئاگادار لە بارو زرۇوفى سەردە مى خۆي وەك لە

(٢٢) حسين عارف ، الواقعية الانتقادية في القصة الكردية ، مجلة القلم ،

العدد الثاني ، السنة الرابعة عشرة ، تشرين الثاني ، ١٩٧٨ ، ص/١٢٦ :

(٢٣) كاكە مەم ، ھەر ئەو سەرجا وە ، ل / ٢٤-٢٥ .

(٢٤) كاكە مەم ، ھەر ئەو سەرجا وە ، ل / ٢٨ .

پیا ویکی پشت کوما و لهژیر با ری ته مدن و ئازارو ژانی کوره شه هیدنکمیدا، با وه رنگری هیند چالاک بی بتوانی به دلی خوی له جهنگی بدرگری له خاکو میللەت‌ها و بەشی بکات، ئەو جوئر پیرانه دەبی کاشکا به هەرتتى لاویستى و تەمنى را بوردۇویان بخوازن.

له نیوان دوو ھېرىشەكدا بۆ سر ئەو دیيە، چەند مانگى كەوتۆتە بەينەوه، لهو ما وەيدا "ما مۆستا" دەمراست و کارھەلسوورینەرى دىبووه، برازای لالو حەمدەدیش بووه و ئاشیشى ئامۇزاشى ھەر لە مندالىيە و مسارە بىرى بووه، گوايا ھيچيان به خۆيان نەزانىيە كە مام و برازان. ئەوه به ئاسانى ناچىتە عەقلەوه، خۇتا يېتە ما مۆستا زانىيويتى با وکى رۆلەی ئەو دیيەيە. مەرجە بزاڭى كارگى بەهاران نەبوون بە ھەورەگرمە ھەلتۆقى بن. دەبى كەسيكىيان ھەمبوو بى... با با وکىشى و لالو حەممى دەمىلىك زىز بوبىن، بەلام خەباتكەریکى وەك ئەو كە لە نەته وە و نىشتمان زۆرى زانىيە، چۈن دەگۈنجى بۆ كەس و كارى نەگەرى، كە بەشىكە لە بەدوادا گەرانىي رەسەنىستى و بناوان. ھەر ئەوهش واي كردووه گريي چىرۇكە كە زۆر لە ناكا و بکرىتە وە و تەقىنە وە يەكى بەته ما نەبوو بېتە پېش.

له چىرۇكى "نه گول ... نە ھا ورى ... نە فرمىسک"دا، وېنەي ئازارى نەته وە بى سېكەل بە چەوسا نىنەوه و دەست درىيى كردە سر ئافرەتنما بۆ دەكىشى. كە لم چىرۇكەدا، مەسىلە ئافرەت تەواو بە مەسىلە نەته وە يە كە و گرى درا و ... دەسەلاتى ئەفسانەي پۆلىسيك بەسەر جوتىرىي وولاتدا كە هیندەي پادشا يەكى بى مروھت لە وولاتىكدا و ئەو لە ناوجە كەيدا كېرىھووه بۇمان باس دەكا.

ما م هوْمەرى كۆنه سالى لوازو رەنگ زەردو بىھىز، دواى نويىزى شىوان بۇ كۆلىتە كەيان دەگەرېتە و كە دوو بە دوو لەگەل ئامە كېيدا، سەريان تىدا سېكە و نابوو. چەند پۆلىسيك بە پېلەقە دەكەونە بەرگاکەيان و بى هىچ بىا نوویەك جەنە لەوەي "ما دام كوردى بى تاوان نىت!"⁽²¹⁾ بۇ پۆلىسخانە بەكىش دەكەن.

پاشان پۆلىسە سەردەستە كەيان كە ئارەزووی چلىسى لە ئامە كېلى، ما م هوْمەرە، بە شىوى جاجم بۇ ما م هوْمەر بىردى وە، دەگەرېتە وە لاي ئامە پۆلىسە دەكە وىتە گيانى و "بەو تەنها بىيە هىچ دەسەلاتىكى لە بەرامبەر

(21) كاکە مەم، ھەر ئەو سەرچا وە، ل/٢٧٠.

له کاتی ئا وادا ، جوا میری و ترسنونگی، دلسوژی و بی وەفا یی، دیار دەدەن، پیویست بە وە ناکات کەس دوودل بى، بىریا رى ژیرانەو لەجىئى خۆى دەوی، (لاله حەممە) ئاسا یی، سادەو ساکار " قسە ھەزارە دووانى بەكارە ئەمە شەرزۇ ئەمە گەز! كى ئازا دلسوژو پيا وە بىشە پېشە وە ". (۱۶).

بەشىك له كۈچەلى ئا وایي، بە ھا وکاري كا ملان و دنيا دىدەكان، خۇيان ئا ما دە دەكەن، جىڭا له سەنگەرى پا رىيىزگا رى شەرهە فدا دەگرن و بە نەبەر- دىيەكى بى وېنە وە لە رووى سووباي زۇرو بېرچەكدا دەجهنگن، تا هېرپە سەر شورە كە تىيەشكىيەن و بۇ جىئى خۆى دەگىرە وە .

چیز و کنوس و رده ورده با سه کان به ره و نهیّنی و نادیار ده با ، به و جوره‌ی خوینه‌ر بو ئهنجام و کوتا یی یه‌که‌ی به په روش بیت ... به گشتی لمه هؤشیاری و له ئاگا داریه‌وه نووسراوه ... ئه وه نه‌بی له یه‌ک دوو شویندا تووشی سووکه غه‌فله‌ستیک ببووه ... "ئه و منداله‌ی به به ر فاتیّی ها و سه‌ری کوپه شه هیده‌که‌ی لاله حمدد" ووه‌یه شهش ما نگانه‌یه (۱۷) . که‌چی دوای ما وه‌یه‌ک له کاتی دی" کوچ کردندما له هه‌لوبیستی رشتني فرمیسکی فاتیّدا ده‌لی" خوی پیرا نه‌گیرا چند دل‌په فرمیسکیک له پیلوه‌کانی چاوی ترازان و که‌وتنه سه‌ر مدلوتکه‌ی به سه‌زمان که نازانی پاشه روژ به‌چی ئه‌گات (۱۸) که و ا ده‌زانم مندال له ته‌مه‌نى شهش ما نگان و پیشتریشدا له مدلوتکه‌یی ده‌رده‌چی ... لالو حمدد له دووکاندما به دوو جوری هیزو توانتست پیشان ده‌دری " چا لاکانه هه‌نگا وی دهنا " (۱۹) " فاتیّی بعوکی و ئاپیشی کچی هه ردووکیان به ده‌روونی پر له خفه‌تموه دوای لاله‌ی پشت کوما و که‌وتبوون " (۲۰) که

(۱۰) کاکه مهمن، ههر یه و سه رچاوه، ل/۱۰.

(۱۶) کاکه مم، هدر ئەو سەرچاوه، ل/۱۱.

(۱۷) که مم، هر ئه و سه رچاوه، ل/۷.

(۱۸) کاکه مم، هدر عه و سه رجاوه، ل ۱۳/

(۱۹) کاکه مدم، هه، ئەو سە، حا و ھ، ا

(۲۰) کا کہ میم، ھھ، ٹھے، سو، جامو، ۱۲/۱

۱۷۸ میرزا علی شریعتی (۱۰)

دهولمت و سنوری سیاسی وای هبوبه که سچوکی به سنگیه و نهناوه، کاتسی واشبووه به چهند لایه کسریان به یه که و ناوه و هیزیان کوکر دوتنه و تا ده سه لاشی رامیاری و ریکختنی نه هیلّن و په پوپالیان کردووه، به لام هرگیز له دوای په یمانه دوو قوکلیه که سایکس - بیکوئی شووم سه ختری وهت سوش نهها توروه، لمگه لئوه شدا به شیکی گه ورهی سام و هه یبهت هه یه و له سیاستی نا وچه که و دوور تریشدا حسیبی بو ده کری، ویترای گشت ته قله لایه کی دوزمنان و داگیرکه ر، هستا وته وه و بو گیپرانده وهی زیانی سربه رزی، چالاکانمه تیهه لچوته وه، میژو و ما ن له چه رخی بیسته مدا گه لیک را په رین و شورشی به خویه وه بینیسوه، به ختکردن و قوربانی زیارتی له دا واکردن کانی ئمه و سالانه بخشیوه.

شورشی ئه یلوولی حفتا هه زار شه هید... شورشی سه ربکندي و بمه پیوه مانی کورد، شورشی به رهه لستی زورداران و داگیرکه ران، گیانی نهته وهی و نازه زایی بونون له رووی ئازاری نهته وهی و چه وسا ندنه وهی جه ما وه رانی رهش و رووتدا بلیسهی خوش کرد، ده ریا یه که ره سهی خاوی بو ئه ده بیات له پیشه وه چیروک پیشکیش کرد، ئه گه ر سه دان کتیب و کومنه له چیروک و دیوانه شیعری له سه ر بنووسنی، هیشتا هه که مه دارایه که هه زار نابیت.

کاکه مه می له مه ر خومن، وه چهی ئه و شورشیه، له قوتنا غه کانیدا، له پیش ئه یلووله وه تا هه ره سه کهی، ها وبه شی تیدا کردووه، بویه ئا سا سی یه چیروکه کاسی هه ر یه که یان له گوشه نیگایه که وه بوئی ئه وه یان لئی بیت و بو به سه ردا هه لدان و سه رکه وتنی ته رخان کرابن، یا ره خنه دلسوزانه لئی بگریت.

له م شورشدا، چی بیری لئی ده کریته وه، له نهته وه که و خاکه کمه، قوربانی خوی داوه، جودا واژی له نیوان گیان و مادده دا نه بوبه، هستیزو بیری دوزمنان، چیبا ن پی کرا بی، دریغیان نه کردووه، دیهه تی کوردستان، ده ربده ده ربوونی خه لکه کهی، تالان و ما شینه وه، کاولی و سووتان، بدهی بوبه، و اده زانم بتوانی بگوتری، دی نه ما بی له وولاتی به فرو خویشدا دیاری خوی نه دا بیه.

له، چیروکی "خور و دهست دینین" دا یه کیکمان له دیهه ته کان بو ده کری به نمونه، که له سالیکدا، دانیشتواشی بو دووه م جار مال و حال لمه کوک شه ته ک ده دهن. چونکه په لاما ری له خوپای بوبه کان ده چیته وه سه ریان.

نه‌نیا بی نین، بی‌کردنده و دال‌گهی رۆژا نی بی‌کاری نین، ورپنیه‌ی ده‌وری نه‌خوشی و ماندوپتی سه‌رما و سوله‌ی ژیان نین. به‌لکو زوربه‌ی همه‌ره زۆزی وه ک روودا ویکی میژووی کۆمەلایه‌تی خۆیان پیشان ده‌دەن." (۱۲). ئەمە و کۆمەلە چیرۆکه بە گشتی دوو باسی سه‌رەکیان له خۆدا کۆکردوتە و، خمباتی نه‌ته‌وه‌بی و تیکوشانی چینا یه‌تی، کەره‌سە و جىگا و شوینیان، ئەمە خەلکه‌یه کە بە بدر چا وی هەمووا نه‌وه دین و دەچن، ئەم کوردستانه بەرینه‌یه بە شارو لادی و شاخ و دۆل و هەردیمه و... کوشن و بىرین، تالان و بىرده، گیران و چەرمەسەری پى کردن، سیخور، زۆردا ران و چەوسینەران، پیا و خراپانی دیکه نەبراون. له بەرامبەریشیاندا، خەباتکەرو پیشەرگە، ما مۆستاي بە جەوهەر، جوتىرۇ كارگەری جوا مېر، خەلکى رەش و رووت لە فەروپىتىدان... له روانگەی ھوش و ئارەزووی مەرقەوه وا بو ئاسسو دەرپانىن کە رۆزى نەمانى چەوساندنه‌وه. ئازادى لەبەرەوه‌بی، بە خەبات بە ھەويای ئەوهەی تا بىت‌دەستەی يەكەم كەم بىتەوه، دووهەم رىيەن بى، ئەگەر ئەم جۇرە بۇچۇون و تیکوشان و ئاواتە نەبايە، مەرقەدە بوايە جا رىتكى دیکە تۆۋى مەرقا یه‌تى نەوهشىنى و مال ئاوايى له ژيان بکات.

نیاز له خەباتی نه‌ته‌وه‌بی، تیکىرا ئەم كوش و ھەولداناندەی کە پەيوەندىان بە نه‌ته‌وه‌ی کوردە وە ھەيە، رزگارى، يەكگرتىنده، چارەنۇس لە مانه‌وه و چوونە پېشەوه، پاراستن و ھېشتنەوه میراتى میژوویى و شا رستانىيەتمان، دىارى كردىنى رۆلى كوردەوەک مىللەتىك لە رەوى نىئۇ مىللەتان و نەخشە مەرقا یه‌تىدا.

لەم دەمەيدا كورتە چیرۆکى كوردى خونچەی پىشكۈوتۈوه، كەم يا زۆر گرېنگى بە تیکوشانى نه‌ته‌وه‌بی داوه، بۇ نموونە له ولاتى فارەماناندا، تۆلە سەندن - ئى بلە (۱۳)، تاج و تەختى كويىخا ھۆمەرى قىزلىجى نموونەی سەركەوتۇوی ئەم جۇرە ئەددە بهن.

لەوهەتى ئەم كورده ھەيە، چەندى پى كراپى بۇ دروستكردىنى قەوارە ئەتىيەتى و مانه‌وه‌ی ھەل و مەرج و كەسا یەتى خۆى خەرىك بۇوه جارى و ھەبۈوه

(۱۲) كاكە مەم بۇتانا، بۇممەلەر زە لە گۆمى مەنگدا، چاپخانەسى شەفيق، بەغدا، ۱۹۶۹، ل/۰۶.

(۱۳) بلە، كويىرە وەرى، چاپخانەى النجاح، بەغدا، ۱۹۵۹.

(۱۴) حەسەن قىزلىجى، پىكەننى گەدا، بىنكەپىشەوا، ۱۹۷۲.

نماین کپ و بی ده نگ بیون، لدو لاده شه گهرمه له نیوان دوو برادا که سه دان سال پیکه وه زیان، جا داخو چیر و کنووسی کورد له ئاستی ئەستم حاڵدا چی ده توانی بلی؟ له وه فادا بو شه ره فی وش، بی ده نگی هه لبڑا ردا له بەر ئەوه به دریزا بی ئەو سالانه (۹۶۱-۹۶۹) هیچ به رهه میکی با یە خدار نابینین " (۱۱) .

لیزه دا بو وەرامى ئەو دەبى بگوتري: شورشى کورد هەرگيز لە نیوان دوو ميلله تى کورد و عمره بدا نەبووه، بىلکو له نیوان کسورد و دەستمی کاربە دەستانى بە غادا بیووه، دلنيام حوسین ئەوه زۆر چاک دەزانى ، بەلام تووشى غەفلەت بیووه، ئەوجا کە دەلی: " چیر و کنووسی کورد له وە فادا بو شه ره فی وش، بی ده نگی هه لبڑا ردا " حق بیوو هەلۇيىتە يەک له بەرا مبەر ئەو رستەدا بکا، خۆي خاس ئاگا داره سەرچەمی بۈومە لەرزا له گۆمی مەنگدا، چیر و کە کاسى خۆي، چالى جەرگى پېرىيەن ، رووی کرده وە شاخ... چیووکى دیکەی چیر و کنووسا ان مواعاناتى تايىھەتى ئەو سالانىن ... پیشها تیش چۆن بىت، روودا وە كان بە چ شیوه يەک بىنە پېش دەبى لە ئەدە بدا باس بکرین، نووسەر ناتوانى خۆي لېيان بى ئاگا بکا . تايىھەت ئەو شورشە گەورە يە و بە سەرەتاتە مەزنە له مىزۇوي نەتە وەی کورددادا، ناكىرى ئە دىبلىقى بى قسە بى، وەک لېي بى دەنگ نەبووه . ئە من دلنيام ئەم سالانه و بە دوا يشياندا سالانى دیکە بو نووسەر انى ئايندەش سەرچا وە دەولەمەندو تاقىكىرنە وەی بە پېتن و مەيدانى هەلۇيىت ئاڭرا كردىن . وەک شتىكى گشتى، بەرەمی ئەدە بیات لە دوو سەرچا وەی گەينگە وە، چە مى خۆيان هەلە بەستن، سەرچەشمەي ژيانى واقىع دەگەل سەرچىما وە ئەندىشە .

دياره ئەوهى پىتر لاي خويىندر نزيك و پەسندە و ۋىرىتى پىشوازى لى دەكەت ، بەشى يەكە ميانە، ئەگەر چى نووسەری رەسەن، هەر دووكيان لە بنە پەرتدا بو مەبەستى خزمە تىرىدىن و تازە بۇونە وەي ھۆشىارى و هەلنا نى جە ما وەر بەرە و چاکە و جوانى و دادو سەرپەستى دەنۇوسى . كۆمەلە چیر و کى " بۈومە لەرزا له گۆمی مەندادا " پاکيان لە سەرچا وەي يەكە مەوه بنا وانيان هەلگەرتۈوه " خەونى شەوانى با وەشى

(11) حسین عارف ، روشنبىرى نوى ، ژمارە / ۵۴ ، ئەيلوولى ۱۹۷۶

زووربهیان پلدهیه کی ئه و تۆیا نه بwoo": (۱).

دەرچوونى رۆژنا مەی برايى لە ٦٥ مايسى ١٩٦٧ ، سەرەتايەكى دىكەي لە سەرخۇي بىز ووتنه وەي نووسىنى كوردى بwoo ، لە پال و تارى سپاسى و ھەندى با بەتى دىكە سووکە با يەخىكى بە ئەدە بىا شىش دەدا ، چىروكىيەش پىشكى خۇي ھەبwoo. (٢).

ئەوجا گۆقا رى رىزگارى لە ٢٠ نيسانى ١٩٦٩ بلاودە بىتە وە، بايە خىكى چاڭ بە چىرۆك دەدا ، دوا ڙما رەشى تا يېمەت بە چىرۆكى كوردى دەبىي ، ھەر لەو سالەدا چەند كۆمەلە چىرۆكىك لەوانە ئەلە ما ن كوردى (٣) دە چىرۆك (٤) سەيىد كەلەك (٥) بwoo كە شووشە (٦) ئادە مىزاد (٧) نەواي ھەتىسو (٨) زەردە خەنەي ڇيان (٩) ڇيان و ئەشكەنجه (١٠) لە پالىشياندا بۇو مەلەر زە لە گۆمى مەنگدا بلاو دەبىنە وە.

حوسىئىن عارف لە بۆچوونى دەربارەي سالانى شەستەكان دەنۈسى: "لە كاتىكدا چىرۆكى عەرەبى لە عىراقدا لە پۆپەي ھەلچوونيدا بwoo ، چىرۆكى گوردى لە خا مۆشىيەكى تەواودا بwoo . زوربەي ھەر زۆرى چىرۆكتۇو سەكا -

(١) عومەر مارف بەرزنجى ، لىكۆلىنە وە و بىبلىيۆگرافياي چىرۆكى كوردى ، چاپخانەي كۆرى زانيا رى كورد ، بەغدا ، ١٩٧٨ ، ل / ١٤٣

(٢) دىيا رترىن بەرھەم ، چىرۆكەكانى سەدرە دىن عارف و ئەھمەم مەممەد ئىسماعىيل بwoo.

(٣) دكتور مارف خەزىەدار ، ئەلە ما ن كوردى ، چاپخانەي ئەسەد ، بەغدا ، ١٩٦٩

(٤) دكتور كاوس قەفتان ، ١٠ چىرۆك ، چاپخانەي سلمان الاعظمى ، بەغدا ، ١٩٦٩

(٥) جەمال بايان ، سەيىد كەلەك ، چاپخانەي ئەسەد ، بەغدا ، ١٩٦٩

(٦) دكتور مارف خەزىەدار ، بwoo كە شووشە ، چاپخانەي ئەسەد ، بەغدا ، ١٩٦٩

(٧) موھەر رەم مەممەد ئەمین ، ئادە مىزاد ، چاپخانەي كامەران ، سليمانى ، ١٩٦٩

(٨) ساجيد ئاوارە ، نەواي ھەتىسو ، چلىپخانەي كامەران ، سليمانى ، ١٩٦٩

(٩) جىهان عومەر ، زەردە خەنەي ڇيان ، چاپخانەي كامەران ، سليمانى ، ١٩٦٩

(١٠) مەممەد رەشيد فەتاخ ، ڇيان و ئەشكەنجه ، چاپخانەي كامەران ، سليمانى ، ١٩٦٩

بِعْدَ مُهَاجَرَةِ الْكَوَافِرِ مُنْكَدِرًا
بِعْدَ رُوْسَيَا لَكَ شَتَّى

صہابی غالب

یه کیک له چاکترین ده سکه و ته کانی شووشی ته ممووزی ۱۹۵۸ به ندی
سییه می دهستوری کاتی بتو که دانی به ها وبهشی میللته تی کورد لەگەم
عده بدا هینا ، ته وا اوی ئەو بەندەش بەم جۆرە يە " قەوارەی عىراق لە سەر
بنچینەی ها و کارى نیوان گشت ها و نیشتمانا ن دروست دەبى ، ریز له ما فى
ھە موان دەگىرى و پارىزگارى سەربەستييما ن دەكىرى ، عەرەب و کورد بە
ها وبەش لەم نیشتماندا دادەنرىن و ئەم دهستورە له چوا رچیوهى يەكىتى
عىراقدا بىيار لەسەر ما فى نەتەوە بىيان دەدا " (*).

ئەوە بۇوه هوئى زىيىدەتەر ھۆشىا رېبۈنە وە فراوان بۇونى مەۋداى سيا سەت، جوتىر لە گۈندان، كارگەر لە ھەر شوينىك، فەرمانبەر و قوتا- بىان، ئافرهەتان و ما مۆستا يان، چالاكانەتەر دەست لە نىيۇ دەست چۈونىمە مەيدانى كا رىكىرىنە وە، بىزۇوتتە وە رۆشتىپەری گەشەي كىردو چەندان رۆژنا مە و گۆقار، بلاڭكىرا وە كىتىبان، چاپ و بلاڭبۇونە وە.

ئەو گۇرپۇتىنە تا ئەپلۇولى ۱۹۶۰ بەردەوام دەبىي، دوا ئەوه ھىيىدى
ھىيىدى، رېگرى دەكىرى، لە ھەشتى شوباسى ۱۹۶۳ لەگەل خويىندىنەوهى يەكە مىن
بەيانا نىدا مەدەنگى شۆقىنى ، سەرپاڭ گۆقا رو رۆزئا مە كوردىيەكان پېپە
دەدرىيەن... بە زورە ملى پىنۇوسى نۇوسەرى كورد دەخربىتە خەونە چەند
سالىكەوە . ئەگەرچى لە حوزەيرانى ۱۹۶۴ لە سليمانى بە نىيۇي "راپەرپىن"
ووه رۆزئا مەيدەكى حەفتانە چوار لايەرەيى كە زىياتر بۇ مەبەستى بانگاشە و
با زىرگانى بۇو، دەردەھىيەنرا . " ئەو رۆزئا مەيدە نا و بە نا و چەند بابەتىكى
ئەدەبىي بلاو دەكردەوە، ھەندى چىرۋەكىش لە سەر لايەرەكانى كەوتىنە روو ،

(*) محمود فهمي والدكتوران مصطفى جواد واحمد سوسه، دليل الجمهورية العراقية لسنة ١٩٦٠، دار مطبعة التمدن، بغداد، ١٩٦١، ص / ٢٥٥.

بکه م به لام ده لیم : ئەوهى دكتور نووسیویه تى زۆر زانستيانه نىھە و ئەھە و
رەخنه نىھە ، بەلكو پلار تېگرتە !
ئەجا دكتور جەمشید لە پېرىڭدا دەيە و يېت چەند تېبىنېك دەربارە
وتارەكەي رەووف حەسەن توْمار بکات ، ئىيتىر بە بىئى ئەوهى خويىنەر ئاگادا رى
وتارەكەي رەووف بکات دەلىت : رەووف كاتىك باسى شىعرەكەي حەمدى دەكەت
دواى (مەسىلمەي وېزدان) لە جىيى خۆيىدا نىھە . وا بىزانم ئەمە دوورە لە
ھەموو شىوه يەكى رەخنه و ادیارە دكتور كۆمەللى بىرۇ راي لە لاي خىوۇ
گەللاھ كردۇھ ، ئىيتىر وا دەزانىتھە موو خويىنەر انھەر بىر لەو شتائىھ
دەكەنەوە كە ئە و سپىوهى خەرىكە و چا وەرۋا نەن دكتور بۇيىان بخاتە بەھە
تېشك !

دكتور جەمشید بە دوو رىستەتىر لە كۆتا يى و تارەكەيدا مۇرۇڭى
لاوه كېتىي و نازانستىيەتى ناوه بە كتىبەكەي عومەر ما رفدا ، ھەر باشى
ھىواي ئەوهى بۇ عومەر ما رفھىشتەتە كە (ئەگەر ھاتو كاك عومەر ما رف
لە چا بىي دووھە مىدا ئەم رەخنه و سەرنجا نەي (دكتور جەمشیدى) وەرگەرت
ئەوهى كتىبەكەي (رەنگە) لە رووى زانستەتە (كەمىك) سوود بەخشىترو پا يە
بلەندتر ئەبىت). وەك دكتور جەمشید بە بىئى گومان و بە شىوه يەكى موتلەق
با وەرى بە زانستىتى رايەكانى خۆيى كردىتىت ، بەلام وەك دەزانىن رەخنەگەرە
سەركەتووھە كانى جىبەن ھەمىشە دەلىن "بە راي من" ماناى ئەوهە مەرج نىھە
ئەمە راست و موتلەق بىت .

لە كۆتا يىدا رام وا يە ئەگەر دكتور ئەھە تىشكەي فراوانىتىر بىردا يە
و لە نا مىلىكەيەكدا بىلۇي بىردا يەتەتە ، رەنگ بۇو سوودى زىيا ترى بوا يَا .

× × ×

پرسیاریک و هنر سرنجیک از روشنایی و پیش

که مالی حمید رهش

حجز ده کم له به ریوه به رانی "هیوا" و له د. جه مشید حه یده ری، نووسه ری "روشنایی و تیشك" ، سه رنج و ره خنه له لیکولینه وهی چیرۆکی کوردى له عیراقدا" ، که له ژماره دووی هیوا دا بلاوکراوه ته وه، بپرسم: ئا يى ئامانجيان چې له بلاوکردنە وهی ئە و نووسینه له گۇفارى "هیوا" دا؟ بى گومان من دزى ئە وه نىم که "هیوا" لايپره کانى بخاتە سەرپشت بىو هە مۇو جوّرە نووسینىك و بە تايىبەتى رەخنه ، بەلام بە مەرجىك ئە و نووسینه وە يان ئە و رەخندىھ سوودىك بە خويىنە رانى گۇفارە كە بگەيەنىت ، نەك هەر بە تەنها توّما رکردنى چەند ھەلۈيستىكى نووسه رىك يا رەخندە گرىيک بىت سەبارەت بە باسىك . هەموان ئەزانىن کە شەشە وە سال بە سەر چا پکردنى ھەر دوو لیکولینە وەكى حوسەين عارف و عومەر مارفدا تىپەریوه و تەنانتەت ئىستا له بازاپى عیراقدا چىڭ ناكدون. رەخندە وەك ئاشكرا يە كەنە لە گۇفارىك يا بە رۆزنا مەيەكدا بلاودە كریتە و سەبارەت بە چا پکراوه نسو- يکانە نەك ئە وەي پىش ئەم ما وە دوورو درېزە چاپ كراوه . جا ئىستا ئەگەر خويىنە رانى "هیوا" بىيانە وىت لە تىشكە كەي د. جه مشید بگەن دە بىت ھەر دوو كتىپە كەي حوسەين و عومەر پەيدا بکەن، ئە وەش بىو ھە مۇو خويىنە- ران نا لوى و د. جه مشید يش ئە و راستىيە دە زانىت!

بەلام لە گەل ئە وە شدا چەند تىپەننە كەم سەبارەت بە نووسینە كەي د. جه مشید ھەيە، حجز ده کم بىيانەم پىش چا وى خويىنە ران. د. لە سەر جەمى نووسینە كەيدا داوا له ھەر دوو نووسەر، حوسەين عارف و مارف دە كات كە دە بىت بىو ھەر رايىك نمۇونە لە سەر ئە و چیرۆكانە بىننە وە كە رەخندە يانلى ئەگەر، بىو ئە وەي لیکولینە وەك يان "عىلىمى" و زانست "يانە بىت، كە چى دكتور خۆي بە چەند رىستە يەك رۇما نىكى دوورو درېزى وەك (قەلائى دەمدەي) عەرەبى شەمۆي لە گرىيژنە دە رەھىتىا وە، بى ئە وەي با سەكە پەيوەندىي بە عەرەبى شەمۆي بىت .. بى گومان من نا مە وىت بە رەگرى لە عەرەبى شەمۆ

سەمبولىزم و راسىز

كەمال ميرا ودهلى

بە داخه‌وه کاک سمکو ناكام و تاره‌کەمی لە باوه‌پىكى يوروستانا وەندى Eurocentrism تەواوه‌وه نووسىوھ . رە Miziyet نەك تەنها لە چەرخى نوزدەھم دەست بى ناكا (چونكە ئەوروپا وادەلىٽ و سەرچاوه بىگەرده‌کەمی فەرەنسا و بودللىر) بەلکو لەگەل دروست بۇونى زمانىشدا رە Miziyet ھەيە و رە Miziyet لە ئەركى زمان جىا ناكريتەوه ، وەكى رىبازى ئەدەبىش لە ئەدەبى ھەمو نەته‌وه يەكدا ھەبووه و ھەيە . ئەوه نەبى كەلچەرى ھەلبژار دەھى بورۇزا زىيەتى ئەوروپى پىئنا سىكى فۇرمالىستى و ئايديا لىستى پى بەخشىوھ . ھەق ئىمە وەك رۇونا كېرى كورد ئاگامان لە تەلەو داوى بىرى يورو - نا وەندى بى . . و پىئنا سە - قوتا بخانە شكلىيەكانىيان وەك سەرتاۋ زە مىنەي بىركرىدنه وە لىكدا نەوهى خۆمان وەرنەكرين .. خۆزگە كاک سمکو ئەو ھەولەي خۆي بۇ لىكۆللىنەوهى رە Miziyet لە دەيان نەموونەي بىئەرزى ھونرا وە چىرۇكى فۇلكلۇرى كوردى (جا جا ئەدەبى نوئى) تەرخان دەكردو ناساندى رە Miziyet لە سەر بىنا غەي لىكۆللىنەوهى كى زانستى پەيوەندى زمان و جىهان داده رىشت ... نازانم كام شاعىرى كوردىش لە حەفتاكاندا لافى (بە رە Miziyet تەوه) لىدا وە ؟ يان سەمبولىزم لە ج روویەكەوه جىكە شانازى پىوه كىردىن و لاف پىوه لىدا نە ؟

x x x

بداته وه و تیگه یشتنيکی گشتی له باره يه وه هه بی. که جی شده بی کشور دی، که له و سالانه دا هه تا راده يه کی زور مانای فهره هنگی کور دی ده گرتمه وه، لیل و مژاوی و که م سه رچاوه بwoo. پیویستی يه کی گه وره و قسول به دا مالینی شم باره ناله باره هه بwoo. ما مۆستا سجادی شم ئه رکه گهوره يه کرتە ئه ستۆ خۆی و توانی له کاتیکی ناسکدا نیشان بپیکی. بنویس کتیبه که دی سجادی جیگا يه کی دیا ری بو خۆی هلبژاردووه له میزوه په ره - سهندنی نه ته وا يه تیگه لای کور ددا.

ما مۆستا سجادی به ووه نه ووهستا، هه ره سالی ۱۹۵۷ وه دهستی کرد به بلاوکردن وه کۆمەلی قسمی خوش و نهسته ق که له تا و کور دانا باون. ئه گه رجی له کاتی خۆیدا " رشته مرواری " درایه بدر تیر و توانچ، بەلام زوری پی نه چوو ههست به گه وره بی شم کاره کرا، ئیمرو ناتوانیین کاریگی ئیتنولۆزی و سوسيولۆزی له سه رچاوه گرنگه کانمان. هه روا، له سالی ۱۹۷۸ مرواری بکهین به يه کی له سه رچاوه گرنگه کانمان. هه روا، شاکاریکی کەشی بلاوکرده وه، کور ده واری، بو با سکردنی دهیان داب و نه ریت و یاری نا و زیانی کور ده واری، که ههندیکیان ئیستا نه ماون و ههندیکی تریان له نه ماندا ن. بەلام خا مەکھی سجادی رزگا وی کردن و خستنیه شوینیک که هه تا هه تا يه ده میزنه وه.

جگه لهم سی شاکارهی ما مۆستا سجادی، چەند کتیبیکی دیکهی نووسیو وه ک : نرخ شناسی، دوو چا مەکھی نالی و سالم ... هتد، که نرخی تایبەتی خۆیان هه يه له میزوه شهده بی کور دیدا.

هه رچەندە ما مۆستا سجادی به جیئی هیشتین، بەلام بیرونرا و کاره کانی هه میشه له ناماندا ده میزنه وه.

کۆچی سی یەم

ھەلکەوت ھەکیم

ھیشتا خەمی کۆچی دوا بىی ما مۆستا جگە رخوین و يەلماز گیوناي
لە دل دەرنەچوو بwoo، خەمیکى ترى ھاتە سەر، ئەوپىش کۆچى دوا بىی يەكىسى
لە گەورە ترىن نۇۋەسەرانى ئەم سەردەمە گەلەكە ما ان، ما مۆستا عەلاعەالەين
سجادى بwoo كە رۆزى ۱۲/۱۲/۱۹۸۵ بە يەكجا رى ما لۇا يى لە دەنیانى
سەر زەمین كرد.

ھەر لە سالانى سېيەوه ما مۆستا سجادى چووه رىزى ئەو لىكۆلەزە.
وانەي ژيا نەوهى را بۇوردوو مىژۇوبى و فەرەنگى گەلى كوردىما ن كردىبو
بە چا لاكىيە سەرەكىيەكەي ژيانى خۇيان. ئەو نەوهەستا و ھەر بەرددەوا!
بwoo. توانى گيان بکاتەوه بەر دەيان شاعير و دەيان پارچە شىعر لە
گۆرستانى لە بىرچۇن رزگار بكا و رىگا بۇ قۇولبۇونەوهى زيانتر خىوش
بكا.

لە سالى ۱۹۳۹ اوھ هەتا سالى ۱۹۴۹، ما مۆستا سجادى و ما مۆستا
ئىبراھىم ئەحمدى يەكى لە پېشىھە ترىن گۇقا رە كوردىيەكانىان دەرددەھىنە
گەلاويىز، ئەو چرا يەي كەپا شەستا نىشى ھەر روونا كى دەبەخشى. لە سالى
۱۹۵۳ شاكارى يەكەمى سجادى، مىژۇوى ئەدەبى كوردى، گەيشتە دەستى
خويىندىرى تىينۇوئى كورد. ئەم كتىبە لە كاشى خۇيدا گرنگىيەكى ئىيچگار
گەورەي ھەبwoo، بە تايىھەتى لە دوو رووهە: يەكە ميان ئەوه بwoo كە بۇ
يەكە مجار مىژۇویەكى فراوان و گشتى لە بارهى ئەدەبى كوردىيەوه پېشىھەش
كرد و بۇشا يىيەكى گەورە لە كتىيەخانە كوردى مىژۇوى ئەدەبىدا پىر
كردەوه. ئىيمىرۇشكە سى وسى سال بە سەر دەرچۈونى ئەو كتىبە تىپەریوھ ھىشتا
مىژۇویەكى گشتى تر لە دايىك نەبwoo. دووهە ميان پەيوهندىي بە بارى
ھۆشىا رىي نەتەوا يەتىي گەلى كوردى ئەوساكەوه ھەبwoo: مىژۇوى كورد
نووسرا بۇوهە، كوردى پېشىنەر را بۇوردوو خۇي و گەلەكە دەيتوانى بە
پشت بەستن بە شەرە فنا مەكە شەرە فخانى بىلىسى و مىژۇوهەكەي مەھەممەد
ئەمین زەكى بەگەوه وەلامى چەند پرسىا رىيک دەربارە مىژۇوى گەلى كورد

شیوه‌یه پاش ما وهیه که وتن له خهسته‌خانه‌ییکی پاریسیدا ، سه‌عات پینچ و نیوی سر له بدهیانی ۹۱ سه‌پته مبه‌ری ۱۹۸۴ یه‌لماز گیونانی دووره ولات مالاویه له دنیا کرد .

هه ر وهک خوی پیش مردنی ئاره زووی کرد ببوو ، تازیکه‌یه له ئەنستیتووی کورد - مالله‌که‌یه له پاریس ، خوی وتنی - گییردراو ، سیانزه‌ی هه‌مان مانگ ههزاران هه‌زار کەس تەرمەکەیان گواسته‌وە بو کوربستانی - پیئر لاشیز - ، که له‌وی به خاک سپییردرا .

بە مردنی یه‌لماز گیونانی ۋەزىيەتی ئېچگار زۆر له روشتبيران و سیاسەتمەندو ھونەرمەندان و كەسانى ناسراوو ئاسايى راسته و خۆ به‌شاريان کرد له تازیکه‌یدا، ياخىدا بە نامەو تەلگرام ماتەمینى خویان پیشان دا . روۇزنا مەكانى تۈركىياش بە مانشىتى گەورە بە تەوسەوە رايسانگەيياتىد : پیا وکوژە هەلاتوھەكە مرد .

سال بەندیخانەی بەسەردا دەسەپی. لە بەندیخانەدا دوو رۆمان و سی سینا ریوی فلیمی دریزو باسیکسی سیاسی: دەربارەی فاشیزم دەنوسی. بو ئەم نووسینەی دوا بى حەوت سال و نیو بەندیخانەی تر حۆكم دەدرى. وتاریکى تر: چەند دەستەییکى سیاسى، ئەوهنەدەی تر حۆكم دەدرى. پىنج سالى تر لەسەر نامەمەك كە بۆ سینیووْر فیرتەندىز هیرىراى كارگىری فیستیقلالى سینەما بى ۋالادىد لە ئىسپانىيا نووسیویتى. حەوت دەعوای سیاسى ترى لە دژە، سەرجمەم: سەدد سال بەندیخانە.

كۆل نادا. لە بەندیخانەوە چەند فلیمی كار دەگىرپى. ھا ورپىكانى كارەكە جىبەجى دەكەن لەسەر سەرنج و پلانەكانى خۆى. يەكى لەم فلیمانە: مىگەل سەركەوتتىكى زىرنگەدار بە دەست دەيىن لە ئەوروپا دا.

سالى ۱۹۸۰ ھەر بە شىۋەيە فلیمیكى تر كار دەگىرپى: يۆل. بەلام پىش ئەوهى كاروبارى فلیمەكە بە يەجگارى تەواو بى، كوديتا يېكى سەربازى بارى تۈركىيا دۇزارتر دەكەن. يەلماز گيوناتى سوود لە مۇلەتى دەبىنى كە بۆ چەند رۇزى سېرى دراوە تا لە بەندیخانە بچىتە دەرى سەر لە كەسوڭارى بىدا، دېتە دەرى، بەلام ھەرگىز بۇي ناگەرپىتەوە. لە ئەوروپا جىڭىر دەبى. دەسەلاتدارانى تۈركىيا كە لە گيوناتىدا نەمۇنەتى ياخى بۇون و كەسى دەبىنەوە كە دەستەو يەخە بە گىرىھىنەن، جنسىتى تۈركىلىقى دادەمالن و، فلیم و كتىپ و تەنائەت وىنەدا نىشى لە تۈركىادا بە تۈندى قەدەغە دەكەن.

سالى ۱۹۸۲ فلیمى يۆل لە فیستىقلالى كاندا پىشاپەن دەدرى، خەلاتى يەكەم دەپچىرى. سەركەوتتىكى جىهانى. رۆزئا مەكاشى دەنیا لەسەر فلیمەكە و كارگىرەكە دەشۇوßen، ئەو رۆزئا مانە كە ئەگەر جارجار ناچار بىسۇن لەسەر كورد بىسۇوßen دەربارەتىقەلەي كورد چەوسيئەوان بۆ قەلەچۆكىرىنى، ئەمچارەيان بە هوى يەلماز گيوناتىيەوە لە بوارىكى ھەرگىز چاوهرى نە كراوهەوە نا وي دەربا ز دەكەن: سینە ما.

سالى پاشتر، لە فەرەنسادا راستەوخۇ فلیمیكى تر كار دەگىرپى دېوار. ۱۹۸۳/۲/۲۴ يەلماز گيوناتى و چەند روشپىرىكى كوردى ئىساوارە ئەنسىتىتىوو كورد لە پاپىسى دادەمەززىين.

ئەگەر جونتاي تۈركى كە هەزاران پىاوكۇز لە خزمەتىان دەستى نەگە يېشىتە گيوناتى، ھا و كارىكى ترى كار كەمى بۆ ئاسان كرد: نەخۆشى. بىم

۱۹۳۷ کوری له دا يك ده بي: يه لماز گيونه.

تا تەممى هەرزە کار، يه لماز کار دەکا و دەچى بۇ قوتا بخانە.
ئا مانجى با وکى: بىي بە قەپانچى پەمۇو. بەلام ئەم لاوه خۆى دەيىھە وى
بىي بە شتىكى تر. چى؟ خۆيشى نازانى.

سالى ۱۹۵۲ يەلماز يەكمەن كورتە چىرۆكى لە پاشکۆي ئەددەبىرى
رۇژنا مەد (بېرگون)دا بلاودە کاتەوە. ھەر لە سەردە مەدا بېرۇ با وەزى
سياسى بە لاي چەپدا وەرئەچەرخى. سالى ۱۹۵۵ چىرۆكى بلاودە کاتەوە كە
لە كۆتا بىيەكەيدا جوتىيا رى بە رووي دەرە بەگە كەدا ھاوار ئەكا : رۇزى تۆ
كۆتا بىيت دى! پا داشتى ئەم ھاوارە بۇ چىرۆك نۇوس ئەو دەبى كە دەسە
لاتدا رانى تۈركىا بە حەوت سال و نيو بەندىخانە، دوو سال و نيو دوور
خستەوە حۆكمى دەدەن: تاوانى: پىروپاگەندەي كۆمونىست! لەم حۆكمە
سالى بەندىخانە و شەش ماڭ دوور خستەوە ئەنۇشى. پاشھاتىنە دەدە وەي
سالى ۱۹۵۸ وەك سینا رىستى ھاوبەش و ئەكتەر بەشدارى دەكا لە فلىيمى
ئا لىگا يك - ما مز(دا). بەلام كاربەدەبتان دەست لە يەخدى بەرتادەن، بۆيە
ناچار ھەلدى و، خۆيىندى ئا بۇورى لە زاشکۆي ئەستەمۇول بە يەجگارى
كۆتا بىي دى. سالى ۱۹۶۱ جا رىكى تر دەگىرىتەوە بۇ ھەزەدە ماڭ . لە
بەندىخانەدا رۆمانى (بە كەساسى مەردن) دەنۇوسى، كە زۆربىسى
بەسەرها تى ڇىانى خۆيەتى.

لە سالى ۱۹۶۳ بە دواوه يەلماز گيونە دېتەوە مەيداسى سينە ما.
لە ميلودراما بازىغانى يە تۈركى يەكاندا سەركە وتنىكى بىھا وتنى
نازنا وىكى تازە دەست ئەكەوى: شا ناخزە كە سینە ماي تۈركى. لە پىنج
سالدا لە (۶۰) فلىيمدا ھاوبەشى ئەكەت.

سالى ۱۹۶۸ پاش ئەوهى خاوهن كارەكەي دەرى دەكا چونكە كۆمونىستى
جىي ئا بىيەتەوە لاي، يەلماز بۇ خۆى فلىيمى دەرەكى: (بۇوكى زەۋى)، كە
بەسەرها تى بە زۆر شوو پى كەرنى ئافرەتانى كورد چارەسەر دەكا .

سالى ۱۹۷۲، كۆنه ئاشنائى، بەندىخانە جا رىكى تر با وەشى بۇ
ئەكەتەوە. تاوان: شاردىھە چەند قوتا بىيەكى گوايا ئاشا رىشىست. كاتى
خۆى لە بەندىخانە سەربازى (سەلىمىيە) دا بۇ نۇوسىن تەرخان دەكا .

سالى ۱۹۷۴ تازە لە بەندىخانە ھاتۇتە دەرى، لە جىيگا يېكى گشتىدا
حاكمىكى سەرخۇش دى بە گۈزىدا و ئەزىقىنى: ئەگەر تۆ كۆمونىست بى، يانى
ژەتكەت سۆزا نى يە. دەبى بە تەقە، حاكم دەكۈزۈ. يەلمازىش حۆكمى (۱۸)

دوا سه‌فه‌رى رىپووارىكى نه سره‌وت

س . ن

له ژيانى هر گەللىكدا گەللى مىزۇو ھەمە كە جىڭا يەكى دىسا رى كراوى ھەبى بۇ ھەر كەسى كە له و بەسەرھاتانە رائە مىننى كە بە درىيىزى ژيانى ئەو گەلە خۆيان چەسپا ندووه، بۇونتە ما يەي شادى، يَا دلتەنگىنى ئەو گەلە، كە باس دىيىتە سەر كورد، ئەويش وەك ھەر گەللىكى تر، ئەو خالىھ زەقانە لە مىزۇو يدا زۆرن، بەلام بە پىيچەوانەي گەلانى تىرىھە، زۆربەي زۆرى ئەو مىزۇوانەي كورد شادى بەخش نىن... پەلاماردا ن، داگىر كردىن، كوشتا ر، خيانەتكارى، لە سىدرا رە دان، جوانە مەركى... هەندى، سەرە راي ئەمە ھەموو، شتىكى تر كورد جيا ئەكانتەوە لە زۆر گەلى تر، ئەويش بەرده وام بەرەبەرەكانى و، ھەرگىز سەرسۈرنە كەردىن ھەر ئەمە يىش نەھىنىي نەمرى ئەم گەلە بچووك و بى پىشىتە، بەلام نەبەزەيد.

ئى سەپتە مېھرى ۱۹۸۴ دەبىتە مىزۇو يېي، كە كورد لە داھاتوودا يادى دەكانتەوە، بەلام بە پەستىيەوە: لەو رۆزەدا كوردى مەرد. بەلام ھەموو رۆزى كورد دەمرى، دەكۈزۈرى، قەلاچۇ دەبىي: بە ئەشكەنجه، بە چەكى سووک و قورس، بە نەخۇشى، لە بىرسا... يادى دەكانتەوە لە داخدا زۇوخاوه سك دەبىي. راستە، بەلام ۹۹ سەپتە مېھرى ۱۹۸۴ كوردى مەرد كە بە تاقى تەنها جەنگىكى بەرپا كرد، لە سەرى سور بۇو، بەرده وامىي بى دا، چوو بە گىز يەكى لە ھەرە درىنە ترىن رېيىمە سەرسۈكەرەكانى ئىنسان بە گىشتى و، كورد چەوسىنەرە وەدە بەتا يېدەتى. چەپەل ترىن رىيان بەكار ھېينا بۇ لالى كردىن، كۆلى نەدا، خەباتى خۆي بەرده وام بى دا: دەرگاي قەلابىكى گەلى ئەسخت و سامناكى كوتا، كە بۇ گەللىكى لە شارستانىيەوە دوورى وەك كورد ھەر خەون و خەيالە: سىنەما. لەۋى لە سەر يەكى لە قوللە بەرزە كانى ئالا خۆي چەقاتدو، دشىا سەرى رېزى بۇ دانەواندو، چەپلەي ئافەرينى بۇ كوتا.

ئى سەپتە مېھرى ۱۹۸۴ يەلماز گىوناتى مەرد.

خىزانىكى كورد لە سەر خوين نا وچەي شىقەزەك جى دىللى و لە ئەددەنە جىگىر دەبىي. خىزانىكى ترى كورد لە بەر كارە ساتەكانى سەفەر بەلك لە مووشەوە كۆچ دەكما و ئەويش لە ئەددەنە ئەگىرسىتەوە. لە خىزانى يەكتەم كورە جوتىارى و، لە خىزانى دووھەم كچە جوتىارى و، لەم دوانە، سالى

بورو بوو.

شخسيه تى ئەدەبى و هونەرى جىگەرخويىن لە سەرهەتاي سىيەكان دا پەيدا بۇو. شىعرە بە راپىيە كانى رەنگدانە وەرى ئايدىيۆلۈچىھەتى نىشتمان پەرورەرى و بىزۇوتتە وەرى رىزگارى نەتەوا يەتى كورد بۇو. شا عىر ئازايانە دەنگى بەرز دەكىرە وە لە دېرى ئەسەنە بە ناوى ئاينە وە خەلکى كوردىان دەچەۋاساندە وە.

لە چەلەكان دا بە تايىھەتى لە ما وەرى جەنگى گىتى ئەدەبى دەۋەمدا چووار- چىوهى شىعرە كانى بە شىوه يېكى ديار فرا وانتىر بۇو. لەم سالانە دا شاعير بە گەرمى لە سەر ھىزى مىللەتانى دەكىرە وە لە دېرى فاشىزم، ھەر وەها لە ھا وکارى ئىوان كوردو نەتەوە ھا وسىكانتى دەدوا لە خەباتيان دا لە دېرى دۇزمىنى چىنما يەتى گشتى يان لە سەر برايەتى و ھا وکارى ھەمىسو نەتە وە كانى گىتى دەكىرە وە.

شىعرى جىگەرخويىن سووك و ئاسانە، ماناى ئاشكرايە، لەگەل خەلکى نەخويىندەوار و ساكارى كورد قىسە دەكا، لە دەلىكى پىر سۆزە وە دېتە دەرى، لېكىسىكۈنى نەرم و نيا نە، كىش و قافىھى سووكە، رەمز و پىچ و پەنا و ماناى شاررا وەرى كەمە، بەلام كارگەرە، چونكە وېئەرى روودا و دەدا بە دەستە وە.

بى گومان جىگەرخويىن دەورى خۇي لە ژيان دا بىنى وە كوشادە مىزا- دېگى كورد، ئايدىيۆلۈچىھەتىكى نىشتمان پەرورەرى و كوردا يەتى و مروققا- يەتى بە شىعر بلاو كىرە وە، شىعرە كانى ھە وېئى پەرورەدى راست مۇون بۇ دەورى خۇي و لە پاش خۇشى دا بۇ ما وە يېكى زۆر ھەر دەمېتە وە.

سلاو لە گىانى پاكى جىگەرخويىن.

ھېنەدى وورده بەردى خاڭو خۇلى شىوان ستۇكەپەل و جزىرە و بۆتان ھېنەدى ئەستىرە ئاسما ئىوان سويد و نىشتمان.

عەنتابە - ئەلجه زاڭىز

1984/11/6

زنانی ئەستىزه يەكى ھەنگىدار

د. مارف خەذىشدار

ھەوالى كۆچى دووا يى جىگە رخويىن كارىكى گەورەي تى كردم، مردىنى كەسى بەكارو بەبەرهەم زيانىكى گەورەيە، چونكە جىئى پې نابىتە وە دا هىننا نى دەۋەستى.

جيگە رخويىن لە سەرەتاي ئەم سەددەيەوە ھەر ئاوارە بۇوە، ژيانى تا يېتى خۆى رەنگى لە ژيانى نەتەوەكەي وەرگرت بۇو، لە دووا يىشدا بە ئا مانج نەگەيشت و ھەر لە ئاوارەيى مەد، بەلام ئەو خاكەي چاوه رۇوا - نىھەتى بچىتە با وەشىھە ھېشتا ھەر ما وە دەمېنلىقى و نەمرە.

لە سەرەمە مى خۆى دا، ئىممەي منداڭى كوردىپەرسىت بە شوين ھەموو شتىك دا دەگەراین كە بۆنى كوردى لىقى بى، كە دەيىان ووت سورىا و لېبان، ئەوەي بە خەيالىمانا دەھات ئەو بۇو كە سورىا و لېبان بىرىتىيە تەنبا لە دوو شت، يەكە مىيان "جيگە رخويىن"، دووه مىيان "چاپەمەنلىكى كوردى بە لاتىنى". بىنېنى شا عىرېكى وا ئا مانجى ھەموو مىرد - منداڭ و لاۋىكى خويىندە وارى كوردى ئەو سەرەمە بۇو.

لە پاش شۇرۇشى ۱۴ تەممووزى ۱۹۵۸ جىگە رخويىن ھاتە بەغدا، زۆر يەكتريمان دەدى زۆر تەرىپىش لە زمانى كوردى دەدواين چونكە بۇو بۇو بە ما مۆستاي شىۋەي كرما نجى سەررووى زمانى كوردى لە كۆللىجى ئەدەبىياتى زانستگاي بەغدا.

شىعرى شا عىرى مىللەي ناسرا وى كورد جىگە رخويىن بە راستى زمانى خەللى خەللىكى ھەۋارى كورد بۇو، لە ھەموو لايىكى كورده وارى دا ناوبانكى دەركىرىدىوو و لمبەر چا و بۇو. روودا وەكانى كوردىستانى تۈركىيا لە پاش جەنكى جىهانى يەكەم كارىكى گەورەيىان كرده سەر جىگە رخويىن و ھەۋا يىكى سا يکۈلۈچى نائاسا يىيان لە لاي دروست كرد بە تا يېتى كە جەندرەمىسى تۈرك سەرى خەللىكى كوردىيان دەبپى لەو نا وچانى كە شۇرۇشىان تىكىدا بەرپا

زمان و ئەدەبیات

39	د، رەھنەر دىّزان	کانى بەرھەمىن ئەنۋەر ما بى؟
43	فرات جەوهەرى	لاوهكى ئەخوھەش
	رۆزدا وى ڙڙىانا مستى كورى سالحا تەمۇ	
46	شاھينى سۆرەكلى	
55	خەلەيلى چاچان	نه مى و ئەيشى

ھەلبەست

73	تۆسینى رەشىت	ئاخ دايى ، دايى
74	بەرتۆلت بىرەشت	وەلاتى مە
75	جاڭكورد	ئەز و كەۋى
76	مەڙدەل حامى	زىدان
77	برىندار	يەكىتى
78	ئەحمدەد	ترالى
	كۈرمى دارى نە ڙى بە خەرا نابە توجا رى	
79	دلاوهر زەنگى	

فۆلكلۇر .

80	م. لەوهەندى	نەر
87		پېتۈوكىن نۇو

دوملى

93	ما لميسا نىز	فۆلكلۇر ما را
105	ئەنۋەر گويىچە	وا سووهند بۇ ، وا شىرت بۇ
106	ئەنۋەر گويىچە	جا ئەدەيانى ما د زى
107		ما جەrai سلەمۇنى گىنچە
109	پ . ل. لەرخ	قەوخى نىرپ و سىوانى
112	خۆرتى كورد	وەلات وەلاتى كوردىنىڭ
113		خۇنا حەجى
114	ما لميسا نىز	بىبلىوگرافيا دەملى
	حالىتەكانى جنس و بىيانى بەركار لە زازادا	
118	پرۇف . قاناتى كوردو	

نـاـوـهـرـوـك

بـهـشـيـ كـرـمـاـنجـيـ خـوارـوـو

- د. ما رف خه زنه دار ٦ رژانی ئەستىرە يەكى پەشنىڭدار
س. ن ٨ دوا سەفەرى زېپوا زېكى نەسرەوت
ھەلکە وەت خەكىم ١٢ كۆچى سىيەم
- شا مەي ھا ورگىيا ن دەربا رەھى ڦما رە دوو
سەمبولىزم و رامبۇ ١٤ كەمال میرا ودەلى
پەرسىا رېك و چەند سەرنجىك لە روشنائى و تىشك
كەمالى حەمەرەش ١٥
- لىكۈلىنەوه :
بۇومەلەرزە لە گۆمى مەنگدا و بەرە و ئا سۆيەكى گەشتەر
صەبا حى غالىب ١٧ سەرنجىكى سەرپىيى - فۆلكلۆرى كوردى كەريمى حىسا مى
ھەلېست ٣٩
- سەذا ن سالە ٤٦ عەبدوللە پەشىۋو
زەنۋەر قادر جاف ٥٠ ئا مادە كەردىنى
سوارە ٥٥ ئەممەد شەريفى
- چىرۇك
ھەلەتن ٦١ فازل كەريم ئەممەد
سەرشاشە ٧٢ سيا مەند شېخا غايى

بـهـشـيـ كـرـمـاـنجـيـ ڙـوـوـرـوـو

- بىرا نىبا يلمەز گيوناى و جىگەرخوين ٧
ڙ نا مەيىن ھاتى 21
بەلگە 25 بىرا نىننین ئىحسان نۇورى پاشا (٢)
205 ٤

کرمانج د دهولهتا دنیدا
ئا يابىچ وەجهى مانە مەحرۇوم ؟
بىلچىملە ئېپچىچ بۇونە مەحكووم ؟
ئەممەدى خانى
(سەددەى حەقەدەيەم)

ئەم گۆڤارە سالى دوو جار
ئەنسىيەتىووی كورد دەرى دەكا

مۇا

كۈفرىكى رووناڭبىرىي كىشتىپ



زىمارە ۳ / شوباتى ۱۹۸۵

ENSTÎUYA KURDÎ

Enstîuya Kurdî malbendeke çan-diya serbixwe ye. Di Sebata 1983 bi destê ronakbîrine kurd ên ji her aliyên Kurdistanê, hatiye danîn. Amanca wê besdarbûna şerê ji bo parastin û pêşvebirina çanda gelê kurd e.

Civandina gencineyên çanda kurdî, çekirina ferheng û rezimanên kurdî, légerînên li ser edebiyat, pişê û dîroka kurdî, çapkirina kovar û kitêbên kurdî, pékanîna kaset, sêlik û filmên kurdî şaxên bingehîyên xebata wê ne. Karekî wê yî serekeyê din jî nasandina çanda kurdî bi gelên cihanê ye.

Enstitu dixwaze bibe cîgehekî xebatê ji bo hemû zimanzan, nivîskar, dîrokñas, hinermend, pişkar û ronakbîrên kurd û dostêن gelê me.

Ew ji bo jiyan û pêşveçûna xwe, hewcê alikarî û tevkariya her Kurdê welatparêz e.

Hîmdarén Enstîuya Kurdî :

CEGERXWÎN, Ordîxanê CELîL:
Hecîyê CINDî, Yilmaz GÜNEY,
HEJAR, KENDAL, Qanatê KURDO,
REMZî, Osman SEBRî, Ismet Şerîf
VANLî, Tewfiq WEHBî, Nûredîn
ZAZA.

ئەنسىتىتووی كورد

ئەنسىتىتووی كورد مەلېبەندىكى كولتۇورىي سەربەخۆيە . لە مانگى فيشىريي ١٩٨٣ بە كۆششى چەندان روونا كبىرى كوردى ھموو بەشەكالنى كوردستان دەمەزرا . ئامانجى بەشدا ربوونە لە خەبات بۇ پاراستن و پەرەپىدانى كولتۇورى گەللى كورده

كۆكىرنە وەي گەنجىنەي كولتۇوري كورد، نۇوسىنى فەرەنگ و رىزمانى كوردى، ليكۈلىنە وە دەربارەي ئەدەب و هونەر و مىزۇوي كورد، چاپكىرنى گۇفار و كىتىبى كوردى، ئامادە كردنى كاسىت و قەوان و فلمى كوردى، ئەمانە بنچىنەي چا لاکىيەكانى ئەنسىتىتون .

ئەنسىتىتوو دەيە وى بىي بىي بە جىڭاي كاركىرن بۇ ھەموو زماننەس، نۇوسەر، مىزۇوناس، هونەرمەند و روونا كبىرىكى كورد و دۆستى كورد . بۇ مانە وەي ئەنسىتىتوو و پەرە سەندىنى، پىويستى بە ھاوكارى و بەشدا ربوونى ھەموو كوردىنى يىشتىمان پەروھەدەي .

صبا

کۆڤلەنکە رۆونا گەپپىيەن كىشتى بە



ژمارە ۳ / شوباتى ۱۹۸۵